


# XORREM

# DAYİKA RAPERÎNÊ

Romana Dîrokî

Nurettin Demirtaş



Li bakurê wê, qûntarên başûr ên çiyayên Elbûrzê hebûn. Li wir xumexuma avê bû. Ji vir lûtkeya çiyayê Demawend ê ku çar demsal jî berfgirtî ye, xuya dikir. Terîqeteke veşartî ya ku mezinên berê yên ola Zerdeştî ava kiribûn û ji nêzî Demawendê derbas bibûn, navê “Saheb-e Dilan” li vir kiribûn: Xwediyên Dil!

“Ya her kesî ye û ne ya ti kesî ye!”

DAYIKA RAPERÎNÊ

# XORREM

Romana Dîrokî

Nurettin Demirtaş

-2021-

Werger: Şervan Xebat

Dîroka Çap: **2021**

Cihê Çap: **Çapxaneya Azadî**

**Di şexsê Şîrîn Elemhûlî û Turkan Yuksel de**

**Ji bo bîranîna hemû berxwedêrên Xorremî**

Ev roman, pirtûka yekem e têkildarî rêbera mezin a civakparêz Xorremê hatiye nivîsandin. Ev roman, romana wan kesan e ku nayên jibîrkirin û ji bîr jî nakin.

## DER HEQÊ ROMANÊ

**Yê bi eşqê neketî çi fêm bike ji maneyê**
**Aşiq ji bîr nake**
**Yê ji bîr dike çi bizane**

Xorrem û Mazdek, li dijî bindestkirina jinê û çînîbûna di nava civakê de rabûne, ji bo bextewariya mirovahiyê têkoşiyane.

Çîroka wan, ne efsaneya wan mirovên yekem in ku ji bihuştê hatibûn. Ew ji nav agirên dojehê derbas bûne, ji rêyên bi kul û êş hatine.

Du beden, du cins, heman ruh:

Ruhê ku wê hemû mirovahiyê li ser nasnameyên wan ên cuda, bi awayekî azad bide jiyandin û bigihîne hevdu!

Di hemû serdeman de serweran berê xwe dane ruhê azad, êrîş birine ser, reş kirine, tine hesibandine.

Mazdek hat kuştin, Xorrem jî ji bîrkirinê re hiştin.

Navê yê hat qetilkirin di hiş de ma, piştî 1500 salan wekî "yekem rêberê mezin ê civakparêz" hat bîranîn. Hat gotin, hevjîn û hevrêya wî Xorrem, peyrewa wî ye û ji bo berxwedêrên piştî wê jî Xorremî hatine gotin. Wisa bi çend hevokan di qeydan de cih girtin. Hemû ev bû.

Esas pê nizanîbûn, Xorremiyê yekem Mazdek bû!

Navê Xorremê ya ku cêwiyê wê yê ruhî bi êş û azarê hat qetilkirin, li pîzotên bin xweliyê; ruhê wê jî di her pirçikên gerdûnê de bi cih bû…

Heger navê Mazdek nehatana zanîn, ma çi qîmeta Sasaniyan dima?

Lê, diviyabû Xorrem qet nehatibana zanîn! Bi ti şeklî ti bîranînên wê nemana!

Heger Xorrem bihatana zanîn, ew ê navê ti hikumdariyên zilmê nehatana bîranîn. Dema Xorrem a ku oleke jinê diyarî gerdûnê kiriye hebûya, ma nîzama zaliman dima? Helbet namîne, ji ber ku di çavkaniya vê baweriyê de berxwedan hebû! Ji ber vê yekê,

hewldanên ji bo tinekirina navê Xorremê hatin pêşxistin bûye mîna xulaseya dewleta despot.

Xorrem, ne tenê nasnameyeke li dijî monarşiya Îranê ye. Wekî çawa onûra hemû gelên herêmê ya bi kedê hatiye strandin temsîl kiriye, her wiha navê berxwedaneke wisa bû ku wê ji bo hemû mirovahiyê şadî bianiya.

Hedefa doza wê, ya wekî "berxwedaneke bi sed salan dewam bike" bi nav dikir, pir sade, lê di heman demê de mezin jî bû: Cîhaneke azad a ku serdest û bindest lê tine ye û xwe dispêre wekheviya jin û zilam!

Li kû derê zilm hebûna, li wir navê berxwedanê Xorrem bi xwe bû.

Ne tesaduf bû, Îrana mozaîka gelan e, li dijî vê Şîatî hilbijartibû.

Yan wê bi saya Xorremdînê hemû çînên mêtingeriyê bi erdê re bibûna yek yan jî wê rêyeke wisa bidîtana ku karîbûna ew jî di nav xwe de hilgirtana. Ya ku Îranê kirî, ev a duyemîn bû.

Vê rêyê Îran ber bi Şîatiyê ve bir, lê sedemeke din jî hebû, li beramberî miletperestiya Ereban parastina nasname û ferqa Farsan. Sedema din jî ew bû ku Şîatî ji bo ew bingehê çanda civakî ya wekhevîxwaz û azadîxwaz a ku heqîqeta Xorremî jiyan dabûyê, guncavtir bû.

Fikra Xorremî ne tenê di dema jiyana Xorrem de, bandor li demên piştî wê jî kirin û îstîqameta hemû gelên berxwedêr diyar kir. Bû navê berxwedana civakî ya ku domahiya sed salan li dijî hemû nîzamên zilmê domdar bûye.

Ji bo were jibîrkirin ti tiştekî ku serweran nekirin nema. Ji ber ku ew ne dijberî olê bû, bi wê baweriya xwe ya olî jî heqîqet kifş kiribû.

Ji wê heqîqetê tirsiyan. Ji bo were jibîrkirin hewl dan çavkaniya wê bimiçiqînin.

Ji bo jibîrkirinê hiştin, ne hewldaneke pasîf bû, halekî lincê yê bênavber bû. Lînca li ser esasê derewan, amûrê ne rewa yê nixumandina her cure gunehî bû. Lînc, makîneyeke xofê bû ku zeîfetiya wan kesên ku di warê fikrî de lawaz vedişart. Lînca zilam pîroz bû. Merasîmeke wisa bû ku yên nikarîbûn bi fikrê tine bikin, bi tirsê tine dikirin.

Lê belê, wekî çawa ti tiştek ji tinebûnê çênabe, ti tiştekî heyî jî bi temamî tine nabe, vediguhere. Kevneşopiya cengê ya eşîrên berê çavkaniya esasî ya berxwedêriya Xorremiyan bû.

Ya kevn, di nav ya nû de dewam dike. Xorremiyên nûjen îspata vê ya herî mezin in!

Fikrê Xorrem, fikrekî wisa yê civakî bû ku her cure qetlîam û linc derbas dikir. Şervaneke herî wêrek a fikrê bû, di dîrokê de bêhempa bû.

Piştî pêvajoya xwedewandan, bibû tekane nasnameya jinê ya ku li ser navê wê ol hatibû avakirin. Baweriyeke ku bi azadiyê, exlaq û îradeyê teşegirtî pê re hebû. Eşqa Xwedê û eşqa civak û mirov ji bo wê heman bû. Eşq, pêşengê civakê bû. Xwedî feraseteke gerdûnî bû, di kêliyê de xwe bi xwe ava dikir. Ji bo damezrandina jiyana azad û wekhev a civakê pêşengî kêlî bi kêlî dikir. Lêgerînên wê bêdawî bûn, lê xeyalên wê yên siberojê jî ji kêliyê ne qut bûn.

Bedewiya heqîqî ya di sadebûna wê de dijî, êşên kûr ên di hezkirina wê de bicihbûyî, siberoja di kêliyê de dîtî, mirov karibe di nav mercên dema wê de fêm bike, ew ê rêzdariya me ji bo wê mezin bike, di rêwîtiya me ya xwebûnê de bibe rêberê me. Ji ber ku ew mînaka şaşnebar a vegera li cewher û xwegiramiyê ye!

Êşa dilên hemû deman, haveyna hemû bedewîtiyan, lêgerînvaneke hezkirina bêdawî û avakara jiyana azad!

Şervana nemir a heqîqetê, alaya onûrê ya berxwedanên bêeman a sedsalan!

Dayika
Her tiştên zindî
Û
Raperînê
Xorrem!
Canana hemû canan, ma tê jibîrkirin?

# BEŞA YEKEMÎN: ÊŞÊN VEŞARTÎ

## Sirê Çiyê, Emanetê Pîroz!

Rehber got:

-Dema tê bîra mirov, mirov pê diêşe.

Beriya niha jî di vê rêyê re derbas bibû. Bi saya wê xebera girtî, vê carê hêviyeke pir mezin pê re çêbibû. Ew koma ku rehberiya wê dikir jî pir bi kelecan bibû.

Eger nehatibana bîra wan, rêwîtiyeke ewqasî zor û zehmet nedidan ber çavê xwe. Jibîrkirin mirin, bibîranîn jî jiyan bû. Tam jî di wê kêliyê de, bi agahiyên nû girtî, bêyî li demsalê binêrin, bêyî rawestan, bêyî taloqkirinê ji bo wî emanetê pîroz ê ku çiyê veşartiye bibînin ketibûn ser rê. Tecrûbe û fîzîkên wan her çiqasî zeîf be jî ji bo jiyanê îradeyeke pir mezin raber dikirin.

Her tişt di bin berfê de mabû.

Latên biriqokî yên kevzgirtî, darên kurt, tûmên bistrî, dûzbûniyên fireh, şiverêyên zirav û dirêj yên li kêleka çem hemû spî bibûn. Mîna ku li ser şaxên darê pembo bi dest hatibû danîn.

Berfeke ewqasî zêde bariya bû, dengê ji şelaleyê dihat jî hisekî mîna dengekî spî dida.

Ew rûberê spî, qalin û pêlpêlî yê çiyayê ku lûtkeya wê di nav ewran de winda bibû, ji bo veguhere aşûteke ku di wê kêliyê de her tiştî bide ber xwe û bi xwe re bibe, amade bû.

Çiya û berf li hev bûn.

Mirovan êşên xwe bi rengê reş û çiya jî bi spiyeke bêdawî îfade dikir.

Berf, mîna ku çiyayek tine be wê nikaribe bedewtiya xwe nîşan bide, herî zêde jî li ser çiya dibariya.

Sirên veşartî, heta dema Nebî Nûh diçûn. Wan siran mirov dikşandin wir, ango çiya. Mirovên nikarîbûna ji ezmûna çiya derbas bûna, nikarîbûn bigihiştana sirên jiyanê jî.

Çiyayên hembêza xwe ji mirovan re vekirî, bi saya berfê ne tenê wan diceribîne, di heman demê de ji dijminên wan jî diparêze.

Çiya, xwediyê razan bû. Yên biketana pey diviyabû wêrek bûna.

Te got çiya, wêrektî ye. Cihê ew ên dilmezin e. Mirov bibêje welatê ew kesên ku dilê wan mîna çiya ye, wê rasttir be: Welatê Wêrekan!

Çiya, welatê wan kesan e ku dizanin çima hatine dinyayê, di ferqa maneya xwe de ne! Ji ber afirînera maneyê jin e, çiya welatê jinê ye.

Eksî hemû demên tarî, çiya tekane cihê ronî ye. Agir dişewitîne, av paqij dike, çiya dîsa çêdike. Ji dema ku Nebî Nûh keştiya xwe lê daniye, çiya bûye welatê jiyana nû. Ya ku ev jiyana nû ava kiriye, dîsa jin bûye. Sirê çiyê jî li vir veşartiye.

Sirê welatê jinê xwe tenê ji bo ew kesên ku bi dilekî pak li maneyê digerin, diyar dike.

Yên sirê çiyê nizanîbûn, wê hayê xwe ji piştî tofanê jî tine bûna. Piştî tofanê hemû heqîqet li çiyê kom bûn.

Ji bo her çavekî nebû nesîb ku li çiyê binêre û heqîqetê bibîne.

Heta dil mezin nebe, çav nikare heqîqetên mezin bibîne. Li gorî hemû olan wisa ye, piştî tofan rabûye, jiyanê li çiyê dest pê kiriye. Ma heqîqeta gerdûnî bêyî çiya dikare were fêmkirin? Çiya, welatê heqîqeta gerdûnî ye.

Jin, sirên welatê heqîqeta gerdûnî hemûyî di dilê xwe de hildigire. Heqîqeta wê heqîqeta gerdûnê ye. Yên bixwazibin fêm bikin, lazim e hemû zorî û rîskên keşfeke gerdûnî bidin ber çavê xwe.

Ma mimkun e mirov ji dûranî çiya fêm bike?

Ji deştê dîmenekî mezin ê çiyê xuya dike, lê ev tenê dîmenek e. Li gorî ku jiyan tenê ne dîmen e, ji bo ku xwe bigihîne sirê wê ji bilî çûyîna çiyê ti çare tine bû.

Dîmenê çiyê rastî bû, sirê wê yê veşartî jî heqîqet bû.

Komek evîndarên heqîqetê jî ketibûn pey vî sirî. Girên ku her diçû bilind dibûn û li pey hev rêz bibûn derbas dikirin.

Dema dihatin ser yekî, wê çaxê xwe digihandin qûntarê çiyayê din. Bêdeng bûn û bi çiyayê asî yê xwe bi hizna spî rapêçayî radipelikîn.

Çend carekî rêya xwe şaş kirin, hatin ber kendal. Ji ber ew biriqokiya spiyê, ku çav delandin, nikarîbûn çavên xwe tam vekin. Tevî rehberê wan bi ezmûn bû jî bivênevê wê rêya xwe hin caran şaş bikirana

Beriya firtoneyek bi ser wan de bihatana, diviyabû derbenda çiyê, ku tekane cihê derbasokê ye, derbas bikirana. Artêşa Îskender nikarîbû ev cih derbas bikirana.

Rehber got:

-Em hinekî din lezê bidin xwe, qûntarê dawî ye!

Ev “qûntarê dawî” ya çendemîn bû! Êdî pê bawer nedikirin. Tam gotin qediya, vê carê dareçeyeke mîna zeviyê berfê lê hatiye û kaşekî din derket pêşiya wan. Heqê wan hebû bawer nekirine! Dîsa jî gilî û gazind nekirin, meşiyan.

Hewa sar bû, nedibariya. Ji ber xwêdanê şilûpil bibûn. Di germa Tebaxê de heman rê bidana ber xwe ewqasî xwêdan nedidan; di barana biharê de wisa debûşî şil nedibûn.

Herî dawî derbendê xuya kir. Li pêşiya wan tenê kaşek mabû. Navber danê, lê dema ku dîtin mîna ava cemedê bi ser pişta wan a xwêdandayî de tê rijandin, navbera xwe kurt kirin.

Rehber:

-Va ye, derbenda ku Îskender nikarîbû bibihurîne! Gaveke din em ê lê bidin û derbas bikin!

Bi van gotinan gûrûra wan geş bibû, enerjiyeke taze hatibû lingên wan, keyfa wan hatibû cih.

Pir kêm mabû bigihêjin derbendê, dîtin berfa nerm dide ser bejna wan. Nikarîbûn dora xwe bibînin. Nikarîbûn lingê xwe rakin, gavên xwe biavêjin. Ew û berfê ketibûn ber hev.

Rehberê li pêşî dimeşiya, berfa ku bejna wan derbas dikir, bi dest û milên xwe didewisand, heta tanî ber nava xwe, piştre jî hinekî bi gewda xwe didewisand. Herî dawî jî çoka xwe didayê û tenê dikarîbû mesafeya gavekê bi pêş de biçe.

Di vê hewayê de dîtina rê jî pir zehmet bû. Eger serwextbûna Rehber jî nebûna, di kêliyê de dikarîbûn rêya xwe bi temamî winda bikin û li çiyê winda bibin biçin.

Tenê asîman didîtin. Bi qasî du saetan meşiyan û gihiştin derbendê. Hema hema 10 saet çêbibû li ser rê. Êdî ew saetên ku ji ber xwêdanê dişewitîn li pişt xwe hiştibûn, vê carê jî ji ber sermayê diqefilîn.

Cemedên ji por, birî, poz û cilên wan dadiketin digihiştin hev; bi wan lekanên cemedgirtî, her gava diavêtin jî li ser wan berf-cemet zêde dibû, lingên wan giran dibû.

Dema dîtin êdî lekan kêr nayên, vê carê derxistin û li pişta xwe girê dan.

Li derbendê firtoneyeke hişk ew girtin. Her çiqasî êdî berf ketibe asta bin çokên wan jî wekî tozê lê hatibû. Vê berfê ling dişewitandin.

Diviyabû lez bikirana, lê firtoneyê nedihişt çavê xwe jî vekin, dest ji pêşdeçûnê berde, nikarîbûn êdî hilmê jî bigirin. Heke bi lez û bez derbas nekirana, wê lingên wan bişewitiyana, heta dibe ku li derbendê bicemidiyana jî.

Eger wisa dewam bikira, diviyabû paşde vegeriyana. Di vê rewşê de jî wê tarî biketa û zoriyên mezintir derketana pêşiya wan. Rehber, her îhtîmal hesiband. Biryar da, lezkirin wê helwesta herî baş be.

Tevî ku diqîriya û diaxivî jî ji ber dengê firtoneyê fêm nekirin bê rehber çi dibêje. Bi îşaretên dest û milan diyar kir ku lazim e bi lez bimeşin.

Firtoneyê pergala wan xera kir. Tevî ku dûzatiya derbendê bi şeklekî belave û bi zorê derbas kirin jî ji ber pûkê ber xwe jî nedidîtin. Ji ber vê yekê jî nizanîbûn derbend li pey xwe hiştine û gihiştine milê din ê çiyê.

Demekê wisa li wan hat ku nikarîbûn gavekê jî biavêjin û li cihê xwe jimartin. Êdî nikarîbûn rehber jî bidîtana. Dema leza firtonê hinekî kêm bû, meşa xwe domandin.

Dema firtone hinekî kêm bû, fêm kirin ne tenê derbendek, ser çiyayekî derbas kirine. Pir li jor bûn. Ne di ferqê de bûn, hema hema xwe gihandibûn lûtkeyê.

Dema hewayê vekir, pêşiya wan jî bû qadeke vekirî. Bi qasî çav didît, girên berfgirtî li pey hev bûn; li cihên pir dûr jî lûtke û şkêrên dora çiyayên berfgirtî xuya dikirin. Texmîn kirin, ku cihê ew lê dimeşin pir bilind e.

Rehber gote wan, îstîqamet ne şaş e, lê pir zêde bilind bûne. Ji ber vê yekê dikarîbûn li şkêrên rê nadin yan jî li kendalekî rast bihatana. Ji ber cemeda li erdê hişyariya baldariyê li her kesî kir. Hê galegal bû, li milê xwe yê rastê valatiyeke mezin dîtin. Bawer nekirin ku ewqasî bilind hatine.

Şiverê tine bû. Cihê tê re derbas dibûn, li milê wê yê çepê şkêrekî tîk bû, milê din jî ber bi jêr ve bi meyl bû û eraziyeke cemedgirtî bû. Firtoneyê erd hêlû kiribû, şematokî bibû.

Rêwiyê dildarê emanetê pîroz yê navsere, esmer, simbêltenik, çavreş, wêrek û jêhatî, li pey rehber, lê li pêşiya ew ên din, bi gavên ji xwe bawer dimeşiya. Ji nişkê ve lingên wî ji erdê qut bûn.

Got terp û li ser erda cemedgirtî ket. Pê re li ser kêlekê ber bi jêr ve bi lez şemitî!

Ti tiştekî xwe pê bigire tine bû. Bi hemû laş û destên xwe ve xwest xwe bixişiqîne û xwe bisekinîne, neynûka tiliya navîn şkest, serê tiliyên wî xwîn bûn, dîsa jî nikarîbû xwe bigirta. Giran giran ber bi jêr ve şemitî û çû.

Talûkeyeke kujer bû. Li jêrê valatiyeke mezin li bendê bû. Baş dizanî li kendalekî kûr rast hatiye. Herî dawî kefa destê xwe bi erdê zeliqand û sekinî. Bi hisên xwe bawer bû: Heger tiştek nekirana wê gaveke din mîna teyran bifiriya! Bi destê xwe yê rastê hewl da xençera li ber xwe derxîne. Ewqasî qufilî bû ku girtina xençerê jî zehmet bibû.

Di serî wî de tiştên ku gaveke din rû bidin çêbûn. Dema ji kendal werbû, hevalên wî qîrewîr bang dikirin, lê belê wî tenê dengê fîqîniya wê valatiya mezin digirt. Dibe ku parçe parçe bibûna. Ketina xwe ya ji kendalê anî ber çavê xwe. Ji ber vê xeyala kêliyekê jî veciniqî.

Dema his kir dike ji kendal werbibe, cara dawî xwe dayê, piştî çend ceribandinan, xençera xwe li navbereke berfê çikand.

Çi heye ku di wê kêliyê de ferq kir lingê wî li valatiyê ye; kendalê bêbinî ew ber bi xwe ve dikşand…

## Dengê Kendal û Şervanên Xorremê

Li kêleka kendal rûniştî, guhdarî dengê ba dikir.

Di nav wê fîqîniya ba de bangên egîdî yên Xalê Kevî, Hoşeng, Şîrîn û şervanên din ên Kewyarê hebûn. Deh sal di ser re derbas bibû, heçkû mîna duh bû, hat bîrê çawa bi heyecanake mezin derbasî milê din ê vî kendalî bibûn.

Koma wan ne qelebalix bû, lê şervanên herî xurt girtibûn ba xwe. Destan şandibû milê Xorasanê, bi xwe jî piştî ku gundên li binarê Demawendê geriya, derbasî gundê berê yê Kewyaran bibû.

Beriya biçe çiyê, ji bo ku çavdêriya artêşa zilmê bikin li ba şervanên xwe çibûn. Li herêmê li dora Yekîneya Artêşa Sasanî ya ku tirs û xof xistibû dilê gel, bi awayekî veşartî digeriyan, bi qasî ku karibin qiseyên nobedaran bibihîzin hatibûn nêz, lê ji ber ku di veşartîbûnê de bibûn hoste, ti kesî ew ferq nekiribûn.

Dema guhdarî dengê kendal dikir, hemû bîranînên wê hatin ber çavan, di çavên Xorremê de ev bibû kaniyeke hestiyariyê. Dema ji wir veqetiya, dîsa nehiştibû ti kes pê bihese çavên wê tijî bûne.

Şervanên li balê, ji ber gotinên li ser şerê vir, her tim serbilind bûne. Niha jî ew qada ku şerê efsanewî lê qewimîbû bi çavên xwe didîtin.

Her çiqasî bi qasî berê gavên xwe bi lez nediavêt jî hê jî lingê wê saxlem pê li erdê dikir. Beriya li hespê siwar bibe, bi hefserên wê girtin, di nava hûşûyê de, ji kêleka kendal paşde vegeriya û grûba xwe daxist nava dolê.

Ji bo ku hespên xwe nedin nava tûmên dirî yên dol rapêçane, ew li daristana gur berdan û meşa xwe domandin.

Piştî ku darên cur bi cur ên li dolê belav bûne li pey xwe hiştin, ketin ser rêya gundê li beramber. Tişta jê re rê digotin, şiverêyek bû û tenê yek kes dikarîbû tê re derbas bibûna. Dora wê cih bi cih bi deviyên striyan girtîbû, cih bi cih jî li kendal vedibû.

Dema ku ji kendal dûr ketin, ketin nav daristaneke gurtir. Xorremê got di nav vê daristanê de rêyeke veşartî heye û bi saya vê rêyê dikarin yekser xwe bigihînin binê kendal.

Ji bilî kesên ku demekê li wî gundê ber kendal diman, ti kesên din nizanîbûn rêyeke wisa heye. Xorrem yek ji wan kesan bû, bi vê dizanî.

Ev patîkayeke pir kevn bû. Ser wê bi xakê, çiloyan hatibû qepatkirin, lê kêm zêde şopek jê mabû.

Dema gihiştin binê kendal li jorê mêze kirin, asîman winda bibû, ewqasî kûr daketibûn ku dengê wan olan dida.

Piştî ku hinekî meşiyan, hestiyê mirov û heywanan dîtin, pel û ax ketibû serê.

Ewqasî zêde hestî hebûn ku ev şervanên wêrek bi xwe jî tirsiyan û vekişiyan.

Ev, şopên şer bû. Demekê li wir bêdeng man, dûvre ber bi jêr ve meşiyan. Eraziyeke wisa bû ku ne dar ne jî nebateke din hebû. Tijî kevirên tûj bû. Li cihê ku êdî derfetê meşê nedida, sekinîn. Li vir hestiyê mirovekê dîtin. Di nava hestiyan de ku beşek wan ketibû nav keviran, parçeyên cilê hirî û qehweyî hebû. Xorem gihiştibû hedefa xwe:

"Jê re Tavge dihate gotin. Ji bo wê deynekî min ê derengketî heye. Em wê jî bibin cihê gund. Wê çaxê dê ruhê wê azad bibe!"

Li jora gund "Şkêrê Pîroz" yê ku miriyên xwe datanînê hebû. Hestî li wir danîn. Di nav qebîleya Kewyaran de kevneşopiyek hebû, li cem miriyan xatirayek datanîn. Xorem, xençera Kewyaran a ku navê wê li ser nivîsandibû, wekî xatiraya xwe ya herî bi nirx danî wir. Bi xemgînî ji wir veqetiya…

Di nava xirbeyên gund de ti tiştekî ku wekî xatira karibin bigirin ba xwe nemabû. Careke din li hespên xwe vegeriyan.

Parçeyê ji êlegê hirî yê Tavge mayî xist ber kemera xwe û li hespê xwe siwar hat. Berê xwe dan Xorasanê. Rêya wan dirêj bû û wê rêwîtiya wan jî tijî zehmetî bûna. Wê bi dizî biçûna heta wê derê.

…

Wextê ji xakên eşîra Lawîn ketin Xorasanê, gundiyên ew dîtin wekî xeyalet dîtine lê hatibûn.

Li wî gundê ku beriya bi salan ji bo starê hatibûnê vegeriyabû. Gund eynî bû, eşîr eynî bû, kevneşopî jî eynî kevneşopî bû. Tenê tiştê guherî, sûret bûn.

Mirovên berê dinasîn, bi piranî miribûn. Yên ew nas dikirin jî hêna bawer nedikirin ku ew sax e.

Têkildarî wê ewqas çîrokên bi êş bihîstibûn ku diviyabû heta niha bi hezaran caran hatibana kuştin. Di demeke nêz de gotegoteke derketibû, digotin sax e, lê ti kesî îhtîmal nedida tiştekî wisa. Tevî vê jî hin kes hebûn, bi sond û peyman digotin li Mervê Xorrem dîtine û mîna xeyaletekê ji ortê winda bûye.

Bi saya qasidên şandibûn derdor, di demeke kurt de pê hesiyan ka Destan li kû ye.

Wê digot, li gorî hesabên wan lazim e heta niha ji hundir garnîzona li Şîrvanê feth kiribe. Xorremê dixwest vê garnîzona eskerî bi kar bîne û têkildarî Qesra Sasaniyan îstixbaratê wergire. Dixwest tenê bi vê armancê qesrê bişopîne. Ji derveyî vê rewşê, wê hemû karên wê li gel şervanên wê bûna. Mîna demeke dirêj kiribû, wê dîsa veşartî bimana. Tenê gundekî eşîra Lawîn ew dîtibû. Bi saya wan, tevî şervanên xwe, stargehên xwe yên veşartî jî di demeke kurt de çêkirin.

Niha wê sîstemeke kurye di nava Xorasan û Reyê de ava bikirana û ti kesî nizanîbana kengî li Reyê ye, kengî li Xorasanê ye.

Diviyabû teqez li ba Destan biçûna Reyê. Wê û hevrêyê wê Destan halê berê yê wî gelî dizanîbûn. Pev re li wan gundên malên gel ava kiribûn, ji bo rêxistinkirin û perwerdekirina gel xebitîbûn, dem çêbibûn bi hev ketibûn nav şer jî.

Pir wext neket navberê, xwe gihand Destan û ketin ser rêya Reyê.

Tevî ku di nava rojê de li sûkê-bazarê digeriyan jî ti kesî ew nas nekirin. Ji ber vê keyfxweş bûn. Dema li wir bûn, rê û rênîşandêrên ku bikaribin bi her alî ve liv û tevgera wan rehet bike, amade kirin.

Hemû amadekariyên xwe di demsalekê de pêk anîn.

Li gorî agahiyên ji qesrê tên, qesr dihesibîne ku hemû şopên qetlîamê veşartine û ji bo careke din zindî nebe jî di her firsendê de, Qral Xusrew bi xwe aqûbeta ew kesên ku serberjêr di nav axê de çiqandibûn bi bîr dixist.

Ditirsiyan!

Xorrem gihiştibû vê encamê. Tevî ku 14 sal di ser qetlîama mezin re derbas bibû jî hê destê tirsê di pêsîra wan de bû.

Xorremê şervanên xwe li hev kom kirin û tenê du gotin kirin:

"Wext hatiye!"

Şervanan ji ber ku wezîfeya xwe dizanîbûn, rehet bûn. Xatir ji Xorrem xwestin, ji bo cejna ku wê piştî çend rojan were jî di wê kêliyê de cejna hev pîroz kirin. Ew ber bi Demawendê, Xorrem jî ber bi Xorasanê ve bi rê ket. Roja 12'emîn a meha Adarê bû. Salvegera qetilkirina Mazdek û hevrêyên wî bû. 13'ê Adarê jî salvegera qetlîameke mezin a Mûğan bû…

Li Tîzpon, Hemedan û Hewremanê, şervanên Xorremê wê hemwext li çar aliyên herêma Demawendê gel rakirina ser piyan. Ji çiyayên Med wê xwe pêl bi pêl berdana bajaran û ji bo bîranîna qetlîamekê ji Garnîzonên Sasaniyan 12 lib bihatana şewitandin.

Wisa jî wê moral bidana gelê Êranşehrê, agirê di dilê wan de geş bibûna.

Li her aliyê welat, alîgirên wê li malên hevpar ên veşartî bi rêgezên wekhevî û azadiyê tevdigeriyan. Lê Xanedanê Sasaniyan wê bigota ev heyecaneke Newrozê ye. Qesra ku hayê xwe ji moralê gel û hejmara şervanên li çiyê tine bû, wê li ber çavê gel tenê wekî qalikekî bimaya.

Dîsa bi saya vê, sîxurên qesrê wê bigotana ew li Çiyayên Med in, lê wê rêxistinkirina gel li Xorasanê bidomandana.

Dema şervanên li Demawendê, yekîneya herî har a artêşê bi erdê re bikirana yek, wê ji bo qesrê bibûya peyameke herî watedar û dijwar! Emrê ti kesên li qesrê wê têra fêmkirina vî sirî nekirana.

Şeva ku agir hatin pêxistin, Xorremê cilekî zer li xwe kir, cejna Newrozê li gelê ku cilên sor li ber kiribûn pîroz kir.

Jinên gund fêrî rengê sor bibûn, dema ku ji Xorremê re pirsîn çima di vê roja cejnê de rengê zer li xwe kirine, cara yekem wê Xorrem bîranînên xwe yên zarokatî ji wan re bigotana.

Her tiştî, bi êşên dayika wê ya "Zer" Dayzerê dest pê kiribû…

**Bîranînên Bişewat**

**Straneke kevn a rojhilat im**
**Li neqaratên min gul xwînî dibin**

Rengê herî zêde jê hez dikir zer bû. Ji payizê hez dikir, di pelên payizê de her tonê zerê hebûn. Ji tavê hez dikir, zer bû. Ji agir hez dikir, kevçika dilê wê yanî tam orta wê zer bû.

Rengê roja Şemiyê zer bû. Rengê hezkirina wê zer bû. Roja vehesîna tavê bû. Ji wê rojê hez dikir, ji ber ku herî kêm mehê rojekê be jî tenê wê rojê têra xwe bavê xwe didît. Hejîrên li baxçe zer bûn. Balîfa wê zer bû. Kiras-fîstanê herî jê hez dikir, zer bû. Dayika wê bi destê xwe dirûtibû.

Zer, dayika wê bû! Rû, por û navê dayika wê zer bû; mîna navê xwe yê bûyînê bû. Zare bû, Cêger bû û her kesî digotê Dayzer. Ango Dayika Zer! Destpêkê gotine "Dayzerî", dûvre bi demê re tîpa "î" avêtine milekî û gotine Dayzer.

Mîna ku bi hezaran salan dayika wê bû. Dayiktî, hilgirtina barê hezaran salan bû. Dema ku şîret li jinên ciwan ên ku nû dibûn dayik dikir, destpêkê digot, "keça min a xweşik", her tim digote wan bibin "mîna darên hezaran salan":

"Dayiktî ne mêzekirina zarokan e. Dayiktî mirovatî ye. Domandina kevneşopiya mirovatiya bi hezaran salan e. Qîma xwe bi her bextewariyê neanîne, bi her êşê neketina xwarê ye."

Çavên wê yên êş vedigotin, mîna du agirên li mabeda hezaran salan bû. Mîna zêmareke hezaran salan bû. Çavê Dayzerê, awazekî şewat bû mîna navê wê. Şewat mêze dikirin.

Ew çav ewqasî birqokî bûn ku rengê wê nedihat ferqkirin. Yên li wan çavan dinêrîn, mîna li tavê dinêrin, çav didelandin.

Çavên hewl didan rengê çavê Dayzer fêm bikin, mîna di spiya berfê de dişewitîn, diêşiyan. Ti kesî nikarîbû çavê xwe nede aliyekî û

binêre. Hinekî dewam bikirana, rondik bi çavan diketin, hem ji ber birqokiyê hem jî xemgîniyê…

Nedihat fêmkirin ka ew çavên roniyeke zîvîn jê diçûn qehweyî ye, hingivîn e, ela ye yan jî kesk e. We digot qey digirî, nedigiriya. Dema dikeniya jî çavê wê xemgînî bûn. Di azara wê de zirinc diheliya, di êşa wê de avên geş disekinîn. Wan çavan çi dîtibûn çi nedîtibûn, çi jiyabûn, xwedê dizane.

Mirina kurê wê yê yekem Sata ji her tiştekî zêdetir bandor lê kiribû. Bavê wî nav lê kiribû. Navê yek ji pêşengên berê yê Medan bû. Her wiha, her çiqasî di Avestayê de hejmara sedî îfade dike jî, bavê wî wekî navê qehremanekî ji ziriyeta wan e, ev hilbijartibû.

Mirina wî, di dema hikumdarê pêşî de bû. Wê çaxê li Tîzponê (Tîsfun) rûdiniştin, ango li paytexta Sasaniyan.

…

Hikumdar Fîrûz li dijî Ak Hûnan ketibû şer û jiyana xwe ji dest dabû. Piştî wî birayê wî Belaş hatibû desthilatdariyê û polîtîkayên nerm şopandibûn.

Heta wê demê hemû text bi xwînê hatibûn destxistin. Ma mimkun bû ku mirov li ser textê birûnê û karibe xwe ji rijandina xwînê dûr bixîne?

Rahîbên çavbirçî û hemû derdorên asilzade yên ku ji xwînê têr nedibûn, şer dixwestin. Ji ber feqîriyê bibû himehima gel û ji ola desthilatdariyê jî dûr ketibûn. Li beramberî vê tekane çare dîtina dijminekî û bi şerê dijmin jî bêdengkirina gel bû.

Li dijî vê, Hikumdar Belaş hewl daye nêzî şer nebe, serhildana ku birayê wî Zareh hewl daye geş bike jî asteng kiriye.

Di serî de Xrîstiyan, bi rêzdarî nêzî bawerî û çandên cuda bibû. Di nav ortameke wisa de liv û tevgera terîqetan jî zêde bibû. Hema hema hemû terîqetên li dor bajêr hewl dane hevjînê Dayzerê, Qade ji bo xwe qezenc bikin, lê nikarîbûn xwe bigihandana ew sirê di mejî û dilê wî de.

Li hemberî qezenca neheq a ku zilamên paşverû yên oldar bi dest dixin, biçûk-mezin gelek terîqet hatibûn avakirin. Lê ev terîqet di nav xwe de girtî û bêbandor bûn.

Bi saya Arad, hayê wan ji hebûna terîqeteke biçûk, veşartî, lê hêzdar çêbibû.

Arad, di terîqeta bi navê Sanewî de ku ji derve re vekirî bû, cih digirt. Wisa bû ku ji bo xebatên rêxistinkirinê hatibû vî bajarî.

Ji dema hatî ve, pê hesiyaye ku Qade li beramberî ew rahîbên ku olê ji bo her cure berjewendiyên xwe yên takekesî bi kar tînin, ji rê derketine, ne rehet e. Biryar daye li mala Qade bimîne, hem deriyê malê hem jî dilê malovanan jê re vekirî bûye.

Rahîban hifza xwe ji Qade dikirin, wekî çawa dijminahiya wî dikirin, her wiha bi dizî be jî heyranî wî bûn. Ji ber ku ji rahîbên navdar jî zanatir bû û di nav gel de pir dihat hezkirin. Ola Xrîstiyan, Cihû mîna ola xwe dihesiband. Li dijî ew kesên ku cihêwaziyê dikin helwest digirt, heta ku derseke mirovahiyê nedê jî, wan poşman neke jî dest ji wan bernedida.

Zanebûna wî ya olê kûr bû, ne wisa şeklî bû. Sohbetên wî kurt, lê bibandor bûn, encamgir bûn. Hostayê guhdarkirina mirovan bû. Ew qabîliyeta wî ya helkirina pirsgirêkan, mîna îşaretekê bû, te digot ruhê Mûğên berê yên adil li gel xwe dihewîne. Dema ku Zerdeştî kiribûn ola dewletê, êdî ji bo ruhaniyan nema digotin “Mag” yan jî “Mûğ”, digotin “Mûbed”. Mûbedan wer dihesibandin ku Qade hê jî kevneşopiya Mûğan didomîne. Bi rastî jî li mala Qade, Zerdeştî bi hemû taybetmendiyên xwe ve dewam dikir û wî bi xwe jî taybetmendiyên Mûğekî zana nîşan dida.

Mêvanê wan Arad, ciwanekî derdora 20 salan û mîna navê xwe bi ruhekî melaîketan bû. Simbêlên wî yên reş ên lêvên wî qepat dikin, ew mezintir nîşan dida.

Behsa fikrê Manî dikir. Komployên ku ruhaniyan ji bo berjewendiyên xwe çêkiribûn, yek bi yek tanîn ziman. Bi zanebûn, pîr û pergala xwe ve bal dikşandin.

Bi êş tanî ziman ku ti ferqa statuya jinê ji koletiyê tine ye, destnîşan dikir ku ji bo azadiyê lazim e ola sexte bê terikandin, li dijî vê berxwedan neçarî ye, ji bo berxwedan û şer jî rêxistinbûn lazim e.

Ji vê berpirsiyarî, kesayeta kamil, zanebûn, bawerî û biryardariya Arad, di vî temenê ciwan de, Qade pir bandor bibû.

Der heqê jinan de ji hemû olan cudatir dipeyivî. Mîna ku Manî li ser piyan bû. Mîna ku ji cem Manî hatibû. Halbûkî ji dema qetilkirina Manî û şûn de bîranîna navê Manî, dibû egîdiya li dijî ejderhayan, ango mirina xwe dayîna ber çav.

Qade li tiştê digeriya dîtibû; ev terîqeta veşartî, dikarîbû bibûya hêviyeke berxwedanê ya ku karibe qedera hemûyan biguhere.

Lê çi heye ku Arad beriya têkiliya Qade li ba terîqetê deyne, wê bimiraya. Ew ê şopa hevrêyên wan jî nehatana dîtin.

Di wan rojan de dihat gotin, bajarên derdorê jî tê de, li gund û bajarokan gelek kes bi şeklekî bi guman mirine.

Mirina Aradê egîd jî bi guman bû, di nav şewatê de ku bi mala Qade ketibû, miribû. Di nav vê bûyerê de li gel Arad kurê wan Sata jî şewitîbû û jiyana xwe ji dest dabû.

Yên meraq dikirin, çima çavê Dayzerê wisa şewat mêze dikin, lazim bû vê bizanîbana. Şewateke hezar salan bû, mîna ku bi hezaran salan ev êş di nava xwe de girtibû.

Mala wî neşewitîbû, hatibû şewitandin. Ti carî diyar nebû kê wisa êrîş kiriye. Gumana Qade li ser ruhaniyan hebû.

Şeva ku 4'ê Mijdarê digihîne 5'ê Mijdarê bû. Arad dikarîbû bi rehetî xwe biavêtana derve, lê derneket: li ba Qade ma, xwest Sata xelas bike, lê hersê bi hev re ketin nav agir.

Dema ku Qade ew derxistin derve, herduyan jî nefesa paşîn didan.

Di dema şewatê de qîrînên Dayzerê hemû masîvanên li dor Dîcleyê di qeyikên xwe de razabûn şiyar kir.

Li wê mehelê ti kes wê şevê raneza.

Mîna ku hezaran salan qîrînên Dayzerê bêdeng nebibû.

Ti kesî wê ew qîrîn ji bîr nekirana. Piştî hezaran salan jî wê ew qîrînên Dayzerê bihatana bîranîn.

Di nav rondikan de wê bi bîr baniyana û bigotana:

“Me qîrîna agir bihîst!”

Li malê ocaxa wan qet neditefiya, ti carî av li agir nedikirin, pakbûna di pîrozbahiya wê de wekî îbadet dihesibandin. Lê, agir Arad û Sata tine kiribû.

Mîna pepûleyê ji vê dinyayê koç kiribûn…

Piştî bûyerê bar kirin, çûn diyarê xwe. Li vir demeke dirêj herdu tenê man. Derbaskirina şoka bûyerê sal xwarin. Wekî bîranîna bi êş a şewatê jî li ser milê Qade şopên şewatê man.

Piştre zarokeke wan çêbû û bawer kirin ku careke din stêrka qedera dibiriqe. Ji ber vê jî navê wê di wateya stêrkê de kirin Asara.

Piştî çend salekî jî kurekî wan çêbû. Fikirîn ku êdî qedera xwe girtine destê xwe.

Dema ku zaroka dawî jî hat dinê, tijî hêvî bûn ku bawer kirin wê êdî cîhan biguhere.

Navê Arad li yê xort kirin. Ji bo wan sirek bû, hêviya derketina ji stemkariyê bû, ji êşekê yadîgar, hafizeyek bû. Navekî hezar salan bû, ew ê piştî hezar salan jî bihatana bîranîn. Hem rabirdû hem jî dahatû bû.

Ji bilî wan ti kesî maneya wê nizanîbû. Ji bo wan sembola 5'ê Mijdara di du salên cuda de bû.

Qralê Persan Dara, dijminê xwînxwar ê Mûğên Medyayî bû. Gelek caran ew qetil kiribûn. Yek ji van qetlîaman jî di roja 5'ê Mijdarê de bû. Piştî qetlîama Mûğan Kurd bêserî hiştibû, ji hêza rêveberî û fikrê dûr xistibû û kiribû eskerên sîstemê. Roja şewitandina mala wan di heman rojê de çêbibû. Feqet vê carê guman li ser Mûbedan hebû.

Zaroka wan a dawî jî ew kiribûn nav keyfxweşiyên pir mezin. Xweşikiya wê, ji çavên wê dest pê dikirin, ji Dayzerê girtibû.

Di çavên wê yên reş de wextê li ber taldê jî bûna ronî qet jê kêm nedibû. Dayika wê ji bo wan çavan digot, "siyaçeman". Porên wê geş û dirêj bûn. Serikê porê wê xingalokî bû. Ji temenê biçûk ve, bi saya dayika wê porê wê her dirêj mabûn. Ji reşbûna wê, dirêjbûna wê û xingalokiya wê pir hez dikir.

Di rûyê wê de çar demsal xuya dikirin. Li ser çermê wê spiya berfa zivistanê, li ser gepên wê tazebûna biharê, li porê wê bayê payizê, li çavê wê germahiya havînî…

Pêtek agir bû ji tavê ketibû, di nav gulistaneke rengûreng de gula herî sor bû, çavê dayika xwe, dilê bavê xwe bû. Hemû wateyên bedew ên mîna xweş, baş, bedew, azad, şad di rûyê wê de dihatin xwendin, diviyabû navê wê jî wisa bûya: Ew Xorrem bû!

Xorrem şadiya wan a herî mezin bû. Êş û azarên veşartî yên dayika xwe nerm dikirin. Piştî rêwitiyên dûvdirêj ên bavê xwe, teseliya wî ya hatina malê bû.

Bavo Qade ji bo karûbarên xwe diçû diyarên din û dihat. Li gel heywanên xwe tevlî karwanên mezin dibû, bar hildigirt. Ji bo ew ên dipirsin bê ka çi hildigire jî bi henekî û bi mane digot, "ez rabirdûyê ji bo siberojê hildigirim".

Bi saya cîranên xwe yên pêbawer, dema ku malbata xwe li pey xwe dihişt jî ti carî wekî berê fikar pê re çênedibûn. Dîsa jî nediçû cihên ku çûnhatina wê zêdetirî mehekê wextê bixwe. Ji bilî yek-du îstîsnayan pêwîst nebibû biçe dûrahiyên wisa.

Dixwest ji bo her dûrahiyekê keça xwe Xorremê jî bibe, lê hê biçûk bû û enceq dikarîbû vê ji bo cihên nêz bike.

Dema diçû cihên dûr jî kelecana vegerê herî zêde ji ber Xorremê pê re çêdibû.

Bi xeyalê dîtina wê, vegerên wî rehettir dibûn, westandina xwe ji bîr dikirin. Jixwe çiqasî betilî be jî heta ew bajarên çûnê ji Xorremê re negotana, nikarîbû ji destê wê xelas bibûna, razaya. Di nav vegotinên wî de çiya jî hebûn. Teyrê Sîmûrg ê ku li lûtkeyên çiya dima jî pir bandor li Xorremê kiribû. Teyrê zanatiyê bû. Ewqasî dirêj jiyabû ku 3 caran dîtibû dinya tê avakirin û hildiweşe. Zanebûnên 3 dinyayan kom kiribû. Piştî ku ewqasî kal bibû jî xwe şewitandibû û dîsa xwe ji xweliyên vejandibû. Xorremê bavê xwe dişiband vî teyrî.

Di nav bîranînên taze de teqez tiştanokên biçûk bi cih dikirin, di demên cuda de ev ji Xorremê re dipirsîn.

Xorremê bi bîranînan jiyan nas dikir, bi çîrokan mezin dibû.

**Nefesa Kendêl**

Bîranîn, her çiqasî meyleke jibîrbûnê nîşan bidin jî mîna pîzotên di bin berfê de ne. Wext hat, helbet wê hemû berfê bihelînin: Ne ewr divê ne jî ba, tenê dem bes e!

Wextê ku dema wê hat, her xatira ji nû ve şîn dibe.

Di demekê de têkçûyî be jî, di demeke din de pêkhatin, dikare wekî îşareta nemiriyê bê hesibandin.

Bêyî ku kêlî û bîranînên nemir hebin, her tiştên li ser jiyanê bên zêdekirin mîna ku wê li kêleka kendêl bimana xuya dikirin.

Bi bîranînan dikarîbû benek bihatana çêkirin û wisa xwe bi jiyanê jî bigirta, yan jî dikarîbû ew ben bixistana stûyê xwe û dawî jî li jiyana xwe bianiyana.

Diyar nabe ka ew bîranînên li ser çiyayên tijî berf, cemet, kendal wê çi bîne. Dîsa jî bêyî hembêzkirina bîranînan ne mimkun bû ku mirov karibe xwe bi jiyanê bigire.

Texmîn dikir, bê li serê kendalekî çawa xwe bi jiyanê girtiye. Bi şeklekî dirêjkirî, serê wî li jor, li milê hevalên xwe dinêrî, lingên wî jî hema hema heta çokên wî daliqî bûn.

Destekî wî li ser xençera wî ya di erdê de çikiyayî, bi destekî jî erd dipeland, bi kaşkirinên hêdî jî hewl dida gewda xwe ber bi jor ve dehf bide. Mîna ku ji xwêdanê dişewitî. Ji bo ku karibe ew xwêdana dikeve çavê xwe paqij bike nikarîbû tiştek bikirana. Parçeyên cemedê yên li ser simbêlên zirav û qeytan jî diheliyan, ji lêvên wî diherikîn jêrê.

Li ser eniya wî germahiyeke wisa çêbûye, mîna ew ê volkan biteqe dişewitî. Damarên li ser cênîka wî mîna wê biqetin kişiyabûn. Şaxek, kevirekî ku karibe xwe bi jiyanê bigire tine bûya jî, hinceta di dilê wî de mezin bû.

Mesele ne ketina ji vî kendalî û mirin bû. Ew hestê ku negihiştina armanca xwe ya pîroz, ji mirinê xerabtir bû.

Dema li ser kendal li ba dibû, heger kêliyekê jî ji armanca xwe biqeriya wê nikarîbûya xwe bi jiyanê bigirtana. Nefesa baweriyê ji nefesa kendêl xurttir bû. Ne tenê bi xençerê, bi bawerî xwe bi wê cemedê girtibû.

Rehber, ji ber ku benek li ba xwe neaniye, ji xwe re nifir dikirin. Cenazeyê ji kendal ketî jî heta biharê wê nikarîbana bidîtana.

Her çiqasî hewl bidana hevdu bigirin û wisa dakevin jî hejmara wan têrê nedikir, heta hemû bi hev re jî dikarîbûn biketana.

Dema ku li rêbazeke xelaskirina hevalê xwe digeriyan, yê herî ciwanê grûbê bêyî tiştekî bibêje xwe li ser cemedê berda.

Carina his ya rastî didin kirin û jiyanê xelas dikin. Carina jî ew his dibin felaketa her kesî.

Di kêliyeke wisa de wêrekî lazim bû, egîdiyek wisa bûna ku diviyabû bi hisên ji şewqê leztir biketana tevgerê.

Hemû egîdiya lezgîn li ba ciwantiyê bû, lê yên digotin ev wêrekiya serê bêaqil e jî hebûn. Halbûkî van nêzîkatiyan bi xwe, mirov dikirin mirov.

Egîdî tenê di şer de nedibû. Sedemeke bi jiyanê bide girêdan hebûya, ji bo egîdiyê bes bû.

Daketineke wî ya wisa tîk hebû ku li lêva kendal tenê xwe bi xençerekê girtin mîna mûcîzeyekê bû. Xelasbûna wî wê mûcîzeyeke mezintir bûna.

Hevalê wî yê ciwan baş dizanîbû wê li vir nikaribe li benda mûcîzeyekê be. Baweriya xwe bi hisên xwe anîn, bêyî fikrê li ser bike, xwe berda. Di nava çirkeyan de nexwe fêm kiriye wê laşê wî yê sivik ber bi kendal ve neherike. Li ser wê cemedê, navber bi navber serikê tehtan hebû. Çawa çavê wî lê ket, wisa jî xwe berda.

Lê belê, her ku şemitî, laşê wî sivik bû, her ku şemitî, leza wî zêdetir bû. Mîna ku wê hevalê xwe jî bide ber xwe û di kendal de wer bibin lê hatibû. Piştî ku herî kêm di bejna heşt mirovan de şemitî bû, bi kefa destê xwe ya dişewitî xwe bi serê wan tehtan girt, berneda.

Yên li jorê temaşe dikirin, zêdetir kelecan girtin, hilma wan çikiya.

Li cihê girtî, dema ku navbera cemednegirtî ji berfê paqij kir, heta axê çû. Ji bêrîka xwe kêrek biçûk derxist, kirtên biçûk tê de çêkirin; yek rast yek çep, yek jêr, yek jor û wisa wisa nexşeya xwe ya jiyanê hazir kir, destê xwe dirêjî hevalê xwe kir û ji kendalê mirinê kişand.

Tekane mûcîzeya li wir ew bû ku firtone sekinîbû. Ji derveyî wê her tişt bi hewldanên wî pêk hatin.

Piştî firtoneyê fêm kirin ku li rûyê din ê çiyê ne.

Ji bo karibin xwe bigihînin emaneta pîroz, meydan ji mirinê xwestibûn. Beriya ku prensê tarîtiyê bigihêje wan, diviyabû xwe bigihandana cihê xwe.

## Zarokê Çavstêrk û Cehnîka Kumêt

Piştî zivistaneke bol berf, bihar bi coşa cejnê hat. Her çiqasî hêj berfa li lûtkeya çiyê neheliyabe jî qûntarên wê bi tonên keskê xemilîbûn. Her çiqasî ji ber berf diheliya ava çem şêlû jî bû, bi qasî ku şadiyê li dora xwe belav bike bi coş bû.

Xak, giha, dar, ewr û herî zêde jî zarok bi coşeke mezin bibûn.

Li ser qîrewîrên şên û şeng ên zarokan, wîçîniyên çivîkan jî zêde bibû. Piştî baranê, kulîlkên nazdar vekirine; li ser rûberê kesk mîna neqşên zer, şîn, sor, pembe, xemrî berbelav bûne. Tavê bi camêrî germahiya xwe li her kesî dikir.

Piştî her baranê diçûn komkirina kuvarkan. Giha, nebatên xwarinê yên mîna tûzik, mendik, tirşo, soryazê şîn bibûn. Herî zêde kenger kom dikirin. Bi torbeyên paç berê xwe didan deşt, gund û qûntarên çiyayên li dora bajêr. Tam cejn bû. Li şkêran rastî keriyên pezkoviyan dihatin. Mirov ji temaşekirina wan têr nedibûn.

Bihar ti carî ewqasî xweşik nebibû. Ji bo her kesî tav, baran, pelên şîn, giha bihar bû. Bihara wî jî Xorrem bû.

Dayzerê xwe bi wê hêviya di çavê Xorremê de dîtî girtibû. Bi coşa biharê zêdetir bi zarokên mehelê re eleqedar dibû. Xwarin li wan belav dikir û dûvre jî çîrok digotin. Zarok bi van çîrokan perwerde dikirin.

Di destê her yekî de parçeyek nanê spî û zirav, ketibûn rêzê. Pir bêsebr bibûn, wê li tama donê ji gund hatî binêriyana.

Dayzerê bi kevçiyê textîn nivişk li ser nan dida. Xorrem jî li rex wê alîkarî dida dayika xwe.

Bi saya ku Dayzerê xwarinên mîna gûz, sêv, mişmiş, hinar, hejîr, hirmî, nivişk, hingiv li gel şîrê germ belav dikir, Xorrem jî bibû hevalê hemû zarokan.

Mîna ku Dayzerê dayika hemûyan bû, ew jî xwişka hemûyan bû. Halbûkî ji bilî yek-du kesan hemû jî jê mezintir bûn.

Xorrem her roj li gel wan diçû lîstikê, ji xwe re dibeziyan, lê hin rojên Şemiyê hema hema qet ji malê dernediket. Wê rojê li cem bavê xwe dima. Sibe wê zarok li ba malbatên xwe biçûna Çemê Daristanê seyranê. Feqet ji ber ku wê bavê wê bihatana, Xorrem wê neçûna.

Malbat bi hev re diçin daristana mezin; zarok li wî çemê şîrîn ê ku navê Çemê Daristanê lê kirine, melevaniyê dikin, jin jî xwarin

çêdikin. Piştî xwarinê bi hev re lîstok dilîstin, stran digotin, govend digerandin. Jin, di jiyana xwe ya meheleyê de jî her tim li gel yek tevdigeriyan.

Ev rewş di her qada jiyana civakî de dihate dîtin, jinan karkirina bi hev re wekî stûnê exlaqê didîtin, tersê wê jî şermezar dikirin.

Her çiqasî zilam li beramberî hev di nav reqabetekê de bin jî, jin tam tersê wê mîna yek malbat e tevdigeriyan.

Her çiqasî demên ku dayiktî pîroz dihate dîtin li berê mabe jî, li hin deveran hê jî rêz dihat girtin.

Dayik, ne tenê dayika zarokên xwe bû, dayika civakê bû. Ji ber vê çandê, civakên cuda yên li herêmên cuda li nav hev diman, di nav piştevaniyê de kevneşopiyên xwe diparastin.

Dayzera dilbijan neçe dawet, ger, seyranê jî xwest Xorremê bişîne. Rojên din biçûbana jî, di wê rojê de wê bavê wê bihatana, Xorrem nediçû ti deverê.

Dîsa tevî hemû israrên zarokan jî ji malê veneqetiya.

Ji rojan roja zer bû: Şemî!

Ji bo ku karibe bavê xwe yê ji rêkên dûvdirêj, ji çiyayên berfî hatiye hembêz bike, xwe dabû benda çûyîna mêvanan.

Ew mêvanên ku li gel bavê wê nîqaş dikirin cara yekem didît. Her ku nîqaşan dirêj diajotin bêsebr dibû, her ku dengê bavê wê li beramberî mêvanan zêde dibû, li gel wê jî li dijî wan aciziyek peyda dibû.

Qade, li cihê rûdinişt jî ji ber yekî girs bû, her kesên wir ji xwe ditirsandin. Zendên wî yên qalin û simbêlên boq, ku heta lêva jêrê dirêj bûne û qismek jê spî bûne, heybeta wî zêdetir dikirin.

Ji ber ku kefiyeya reş-spî-zer, belekî li serê xwe şidandibû, tenê goşeyek porên wî yên reş xuya dikirin. Dema mêvanên wî lê guhdarî dikirin, bi serikê keyfiyaya xwe ya ji ser milê wî yê çepê hatiye xwarê dilîst.

Dema ew diaxivî û îcar dengê xwe bilind dikir, mîna dipelçiqîn li mêvanan dihat. Ji nav wan yekî nikarîbû cirifandina destê xwe kontrol bikirana.

Wextê Xorremê mêzeyî wan dikir, hema wisa lê hat ku bavê wê di rewşeke zor û zehmet de ye.

Pir zêde xwe negirt. Ket odeyê, du-sê gavan ber bi wan ve çû, ji bo mêvan zûtir biçin, bi dengekî gazindî û bi zimanê mezinan got:

-Ma bavo te ji bîr kir, îro karê me hebû!

Bêyî ku li keça xwe bizivîre, bi destê xwe îşareta “bisekine cihê xwe” kir. Xorremê lêvên xwe gez kirin, bêdeng bû û paşde çû. Bavê wê qet wisa nedikir. Çavê wê tijî bû, vegeriya. Dema derket, derî kêmekî vekirî hişt.

Heger bavê wê ewqasî pûteyê bi vê nîqaşê dide û Xorrem vegerandiye, nexwe mijareke pir girîng bû. Ji mêvanan hez nekiribû. Diviyabû tiştekî ku aciziyê bide bavê wê kiribana.

Dema ku careke din hewl da bikeve odeyê, vê carê birayê wê Arad ji milê wê girt, bi acizî bi ser de meşiya. Arad, bi wî halê xwe yê qelew dema aciz dibû komîk xuya dikir, lê xurt bû.

Hema hema 2 qatî emrê wê kiribû. Mîna ku dixwest di her firsendê de mezinbûna xwe nîşan bide derdiket ber wê. Mîna hevrikê wê yê ezel-ebedê ye, xwe têkilî her tiştên wê dikir. Tenê dema ku ji bo lîstokê derdiketin kolanê dibû parazvanê wê.

Arad, mêvanên îro nas dikirin û dizanî nîqaşeke girîng e.

Heke zêdetir bavê wî aciz bikirana, xwe amade kiribû bi wê kêra ku ji xwaringehê girtî û di bin cilên xwe de veşartî êrîşî wan bike. Xorrem biçûk bû, fêm nedikir. Lazim bû xwe ji navê bikşanda, bêdeng bisekiniya!

Xorremê tenê bavê xwe dixwest. Dixwest hembêz bike, bêhn bike, pê re bilîze. Helbet ne cara yekem bû li mala wan nîqaşeke wisa çêdibû. Pir caran bi qîrên xwe pevçûnên dê û bavê xwe tepisandibû. Ev pevçûn di 6 mehên dawiyê de zêdetir bibûn.

Arad çiqasî li dij derkeve jî, heta hewl bide lê bide jî, qîrên Xorremê hema hema di her carê de li her derên malê olan didan.

Bavê wê jî her carê bersiv dabû vê qîra ku dilan dax dike, nîqaş qut kiriye, keça xwe hembêz kiriye û aram bûye. Lê her çima bûya vê carê hêza aramker a Xorremê kêr nedihat. Nîqaş nediqediya.

Qet negotibû, hêza wê ya aramker ji ber qîrên wê ne. Feqet qîr nekiribana wê bavê wê lê mêze nekiribana, çavê wan nehatibana beramberî hev.

Wê her tim bawer dikir ku di çavê bavê wê de hêzeke efsûnî heye.

Çîrokeke dayika wê rojekê behsa zarokekî dikir, çavê wî efsûnî bû. Li çi mêze bikirana, dikarîbû veguherandana tiştekî xeyalkirî. Dixwest çavên wê jî mîna çavên çîrokê efsûnî bin. Wisa nebe jî dizanî herî kêm dikare bi mêzekirinên xwe bandorê li bavê xwe bike.

Ev çavên çîrokî yên ku her tim li ser bavê wê bandor dikirin, vê carê ti bandor lê nedikirin.

Tevî ku bavê wê ewqasî aciz bibû jî, mêvan mîna kevirê aramê li cihê xwe rûdiniştin. Hema hema tav di ser baxçeyên wan re diçû ava, lê mêvan neçibûn. Gelo wê şev jî bimana?

Ji ber bêzariyê, bêsebriyê, dibe jî ji ber aciziyê be, pelên ziwa yên kulîlka guldankê bêyî bikeve ferqê qut dikir, hûrhûrî dikir.

Bi wan pelê ziwabûyî, çû pişt dayika xwe ya bi xwarinê re mijûl, bêdeng sekinî.

Laşê xwe giran giran çep-rast hejand, pelên dawiyê jî di nav destê xwe de hûr kirin û diavêtin erdê. Ji ber hiznê û hêrsê, çavên wê tijî bibûn, kelegirî bibû.

Dayika wê neket ferqa wê jî. Dema zîvirî lê qulibî. Çi qewimî, li wir qewimî!

Çanaxa donê sorkirî ji destê wê ket, dilopek mezin jê pekiya û li rûyê Xorremê ket.

Agir lê biketa, ewqasî nediêşand. Qîrîna dayika wê jî tevlî qîrîna wê bû. Bi panîkê av li rûyê wê da.

Li kêleka çavê wê yê rastê, li cihê di navbera birî û çavê wê de şewatek hebû. Hema hema bi qasî çavekî çermê wê rabibû, rengekî pembe girtibû.

Dayzera ku şewat dît, îskeîsk pê ketin. Ev şewata biçûk jî têrê kir ku ew bîranînên bi êş werin ber çavan. Di nav îskînê de rewşa çavê wê pirsî:

-Xweşika min! Tişt bi çavê te hatin delala min?

Xorrem tenê dibêje "çavê min!" û tiştekî din jî nabêje.

-Ka çavê xwe veke binêrim delalê!

-Ax çavê min!Çavê Min! Çavê min! Çavê min!

-Ket çavê te! Ka binêre!Çavê xwe veke, li min binêre!

-Çavê min!Çavê min!

-Tu dibînî birîna dilê min, tu dibînî cêgera min?

Bi dengê qîrewîrê, bavê wê û mêvan jî bi bez hatin, li ser serê dêkeçê kom bibûn. Bavê wê bi çena zirav a Xorremê girtiye, bênavber pif dikir rûyê wê û hewl dida hênik bike.

Ji nişkê ve çavê xwe nîv vekir. Bi wan çavên sorbûyî li derdorê nêrî.

Dîsa pirsî, "tu dibînî?"

Xorrem tenê got, "e, e".

“Şikir ji Xwedê re, xweşika min, emrê min, Xorrema min, kêmekî rûyê te şewitiye, niha dermanekî lê bikim, ew ê zû rehet bibe, biçe.”

Porê wê miz da, danî ser singa xwe.

Xorrem ji êşa şewatê zêdetir, ji ber ku ew mêvan hê li malê bûn, rûyê xwe tirş kir.

Mêvanê kal hewl da serê Xorrema di hembêza dayika wê de miz bide û jê hez bike. Bavê wê ji zendê zilam girt, nehişt. Hewayek wekî cemedê li wê derê da.

Jixwe ketina mêvanan a xwaringehê, îcar jî biyaniyan şerm bû. Qade bi xwe jî bi rehetî serê wê miz nedida. Ji bo Xorrem bibe kesayeteke xurt bi baldarî nêz dibû, li hemû nêzîkatiyên xwe miqate bû.

Heçkû mêvanan bi çavê xizimtiyê li xwe nêrîbûn ku li ba Qade derbasî xwaringehê bibûn. Lê, dema ku fêm kirin dilê wî nerm nebûye, bêyî li benda xwarinê bimînin, dua kirin, xatir xwestin, lê bêyî bersivekê bigirin ji malê derketin û çûn.

Roja din Qade neçû; esas diviyabû derketina rêwîtiyeke dirêj. Diviyabû wekî her mehê dikir, vê carê jî hemû alavên pêwîst bigirtana ba xwe, li hespa xwe siwar bûna û li gel 2 hestiran derketana rê. Lê neçû. Herî zêde jî keyfa Xorremê ji vê rewşê re hat.

Domahiya rojê bi Xorremê re eleqedar bû. Jê re cihên geriyayî û agahiyên dîrokî yên fêrbûyî vegotin. Dawiya wê jî wekî her tim bi çîrokekê temam kir.

Rojên wisa yên Xorremê zêde bûn. Bêyî bizane çi rastî ye çi çîrok e, di xeyalên xwe de qehreman kom dikirin û wisa mezin bû. Hevalên wê yên herî baş ew leheng bûn. Heta bibûna 12 salî û bavê wê jê re diyariyek bianiya…

Wê rojê sê mohrên Manî wekî pirs ji Xorremê re pirsî. Got eger bersiva wê tam bide ew ê diyariyekê bidiyê. Dema ku Xorremê navê Manî bihîstibû hê ew şewata li rûyê wê çênebibû. Ji wî temenê biçûk ve têkildarî Manî guhdarî gelek tiştan kiribû, lê tiştekî wekî “Sê Mohr” qet nebihîstibû.

Ne ji ber nedîtina bersivê, lê eger bavê wê jê re gotibe, ji ber îhtîmala jibîrkirinê pir şerm kir. Her çiqasî nizanîbe mohr çi ye jî, fikirî gelo sê tişt dikarin çi bin. Gelek sêmend hatin bîrê, lê nizanîbû kîjanê ye. Destpêkê kîjan hate bîrê ew got. Her kesî ev sêmendî dizanî, tenê sêmendiya destpêkê ya ji bo nefsê bû:

Got, “ya yekem dest e!” û sekinî, li rûyê bavo nêrî, dema dît dikene, bêdudilî dewam kir; “dudu, dev, sisê dil e!”

Piştî ku fêr bû ji van re mohr tê gotin, yek bi yek maneyên wan got:

“Mohra dest, nahêle ku ronahiya di hundirê hebûnên zindî de zirarê bibîne, mîna zirarnedana nebat, kulîlk, dar, ajal, mirovan…

Mohra dev, hemû gotinên xerab û xwarinên nebaş qedexe dike…

Mohra dil jî dûrketina ji her cure fikrên ku ne li gorî bawerî û terzên jiyana Manî ye…”

Bavê wê Xorrem pîroz kir. Sebebê zehmetiya wê ya ewil fêm kiribû. Got, peyva mohr peyveke Erebî ye, ji ber vê yekê dibe ku nebihîstibe.

Jixwe diyariya wê jî bi dizî anîbû, tenê vekirina derî bes bû. Destpêkê guhên wê diyar bûn. Piştî guhên qehweyî, vê carê jî ser û çavên wê yên şîrîn xuya bûn. Ev cehnîkek bû.

Xorrem dikira ji keyfa bifiriya. Destê xwe danî ser deqa spî ya li ser eniya hespa sor-qehweyî û miz da. Ling û bijiyê wê reş bûn. Çavên wê yên mezin meraqdar mêze dikirin.

Dema destpêkê destê xwe da ser, his kir bê çiqasî saxlem e û navê wê hilbijart: “Ew ê navê te Mohr be!”

Jê û şûn de wê Xorrem û Mohr bi hev re mezin bibûna.

## Li Gund Eşqa Yekemîn

Her ku Xorrem mezin dibû, ew birîn biçûk dibû û tenê şopeke bi qasî hebika genim ma.

Dayika wê ji bo ku vê şewata bi destê wê çêbûye bigire, li goşeya birhê wê yê rastê deqeke jê re "xalkûtan an jî bi kurtî Xal" dibêjin, çêkir. Dema ku şeklê stêrka bi dûvik a ku yek ji deqên kevnare ye neqişand, ew şopa şewatê ya li ber çavê wê jî bi temamî winda bû. Yên niha zêdetir motîfên kîvroşk, xezal an jî sedefa behrê çêdikin, lê Dayzerê bîranînên berê taze kiribû, sembolên berê li rûyê keça xwe zindî kiribû.

Birînek digirt, lê birîneke din li rûyê wê neqiş dikir: Birîna Xwedewandan, a sembolên demekê bûn!

Gotibû, "ew ê bibe oxira keça min a xweşik."

Ew gotin wê her tim di bîra Xorrem de bimaya, tim li pey wê oxirê biçûna. Îcar di ser de ji ber ku hespeke wê jî hebû, wê bi çar lingan li pey oxira xwe biçûna.

Hespa bi navê Mohr û Xorrem, wekî di dema Xwendewandan de bûn, azad bûn.

Azadbûna hespan, girêdayî serbest gera wan a li çolê bû. Azadiya Xorremê jî bi ya Mohrê re heman bû. Dema bi hev re diketin çolan wekî ku ji hemû azarên dinyayê xelas dibûn.

Li bajar, bi hespê nikarîbû rehet bigeriyana. Ji ber vê jî tim û tim diçû ba xizmên xwe yên li gund, li wir bi hemtemenê xwe re hespê dibezand, carina jî pev re serdana gundên derdor dikirin.

Carina jî bi tena serê xwe hema kêmekî li derveyî gund, li dûzbûniya "Warê Şivanan" Mohr serbest berdida an jî lê siwar bihata jî gem lê nedida û dida bezandin.

Şivanan bi heyranî lê dinêrîn. Dema ku ferq dikir tê temaşekirin, hemû hereketên bi Mohrê dane fêrkirin pê dida kirin, ji ser kevirên mezin, tûmên bilind mîna difirand dida avêtin. Di demên wisa de bi xwe jî dibû mîna bayekî û bi bask dibû.

Di geran de alîkarî dida karkerên li ser zeviyan. Hema hema hemû gundên derdor nas kiribûn.

Tevî ku ji bo hemû eyaletan serbestî hebû jî, bi navê bila qudreta Sasaniyan bigihêje gundan jî, li gundên jê re "Deh" digotin jî rêveber bi cih kiribûn. Her çiqasî ji van rêveberan re rêveberên herêmî bêne

gotin jî dilsozê dihkanan bûn. Ji bo Dihkanan ku axayên xakê ne, li hin deveran dehqan an jî kedxoda dihate gotin. Carina ji nav wan yên bi başî nêzî gel dibûn derdiketin, lê piranî bi zalimî û timatiya xwe dihatin zanîn. Carekê Xorrem derket pêşberî herî timayê van û pê re nîqaş kiribû. Ewqasî jî bi xwe bawer bû.

Ji nişkê ve bibû nûnera gundiyan. Gelek kes derdên xwe jê re dibêjin, wê jî li kû derê nûnerekî Sasaniyan bidîta, derdiket pêşber û berê xwe didayê.

Di zarokatiya xwe de digot qey li pişt dîwarên kevir ên garnîzonê ku di nav xirbeyên qesra kevn de hatibû çêkirin, cinawir heye.

Rast bûye!

Dema ku bi zilamên wan re hevrû dibû, fêm dikir ku şaş nefikiriye.

Wextê ku fêr bû ev xirbe jî di dema Persan de li ser navê Darîûs hatiye çêkirin û aîdî qesra hezar odeyî ye, vê carê ji fikrên xwe tam piştrast bû. Qesra bi hezar derî tarîfa wî mekanê berê bû ku Xwedayên zalim lê diman. Diviyabû ji wê îlham girtibana.

Yên niha li wir dijîn cinawir in ku xwe li pişt perdeya olê vedişêrin, ti eleqeya wan bi ol-wijdanê tine ye, ked û xwîna gel dimêjin.

Her çiqasî hêj nizanibe wê çawa li dijî cinawir şer bike jî, lê li dijî zilamên wan hêza dijderketinê li ba xwe didît. Bi hêrseke wisa tijî bibû heger civak hinekî cesaret bidayê, wê li dijî wan çek jî rakirana.

Di çîrokên bavê wê de şerkerên li dijî dêwan jî hebûn. Xwe dişiband wan, xeyal dikir. Porê xwe yê reş dikir kemend, diavêt qirika cinawir, dûvre dixist erdê û devê wî girê dida. Wisa jî ew agirê ku cinawir bi devê xwe diavêje derve, di nav bedena wî de dihişt û xwe bi xwe tine dibû, dibû xwelî.

Carina di xeyalê xwe de ew cinawir wekî sifetê zilamekî oldarê sexte yê ku Zerdeştî kiriye rûpoşa xwe didît, maskeyên wan parçe dikir, rûyê wan ê tirsnak derdixist ortê. Wê çaxê direviyan û diçûn, hemû gel jî diket nav cejnê.

Diçû ku derê dixwest xeyalên xwe parve bike, feqet ev ewqasî jî rehet nedibû.

Her carê li pêşiya xwe sînordarkirinên olî didît. Dihat hişyarkirin ku xeyalên wê, liv û tevgera wê li derveyî olê ye.

Çend caran hayê bavê wê jê çêkirin, gotin “xwedî li keça xwe derkeve!” Ne tiştekî wer asayî bû, keçeke ciwan li her deverê bigere, li beramberî “esilzadeyan” mîna pevdiçine biaxive!

Lê çi heye ku yên jê hez nedikirin jî bi dizî heyranên wê bûn.

Gundiyên ku heyranbûna xwe venedişartin jî bi fikar bûn ku ji ber vê wêrektiya wê esilzade û rahîb zirarekê bidinê.

Van tiştan çavê Xorremê neditirsandin, feqet ji ber ku hinek gundiyan jî mîna esilzadeyan dev diavêtinê, xemgîn dibû. Di rewşên wisa de xwe dikşand nav xwe, nediçû gundan.

Yên digotin Xorrem dîn e û çavê xwe berdabûn hespa wê Mohrê jî hebûn! Hespeke li gorî egîdan enceq yeka mîna Mohrê bûna. Rahşi Belek heçkû vê carê wekî sor-qehweyî vegeriyaye, siwara wê jî di sifetê jineke ciwan de Rustem bi xwe bûye.

Mohr ji ba jî leztir diçû, lê wê çaxê jî moriya li erdê didît û pê lê nedikirê. Ji bilî Xorremê ti kes li xwe siwar nedikir. Tenê qisûrek wê hebû, nikarîbû ji serê çiyakî xwe biavêje serê çiyayekî din, ji bilî vê her tiştên ku hespek dikare bike dikir!

Xorrem carina li gelê dimeşiya, carina jî pê re diket pêşbirkê. Xorrem jî lez bû. Nikaribe Mohrê derbas bike jî, yên didîtin ew bi hespê xwe re dibeze, digotin difire.

Dayikan wekî bûka xwe xeyal dikirin û bêyî serî li rêyên fetlonek bidin, bi gotinên tenê dikarin dayik bibêjin, gotinên herî vekirî, kurên xwe teşwîq dikirin.

Dema ku bav bi keçên xwe re aciz dibûn, keça Qade mînak nîşan didan. Pesnê wê didan û keçên xwe zem dikirin. Feqet dema ku keçên wan dixwestin mîna Xorremê derkevin derve jî hem Qade hem jî Xorrem reş dikirin û keçên xwe asteng dikirin.

Ewqasî xweşik bibû ku diket xewna çiraxên hesinkarên li bajêr, şivanên qemer ên li gundan.

Keç jî wisa dihizirîn:

“Di warê bedewtiyê de ji me ne cudatir e, lê çima ewqasî tê hezkirin? Gelo ji ber pir rehet tevdigere? Vê wêrektiyê ji kû digire? Meydanê ji kevneşopiyan dixwaze. Ev cesaret wê rojekê bibe bela serê wê!”

Helbet hayê xwe jê hebû rehetiya wê meydanê ji kevneşopiyan dixwaze. Feqet xweşik bû yan na, wê bi xwe jî nizanîbû û bi nîqaşên wisa re eleqedar nedibû.

Lê belê, bi ciwanekî re eleqedar dibû!

Cara yekemîn ew jî mîna xwe li ser hespeke kumêt dîtibû. Tenê ya Mohrê reşa bijiya wê û lingên wê, sora gewda wê biroqoktir bû. Mîna nêzbûna du ewran, wisa hêdî nêzî hev bibûn.

Hespên ku ji dûranî dihêriyan, ew ber bi hev ve kişandibûn an jî wan hevdu kişandibûn, lê ji bo wisa xuya neke sûc avêtibûn ser hespên xwe:

-Ka mêze bike, li min guhdar nake!

-Ev jî wisa ye, pir ecêb e, dibe hespên me xizmên hev bin!

-Hespê heta vir ez anîme.

-Ya min jî wisa!

Hemû axaftinên wan ev bûn. Li gorî wê demê dikarîbû wêrek bihatana hesibandin hem ji bo Xorremê hem jî yê din…

Xorrem ji vî ciwanê ku bi banga gundiyan bêyî li pişt xwe jî binêre lê dabû û çibû, bandor bibû.

Roja din dîsa çû heman gundî. Li meydana gund ji bilî mirîşk û çend çêlekan ti tiştekî berçav tine bû.

Meydan derbas kir, dema ket ser rêya Kaniya Perî ya li milê spîndaran, dengê herî şên û şeng ên qelebalixê bihîst.

Keçên ku li ser Kaniya Perî kombûyî dema Xorrem dîtin ketin hereketê û bi henekên cur bi cur ew pêşwazî kirin.

Keçan hewl didan fêm bikin çima Xorrem ewqasî zêde tê û diçe. Herî dawî li gorî xwe mesele fêm kiribûn:

"Teqez dilê wê ketiye xortekî gund, hekena çima ewqasî biçe û bê!"

Ne neheq bûn, lê ev bûyer hê duh bû; di hatinên beriya wê de ti zilam ne li ber çavê wê bûn. Mohr şahid e, berevajiya wê dibe bêbextî!

Ji rojan În bû, ango roja bi rengê kesk bi bîr tanîn! Roja tazebûn û bereketê bû.

Her tonê keskê cîhan rapêçabû. Çavkaniya hemû bedewîtiyên li gundekî kesk bû, çavkaniya keskê jî ava sar bû.

Ji hespê daket û ji hewdê av da. Piştre bi xwe jî ji kaniyê av vexwar.

Ev av bi sarbûna xwe li herêmê nav dabû; çend caran kulma xwe tijî av kir û li rûyê xwe da, hênik bû. Bi destê xwe av li stûyê Mohrê jî kir, hênik kir.

Keçan setilên avê danîbûn milekî û sohbet dikirin. Ji bo bikeve nava wan, çend gotinên wê bes bûn. Ji zimanên wan û halên wan baş fêm dikir. Berê xwe da çarik sorê:

-Ma tu xwe bi vê ava sar dişo?

-Naa!

-Bawer nakim. Eger te xwe bi vê avê neşuştibe, tu yê çawa wisa wekî bacana sor a hê çênebûyî saxlem bimînî?

Hema di cih de bi ken bersiv dan sohbetê:

-Wele tu rast dibêjî. Her roj heta paqên xwe li ava Perî nede ji vir naçe.

-Tu li van gepan, li wê kemaxê binêre!

Kenê wan bi erd û ezman ketin, lê bedewa bacanên sor ket hicûmê. Ket pey ew keça ku herî dawî peyivî.

Çavê Xorremê li derdorê digerin, meraqa wî xortê duh dîtî li ser dilê wê bû. Heger pirsa wî bikirana, wê biketana ser zimanan, nepirsiya wê ji meraqa xwe biteqiya.

-Duh min li vir hespeke mîna Mohrê dît. Gêrçî enceq bibe siya Mohra min, lê rengê wê dişibiyayê, bala min kişand, gelo ne ji eynî ziriyetê bin?

Keçekê got:

“Ez hespê nizanim, lê yê li ser birayê min bû” û bi konekî keniya.

Xorrem:

-Waa, nexwe ew acemiyê ku hewa xwe diavêt birayê te bû!

-Tu li hewaya wî mêze neke. Ew ji malê dernakeve. Em bi halê xwe yê keçiktiyê zêdetir derdikevin derve. Sê keçên malê hene, yek jê jî ew e! Ji ber kenê keçan keyfxweş bû. Nexwe têkiliya wan bi kurik re tine bû.

Ji bo careke din wî bibîne lazim bû bi dehan caran bihatana ser wê kaniyê. Bi rastî jî ji malê dernediket.

Dawiya dawî êdî mesele bû û çû. Xwişka wî ji destê wî girt, anî serê kaniyê ba Xorremê.

Di nav keçan de sor bibû. Rûyê wî mîna zebeşekî bihurî lê hat. Bi zorê karîbû silavê bide Xorremê.

Dema destê wê girt, careke din berneda. Xorrem jî nekişand. Wisa li hev mêze dikirin.

Eger kenê keçan nebûya, heta roja biçûna ava jî wê wisa bimana, roja din bêyî bixwin û vexwin tenê di pozîsyona destgirtinê de li hev mêze bikirana û dibe heta mirinê jî wisa bimana.

Navê wî Perwa bû.

Bi qasî lewend bû, kubar jî bû. Eger cilên wî ne bi terzê xortan bûya, te digot qey keç e.

Porên zer ên wekî zêr dibiriqîn, heta birhên zirav dadiketin û ber bi kêlekê ve difitilîn, ji pişt guhên wî heta stûyê wî mîna hevrişmê dadiketin.

Xorremê jî bi heman şeklî bandor lê kiribû. Ji roja yekem ketibû nav agirê awirên wê, kenê wê û du hefte bûn ji malê dernediket, nexweş ketibû.

Perwa jî eynî mîna xwişkên xwe di bin zexta malbatê de bû. Vê carê ne ji ber zextê, ji ber bi nexweşiya eşqê ketibû, bêhal bibû û derneketibû.

Heger xwişka wî ji destê wî negirtana û neaniyana, ne du hefte, wê du sedsalan wisa li malê bişewitiya. Wê biketa şûna bixêriyê. Wê di nav de tepsî bi tepsî nan bipijandana, li ser şorbe bikelandana!

Dibe ji ber bandora zextan bûya, ev kurikê li malê bêdeng bû, her cara ku çavê wî li Xorremê diket mîna berxikên di biharê de tên berdan şen dibû, nizanîbû bêdeng bibe, bisekine. Dema ku vedigeriya malê jî mîna ku diket binê bîreke tarî.

Her çiqasî Xorremê hewl dida jiberên Perwa yên der barê olê de xera bike jî nikarîbû qeneh bike. Ew jî tersê wê bi hewldaneke bêhude hewl dida qaîdeyên olî yên hişk bi Xorremê bidana hezkirin.

Fikrên wan cuda bûna jî ji bilî xweşikiya rûyê wî bi xwe jî nizanîbû çi di Perwa de dîtiye.

Serikên derve yên birhên wî hatibûn xwarê û li goşeya wê jî çavên qehweyî û avî yên mîna ku dilopek rondike hene, hem wê xemgîn hem jî sempatîk nîşan dida.

Ji Xorremê dirêjtir bû, mîna wê xwedî bedeneke narîn, zirav bû. Bazinên Xorremê jî ji yên wî qalintir xuya dikirin.

Berê, bazin, deng, beden, xûy ango her tiştên Xorremê pir zirav bûn, her ku mezin bû bazinên wê xurt bûn, çetelbûna dengê wê winda bû û bû xwedî dengekî mîna kadîfeyê nerm, li dilê mirov dide.

Li gorî hemtemên xwe girtir xuya dikir. Dema keziya porê xwe yê dirêj û geş vedikir, navtenga wê ya zirav bi temamî qepat dikir.

Dema diçû ba Perwa, êdî porê xwe bi pûtetir dihûna. Ew çavên wê pir zêde nedihat girtin û tîk û hişk li her kesî dinêrî, lê dema dihat ba Perwa ew çav nerm dibûn.

Wextê dihat bîrê ji dema Perwa nas kiriye û şûn de zêdetir bi fîzîka xwe re mijûl dibe, bi xwe dikeniya. Ji vê guhertinê hez dikir. Ji gamzeyên gepên xwe hez dikir. Ji lêvên xwe yên ne qalind ne jî zirav, bi xetên tûj bûn û ji îşareta stêrkê ya li ber birhê xwe yê wekî xetên hevya nû bû, hez dikir. Ji jiyanê hez dikir. Ji ber ku ji Perwa hez dikir.

Gava diçû balê nizanîbû bê wext çawa dibihure. Mîna di xewnekê de his dikir. Ji kêliya vediqetiya û şûn de jî bêriyê dikir. Ji bo xwe pê bide ecibandin her çiqasî carina hin hewldanên taybet raber bike jî piranî xwezayî nêz dibû. Dîsa jî meraq dikir gelo di derheqê wê de çi difikirî.

Perwa jî hemû gotinên bedew ên ku nikarîbû ji Xorremê re bibêje ji Mohrê re digot. Helbet temenê Xorremê têra fêmkirina vê hebû.

Gelo wê zeman herdu heta dawiyê wekî heval bihiştina yan na, hê ne diyar bû. Ji bo niha, bi germahiya agirê dilên xwe nêzî hev bibûn, tenê ev bû. Dema ji agir dûr biketana wê çi bibûya, ew ne diyar bû!

Dema ku tim û tim çû û hat gundê wan, pir zêde pê re ma, bal kişand û ji aliyê her kesî ve hat axaftin, cara yekem Perwa li ser zewacê pê re axivî.

Di Zerdeştiyê de zewac pîroz bû, lê niha ev qûral hatiye hişkkirin û yên temenê wan hatibin û nezewicîbin jî wekî sûcekî olî kirine hatine hesibandin. Dibe bandora vê li ser Perwa hebûya, lê derdê Xorremê cuda bû.

Di dest wê de xîz hebû. Dema ew didan ber tavê rengên wan diyar dibû.

-Binêre, tav hemû rengan kifş dike.

Perwa:

-Tava min tu yî. Tu nebî, ez ê li vir biçilmisim.

-Beriya tu biçilmisî, divê em li ser mijarekê biştexilin. Her tişt di wextê wê de xweş e. Ti feydeya poşmantiyên derengmayî tine ye. Tu deqa stêrkê ya li ser rûyê min dizanî, bîranîna bêsebiriya min e. Her tim baldirêjiyê bi bîra min dixe. Lê niha ez pir bêsebir im. Dizanim tu yê der heqê min de xerab nefikire. Bêsebiriya min ne mijareke besît a gihiştina hevdu ye. Ez wisa his dikim, heke em dereng bimînin wê tiştekî nebaş biqewime.”

Rûyê Perwa sor bû. Dema ku şerm dikir, sorbûna ji guhên wî dest pê dikirin her tim digihişt eniyê, stû û ji wir jî li hemû rûyê wî belav dibû.

Dilê wî mîna wê qefesa xwe parçe bike lê dida, lê tenê got: “Ez hazir im!” û dîsa dema ku rûyê wî bû mîna zebeşê bihurî cara yekem û ji nişkê ve ji ser çavê bi stêrk ê Xorremê maç kir.

Navê wî dihat maneya wêrek, lê ti carê ewqasî wêrek tevnegeriyabû. Dîsa jî ev pir zêde bû. Beriya li benda refleksa Xorremê be, reviya û çû.

Deqa stêrkê ya li ber birhê wê wekî çawa hewayeke cuda tevlî bedewtiya wê dikir, dema awir didan jî hewayeke şervanan didayê. Bi vî halê xwe dikarîbû ew ên bi çavekî xerab lê mêze dikin bide revandin, tirsandin.

Dayika wê ew stêrk neqişandibû, ne ji bo xweşikbûna wê ya fîzîkî, lê ji ber stêrka bi dûvik, ango bîranîna wê, hezkirina dayikê tê de bû, rêzdariya wê jê re hebû. Hezkiriya “Xwedewanda Çiyê” ya ku bi stêrka stêrkan dihat sembolîzekirin bû. Dizanîbû sembola wê ye.

Niha evîndariyeke din hatiye ber deriyê wê û sekiniye. Destê xwe danî ser çavên xwe û germahiya lêvên Perwayî his kir. Qet şerm nekir. Ji xeyalkirina wê hez kir. Dayika wê gotibûyê, berê hezkirin xwedawendek bûye!

Li gundan keçên wisa piştî vî emrî nedizewicîn bi çavekî baş lê mêze nedikirin. Li bajar dima, lê ev rewş ji bo wê jî derbasdar bû, piraniya wextê xwe li gund bû. Dema xebera zewaca wan li nav gund belav bû, hinekî din bêhna wê hat ber wê.

Piştî wê rojê êdî li ser kaniyê keç û xortan govend gerandin.

Gelo evîndarî bû, yan agirekî demkî bû ku hewl dida xwe li ber germ bike, yan jî perdeyek bû, dixwest xwe li piştê bistirîne? Tevî ku ev nizanîbû jî dizanî Perwa yekî baş e. Diviyabû bi zewaceke baş rûyê malbata xwe spî bikirana, mîna Asara nebûya!

Roja ku donê sorkirî li rûyê wê ketibû, mêvanên li mala wan, xizmên hevjînê xwişka wê bûn. Xwişka wê reviyabû mêr.

Xorrem hê nebibû 7 salî û di ser çûyîna xwişka wê re şeş meh derbas bibû. Zilamê pê re reviyabû zewicî bû. Bi gotineke din, bi dildarî bibû hewî. Bavê wê qebûl nekiribû keça wî di vî temenê xwe yê ciwan de vê bike. Piştî 6 mehan xizmên zilam ketibûn dewrê, hewl dabûn bavê wê îqna bikin.

Dema ku di nav malbatan de aştî çênebû, neçar mabûn bar bikin Gundêşapûrê, ku li başûrê warê wan, Hemedanê bû.

Zilamê pê re zewicî, bêhnên xweş çêdikirin û difirotin û li wir doktorekî gerok ê dermanên xwezayî çêdikir nas kiribû. Ew dîtin û bi saya alîkariyên wî xwe li vî bajarî girtin.

**Çiyayî Namirin!**

Bajar ji hev cudatir bûn. Kîjan bajar nêzî çiyê bûna, li wir jiyan heqîqîtir bû. Hewaya sûnî ya li bajarên deştê her çiqasî bixwaze xwe li her derê bi cih bike jî bandora gund hevsengiya wê çêdikir.

Dema ku em werin ser jiyana nava çiyan a ku ewqasî bandorê li bajaran dike, xwezayîbûn enceq dikarîbû xwe bigihîne îfadeyeke ewqasî xweş.

Sirê jiyana li çiyê danûstandina bi çiyê re bû. Di têkiliyeke yekmilî de çiya bêrehm dibe. Dema pê re têkilî tê danîn jî wê çaxê çiya dibe dost.

Çiya hogirê wan kesan bû ku ji zimanê çiyê fêm dikirin.

Perwa xwedî dostekî wekî çiyakî bû.

Diviyabû wî û Xorremê, ku ji zarokatiya xwe ve dibêje heyranê çiya me, bi hev bida naskirin.

Bi saya vê dostaniya ku mîna sirekî ji gundiyan vedişart, jiyana Perwa guherîbû.

Heger bihata zanîn li gel çiyayiyekî qeçax têkiliya wî heye, destêpêkê wê ji aliyê malbatê ve bihatana cezakirin. Bi dizî alîkariya vî qeçaxî dikir.

Mejiyê wî ranedigirt ka çawa li çiyê dijî. Naxwaze bawer bike ku bi tenê dijî, lê qet jî nedîtiye kes li balê hene, tiştekî wisa nebihîstiye jî.

Ji ber berfê, bi xwe li gund bi ewqasî zehmetiyan re hevrû dibû. Wê çaxê jiyana li çiyê û bi tena serê xwe li ber çavên wî wekî qehremaniyekî bû.

Her wiha hem ji ezmûnên jiyanî hem jî ji fikrên vî çiyayiya sûd werdigirt. Bibû mîna mamosteyê wî. Tenê di mijara olê de li hev nedikirin. Qeçaxê çiyayî bêtirs bû. Mijara olê jî bi bêtirsî nîqaş dikir. Perwa bi kevneşopiya olê ya ku ji malbata xwe fêr bûye, pir girêdayî bû û ji ber vê yekê, xwe nedida ber nîqaşê jî.

Çiyayî jî pir bi ser de nediçû. Esas derdê wî ew beg bûn ku xwîna civakê dimêtin. Milê keyfa Perwa jê re dihat jî ev bû.

Li çiya jiyan û dijminatiya began, ji bo Perwa ew kiribû efsaneyekî zindî. Bi saya wî êdî bi çavekî cuda li dinyayê û bûyeran dinêrî. Berê ji bo jiyana li derveyî gund ti eleqeya wî jî tine bû, heta pir kêm tevlî jiyana gund dibû.

Tevî ku yekî dengnekir jî bû, êdî bê dinya çawa dizîvire baş dişopand. Dilê wî li beramberî êşên civakê bibû mîna volkanekî li ber teqînê.

Ji ber fikrê zewacê ne ku tirs neketibû dilê wî, lê bi saya vî çiyayiyê qeçax tirsa xwe jî bin xistibû.

Jê re behsa Xorremê kiribû û ji bo hevdu nas bikin jî destûrên pêwîst girtibû.

Dema ku Xorrem bi vê hesiya, bîranînên wê yên zarokatî hatin ber çavê wê. Gelo ev qeçaxê çiyayî dibe ku şopek ji efsaneyan bûya? Ruxmî zivistan bû jî ji bo ku demildest nas bike nikarîbû li cihê xwe bisekiniya.

Nizanîbû ji rojan kîjan roj bû, lê hisekî pir xerîb pê re bû, ev roj qet nedişibiya rojên din.

Wextê ku ber bi çiyê ve dimeşiya, heçkû diçû dinyayeke din.

Her ku nêzî çiyê dibû, gund, bajarok, bajar û jiyana li wir a li pey xwe hiştiye jê re besît hat. Hewl dida fêm bike çawa ji nişkê ve ket nav hisekî wisa. Di her gavê de zêdetir diket nav efsûna çiyê.

Ev rêwîtî nedişibiya gera li gund a li ser pişta hespê. Ji ber sermayê hema hema lingên wan dikira biqerisiya.

Demek dirêj bêyî Mohrê derneketibû ser ti rêyan. Li qûntarên çiyan li ser Mohrê gelekî geriyabû, feqet cara yekem bû wisa berê xwe dabû lûtkeya çiyê. Ev çiya, tew îcar di vê demsalê de, hesp kêr nedihatin.

Her ku rê dirêj kir, fikrên mîna ku Perwa ji vî sûretê heyî cudatir e di serê wê de geriyan. Ew jî tijî sir bûn.

Gelo ew dostê wî yê hêja yê ku ji bo wî rapelikîna vî çiyayî dide ber çavê xwe, yekî çawa bû? Çawa bi salan li vî çiyayî jiyabû? Bi rastî jî mîna gotî bi tenê bû?

Wextê li qûntarê çiyê hildikişiyan, cih bi cih li berfê rast hatin. Her ku diçûn jor berf jî zêdetir dibû. Xorrem ewqasî cemidî ku li cem xwe got ew ê ti kes nikaribe li çiyayên berfî bijî. Hewl da bîne ber çavê xwe ka di berfê de, di firtoneyê de mirov bicemide û wisa bimire êşeke çawa ye, lerzî hatê, dilzîz bû. Bêdeng dimeşiyan. Nikarîbû ev xeyal ji serê xwe biavêtana, heta ku Perwa axivî.

Dema hatin cihekî şkêrên tîk, Perwa got rê heta vê derê ye.

Cih bi cih rengê şkêran mîna ya xakê bû, avên jê herikîne cemet girtibûn. Xorrem li beramberî şeklên cemedê efsûnî bibû.

-Pir xweşik in, her yek mîna şûrekî ye.

-Heger tu hinekî din paşde biçe û binêre, tu yê tiştekî girîngtir bibînî!

Xorremê çend gav paşde avêtin. Perwa got hinekî din jî biçe.

Xorrem qederekê ji şkêran dûr ket û nêrî. Her der bibû cemet. Ev şkêrên her derê wê bûne cemet, ne ji bo pêş ne jî ji bo jorê rê didan.

Di carekê de veciniqî. Şeklê şkêran dişibiya serê mirovekî.

Çavên girtî ferq kirin, pêlûyên wî yên giran ên mîna di xeweke hezar salan de ye hebûn. Firmêskên çavan bibûn cemed. Dilbikul, xemgîn, ketûm û saxlem xuya dikir. Li orta rûyê wî textek û li ser textê jî fîgura jineke rûniştî hebû.

Xorrem ev şiband texta xwedawendan. Ji Perwa re pirsî çawa ev şkêr ferq kirine.

Ew jî ji Awyer fêr bibû. Li herêma şkêran ya ku heta mirov bêteqet bikeve jî çûyina wê naqede, hem li milê bakur hem jî li rojava şeklên hevşib hebûn.

Pirsî bê wê niha biçin kû derê.

Perwa ji ber berê jî hatibû vir, aram bû, got:

-Jê û şûn de em dewam nakin, wê dostê me were vir.

-Ew ê çawa bizane em hatine vir?

-Meraq neke, niha wî li cihekî ser şkêran em dîtine jî.

Wisa xwe dan bendê. Wext derbas dibû, lê ew diqefilîn.

Ewqasî qefilîn û westiyabûn ku wext derbas nedibû. Piştî demekê fikar li gel Perwa çêbûn. Dostê wî yê çiyayî xuya nedikir. Qet wisa nedikir.

Perwa qet derneketibû ser wan şkêran. Hîç nizanîbû dostê wî ji kû, çawa dadikeve, çawa derdikeve jor, çi li wir heye.

Ji nişka qîrek da xwe û navê wî got:

-Awyeeeerrr!

Piştî çend carekî bang kirê, vê carê Xorremê jî navê wî qîr kir. Ti deng ji Awyer derneket.

Perwa xemgîn bû, piştî ewqasî rê hatin jî wê hevalê xwe nedîtibana. Îcar li ser vê, fedîkariya li beramberî Xorremê jî zêde dibû.

Niha Xorremê bigotana ev lîstok e, esas ti qeçaxekî çiyayî tine ye, wê ne neheq bûna.

Baş e, lê Perwa çima tiştekî wisa bikira?

Perwa li cihê Xorremê dihizirî, çi dikarî di mejiyê wê re derbas bûna, xeyal dikir.

Eger Xorremê hesabê rêya vegerê nekirana û negotana em vegerin, Perwa dê heta êvarî li wir bang bikira.

Gotin, "êdî careke din!" û vegeriyan.

Hê beriya bigihêjin gund, xwişka Perwa ew li ser rê pêşwazî kir. Kelecan girtibû.

Ji ber rê bêtaqat ketibûn. Dixwestin tavilê biçin malê û bêhna xwe bidin, lê li ser gotinan hejiyan:

Dema ku ew ber bi çiyê ve diçûn, li bajar bûyerek qewimiye û li ser vê meseleyê esker ji garnîzonê hatine gund, li hemû malan geriyane û her li çi digeriyan, dema nedîtine jî çûne.

Perwa pirsî bê bûyereke çawa li bajêr qewimiye. Xwişka wî nizanîbû. Eskeran tenê gotine bûyereke têkildarî yekî qaçax e, ewqas.

Halbûkî bûyereke wisa mezin çêbibû, pê bajar hejiyabû.

Dihkanekî bi sifatê Delegûr ê ku bi zilma xwe ya li ser gel navdar bûye, tevî ku di nava dehan zilaman de tê parastin jî hatibû kuştin. Ji zilamên wî jî çar miribûn.

Li sûkê, çar kes, yek jê jin, rûyên xwe paç dane ber û bi hespên xwe ketine nav qelebalixê, bi xençeran wisa kiribûn.

Zilamên dihkan jî li wê derê yek kuştibûn. Serê wî ji gewda wî qut kiribûn û girtibûn ba xwe.

Cenazeyê bêserî hê jî li erdê bû. Talîmata Garnîzonê bû: Heta ku yên revî neyên dîtin wê nehatana rakirin.

Yek ji ew ên revî jî birîndar bibû. Ne diyar bû bê yê birîndar jin e yan mêr e. Şopên xwînê ber bi gundê Perwa ve diçû. Ji ber vê yekê li wan gundên derdorê hemûyan geriyabûn.

Perwa, li ba xwe got dibe ev qaçax Awyer be. Lê dihat gotin ku yê li sûkê hatiye kuştin qaçaxekî kevn bûye, digotin, "Qeçaxekî Çiyayî" bûye!

Dema ku ji hev cuda bûn, Perwa ji Xorrem re got ne mimkun e, Awyer dijî!

Dizanîbû ew cenazeyê li orta sûkê bêserî li erdê ye ne aîdî Awyer e. Ew hem dirêjtir hem jî girtir bû. Yê hatî kuştin ne ew bû. Feqet Awyerê birîndar çibû kû derê?

Ji bilî wî çiyayî ti deverek din nehat hişê Perwa. Çibûn wê derê jî û ti şop nedîtibûn.

Şevê nikarîbû razê. Her ku li ba xwe digot dostê wî birîndar e, dibe alîkarî jê re lazim be, diqeherî. Mîna ku ew bi tenê hiştiye xwe sûcdar his dikir.

Fikirî, “ez li vir bi rehetî di nav nivînên xwe de radizêm, ew niha di nav êşê de ye!”. Hemû duayên dizanî ji bo wî gotin.

Wê rojê, dema bi çiyê radipelikîn, di kû derê re derbas bûne, dîsa anî ber çavê xwe. Her gava wê rêwîtiyê tanî bîra xwe, her carê jî li wan şkêran disekinî.

Dema ku ya dawî û rêwîtiyên din tanîn beramberî hev, fêm kir ferq çi ye: Şeklên di şkêran de cuda bûn!

Ji ber berfa li jorê barî û helbet ji ber ew kelecana ku li ba Xorremê diçe rêwîtiyê, rê şaş kiribûn, çibûn bakurê şkêr. Halbûkî her tim wî û dostê xwe li rûyê rojava yê şkêr hevdu dîtine.

Dema ku ev fêm kir, got wê qet nebe sibe. Derket derve û hewa kontrol kir. Hawa aram bû, nedibariya, lê hem pir sar hem jî pir tarî bû. Nîvê şevê derbas kiribû. Heger di vê wextê de hewl bidaya biçûna çiyê, dibe rê nedîta, rê bidîta jî dibe ji serma biqerisiya.

Vegeriya nav nivînan. Çavên xwe qepat kirin.

Hemû laşê Awyer tijî birîn bibû. Ji ber ku destê wî nedigihişt birîna şûr a li ser piştê, nikarîbû xwîn bisekinandana û pir zêde xwîn jê çibû. Êş dikşand, pest digotin, alîkarî ji dostê xwe dixwest.

Perwa, alîkariya ku dostê wî dixwaze di hişê xwe de zindî dikir. Dema çavên xwe girt, dîsa heman tişt dîtin. Her çiqasî bi wê westandinê çavê wî nikarîbû li beramberî xewê xwe ragirtana jî, dîsa pest gotin.

Piştî pestgotinên bilind û nalînê, hê beriya bibe sibe xwişka wî ya biçûk hat ew şiyar kir.

Navê Awyer dibêje, di nav êşê de dinale. Dema ku xwişka wî şiyar kir, fêm kir xewn e.

Yê di xewê de dihat birîndarkirin ew bi xwe bû û alîkarî ji hevalê xwe Awyer dixwest. Dema ku Awyer dihat nêzî wî, ew bêserî didît, lê ruxmî ku serê wî tine bû jî laşê wî dipeyivî û digot, “netirse, çiyayî namirin!”

Roja din li şûna biçe çiyê, berê xwe da bajêr. Çû cem Qade.

Cenazeyê ku li sûkê li naverastê hatibû hiştin, heman şevê hatibû rakirin. Nedihat zanîn kê biriye.

Piştî vê bûyerê, amadekariyên dawetê taloq kirin. Ji bo vê sebebeke wan, dostekî diviyabû biparêzin hebû: Awyer!

## Efsûna Bajêr û Hevdîtina Mezin!

Piştî Ardeşîr, Şapûr hatibû ser desthilatdariya Sasaniyan û bajarê Gundeşapûr jî ji aliyê wî ve hatibû çêkirin. Jê re Qralê Qralan dihate gotin, yek ji mîrateya ku ji bo peyrewên xwe dihişt jî ev sifat bû. Ji ber mirêsê wî erd û ezman dilerizî, vî împaratorî şer qezenc kiribû.

Navê bi sedhezaran eskerên ku di şerê împaratoran de dimirin, navê malbatên wan, navê zarokên wan ti kesî bi bîr netanî. Ti kes nedifikirî ku ji bo ku mesrefên şer were pêşwazîkirin, gelek caran gundiyên cotkar birçî jî diman. Qurban û qral li ser dikê bûn; ma ne diyar bû wê di dîrokê de behsa kê bihatana kirin?

Şapûr, împaratorê Romayê têk biribû, ev bes bû. Yên can dayî jî qurbanên nav û dengê wî bûn. Xwedê wisa xwestibû.

Û li ser daxwaza Xwedê, Şapûr wê bajarekî nû ava bikira.

Cihê ku ew ê bajar bihata avakirin, bi xwe diyar kiribû.

Nêzî 250 sal berê bû, ango sala 260'î bû. 70 hezar eskerên Împaratorê Romayê yên ku di şerê Edessa de têk bir û dîl girt, li vir bi cih kir û bi emrê Xwedê ji behreyên wan sûd wergirt, di her cure karên îmar û mîmariyê de bi kar anî.

Valerîan, împaratorê 40'emîn ê Romayê bû. Di dîroka Romayê de cara yekemîn împaratorek dîl diket dest.

Şapûr, vî Valerîanê dîlgirtî û beşek ji eskerên wî li bajarê Bîşapûrê bi cih kiribû.

Ji bo Romayiyan ev rewş çavkaniyeke şermê bû. Wekî çawa di dîroka wan de cara yekemîn împaratorek dîl diket dest, di ser de jî bihîstibûn ku ne xwedî wê cesaretê ye xençerekê li ser dilê xwe bide, li şûna vê li ba dijminê xwe jiyana xwe didomîne.

Yên êsîrketî helbet xeyal dikirin vegerin welatên xwe, malbatên xwe. Feqet piştî demekê li cihê vî xeyalî avakirina bajarekî nû çêbû.

Têk çûne, li ba împaratorê xwe êsîr ketibûn. Bi çi rûyî wê vegeriyana?

Li cihê hatine bicihkirin, mîna bajarokekî biçûk ê Romayê ava kirin.

Ew bajarok mezin bû, fireh bû, bi demê re veguherî navendeke ku lê ilim-îrfan tê fêrkirin.

Ji Sûriyeyê hunermend, zana, ji Edessayê Nastûrî, ji Atînayê fîlozof hatin Gundeşapûrê. Beşek pir kêm ji van gerok û maceraperest bûn, piranî jî hatibûn sirgûnkirin.

Şapûr, ji zilamên oldar ên ku xakên mezin di dest xwe de digirin, bêzar bibû. Li bajarên nû avakirî fikrên nû şîn dibûn.

Pêxemberê herî rengîn ê dîrokê Manî xistibû bin baskên xwe; ji bo belavkirina fikrê wî jî derfet dabûnê.

Piştî Şapûr û Hurmuz, vê carê Behram derbasî ser textê bû û wekî karê yekem jî Manî qetil kir.

Manî, ji bo ku çavê hemû bawerî û fikrên cuda were tirsandin, li Gundeşapûrê ya bi zimanê Suryanî dibêjin Beth Lapat (bajarok), li qesra nû ya havînî ya qral heta mirinê bi zincîran hatibû girêdan. Yên digotin herî dawî ew ji eyar kirine jî hebûn.

Vî bajarokê bêkok ê nû hatibû avakirin, herî dawî ji bo qetilkirina yek ji fîlozof û pêxemberê herî bi kok û herî mezin ê dîrokê, Manî, bi şermeke mezin malovanî kiribû.

Piştî vê êdî bi qasî bîatî navenda desthilatdariyê bikirana wê cudahî jî bihatana qebûlkirin. Ew ê sînorekî xwînî li nav hemû fikir û tebeqeyên civakî bihatana xetkirin!

Sînor, bi êşkence û qetlîamê hatiye xetkirin, alîgirên Manî hatine girtin, qetilkirin; fikrên wî jirêderketinî hatine hesibandin û qedexekirin.

Ruhê nemir ê Manî jî di nav gel de digeriya. Bi kuştina mirovan, fikir jî nedimirin.

"Fikir" her çiqasî wekî taybetmendiyeke ku mirov ji hemû zindiyên din cuda dike were têgihandin jî di demên berê de li ser wan xakan dihat bawerkirin ku her hebûnek xwedî can û fikrekê ye. Her yekê ji wan xwe bi şeklekî cuda îfade dikirin. Mirovan xwe bi gelek şeklên cuda îfade dikirin. Mîna ken, girî, li ser dîwaran xetkirina resman…

Axaftin ne tekane şeklê îfadeyê bû. Carina bawerî, fikir bi sembolekê tenê jî dihatin îfadekirin.

Berê her tiştên ku jiyan hêsan dikirin, jêneger bûn, bi nirx û pîroz dihatin hesibandin. Dûvre dest pê kirin nirxên ku wateyê li jiyana wan bar dike bi destê xwe hilberandin. Xak cot kirin, li dora wê gund ava kirin. Dayikan ortama ewle ya ku wê zarokên xwe lê bigihînin bi destên xwe ava kirin. Her tiştên ku wê jiyana wan hêsan bikirana bi

destê xwe hildiberandin, hêza wateyê qezenc kiribûn. Ev tişt hemû jî deyndarî aqlê civakî bûn.

Bajarên ku bi hêza aqlê civakî ava kirin, efsûnî bûn. Yên çav berdidin nirxên kombûyî çawa derdikevin ortê, dema mejiyê zarokanî yê Xorremê têra vê nekir, Bavo Qade malbat hemû kom kir û ji wan re behsa çîroka qulûbeyê kir. Asara dema hat vî bajarê nû wê maneya wê çîrokê baştir fêm bikirana.

"Li gund hemû malbat hevpar dijiyan. Ji ber vê jî malên vî gundî bi xwe jî ji hev pir zêde ne qut bûn. We dikarîbû ji deriyê malekê bikevinê û ji baxçeyê ya din derketana. Dûvre zilamekî ku dît pîreke kal heye û dikare nexweşiyên mirovê herî rêzdar ê gund jî baş bike, hewl da wekî wê be. Ji ber ku tecrûbeyên wî ne wekî yên pîrê bûn, li ser xasûkiyekê fikirî.

Xasûkiya di nêçîrvaniyê de bi dest xistiye, niha wê li dijî civaka xwe bi kar bianiya. Lê di nava civakê de nikarîbû ev bikirana. Ji ber ku wê civak qebûl nekirana. Ji ber vê jî li derveyî gund qulûbeyek ava kir û li wir bi cih bû.

Cara yekem maleke ji derveyî gund dihat çêkirin. Gundiyan ev qebûl nedikirin, lê vî zilamî got wê li qulûbeyê bimîne, bifikire, lêkolînan bike û bibe şîfakarekî baş. Bi vî şeklî hewl da her kesî qeneh bike.

Bi demê rê li wê qulûbeyê ciwan, kal hemû zilam kişandin cem xwe û ji wan re çîrokên li gorî dilê xwe gotin.

Ha, ew qulûbe bingehê qesra niha ye!"

…

Piştî qesrên yekem hatin avakirin, mirov kirin dijminê hevdu. Xwestin her kesî bikin koleyê dewletê. Eşîran li dijî van gelekî şer kirin. Dûvre îradeya wan jî şkest. Tarîtî li her derê serwer bû. Ji ber wê tarîtiyê, mirovan agir û roja xwe di dilê xwe de veşartin. Heta ku Zerdeşt derket ortê. Ew hat û mirov ji nû ve ronî kirin. Zerdeşt çi gotin, wan jî eynî tişt gotin, lê dijberê wê kirin. Mejiyê mirovan bi xwe ve girê dabûn. Civak parçe kirin. Tebeqe ava kirin. Mirov kirin dijminê mirov, kirin dijminê xwezayê, dijminê her tiştî. Ol û çand kirin dijminê hevdu. Dûvre Manî derket, mejî ronî kirin û dil germ kirin. Şapûr jî xist ser rêya rast.

Ew zilamên qulûbeyê her tim xwe dan benda firsendê. Herî dawî Manî ji ortê rakirin. Cinawirê mirov li wir mezin bûye…"

Asara, li bajarê Şapûr, Gundeşapûrê çandeke nû nas kiribû. Mirovên li wir nedişibiya mirovên li diyarê wê.

Di serî de hinekî xwe kêm dîtiye, şerm kiriye, dûvre dema çavên wê vebûne jî mîna ku nîşan bide ne kêmî wan e, bi lez û bez fêrî xwendinê bûye. Bi saya dostê malbata wan doktor Naûman, di tedawiya gelek nexweşiyan de alîkarî daye û têkildarî tenduristiyê xwe pêş xistiye. Di têkiliyên cîrantiyê de bûye şahidê nîqaşên felsefeyê jî. Dizanîbû xwe bi xwe pêş bixîne, jêhatî bû.

Ji bilî jinên bazirganên dewlemend û cariyeyên li harema qesrê wêrekiyeke wisa nehatibû dîtin.

Li mala ku wekî hewî çêbûyê, êdî bibû xanima malê. Li cem wê jina ku ji ber zarokên wê çênedibûn qebûl kiribû weke hewî were ser, bibûn heval. Ji bo 4 zarokan, yek jê keç, sisê kur, herdu jî bibûn dayik.

Dibe xemgîniya nedîtina dê, bav, xwişk û birayê xwe be, dibe êşa zewaca ku ji aliyê bavê wê hatibû redkirin jî be, hewl dabû di jiyana xwe ya nû de bi serketinan derbas bike. Lê çi bikirana jî nikarîbû ew hizna di kenê xwe de veşêre.

Dayika wê ya ji jiyana Asara bêxeber, her roj bi hesreta wê diqeherî. Her çiqasî dilê Qade bi demê re nerm bibe jî ji ber ku ji bo lihevhatinê razî nedibû, hevdîtina wan jî mimkun nebû, heta ku dema zewaca Xorremê hat…

…

Dema ku Asara çibû pir bandor bibû. Xwişka wê ya her tim ew distirand, hevala wê ya lîstokê, firîşteya wê ya starê çûbû. Arad jî herî kêm bi qasî wê cirnexweş bibû, her roj acizbûna wî zêde bibû û li ser Xorremê zext çêkiribû.

Bêhizûriya di nav malê de dibû sebeb ku her bûyereke biçûk jî bi lezûbez mezin bibe; Xorrem her carê hesreta xwişka xwe ji kûrahî his dikir.

Piştî ku fêm kir Bavê wê helwesteke wisa li beramberî xwişka wê girtiye, her carê ji bo efû bike hewl dabû, lê nikarîbû encam biguhertana.

Daxwaza wê ya dîtina Asarayê jî bi helwesteke pir hişk hatibû pêşwazîkirin. Careke din jî nikarîbû dubare bikira.

Carekê Qade gotibû, “min keça xwe ji bo bibe kole negihandiye!”

Esas ne diyar bû çima aciz e, ji ber reviyabû çibû aciz bû, yan jî ji ber ku bibû jina duyemîn a zilamekî zewicî. Gûrûra wî şikiyabû û hîç efûkirin li xwe danetanî.

Ji ber vê sedemê Xorrem êdî nema li cem bavê xwe diçû gerê, wê jî li hemberî bavê xwe helwest girtibû. Dîsa jî nikarîbû wî dilê şkiyayî û acizbûyî aram bike.

Piştî 19 salan, dema ku xwest xwişka xwe vexwîne daweta xwe, cara yekemîn bavê wê bi hêrs nêzî mijareke ku navê Asara tê de derbas dibe nebû, li dij derneket.

Nermbûna Qade mîna mûcîzeyekê bû.

Xorrem ji kelecanê, keyfxweşiyê bi bask bibû û difiriya. Meraqa wê zêde bibû. Xeyal dikir ka wê xwişkeke çawa li beramberî xwe bibîne. Dîmenê xwişka di serê wê de mayî tenê bi porên reş û dirêj û du çavên li ken bûn.

Dayzer ji ber ku wê keça xwe ya mezin bidîta dehî dan.

Asara ya ku di 19 salan de carekê jî nedîtine, çawa vexwendin bihîst, tevî keça xwe ya navê dayika xwe lê kirî beriya dawetê ket ser rêya mala dê û bavê xwe.

Xorrem dema ku ji xizmên xwe yên bajêr agahî girt ku ew ê jî werin, Mohr girt û çû pêşiya wan.

Destpêkê di kolanên teng ên bajêr, dûvre jî di rêyên fireh ên herî derve re bi lezeke nedîtî derbas bû. Yên derdorê bang dikirinê, lê wê nedibihîst. Ji ber kelecanê derdora xwe nedidît. Hişê wê li ser xwişka wê bû:

Dibe jî pir kal bûye. Dibe nikaribim nas bikim. Heger nikaribim nas bikim wê pir eyb be.

Hatibû gotin gelek zarokên wê hene. Dibe hingî qelew bibe nikare bimeşe. Dibe jî hingî zeîf bûye wê nikaribe xwe li ber ba bigire.

Îcar wê ji bo min çi bibêje, bêje xweşik, bêje ji rêzê? Gelo wê min biecibîne?

Xeyal dikir, dema wê bibîne wê xwe biavêje hembêza wê û hîç bernede.

Dema ku gihişt eraziya bi Mohr re diket pêşbaziyê, gemên wê berda.

Tevî ku porê xwe li patika xwe kom kiribû û girê dabû jî ji ber ku ba wisa hişk lê dida wekî wê çermê eniya wê rake û bi xwe re bibe

his kir. Çav û guhên wê ji ber dengê ba qepat bibû. Dîsa jî leza xwe kêm nekir.

Heyecana wê tesîr li Mohr jî kiribû. Her tim di nav pergalekê de direviya, lê wê kêliyê tim û tim pergala xwe ya revê diguhert.

Herî dawî gihiştin deriyên berê yên bajêr, ku nedihatin bikaranîn.

Dema di wan deriyên texte û giran re derbas dibû ku salên dûvdirêj nehatibûn girtin û ji ber dîwarên li dorê bi piranî hilweşiyabûn bê wate disekinî, hema hema dikira li balyayan biketana. Di kêliya dawî de Mohr mîna bi bask bû, xwe di ser wan balyayên mezin re ku çi tê de bû nediyar e, avêt.

Zû hatibû. Piştî bêsebir û demek dirêj li bendê ma, hesreta wê bi dawî bû.

Çavê wê li rêya yekê bû, lê du jin derketin pêşiyê, yek ciwaneke çeqelokî, ya din jî periyek bû!

Di nav karwan de periyeke wekî stêrkê biriqokî û siya wê!

Xorremê xwe avêt hembêza Asara û heta rondikên çavê wê bi dawî bûn jî berneda.

Çeqelokê wisa ji xwe re li wan mêze kir, wekî ku ji hembêzkirina wan a bi hesret bi bandor bûye kir, yek-du caran quxiya, pozê xwe kişand. Dema ketibû rêza naskirina xaltîka xwe û hembêzkirina wê heçkû sê roj derbas bibûn. Mîna westiyabû li ser lingê xwe bisekine, çû li ser valîzê texte rûnişt.

Dema ku Xorremê dît rûniştiye, ji milên wê girt û rakir û bi rondikan ew şil kir. Hezaran ramûsanî enceq karîbû kêmekî vê keça sar a mîna siyê germ bike.

Dema hatin malê, dayik û xwişka xwe hembêz kir û bi hev re giriyan.

Bar kiribûn meheleyeke nû. Mala wan a berê mezintir bû, lê li vir têkiliyên cîrantiyê zindîtir bû.

Çawa gihiştin malê cîranan jî berê xwe dan milê wan. Çavên meraqdar herî zêde jî li ser Zarê bûn.

Zarê ya diket sala xwe ya 18’an xweşik bû, lê sar bû, bêdeng bû, girtî bû. Cara yekemîn pîrika xwe, xaltîka xwe û ew cîran hemûyî didîtin, hevdu nas kirin û hevdu bêhn kirin.

Ew roj heta êvarî tenê bi girî derbas bû. Li beramberî van giriyan çeqelokê jî xwe negirt û ew jî tevlî bû.

Xorrem ji nêzîkatiyên nazenîn û germ, gotinên xweş ên xwişka xwe bandor bû. Bajar wekî cihekî efsûnî lê hat. Bi bejn, bal û qiseyên

wê yên xweş nikarîbû bawer bikirana. Ew mîna volkaneke ku nû radibe, Xorrem jî li gel wê mîna kalkereke tefiyayî xuya dikir.

His kiribû ku li ba Asara wekî zarokekê xuya dike. Lê, dema ku Asara gotinên tijî pesin jê re kirin, stêrka ciwantiya wê dîsa biriqîbû.

Xorrem, bi saya bavê xwe, bi navê wê yê di Avestayê de derbas dibe, di warê "azda" ango "zanyariyê" de, pir pêş ketibû. Azda agahiya jiyanê bû ku tê de gotin û kirin yek e, Xorrem bi saya wê kûr bibû. Asara jî bi saya fêrbûnên xwe yên ji bajêr di asteke cudatir de pêş ketibû.

Behsa Romayê dikir, malên mezin, dibistan, gotinên nû, baweriyên cuda dikir. Stranên ku Xorremê qet nebihîstine digotin, digot bêyî muzîk wê mirov nikaribin bi tendurist bijîn. Li gel vê behsa bêhnên xweş, kulîlk û maneyên wan jî dikir.

Bi giştî 4 zarokên wê çêbibûn, bejna duduyan bibûn qasî wê, lê wekî ku hîç kal nebûye, mîna ji malê reviyayî zindî, şên bû.

Ji rojan kesk bû. Roja ku Dayzerê li zarokan xwarin belav dikir.

Îro ne li benda Qade bûn, lê sibe wê teqez li malê bûna.

Qadê ew tewişandin. Ruxmî ku roja Înê jî bû hat malê. Çawa ket hundir malbata xwe li beramberî xwe dît. Keçek genç jî lê zêde bibû.

Dema Qade dîtin ketin rêza merasîma malbatê. Dayzer ket herî serî.

Bi ken gotê, "tu bi xêr hatî".

Qade di dilê xwe de got hevjîna wî demek dirêj wisa nekeniyabû. Keyfa wî hat. Li beramberî wê sekinî û bi serê xwe silav dayê. Bişirî. Lê kenê wî kurt ajot.

Ji serî heta binî li keça xwe Asara nêrî, ew derbas kir û çû gel neviya xwe.

Dema ku bi bêdengî di ber Asara re derbas bû û çû, girêk ket qirika Dayzerê, singa wê teng bû, çavê wê reş bûn.

Naxwe ruxmî ewqas sal ketibûn navberê jî ew dilê wî yê hesin neheliyabû, ewqas êş, hesretê ew nerm nekiribû!

Dayzerê hema dikira li wir ji ser hişê xwe biçûna ku dît Qade hat li beramberî Zare sekinî, serê wê miz da û danî ser singa xwe. Fêm kiribû neviya wî ye. Heman çav, heman poz, heman çene. Mîna kopyaya Asara bû. Tenê germahiya wê di vê ziwayê de tine bû.

Tam dikira ji neviya xwe ya serê wê daniye ser singa xwe veqetiyana, Asara destê bavê xwe girt, ber bi xwe ve kişand û hembêz kir, bi rondikên xwe destê wî şil kir.

Dayzer giriya, Xorrem giriya, Qadê ev girî ferq kirin, çavê wî jî mîna hêlm girtin, lê li ser xwe hakim bû. Birhên xwe nêzî hev kirin, tenê hişt di ser kaniyên çavên wî re ewrek derbas bibe û biçe.

Zareya ciwan jî pir zêde nikarîbû xwe bigirtana, cara yekem ji dil rondikên çavên xwe berdan.

Destên mezin ên şilbûyî, ji bo ziwakirina firmêskên çavên Asarayê dirêj bûn:

Got, “Rondikên zêde dikare dawiyê dilê te ziwa bike! Di hundirê xwe de veşêre bila neqedin!”

Dayzerê piştî ev gotin bihîstin, bi rehetî nefesek kişand, rengê wê lê vegeriya. Ji keyfxweşiyê yek li pişta çeqelokê da, kêm mabû kezeba wê di devê re bîne.

Wê şevê heta razanê tenê bi girî derbas bû…

Bêdengiya keça Asarayê pir balkêş bû. Hêsanî nediaxivî, lê dema diaxivî jî çendek gotinên di bin pozan re dikir û dîsa bêdeng dibû.

Ev biçûkdîtin, henekê xwe pêkirin, ev xwe ecibandin û û pozbilindî jî ji kû dihat?

Li pişt vê sekna sergevez kesayeteke çawa veşartibû?

Di nav malbata wan de li ba ti kesî taybetmendiyeke wisa tine bû, çawa dibû vê keçê xwe ewqasî li ser serê wan mezin dikir?

Ji wî bajarî bû, ji bavê xwe bû, ji kû girtibû ev cira nexweş? An jî jê xerabtir, gelo dayika wê fêrî wê kiribû?

Xorremê bi demê re texmîn kir kîjan hevok ji kû derê ji ber kirine, lê negot. Ji ber ku nexwest wê bişkîne, her tim gotinên hezkirinê yên mîna “heyran, qurban” gotin û xwest vê biçûkdîtina wê derbas bike. Xwe neda ber nîqaşên ku wê siyê bîne ser bextewariya wan.

Ji bo dawetê roj mabûn. Amadekariyên bêatlehî dewam dikirin.

Wê û Perwayê ji malbateke oldar, salek bibû soz dabûn hev. Ji bo karibe demildest wî û Asara bi hev bide naskirin, niqeniq ji nava wê diçûn.

Ji bo rê nede gotegotan û careke din bavê xwe aciz neke, wekî çare xwişka Perwa vexwend malê. Gotê dema hatin bila bi hev re werin.

Arad çû vê xeberê bide wan. Vê carê xwişka xwe neşkandibû.

Zarokên ku her roj li kolanan dilîstin wê rojê li naverastê xuya nedikirin. Cilên ku ji bo ziwakirinê li her derê bi ûsûlekî dihatin daliqandin û li kolanê cimbûşa rengan çêdikirin jî tine bû.

Li ser kolanê bêdengiyeke ecêb peyda bibû.

Heçkû li hewayê bêdengiya mirinê hebû. Halbûkî li wê kolanê li ti malê şîn tine bû. Bûyereke xerab jî neqewimîbû. Ev bêdengî, ev qilqal çi bû?

Xorrem, bêsebrî carê derdiket ber derî, dixwest pêşwazî bike, lê ti kes nedihat.

Dayzer jî piştî wê derdiket û dinêrî. Her derdiket kolanê ew bêdengiya ecêb ya hewayê zêdetir his kir.

Ne tenê kolan, ji malan jî deng dernediket. Dayzer hisên xwe xurt bûn, ji nişka qîr da û her kesên li malê li ba xwe kom kir.

-Em derdikevin, tavilê malê diterikînin!

-Çi bû dayê? Çima em derkevin?

-Keça min a xweşik, guhdarî dayika xwe bike, hemû guhdar bikin, em zû derdikevin, diçin.

Dayzer hemû dan ber xwe, domahiya kolanê bi lez û bez, herî dawî gihiştin kolaneke din a diçe sûkê. Beriya bigihêjin sûkê sekinîn.

Dayika wan pirsî:

-Bêhna şewatê tê we, qiçqiçînî tê we?

Hemû bi awayekî şaşwaz, hilma wan çikiyaye, gotin, “na”.

Dayzerê got, bêdeng bisekinin. Dûvre dîsa pirsî. Dîsa heman bersiv girt. Bi xwe jî ferq kir ku şewatek tine ye.

-Ka em vegerin malê!

-Em vegerin, lê çi bû, çima em hatin? Xorrem ev pirsî, lê bêbersiv dîsa vegeriyan malê.

Çawa gihiştin ber deriyê xwe ku jineke cîranê wan ji şibakeyê serê xwe dirêj kir û got:

-Xêr e xaltîka Dayzer, çima tu wisa pêxwas derketiye kolanê? Wê çaxê Dayzerê ferq kir ku bêpêlav derketiye.

Bêpêlavbûna xwe bêbersiv derbas kir.

-Halê we çi ye keça min a xweşik, çima mehele ewqasî bêdeng e?

-Ma we Şînê ji bîr kir? Her kes li mala xwe ye!

-Spas xweşikê, cîrana şîrîn, bibexşîne, helbet min ji bîr nekiriye, tenê ji ber heyecana keç û neviya xwe min ferq nekiriye ev roj hatiye!

Di nav xwe de ji bo Çarşemê digotin Şîn, li gel hinên din jî gotina Çarşem bi kar tanîn. Şîn, rengê asîman ê vekirî bû; li gorî vê wateyên bi hêvî lê bar kiribûn. Roja çaremîn a hefteyê bû û roja bûyîna

Zerdeşt bû. Wê rojê bi lîstokan nedilîstin, dawet çênedikirin, cil nedişuştin, îbadet dikirin.

Gelê wê mehelê nediçû agirgehên dewletê. Digotin li wê derê agirê pergala xerabûyî pê dikeve û cihekî ketiye fermiyeta dewletê wê nebe îbadetxane.

Di nav wan de hevpeymaneke bêdeng hebû.

Îbadetên li malê mîna lêhûrbûna hundirîn dibû. Li gel vê her meh roja yekemîn, ango roja Ohrmazd (Ahûra Mazda), jin û zilam li odeyeke mezin kom dibûn, li ba muzîkê ayîneke ku diketin cizbê pêk tanîn. Di vê merasîma olî de bi hereketên mîna dansa qulingan li dora xwe digeriyan.

Wê rojê tenê nediketin cizbê, beriya wê şaşiyên xwe dixistin ber darazê û heqê xwe li hev helal dikirin.

Wê roja ku xwarinên mîna tûyên ziwakirî, gûz, bastêq, şîr, hêk dihatin belavkirin, herî zêde jî ji bo zarokan dibû cejn. Mezinan ava tirî ya şîrîn vedixwarin. Ev merasîm li mala xwe dikirin, ji ber ku derketina derveyî merasîmên dînî û nêzîkatiyên derveyî merasîmên Sasaniyan diyarkirî sûcekî giran dihate hesibandin.

Ne mimkun bû Dayzerê rojên wisa ji bîr bikirana, lê bi rastî jî hem kelecana dawetê ew girtibû hem jî wê bîranîna wê ya berê ya şewatê bibû sebeb ku bi refleksekê bikeve nav tevgerê.

Dema ketin hundir, li dor Dayzerê kom bûn. Ji ber xemgîniya di çavên Dayzerê de dihate dîtin, tavilê nepirsîn bê çima wisa kiriye. Wisa demekê rûniştin. Bêdeng. Piştre jî Dayzerê firsenda pirsê neda wan.

Xorrem pir tirsiyabû. Hê tirsa wê derbas nebibû, ji ber ku mêvanên wan nehatibûn. Sebeba nehatina wan ew bû ku ji rojan çarşem bû.

Roja din ber bi nîvro hatin: Perwa, xwişka wî û pismamê wî.

Di dest wan de sêniyek şîrînahî û bi diyariyan…

Cîranan jî ev firsend bi kar anîn, dawetkirî-nedawetkirî hema mal tijî kirin. Dema bavê wan ne li wir bû, li ba zavê rehet bûn. Wekî xwestin xwe nêz kirin, henek kirin, keniyan, kêf kirin.

Ev besî wan bû. Li gorî adetên demê di astek pêş de hevdu nas kirin, axivîn, dema wê vegeriyana pismamê wan got:

“Hêvîdar im beriya agir xweş bibe ev kar bigihêje dûzbûniyê.” Xwest çi bêje, ti kesî fêm nekir.

Welat bibû cihê şewatê. Her kêlî li her derê bûyerek diqewimî. Birçîbûn, feqîrî li her derê bû. Xakên bi bereket di dest dihkananên dewlemend û rahîban de kom bibûn.

Gundiyan ji bo karibin li baxçeyê xwe yê biçûk biçîne jî tiştek nedidîtin. Gelê li bajar nanoziko dixebitî. Eskeran dewlemend diparastin. Dizî mîna şewbê belav bibû. Ji bo sê qirûşan mirov dihatin kuştin. Jin mîna malekî dihatin kirîn û firotin. Ji van şewatan ne bêxeber bûn, lê qet nefikirîbûn wê mala wan jî bişewite, ji derveyî Dayzerê!

**Devê Tarîtiyê**
**"Jina herî baş ew jin e**
**ku behsa wê nayê kirin."**
**(Tukîdîdîs)**

Mirov her tim li beramberî rastiyê ne wêrek in, wê çaxê rastî her tim gavekê li pêşiya mirovan dimeşe.

Mesafeya di navbera rastî û mirovan de bi gotegotan dihate qepatkirin. Nedihat pirsîn gelo ev nêzîkatiyeke durist e yan na. Ji ber ku berê pêşîn dihat bawerkirin, ku duristî di bin talda wê de namîne.

Di wextekî wisa de ku duristî ehmeqtî dihat hesibandin, kî behsa duristiyê dike? Wî zemanî duristî ehmeqî nedihat hesibandin.

Di wê demê de duristî hê derbasdar bû û piraniya mirovan ji vê rûpoşê hez dikirin.

Gotinên herî xerab, nêzîkatiyên herî xerab jî bi rûpoşa "duristiyê" dihate veşartin. Helbet her kes ne wisa bû. Ji devê mirovên ruhê wan ronî gotinên xerab dernediketin. Nêzîkatiyên wan ên xerab çênedibûn. Her tiştên wan xweşik bû. Hundirê wan û derveyî wan eynî bû.

Di serê wan nirxan de ku mirov dikirin mirov, duristî dihat. Lê çi heye ku ji dema her cure qelpî li pişt perdeya duristiyê hate kirin û şûn de, êdî nedihat fêmkirin bê duristî çi ye, ne çi ye.

Di hemû olan de mirovê durist wekî kesê ku derewan neke û neheqiyê nake hatibû pênasekirin. Derew û neheqî her tim hevdu dixuliqînin û wisa zêde dibin, mezin û berbelav dibin. Li her dera ku derew heye neheqî, li her dera ku neheqî heye jî derew heye; mîna cêwiyên peve ne.

Qral Darîûs, duristî wekî wezîfeya herî esasî ya ku mirovê rast li beramberî qralê xwe pêk bîne pênase kiribû. Ji wê demê û şûn de duristbûn dihat maneya serîtewandina li ber qral û sîstema wî. Hêz û duristî çawa kiribûn yek? Ne mimkun bû aqil tê de bigihiştana.

Mirovê ne durist wê serî li beramberî hêzê bitewîne, yê bêhêz jî bitepisîne. Fikra wî xerab e. Ji bo vê veşêre herî zêde olê ji bo xwe dike maske. Ji ber ku duristî û oldarî yek e, ji ber vê!

Halbûkî mirovê oldar qet nikare xwedî fikrên xerab be.

Nebûna xwedî fikrê xerab jî têrê nake mirov bibe yekî/a durist.

Mirovê durist, tevî ku fikrên xwe baş in, neheqiyê jî li ti kesî nake û serê xwe jî natewîne.

Navbera yekî pir zêde derewan dike û pir durist de di encam de taybetmendiya hevpar çi ye? Herdu jî bêrehm in!

Duristiya bêwext dikare ji derewê jî zêdetir zirarê bide. Derewa ku ji bo zirarê bide hatiye gotin jî dikare dinyayê xera bike, bibe sebeba tofanên nû.

Duristî çiqasî bêrehm bibe bila bibe, dîsa jî duristî bû. Derew jî wê her tim wekî derew bimaya.

Bi rastî jî duristî her tişt bû? Dijberiya duristiyê derew bû? Çi bû ya wê ji derewê cihê dikir?

Li gorî baweriya berê ya Mazdayê, gotinên rastiyê, şervanên herî baş in ku li dijminan (derewan) didin. Ev rêgeza jiyanî wekî formuleke di asta pîroziyê de hatibû qebûlkirin û bingehê Zerdeştiyê jî pêk tanî. Feqet niha wisa bû?

Derew pir berbelav bibû. Tevî vê jî nirxdaraziyên demê çima her tim duristî derdixist pêş? Dibe ku ji ber pir kêm bibû, ya ku herî zêde navê wê dihat bibîranîn jî ew bû!

Li beramberî vê çiqasî besît jî be ma “fikra baş” nikarîbû bi nirx bibûya?

Li gorî hinan jî di vê demê de lazim e mirov ne yekî durist be, lê yekî karê xwe zane be. Ji ber ku zeman bêrehm bû!

Zemanekî ku rast, baş, xweşik çi hebûya ev hemû bi her cure xerabiyê re hatibû xermankirin, hatibû û xwe dabû ber derî.

Zeman bibû celadekî ku bi hevrişmê mirovan dixeniqîne. Hemû pîroziyan, ji bo qetlê gotibûn wacib e.

Ji herî jor heta herî jêr li her derê pîrozî, paqijî, îfet, mezinî, duristî girêdayî vê rewşê hatibû kirin, ku “divê jin ji bo zilaman wekî koleyên mûtleq bimînin.”

Qatilê ruhê zemanê, rûpoşa duristiyê bi kar tanî. Ev qatil bi awayekî xasûkî diket her derê, wê qesta jiyana nû ya ku Xorremê bi bexteweriyeke mezin amade dikir jî bikira û di arîfeya zewacê de “cinayeta xwe” pêk bianiya.

Pismamê Perwa yê ku dema ji derî derket ew gotinên ecêb gotin, li ba bazirganekî dixebitî. Asara nas kiribû!

Dema ku ji mêvantiyê vedigeriyan, mezinên malbatê kom kiribû û çerxa cinayetê zîvirandibû.

-Ez wê jinê nas dikim. Xwezika min nas nekirana! Wisa dest bi gotinê kiribû.

Pirsîn;

-Kîjan jin?

-Keça mezin a Qade! Min ew li Gundeşapûrê dîtibû. Ne yeka baş e. Min nizanîbû keça Qade ye.

Dema ku wî wisa got, vê carê mezinan xwest rave bike. Gotinên kirêt ên ku çerx dizîvirand yek bi yek derketin:

-Ew wekî çawa xizmeta ola me nake, li sûkê-bazarê jî ketiye ser zimanê xelkê. Sêhrbazek e, li ba ruhên xerab û tarîtiyê, hevkariyê dike. Li wir di nav rêwiyan de bû. Ma we ji cil û bergên wê fêm nekir?

Tenê ji bo çavê vî pismamê min ê kawik vebe, ez ê vebêjim.

Me mal dibir, esnaf di nav xwe de diaxivîn, min bihîst. Gotinên nayên gotin tanîn ziman. Têkiliya wê bi gelek zilaman re hebûye!

Zilamê wê bêhnan çêdike û difiroşe. Dema ku ew bêhnên heram sûkê hemûyî dipêçe, ti kesên ku fêm neke ew di wir re derbas bûye, namîne. Êdî ka ev mêr û jina wî çi mal in, tu bihesibînî!

Çavên Perwa wekî kasika xwînê lê hatibûn, rondik jê dihatin xwarê, got;

-Çima wisa dipeyivî? Çawa dibe? Çima vê bike? Tu ji kû dizanî ev hemû ne bêbextî ne? Û sileyek li pismamê xwe da. Wextê ku wî jî dikira bi heman şêwazî bibersivanda, apên wan ketin navberê.

Tiştekî nedîtî bû, li ba wan sîle dabûn hev. Di nav malbatê de, îcar li ba apên wan cara yekem bûyereke wisa çêdibû.

Perwa gote wan, ev vegotin ti eleqeya xwe bi Xorrem û malbata wê re tine ye, keça wan a mezin demek dirêj ji malbatê qut bûye. Lê, apê wan ê her tim aram bû, bi hîdet qîr kir:

-Ji niha de malbata me bera ber hev dan. Ev zewac nabe. Û nîqaş qedand.

Apê wan otorîteya silaleyê bû. Li ser gotina wî gotin nedibû.

Dawet hat betalkirin. Xeyal di tarîtiyê de winda bûn û çûn.

Her tişt ewqasî besît çêbûn.

Qediya!

Qediya, lê ew ê Perwa biqedandana, ne diyar bû. Ji dostekî xwe yê çiyayî fêr bibû bê înad û îrade çi ye.

…

Qade xwe bi keçên xwe re aciz nekir. Got, “em ji şaşitiyeke mezin vegeriyane” û hewl da hevjîn û zarokên xwe teselî bike.

Dayzer ket dewrê, ti jin nehişt di nav malbata Perwa de pê re naxivî. Li rûmeta keça xwe difikirî, ditirsiya leke were ser navê wê. Ji ber vê pir mijûl bû. Lê hewldanên wê badilhewa çûn.

Dayzer, ruxmî her tiştî jî fikirî ku heger Asarayê ji nêz de nas bikin wê helwesta malbatê biguhere, feqet hemû hewldanên Asara jî vala çûn.

Malbata Perwa hemû deriyên xwe li Asarayê girtibûn.

Her çiqasî Perwa fikirî bi dizî pê re bide û bistîne jî, ji ber zext û şopandina malbata xwe nikarîbû carekê jî firsend bidîtana. Tenê ji bo lêborîna xwe ji Asarayê re bişîne zarokek kiribû navbeynkar, tenê serketina wî ev bû; fêr nebû ka peyama wî çiqasî bi awayekî rast gihiştiyê jî.

Di nav malbata wî de her kesî helwest girtibû, ev kar qedandibûn. Tenê nedihat zanîn bê wê Perwa çi bike. Ji bo yên din wekî çawa her tişt qediya bû, nîqaşa vê mijarê jî hatibû qedexekirin.

Mîna ku kaniya gund nediherikî, hemû keçan şîn girê dabûn.

Mîna di çîrokeke kevn a têkildarî kaniyê de tê gotin, prensê dihate gotin ji tavê hatiye dîsa hatiye hepskirin, periya ku digotin heyv bi xwe ye, dîsa ketibû hundirê bîrê.

Di bextreşiya wan de siberoja xwe ya kotî dîtibûn, bi rojan giriyabûn, ne li serê kaniyê, li malên xwe, bi dizî…

Xorrem bi rojan neaxivî, nexwar, venexwar. Hezm nedikir, çawa Perwa li beramberî spartinên malbata xwe serî tewandibû. Hezkirina wî ewqasî erzan nedibû. Nikarîbû ewqasî hêsan dest jê berde. Nikarîbû wate bidayê.

Tevî ku hewl da pê re biaxive jî, dît Perwa xwe nêzî vê jî nake, li beramberî wî sar bû, hestên wê yên germ veguherî agirekî sor, di nava wê de hêrseke mezin çêbû.

Asara ji van rûdanan xwe berpirs dît. Ji ber ku bi rojan giriya, roniya çavên îpek tefiya, biçûk bû, ketin kortikê.

Dayzerê nema xwe girt û bang li keçên xwe kir:

-Bes e girî! Ma ne dawiya dinê ye! Heger hûn serpêhatiyên me yên berê bizanibin, niha we yê ewqasî xwe heder nekirana!

Keçan bi ecêbmayî lê guhdar kirin. Dayika wan cara yekemîn ji bo wan behsa Sata, Aradê Egîd dikir. Heta wê rojê tenê dizanîbûn li mala wan şewatek çêbûye û di wê şewatê de milên Qade şewitîne. Di nav rondikên xwînî de bihîstin di nav wê şewatê de birayê wan û egîdek miriye.

Li beramberî vê êşa mezin a ku ewqas salî wekî sirekî mabû, şaşwaz man. Piştî demekê Xorremê dawî li giriyê xwe anî, lê Asara xwe avêt hembêza dayika xwe û giriyê xwe domand.

Piştî rojan jî ev giriyên Asara yên tehdekar nesekinîn, dema Xorremê di guhê wê de kir pistepist ket nav şokeke nû:

"…Ji ber vê yekê divê mirov vê dinyaya wisa lez û bez diherike mîna hebikek şevnemê, kefeke di çem de, di ewrê havînê de çirûskeke birûskê, stêrkeke dişemite, xeyaletekê û xewnekê bibîne."

Bawer nekir ku ev gotin ji devê Xorremê derketine. Xwest careke din dubare bike.

Piştî got, "serpêhatiyên me çiqasî fêrker dibin bila bibin, garantiya siberoja me tine ye" wan gotinên zanayan dîsa dubare kir û got "ya me jî xewnek bû, hat û çû!"

Dema ku dît Asara ecêbmayî lê mêze dike, gotê ev peyv ne aîdî wê ne, aîdî doktrîna Bûda ne.

Asara dîsa şok derbas kir. Gelo Xorrem ji kû fêrî van bibû? Li çavên bi ken ên xwişka xwe nêrî. Fêm kir ku ew bi rastî jî baş e. Dilekî wê yê şikestî hebû, lê dîsa jî baş bû. Çawa karîbû ewqasî zû xwe komî ser hev bikira? Serê wê tevlîhev bû.

Di salên borî de ji malbata xwe bêxeber mabû. Bawer nedikir ku Xorrem jê re behsa Bûda dike. Pirsî bê ji kû fêrî van bûye û bersiva xwe jî girt: "Bavo Qade!"

Baş e, lê Bavo Qade ji kû dizanî?

Qade, ji ber guhertinên di Asara de çêbûne keyfxweş bibû, lê terzê gihandina neviya xwe neecibandibû. Daxwaza Xorremê ya ku dema ew ê vegeriyana malê dixwest bi wan re biçe, red nekir. Hem ji bo Xorremê wê guhertinek bûya hem jî wê bi neviya wî re mijûl bûya. Dizanîbû, ne hewce ye di vê mijarê de tembihan li Xorremê bike.

Dayzer bi şertê ku ji keç û neviyên xwe veneqete ev qebûl kir. Ew ê jî li ba wan biçûna. Lê dema ku Arad kir mesele, neçû. Arad dixwest ji malê veqete, lê Dayzer li dijî vê derdiket. Dayzer ketibû

nav yek ji kêliyên xwe yên herî hestiyar. Di şexsê Arad de kurê xwe yê destpêkê Sata didît û veqetîna wî qebûl nedikir.

Taybetmendiya wê ya hestiyar herî zêde derbasî keça wê Xorremê bibû. Xorremê ne tenê taybetmendiyên wê yên hestiyar, li ser navê çanda civakî çi hebûna hemû daneheva wê girtibû. Qeyîmbûna xwe jî deyndarê wê bû.

Bavê wê têkildarî bajaran zane bû. Dayika wê jî têkildarî çanda civakî xwedî agahî û daneheveke li pêştir bû. Her çiqasî Dayzerê ji bo fêrî zarokên xwe bike pir hewl dabe jî herî zêde Xorremê jê girtibû.

Tevî ku Arad ji Xorremê mezintir jî bû, lê hê jî bi çavê zarokekî biçûk lê dinêrî. Ji ber vê yekê li cem keçên xwe neçû.

Xorrem çend carekî li cem bavê xwe çûbû diyarên din, lê cara yekem wê li başûr biçûna bajarekî. Ew bajarê ku Asara her carê pesnê wê dida pir meraq dikir.

**Şibakeya Cîlakirî!**

Li serê çiyayên ji dûranî xuya dikirin, hê berf hebû. Germahiya havînê dest pê kiribû. Feqet bi saya bayê ji çiyê tê rêwîtiya wan rehet derbas bibû.

Dema ku ji karwanê pê hatin Gundeşapûrê veqetiyan, serkarwan barek emanetî wan kir. Wê emanet bidana Doktor Naûman.

Di têketina bajar de Xorrem wateya navê bajêr ji xwarziya xwe re pirsî. Zarê ev nizanîbû. Asarayê bersiv da. Lê beriya vê, tevî dimeşiyan jî xwe li qirka Xorremê gerandibû û bênavber maç dikir.

-Wextê em hatin vir, tiştê yekemîn me bihîstibû ev bû. Şapûr “şibake” ye, lê ev bajar navê xwe ji qral Şapûr digire.

-Pir kevn e?

-Ne kevn e, xwedî dîrokeke 250 salan, herî zêde 260 salan e.

-Ez têkildarî wê fêrî hin tiştan bibûm. Ma ez ê qet warê te meraq nekim?

-Tu fêrî çi bûye?

Xorremê nedixwest xwe bi zanebûna xwe mezin bike, tevî ku pir bi detay dizanî jî, mîna ku ji hinan bihîstiye got:

-Bawer im wateyeke dumendî ya Gundeşapûrê heye, hem wekî bajar hem jî wekî kelha eskerî. Jê re Gund dez-î Şapûr jî hatiye gotin, ev jî tê maneya Kelha Eskerî ya Şapûrê. Di dema xwe de ev der kelhe bûye û êsîrên şer ên Romayî lê kom kirine. Ji ber vê yekê Ereban ji vir re Cundîşapûr gotine: “Eskeriyeya Şapûr!”

Devê Zarê vekirî mabû. Lingên wê li hev geriyan, dikira biketana. Bawer nekir ku Xorrem ewqas tiştî dizane. Tiştek negot, xwe kişand pişt perdeya bêdengiyê.

Xorrem ji bo ku vê bêdengiya wê xera bike ji xwarziya xwe re pirsekeke besît pirsî:

-Li vir hê jî kelha eskerî heye?

-Erê, kelheyek heye, lê li bajar ji eskeran zêdetir zilamên oldar hene!

Zarê ji ber pirs bêyî bersiv nehiştiye, keyfxweş bû, li kêleka lêva wê kenekî biçûk diyar dibû, bi xwe serbilind bû û mîna bendewariya wê dikir jî ji xaltîka xwe aferînek û ramûsaneke mezin girt.

Zilamên oldar ên ku Zarê behs kir, ji aliyê konseya esîlan dihatin destekkirin. Dixwestin bandora Yewnan û Romayê bişkînin û li çanda berê vegerin.

Împaratoriya Romayê parçe bibû û hevrikê nû yê Xanedaniya Sasaniyan êdî Împaratoriya Bîzansê bû. Feqet bandora çanda Romayê hê jî dewam dikir.

Zilamên olî ji bo ku fikreke jehrî ya ku wê otorîteya wan bixe lêpirsînê şîn nebe, pûte pê didan.

Pir nêz bû ku di şerê fikrî de winda bikirana. Ji ber vê jî dema diketin zorê hema serî li rêya fen û fûtan didan. Ji ber ku "nûnerên Edaletê" ew bi xwe bûn, di hemû nîqaş û dozên girîng de mafdar derdiketin!

Bazirganên Ereb ên ku ji başûrê wê, ji bajarê Sûrkûtîr dihatin xistibûn nav lepên xwe. Nifûsa Ereban kêm jî be, di dewlemendiyê de bi esilzadeyên Farsan re ketibûn pêşbirkê. Hayê Qesrê ji her tiştî hebû. Li vir polîtîkayeke taybet dihat pêkanîn, herêmên Ereban ji ser vî bajarî dihevsengandin.

Xrîstiyan jî wekî ji her kesî zêdetir in xuya dikirin. Roja Şemiyê diketin betlaneyê, rojên yekşemê li dêra bajêr kom dibûn. Di ser de jî hejmara wan bi demê re zêde dibû. Vê rewşê fikar li ba rahîban çêdikir, heta ji nav wan hinekan kehanet anîne ziman û gotine, "tirsa min ew e rojê were hemû Êranşehr bibe Xrîstiyan!" Li bajar her wiha Ermenî, Nastûrî, Medî û hejmareke kêm jî Hindî, Cihû û Yewnanî hebûn.

Wekî parçeyekî hemleyên polîtîk ên li beramberî Bîzansê, "rengînbûna Gundeşapûrê" hatibû fikirandin.

Di bin hikumdariya Kûbad de bajar navendeke wisa bû ku her cure fikir, ilim, zanist lê dihat pêşxistin. Lê rahîb û esilzade dixwazin vê derê bi temamî li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin, fikrên zêde beralî bikin û her tiştî di bin kontrola xwe de bigirin.

Kûbad neçar bû hêza rahîb û esilzadeyan li ber çav bigire. Apê wî Belaş ku text ji wî dewr girtibû, ji ber polîtîkayên wan pêk neanîbû, tenê 4 salan li ser hikum mabû, ji wezîfeyê hatibû girtin û wekî ceza jî çavê wî kor kiribûn. Di ser de jî heman esilzadeyan, ku ew bi xwe jî carekê ji textê dûr xistine; piştî domahiya 2 salan birayê wî Camasb li ser textê dabûn rûniştandin, dîsa ew anîbûn ser textê. Diviyabû Kûbad jê û şûn de baldartir bûya.

Lazim bû balên li ser nîqaşên olî yên li Gundeşapûrê kom bûne bikşandana cihekî din. Rewşa Mûbedan-Ruhaniyan yên li navendê ji bo vê armancê guncav xuya dikir.

Nîqaşên nav Mûbedan, ku mudawîmên rojane yên qesra li Tîzbonê bûn, sor kiribû. Ji bo vê jî aliyê nêzî xwe destek kiribû. Mûbedê ciwan ê ku piştgirî girtibû, di hemû nîqaşan de bi zanebûn û jîrbûna xwe derdiket pêş. Jê û şûn de wê bi awayekî hostetir ji vê rewşê sûd wergirta.

Ev Mûbedê ciwan ji ber ku ol û dewlet ewqasî di nav hev de bû, li dij derdiket. Behsa cihêbûna ol û dewletê nedikir, lê ev yekbûna wan a heyî jî bi fikare didît.

Kûbad, di jiyana xwe de ne di mirovan de, ne jî di pirtûkan de rastî fikrên ewqasî talûke hatibû. Ol û dewlet çawa dikarin ji hev dûr bikevin? Angorî wê tiştekî wisa ne mimkun bûna, armanca esasî ya vî ciwanî çi bû? Gelo dixwest qûralên hişk ên olê nerm bike û pê re îdareya dewletê nerm bike? Dibe li pey olekî nû bûya?

Her çiqasî gumanên qral hebûna jî fikrên ku ji karî wî re dibûn, nas kiribûn.

Xweda Ahûra Mazda bi xwe remza hêzê dabû qral Ardeşîr ê ku xanedan anîbû ser desthilatdariyê. Ji wê rojê ve qraltî û Zerdeştî yeksan bibûn, ol û text bibûn yek. Feqet vê rewşê bi demê re rê li ber civateke nû ya berjewendiyan, ku xwîna gel dimêtin vekiribû; dijderketina textê wekî dijderketina Xwedê dihate hesibandin.

Mûbedê ciwan fikrên xwe bi wêrekî li gel qral parve dikirin, dijberiya xwe ji bo olê ku bibe amûrekî desthilatdariyê tanî ziman. Wateyeke din a vê hebû, mirov karibin bibin xwedî fikrekê; ango bikarîbana bifikiriyana! “Fikrandin” li derveyî feraseta ola wê demê bû. Mirovê fikirdar, mirovê bi talûke bû. Teyisandina wê ya civakî jî dikarîbû hemû berjewendiyên çîna bijartî ji ortê rakirana. Ti kesî nikarîbû bi rehetî civakeke fikirdar bi rê ve bibirana!

Di serê qral de xeyalên cur bi cur çêdibûn. Çi bibûna jî wê vî Mûbedê ciwan destek bikirana.

Di vê têkiliya piştevanî-piştgiriyê de ku wekî lîstokekê dabû destpêkirin, bi demê re his kir ku wê wateyeke kûrtir bibîne. Nêrînên wî cidî bûn û bi qasî wateya oleke nû bide jî berfireh bûn. Her çiqasî berbelavbûna van fikran di nava gel de xeter jî bûna, li dijî rahîb û esilzadeyên hevrikên wî dikarîbû kêrî Qral Kûbad bihatana.

Bi rojan xeyal kir, gelo dikare bi xwediyê van fikrên kûrbûyî çi bike.

Nîqaşên li Gundeşapûrê di jiyana wan de rê li ber guhertineke mezin venedikirin, lê nîqaşên li Tîzponê ewqasî girîng bûn ku dikarîbûn hemû dahatûya welat biguherînin.

Ji bo herêma Paytext Tîzponê ya li Dîcleyê mêze dike, Sasaniyan digotin, "Dil-ê Êranşehd" ango "Dilê Îranê". Bajarekî mezin bû û nêzî 200 hezarî serjimêriya wê hebû. Ew ê bi sedan salan bibûya paytexta welatê Îranê. Piştre ji bo bajarê ku li nêzî vir wê bihatana avakirin jî bigotana "Bexda".

Li Gundeşapûrê ji bo Tîzponê Yewnaniyan digotin Ktesîfon, Ereban jî digotin Medayîn. Di fermiyetê de her kesî ji bo paytextê Tîzpon digotin.

Ev navlêkirinên cuda pir zêde jî niştecihên Gundeşapûrê eleqedar nedikirin. Tenê di nîqaşên siyasî de ev navên cuda dihatin bihîstin.

Gundeşapûr bajarekî wisa bû ku ne siyaset, zêdetir zanist dihate axaftin. Her çiqasî jiyaneke şatafat a niştecihan tinebûya jî wekî çandî xwe ji her derê Êranşehrê rasertir didîtin.

Xorremê sedema vê pirolekirinê zû ferq kir. Di qada fikrê de pêleke teqlîdê pêş ketibû. Gotinên bitûmtûrak yên ji pirtûkan û vegotinên sirgûnan hatibûn jiberkirin xistibûn şûna heqîqetê. Nîqaşên olî ji jiyana civakî razberkirî hatibûn destgirtin, ji ber vê jî aqlekî bêesil yê ji gel qut pêş ketibû. Yewnanîstanê êşên vê beriya sedan salan kişandibû. Li vî bajarî jî teqlîdeke wê ya biçûk pêk dihat.

Rahîb û esîlzadeyên ku ketibûn ferqê ji gel qut bûne, nikarîbûn pêşiya van nîqaşan bigirtana.

Pêşketinên di qada zanistê de jî hêjayî qeydê bûn. Bi taybet ji bo zanista tipê Gundeşapûr her roj ber bi navendbûnê ve diçû.

Dema ku Xorrem li vî bajarî dima, herî zêde ji hekîmê Babîlî Naûman û hevjîna wî Sûrem hez kiribû. Fikrên xwe ji bilî wan ji kesî din re kifş nekiribû.

Ji ber kurê xwe Nîbîrû yê ku deh saliya xwe nîvî kiribû gazind dikirin, zarokekî wisa bû ku nizanîbû sirê veşêre, devtijî bû.

Naûman bi porê xwe yê spî û çavên şîn ên kûr hewaya zanayekî dida. Pir hez dikir xwarinên bi bol sewze û şînkahiyê yên ku hevjîna wî bi hunereke mezin amade dikir, bixwe. Ji ber ku her tim di nav liv û tevgerê de bû, çiqasî bixwarana jî qelew nedibû.

Tevî ku bejna wî ne pir dirêj jî bû, bi saya milên xwe yên tîk dirêj xuya dikir. Kalekî hemandirêjahiya Xorremê bû. Ji henekan hez dikir. Carina bi zanabûn tozên dipişkîne yan jî yên rondikan ji çavan tîne dixist nav dermanên nexweşên xwe, dema nexweş aciz dibûn jî digot ku ev zûtir nexweşiyê baş dikin.

Naûman, cewhera di Xorremê de dîtibû, lê çavkaniya wê meraq dikir. Her çiqasî Xorrem di her mijarê de vekirî nêzî wî dibû jî, di vê mijarê de, ango di çavkaniya zanyarî û fikrên xwe de sir nedida.

Hevjîna doktor Sûrem jî mîna wî sempatîk û zana bû. Li bajar bi alîkarxwaziya xwe ve hatibû naskirin, mîna dayika hemû gelî bû.

Li Gundeşapûrê ji bilî wê  ti kes têkildarî "Bexçeyên Hilawistî" yên Babîlê û Qralîçe Semîramîsê ne xwedî agahiyên berfireh bû. Digot, ev baxçe sê lib in, yek li cihekî nêzî Tîzponê ye, ya din li Nînovayê, ya sêyemîn jî li Hezexê ye, ku eslê wê digihişt wir û navenda Babîla Bakur bû. Ji wê fêr bibûn Babîl dihat maneya "Deriyê Xwedê".

Ji bo ew kesên meraq dikirin bê ewqas agahî ji kû girtiye jî digot, eslê wê digihêje Suryaniyên li Hezexê, wan jî pir girîngî dane zaniyariyê û domahiya sed salan zarokên xwe bi xwe perwerde kirine, agahî ji nifşan derbasî nifşên din kirine.

Ji ruhaniyên sexte nefret dikir. Ew li her derê rezîl-ruswa dikir, bi zimanekî mîzahî durûtiya wan û xedariya wan nîşanî her kesî dida. Qîma xwe bi vê jî netanî, li malan nîqaşên kûr dimeşandin, li ba komekê wekî terîqeteke nav lê nehatiye kirin tevdigeriya.

Asarayê ji doktor zanebûna tenduristiyê girtibû, bi saya Sûrem jî fêr bibû ku wekî jinekê dikare di nava jiyana bajar de çawa cih bigire û zanyariyên kûr ên jiyanê çi ne.

Bi her kesî re nedibû muxatab, di kêliyên herî zehmet de li ser xwe hakim dibû, bi saya îrade û baweriyeke mezin dihişt ku nêzîkatiyeke bi hurmet li beramberî wê çêbibe.

Li milê din, heger alîkariyên Sûremê nebûna wê hayê wê jî ji nîqaşên felsefeyê yên li bajêr çênebûna.

Di nava jiyana zindî ya bajar de cihekî pir cuda yê nîqaşên felsefeyê hebû. Ev nîqaş bi qismî be jî azad dihatin kirin. Di vê mijarê de dema ku Asarayê eleqeya xwişka xwe Xorremê didît zêdetir keyfxweş dibû, êşa serpêhatiyan ji bîr dikir.

Xorrem diçû kû derê, bi dil û can li nîqaşan guhdarî dikir, ew li moxila xwe ya zanyariyê dixist û şîrove dikir.

Bû şahidê ewqas nîqaşan ku êdî di yek-du hevokan de fêm dikir bê yên li wir têne gotin di çi maneyê de tên îfadekirin.

Niştecihên bajêr xwe bi bajarên berê yên Yewnanan re qiyas dikirin û nîqaş jî bi qasî wê fîlozofîk didîtin. Berevajî vê, Xorremê ferq kiribû ku ev tenê xwenîşandanek e, heta çavkaniyeke xemrevîniyê ye.

Ev mirovên ku bi hesrata rabirdûyê dişewitîn yan jî bi xeyalên siberojê teselî dibûn, ji dema tê de ne, dûr ketibûn, ev ji bo xwe kiribûn mîna stargeheke bi ewle.

Xorremê karîbû nîqaşkerên herî bijarte yên vê komê bidarizîne. Bi qasî ji wan fêr dibû, her wiha dida fêrkirin jî.

Carekê kalekî ji nav vê civata bijarte gotibû yê ku rêbaza diyalogê ya li ser esasê diyalektîkê wekî rêbazeke felsefeyê fêrî Sokrates kiriye, jinek e. Halbûkî Sokrates û rêbaza diyalogê yeksan bibûn.

Di terzê perwerdeyê de rêbaza diyalogê pirskirin, pûçkirin û di dawiyê de jî rastî bi yê beramber dana gotinê esas digirt. Xwediya esas a rêbazê jineke fîlozof a bi navê Aspasîa bû.

Di cîhana Yewnana Antîk de îhtîmala jineke fîlozof derkeve li ber çav nedihat girtin û ji ber vê jî di der heqê wê de îthamên cur bi cur çêbûne. Sebebek din a van bêbextiyan jî ew bû ku dixwestin hevjînê wê Perîkles ê serokdewlet bû, biçûk bixînin.

Xorremê ji kalo xwest hemû detayên van agahiyan jê re bêje û bi sebr lê guhdar kiribû.

Dema qiseya kalo derket derveyî rêbaza diyalogê û ket nav nîqaşa felsefeyê ya ku her tiştên li gerdûnê bi dijberê wê re digire dest, Xorremê pêdivî dît jê re bêje çavkaniya vî karî ne Yewnanîstan e. Lê wisa zû neaxivî, dema li nîqaşan guhdar dikir gotinên xwe di serê xwe de rêkûpêk kirin.

Bi navê Aspasîa heçkû sêhrî bibû. Cara yekemîn li vir bihîstibû.

Aspasîa, xelkê Mîletê!

Xorrem, piştî ku fêr bû, rêbaza diyalogê aîdî vê jina mamosteya Sokrates e, bi rastî jî pir keyfxweş bû.

Dihat îdîakirin ku kesa yekemîn a ku gotiye rêya diçe zanebûnê, destpêkê ji xwenaskirinê dest pê dike jî, Aspasîa ye. Li gorî vegotinên gerokan di nivîsyareke kevn de ji bo xwediya vê gotinê wekî “Sokratesa Jin” dihat behskirin.

Aspasîa, di heman demê de hosteyeke xîtabê jî bû. Yên ku ew reş dikirin jî nikarîbûn zanebûn û hunera wê ya axaftinê red bikin.

Li vê dinyaya ku jin tine tê hesibandin, ne tesaduf bû ku rêbaza diyalogê ji aliyê jineke zana hatibe pêşxistin. Ya ku herî zêde pêdivî bi vê didît jin bû û pêşxistina diyaloga hem di nava jinan de hem jî li gel zilaman dikarîbû bibûya destpêka guhertin û veguhertinê.

Feqet nêzîkatiyên ku her tiştî bi fîlozofên Yewnan girê dide, hemû destpêka felsefeyê digihîne cîhana Yewnanan, pir zêde serê wê negirtibû.

Dema firsend dît jî pirseke ku her kesî şaşwazî dike pirsî û fikrên xwe kifş kir:

“Hurmeta min ji bo Sokrates û mamosteya wî Aspasîa heye. Hemû fîlozofên Yewnan jî bi heman şeklî bi rêzdarî bi bîr tînim. Lê belê, gelo em dikarin înkar bikin, pêxemberê mezin ê exlaqê, fikra azad û îradeyê, Zerdeşt, ê beriya wan jiyan kiriye, ne pêşengê rêbaza diyalektîkê ye? Ma çima hûn wî wekî pêşengê felsefeyê û fîlozofan qebûl nakin?”

Pirsek, gelek fikrên kûr di nav xwe de dihewandin. Dema bi pirsên mîna vê dipeyivî, Asara ji ber ku xwişka xwe besît girtibû dest ji xwe fedî dikir. Li gel vê jî pê serbilind dibû.

Xorrem, bi saya pirs û darazên xwe yên ji jiyanê û xwedî çavkaniyên xwe bûn, her kes dida fikirandin û dibû nîşandana milet. Li cem vê, eleqeya wê ji nîqaşên felsefeyê yên teorîk zêdetir li ser nîqaşên civakî bû. Felsefeyeke ne civakî qebûl nedikir. Li her derê gotina, “felsefe dilê civakê yê fikrê ye!” dubare dikir.

Li vî bajarî jiyana civakî û felsefe ji hev hatibûn qutkirin û ji ber vê jî tayisandinên wê pir zû pêş diketin.

Ferq kiribû ku ji bo zanistê meraq û hewldan zêde heye, lê piştevaniya mirovî kêm e; ji ber vê jî belavbûneke civakî çêdibe. Fikrek hebû, lê dil li cihekî bû, civak li cihekî din mabû. Li vir “Dilê civakê yê fikrê” tenê daxistibûn asta fikrandinê. Piştî demekê biryar da ku pir zêde tiştekî ji vir bigire û fêr bibe nemaye û vegeriya mala xwe. Helbet li wir dostên wê yên nû çêbibûn û wê ew ji bîr nekirana.

…

Dema vegeriya, fêr bû ku birayê wê Arad ketiye pey qedera xwe û li pey wê çûye Paytextê. Qet ne bilê Dayzerê bû, lê Bavo Qade tenê bi şertekî ev qebûl kiribû, ew ê têkiliya xwe bi wan re qut nekira û li kû dibe bila bibe, çi dibe bila bibe wê neketana bin emrê rahîban!

Her çiqasî navbera wan ne baş jî bû, qutbûna Arad a ji malbatê dilê wê êşandibû.

Xorrem ew fêmnebar didît. Yekî wisa bû ku dixwaze çi bike, xeyal û hedefên wî çi ne, ne diyar bû. Têkiliyên wî yên biratî zeîf bû. Tevî vê jî ji bo vegera Arad dua kirin. Ji bo tiştekî xerab bi serê wî de neyên, fikra wê ew bû ku lazim bû li ba malbata xwe bimaya.

Arad, ne yekî mîna Xorremê bû ku karîbûya li ser lingên xwe bisekiniya. Xorrem sebeba vê yekê jî fêm nedikir. Ji ber halê wî yê zeîf xemgîn dibû. Her çiqasî pir qeba xuya bike jî îradeya wî pir zeîf bû. Ji ber vê jî hem tirsiyabû hem jî ji ber wêrekiyeke wisa nîşan dabû esas keyfxweş jî bibû.

Ew ê Xorrem jî çiqasî li ba dê û bavê xwe bimana, ew jî ne diyar bû. Heger sînordarkirinên olî nebûna, dibe ew jî li pey Arad biçûna.

Li rewşa Perwa jî pirsîbû, lê tenê jê re gotibûn gund terikandiye û çûye. Ti kesî nizanîbû bi kû ve çûye. Azweriya wî ya olî fikirî. Xeyal kir ku dibe xwe di mabedekê de bi cih kiribe.

Zexta olî ya ku ji zarokatiya xwe ve çûbe kû derê dîtibû, li Gundeşapûrê pir zêde nedîtibû. Dîsa jî his kiribû ku sînordarkirinên ji ber olê li wir jî binvebinve pêk dihatin.

Gera xwe, dîtinên xwe ji dê û bavê xwe re dûvdirêj vegot.

Qade, ji ber ku ber bi Başûr ve pir zêde nediçû Gundeşapûr ji nêz ve nas nedikir, got, “diyar e tiştekî pir zêde guherî tine ye” û karwanvanekî ji wir yê pir zûde, ji rêwîtiyeke xwe nas kiribû anî ziman.

-Ew jî wisa bû! Mîna ku dixwest bêkokbûna xwe û besîtbûna xwe veşêre, her tim bi awayekî pirole, şêweperest nêz dibû. Zimanê wî tijî gotinên nedihat fêmkirin bû. Eynê li gorî dilê wan kesên ji tebeqeya jorê bû. Rêyeke veşartina rastiyan jî ma ne şekilperestî ye?

Vegotinên te bes bûn; ji ber bêkokbûnê, ji wê demê heta niha ti tiştekî guheriye bi rastî jî tine ye!

## Li Bin Siya Qesrê

Li Qesrê mûbedekî ciwan hebû, li ser hest û fikrên qral ji hemû konseyê zêdetir bi bandor bû, bi jîrbûna xwe her kes heyranî xwe kiribû. Di demeke kurt de ew ê bibûya Mûbedê Mûbedan, ango Serê Mûbedan.

Ev Mûbedê ku beriya salan Qral ji bo ku nîqaşên nav Mûbedan sor bike nêz bibûyê, lê piştre dîtibû yekî cidî ye û ji fikrên wî bandor bibû, ji Mazdek Bamdad pê ve ne ti kes bû.

Qral Kûbad dema ku xakên welatê xwe yên ji Hindistanê heta Romayê diçû bi rê ve dibir, pir girîngî dida hevsengiya hundir û derve. Li her sedrapekê (parêzgar) garnîzoneke eskerî datanî û kevneşopiya xwe ya qarişî bawerî, ziman, çanda niştecihan nebûnê didomand.

Qral bibû pispor, dikarîbû berjewendiyên esilzade, rahîb, esker, walî, dihkan, bazirgan, bawerî û miletên cuda di nav hevsengiyekê de bimeşîne. Lê belê, esilzade û rahîban her roj berjewendiyên xwe zêdetir dispartin û zorî didan hikumdar.

Tevî ku sifatên bi qasî xwedê pîroz û dûrîdest li qral kiribûn jî zilamên oldar hêza xwedê kiribûn destê xwe.

Nêrînên Mazdek ên ku her roj kûr dikirin û bi baweriyeke mezin diparastin, dikarîbû van bazirganên olê yên durû û bêrehm biterazandana. Berevajî, wê ruhaniyan bi temamî qraltî bi dest xistana û yekser dest bi rêvebirina welêt bikirana. Ha wê demê jî heta ku hemû gelî îsyan nekirana, ti kes nikarîbû serî bi wan re derketana.

Qral Kûbad carina di ber xwe de digot; “Wê pir xwîn birjê, pirr…”

Armanca rahîban dikarîbû bihatana texmînkirin, lê wê demê çi di serê qral re derbas dibû, ti kesî nikarîbû fêm bikirana. Mazdek, kêmekî jî bûna ruhê wî dixwend, lê ew jî tam ne emîn bû. Bi rastî jî gelo Qral bi wî bawer bû yan jî tenê ji bo ku karibe di siyaseta hevsengiyê de bi kar bîne wisa nêz dibû? Zeman, wê kifş bikira. Baş dizanîbû niha lazim e bi sebr nêz bibe.

Mazdek ne tenê bi fikrên xwe, bi terzê jiyana xwe ya sade jî hurmeta her kesî qezenc kiribû.

Her çiqasî hemû odeyên qesrê ji bo wî vekirî jî bûn, li ser merşekê fikrandin heza wî bû.

Digot, “ji dema Nebî Yûsif û şûn de ti qesrê rûyekî fena yê wî xweşik nedîtiye” û niyeta yên ku pesnê wî didan wisa dixist ber darazê, ji ber ku dizanîbû ne wisa ye. Ji şelaqan hez nedikir.

Enerjiya wî ya bêdawî, ji her çaviya laşê wî, heta hemû hûrgiliyên fikrên wî her kêlî û li her derê mîna volkanê dikeliya.

Porên wî yên reş bi qismî firk, simbêlê wî jî gur û rengekî reş-qehweyiyê biriqokî bû. Heta lêva wî ya jêr bigire dihat. Eniya wî têra xwe fireh bû. Çavên wî yên reş carina dişibiya şînekî tarî. Wextê diramiya mirov dikarîbû bibûna şahidê vê. Pozê wî yê li gorî rûyê wî hinekî mezin jî li pişt simbêlê wî xwe veşartibû. Ji ber ku tîk dimeşiya, bejna wî her tim dirêj xuya dikir.

Kûbad ê ku ronahiya Xwedê Ahûra Mazda li ser rûyê erdê bû; di nav mirovan de xwedê, di nav xwedayan de mirov dihat hesibandin, çend caran bêyî bala ti kesî bikşîne bejna xwe bi ya Mazdek re qiyas kiribû. Carekê dema nêzî wî bû, xwe dirêjtir dîtibû, lê di rastî de bejna Mazdek ne dirêj bû, lê ne kurt jî bû.

Hewaya wî ya cazîb dibe ji kûrahiya çavê wî be, dibe jî ji ziraviya nêzîkatiyên wî bûna.

Di ser de jî xwedê dizane li qesrê, dilê çend jinan li ser şewitîbû.

Malbata wî li bajarê Hemedan ê Medan, di nav malbatên dewlemend de cihê xwe digirt. Bavê wî Bamdad û dayika wî Ahûyar ji du silaleyên cuda bûn ku ji berê ve bi çanda Mûğan teşe girtibûn. Bamdad, ji ber ku Mazdek ketibû xizmeta olê dilxweş bû.

Ahûyar jî her tim li ser navî wî şer dikir. Her çiqasî bi kurê xwe pir bawer be jî dizanîbû li ber çavê civakê îtibara berê ya zilamên oldar nemaye. Ji ber ku hêza di dest xwe de ji bo berjewendiyên şexsî bi kar tanîn. Çiqasî pê bawer bû wê Mazdek ne yekî wisa bûya jî ji ber ku di nav wan de bû, dilê wê ne rehet bû.

Mazdek, hê ji dema nû diket nav meseleya oldariyê bi hin bûyeran re hevrû bibû û fêm kiribû şîretên dayika wî çiqasî li cih in.

Esas dayika wî ji olê zêdetir têkildarî jinan şîret lê kiribûn.

Piştî gotibû, “Tu yê ji bo olê perwerdeyê bibînî, lê bêyî jinek hebe tu yê çawa ji jiyanê fêm bikî?” ew ji bo zewacê teşwîq kiribû.

Di nav malbatê de nêzîkatiyeke rêzdar li beramberî jinan hebû.

Tevî hemû guhertinên li welat jî, çanda di nav malbata wî de pir zêde zirar nedîtibû.

Statuya jinan a di nava civakê de Mazdek xemgîn dikir. Dema ketibû Qesrê, dîtibû ku jinên dibêjin ew xwedî asta herî jor a çandê

ne û bi vê pesnê xwe didin jî li beramberî zilamekî ji rêzê yê li qesrê jî li plana duyemîn dimînin. Ji ber vê jî li xwe qedexe kiribû ku mîna hinên din dike xwe bi zilamtiya xwe bipesnîne.

Fikrên wî li milekî bûn, nêzîkatiyên cariyeyên li qesrê jî li milekî din bûn! Ew bi wekhevî, edaletê eleqedar nedibûn. Ji wan bihatana pirsîn, ew xwedî îmtiyaz bûn, zana bûn, dinya bi rê ve dibirin! Îcar yek di nav wan de hebû ku Mazdek nema dizanî wê li beramberî wê çi jî bike.

Serê wî bi Esle re ketibû belayê, ketina nav dilê wî ne mesele bû, lê wekî deryayeke vekirî dixwest bi rehetî bikeve hembêza wî.

Porên wê yên mîna qîrê reş bêhnên emberê didan. Gula sor a gulpik her tim datanî rexekî wê. Cilên ku li serê neqşên gulan tine bûna, li ber nedikirin.

Di nav cilên xwe yên bol de, ku neqşên gul û sîmê li ser bûn, ji milekî bi qasî ku ti jinên li haremê nikarin biwêrin çîpên xwe vekirî hiştibû û dixwest eşqa xeyalên xwe Mazdek bide windakirin.

Esle, serê wê komê bû, berpirsiyarên hemû xizmetên qesrê bûn. Li gel vê ekîbeke wê ya nêz a ji jinan pêk dihat jî hebû. Her çiqasî hemû cariyeyan perwerde didîtin jî ev ji nav cariyeyan dihatin hilbijartin, taybettir dihatin perwerdekirin, mil û baskên Esle bûn.

Li civakê perwerdekirina jinan pir ne mimkun bû, lê ji bo ku dixwestin yên li haremê zana bin, bi pîr û pergal bin, hê ji temenê biçûk ve perwerde dikirin.

Li gorî Esleyê her cariyeyek artêşek bû; ew bi xwe jî serfermandara vê artêşê bû!

Devên fermî ji bo haremê digotin, “Heremsara” û ji bo cariyeyan jî “Kenîz” digotin. Hejmara wan bi sedan, heta bi hezaran dibû.

Esle û keçên kenîz, ne bi qasî rahîban jî bin, bibûn xwedî agahiya dinya û axîretê. Hêza xwe ya esas jî dema fêr bibûn jintiya xwe wekî hunerekê bi kar bînin, qezenc kiribûn.

Rahîb û giregirên fermandaran xistibûn nav destên xwe.

Ji bo ew kesên ku ji ber tirsa olê nêzî wan nedibû jî çareyeke wan hebû: Bi dizî û demkî zewac! Yê ku ev aqil dabû wan notirvanekî perestgehê bû ku jê re “Simbêl Zil” digotin.

Tevî hemû “dehfikên wê yên eşqê” jî ji bo ku li gel Esle bi tenê nemîne her carê hincetek peyda dikir. Wisa lê hatibû ku ji ber wan hincetan Mazdek êdî xwe wekî derewçînan his dikir.

Esle dişiband Cahî, ku di pirtûka pîroz Avestayê de wekî jina yekem a arezûyên zilaman dikişkişîne tê bibîranîn. Di têkiliya wê û qral de pevçûnên veşartî hebûn. Dibe ku dixwest Mazdek li dijî wî bi kar bîne. Dibe ku dil ketibûyê. Bi çi sebebê dibe bila bibe, ji bo wî bi dest bixe serî li her cure dek û dolabê dida. Carina ewqasî nêz dibû ku hema hema hişê Mazdek ji serî wî dibir. Mazdek, ne dixwest jê dûr bikeve ne jî nêz bibê.

Hîna ne diyar bû ka wê zeman çi bi xwe re bianiya.

Mazdek, dema ku wekî oldarekî diket qesrê û derdiket, rastî bi çavê xwe didîtin.

Fêm kiribû ev navenda desthilatdariyê ya ku tirs û xof li her deverê belav kiriye û wê heta dawiyê li ser piyan bimîne xuya dikir, binvebinve diriziya û ne fena çav didît xurt bû.

Ew ê nebûya parçeyekî vê sîstema riziyayî.

Bi tenêtiyê hem xwe diparast hem jî fikrên xwe kûrtir dikirin. Carina halê gerok ê Manî tanî bîra xwe û ji ber vê rewşa wî heyranê wî bû.

Ji ber ku mirovekî wekî Manî mezin hatibû qetilkirin, di dilê wî de birîneke mezin vebibû.

Manî dixwest dinyaya xerabûyî biguherîne. Qralê Sasaniyan îqna kiribû. Heger nehatibana qetilkirin wê ji bo îqnakirina Împaratorê Romayê biketana rê.

Manî ne tenê ji bo ola Zerdeştiyê, her wiha bawer dikir ku di cewherê felsefeya Xrîstiyanî, Cihûtî, Bûdîzm, heta Yewananî de jî başî heye. Wê başiyên hemû olan bidîtana, bigihandana hevdû û wisa hemû mirovahî bigihandana hev.

Di vê baweriya wî de lêpirsîn û îradeyeke mezin hebû. Wisa vala vala pêxember Zerdeşt îrade esas negirtibû. Heger hêza fikrê û îradeya ku Zerdeşt bi gelan dabû qezenckirin nebûna, ne mimkun bû ku îsyanên bikarîbûna împartoriya koledar bîne rêzê pêk bihatana.

Manî jî mîna Zerdeşt dihat maneya “ronîker”. Wî jî rêxistinkirina raperînê nekiribû, her tim mirov ronî dikirin. Ji ber vê jî ji bo Manî jî hatibû gotin “Mamosteyê Roniyê”.

Mazdek, hêza fikrê herî zêde di Manî de didît.

Ew çawa ku di qesra Sasanî de bi qasî karibe qralan bîne rêzê bi xwe bawer û ewle bû, Mazdek jî di xeyalên xwe de xwe dixist şûna wî, lê nikarîbû ev ji ti kesî re bigotana.

Qulûbeya wî biçûk bû, lê xeyalên wî her diçû mezintir dibûn.

Dest jê berde ji tenêtiya xwe ya li xanîk bêzar bibe, ev tenêtî wekî nîmeteke Xwedê didît û bi çavnebarî diparast. Lê dema nexweş diket, nema dizanî wê çi bike.

Demekê bi nexweşiyeke demkî ketibû. Nedihat bîrê bê çawa û kengî razaye jî.

Kêm mabû, şev bibûya roj.

Li mala xwe ya kevirî ya du qatî ku li pişt perestgehê, li baxçeyekî dûrî çavan bi alîkariya dostên xwe çêkiribû, razabû.

Qatê binî ji bo heywanan bi kar tanî. Xwedîkirina yek-du heywanî ji bo wî fena îbadetê bû.

Dîk bêyî mêze bike ji sibehan kîjan sibe ye, ji rojên rengan kîjan roja reng e, dûvdirêj bang da.

Wê sibehê tevî ku şiyar jî bibû, lê nikarîbû ji nav nivînan derkeve. Fikirî bê ketiye nav pencikê nexweşiyeke çawa, lê nehate bîrê.

Heta ku tavê şibakeya wî derbas kir û serê wî şewitand, xewa xwe domand.

Mîna ku laşê wî bi nivînan zincîr kirine, li ser serî wî def û zirne lê didin. Bi zorê pişta xwe rast kir û li ser nivînan çarmêrkî rûnişt. Milên xwe li herdu aliyan vekirin û dûvdirêj tevzî dan xwe.

Dixwaze rabe, lê lingê wî guh nadin wî. Ji ber janên movikên xwe dîsa xwe dirêj kir.

Dema hat bîrê wê rojê mêvanên wî tên, ji nişkê xwe rast kir. Dereng mabû. Hema ji dirêncekan daket.

Hê çend gav avêtibûn, lingê wî fistikî û ket erdê. Ji ber êşa wê demekê li cihê xwe rûnişt.

Dema êşa wê kêm bû, ofîn û pifîn pê ketin, daket jêr û derket baxçe. Reflesa yekemîn wiha bû:

-Xwedê! Tu ne bi tenê ye!

Mêvanên xwe hembêz kir. Ya din jî bi serê xwe silav kir.

Ji ber dereng mabû lêborîn xwest.

Ji ber ku li ber derî pêşwazî nekiribû, heta erdê xwe xwar kir û dîsa xwest bê bexşandin.

Porên wî yên firkbûyî belav bibûn, awirên wî nîvkêşî bibûn, bi zorê çavên xwe vedikirin. Hîç wisa bêhal, dafilî û belave nebibû.

Ji bîr kiribû hê cilê şevê li ser in, lê tenê lêborîna derengmayîna xwe dubare dubare tanî ziman.

Mêvanê wî Qade got tiştekî lêborînê tine ye, jina ciwan a ku ji bo paytextê ji nêz de nas bike bi xwe re anîbû, da naskirin:

-Keça min, Xorrem!

Mazdek di carekê de şaşomaşo bû. Dizanîbû zarokên Qade hene, lê xebera wî ji xweşikek mîna Xorremê tine bû.

Dest û lingên wî ketin nav hev, wisa jî dawetî hundir kir. Tevî ku ketin hundir jî dema hat bîra wî odeya wî ya li jor pir belave ye, daxwaz kir ku li baxçe rûnên û ew ji hundir dîsa derxistin.

Ruxmî ku hersê jî li ser qurmê daran rûniştin jî Mazdek hê mîna Xorrem li ser piyan e, jê re got, "Kerem bikin, werin rûnên".

Xorrem bi kenekî bersiv dayê, jixwe rûniştibû. Mazdek nexweş bû, lê niha tam hişê wî ji serî çibû.

Piştî sohbeteke dûvdirêj, Qade ji bêrîka êlekê xwe pakêteke biçûk a baş hatiye pêçan derxist û da Mazdek. Ev, ji ber çavê Xorremê xelas nebû. Feqet, Xorremê guhdarî wan nedikir. Kîvroşkek girtibû û pê dilîst.

Qade bi bîr xist ku piştî nîvro ew û keça xwe wê li bajar bigerin. Mazdek tevî ku nexweş jî bû, got ew ê jî bi wan re were.

Qade diyar kir ku hinekî bimeşe wê ji bo Mazdek baş be, dûvre bi awayekî bi mane keniya û got:

-Heta tu li ber siya qesrê bijî tu yê ji nexweşiyan xelas nebî.

Dema derketin gera nav bajêr, bi çavê xwe dît bê Xorrem çiqasî zana ye. Dema sohbeta wan bû ol, Mazdek axivî, der barê gundiyan de jî Xorrem axivî.

Mezinahiya bajêr aqil disekinand. Wê bi gera rojekê neqediyana. Mazdek têkildarî dîroka bajêr çi dizanîbû vegot.

Tevî ku hevdu nû dîtibûn jî ewqasî rehet sohbet dikirin, Xorrem jî ecêb mabû.

Dema wê ji hev cuda bibûna, Qade dîsa heman gotin dubare kir:

"Heta ku tu ji siya qesrê xelas nebî teqez e ne tu, ne jina tu pê re bizewicî, ne jî zarokên we wê têra xwe ji tavê sûdê negirin û nexweş bikevin!"

Mazdek di ber quxikan de keniya, xwe kom kir û mîna her tim bi rêzdarî bersiv da: "Heke tu wisa dibêjî, wisa ye Bavo Qade. Di firsenda yekemîn de ez ê çareyekê jê re bibînim!"

Ji bo ji qesrê derkeve niha hinceteke wî ya girîng hebû. Xorrem jî ji dil û can bersiva vê dabû.

Zeman dibû şahidê eşqeke nû, ku wê bibûya malê dîrokê. Ji komployên ji pişt perdeyê bêxeber, eşqek dibişkivî…

**Şûrê Tarî Li Ser Porê Spî**
**Cihê sirên xedar gor e,**
**Cihê ew kesên bê gor jî dilê bê mifte ye!**

Hin kêlî hene rêveçûna dîrokê diguherin. Yek ji van kêliyan jî îxaneta li dijî Konfederasyona Medan e. Beriya hezar salî çîroka dewletbûna Persan werê dest pê kiribû.

Hezar sal in çi şer dîtibûn. Dem hebûn bi artêşa ji milyonan kesî ji şerekî dibeziyan şerekî dîtir.

Di nav vê împaratoriyê de ku di kevneşopiya wê de tirsa ji şerê herî mezin jî tine ye, niha komeke zilamên oldar ên sexte, tirsên herî mezin ên dîrokê mezin dikirin.

Di her merheleya dîrokê de oldarên sexte derketine. Carina civak bi gotinên wan xapiyane, lê di encam de her tim li jiyana wan mêze kirine û rastî dîtine. Yek ji amûrên herî girîng a veşartina rastiyê jî tirs bû. Wekî cilê veşartina qelpiyan, yan nirxên pîroz ên gel dihatin bikaranîn û tirs dihat belavkirin, yan jî kesên wê bihatana tasfiyekirin wekî çavkaniya tirsê dihatin nîşandan.

Ew ê tirs mezin bikirana ku gef xuya bike û tinekirina wê rehet bibe.

Ji ber ku oldariya wan sexte bû, li beramberî fikrên azadîxwaz dilerizîn.

Ne di kêliyeke krîtîk a dîrokê de bûn, ne jî di nav şerekî de bûn. Feqet tirsa wan a li beramberî nîqaşên komeke fikirdarî xedar bibû. Ew dabûn girtin. Daraza wan teqez bû:

-Xwedê ji bîr kirine!

-Li qatê Xwedê gunehkar in!

-Ji Xwedê Ahûra-Mazda re şirîk çêkirine!

-Navê Xwedê qirêj dikin!

-Wisa biçe ne ol dimîne ne dewlet!

-Sîxurên Bîzansê ne!

-Dixwazin Êranşehrê tine bikin!

-Bêyî ol, bêyî exlaq in, qirêj, pîs û nexweş in; beriya ku hemû welatî bi nexweşiyê bixînin, divê werin tinekirin!

Mazdek, dibû şahidê van nîqaşan, hewl da sekanbûna xwe biparêze, di ber xwe de got, “bi qasî Xwedê kevir bi ser we de bibare!”, û li çavê rahîbên kal ku agir jê derdiketin, mêze kir:

-Hûn şaş in, ji ber ku we hê li wan guhdar jî nekiriye!

Kef bi devê Darî İyaz ket, ku nikarîbû xwe li ber vê derketinê ragirta û tevî qazîtî dikir jî ji bin emrê rahîban dernediket. Bersiv da:

-Ma em ê li çi guhdar bikin, her tişt li holê ye? Cezayê ev kesên derketine derveyî olê jî diyar e!

Dema ku yên din jî ev gotin erê kirin, Mazdek fêm kir nîqaşa li gel wan bê feyde ye, ji bo ku biçe Qral bibîne derket.

Çawa ji derî derket, bêhna xwînê li pozî wî da.

Girtî wekî şelteyekê avêtine bin komeke sergînan, di nav xwînê de dinaliyan. Li ser serê wan jî eskerên kumik sor nobed digirtin. Bandora kevneşopiya Zerdeştî pir zêde di ruhê wan de nebûna jî wekî şekil di cilên wan de xuya dikir.

Fermandarê eskeran li benda emrê rahîban bû.

Ev esker, demekê bi temamî girêdayî qral bûn. Di sîstema artêş û eskeriya Ardeşîr de esker ji her cure otorîteya olî, begîtiya herêmî, axayê xakê dihkanan, waliyan serbixwe bûn, yekser di bin emrê qral de bûn. Lê niha, oldarek, axayekî xakê jî dikarîbû bi rehetî bandor li ser wan bikirana.

Hema hema baraneke ku dikarîbû bêhna xwînê bide derbaskirin dikira bihatana. Ewran her tonê reşê li xwe kom kiribûn. Dîsa jî bi rojan baran nebariya. Hewa her tim wisa girtî ma.

Piştî rojan dema libên baranê hêdî hêdî ketin, fermandar derbasî hêwana axûrê bû. Girtî û esker şil bûn. Dema baran zêde bû, bi emrê fermandar esker jî derbasî hundir bûn.

Wê rojê Mazdek ji rêwîtiya xwe vedigeriya, guh neda westandina xwe û baranê, li hewşa dirêj a kevirî bi gomlegekî spî û tenik ber bi girtiyan ve meşiya. Heta hat ber girtiyan şil û pil bibû.

-Ev mirov in! We hem êşkence li wan kiriye hem jî li ber baranê hiştiye. Qet wijdanê we tine ye?

Ji milê fermandar girt, kişand û ji hêwanê derxist, da ber baranê û ew jî şil kir.

Fermandar tenê got, “emir wisa ye!”

-Kê emir dabe, ez îptal dikim!

-Çi!Çawa!

-Min got betal dikim, ma dilrehmiya we miriye? Destên wan vekin, bibin hundir!

Li beramberî vî Mûbedê jêhatî û navdar fermandar cesareta axaftinê di xwe de nedît. Emir da eskerên xwe. Girtî birin hundir.

Dema ketin hundir, bêhna tênşîr a kayê difna wî şewitand. Yek bi yek mêzeyî girtiyan kir.

Ket milê jinekê, ku ji ber xwîna ji birhê wê diherikî nikarîbû çavê xwe veke, û ew li ser qurmekî gilover ê darê da rûniştandin. Destmala xwe derxist û xwîna wê paqij kir. Pirsî bê kî ye, ji kê ye, lê ti bersiv negirt.

Pêlûyên jinê hê di nav xwînê de bûn. Tevî ku bi zorê çavê xwe vekirin jî, çavê wê li destmala zer a Mazdek ket, pê xwîna wê paqij dikir. Vê carê rondik jî tevlî xwînê kir.

Destmal nas kiribû. Dema ku Xorremê xeyalên xwe li wê destmalê neqş dikirin, li balê bû. Dizanîbû dê destmalê bide hezkiriyê xwe Mazdek. Dema çav li wê destmalê ket, fêm kir Mazdek e, xwest pê re biaxive. Lê li ser navê Xorremê tirs ket dilê wê. Fikrê ku dikarin wî jî sûcdar bikin di wê çirkeyê de wekî şûrekî li mejiyê wê ket û ji axaftinê qeriya.

Dema ku Mazdek dikira biçûna, ji wan re got:

-Duristî di hundirê mirov de ye û qet namire, lê careke din bifikirin ma hêja ye mirov ji ber duristiyê zû bimire!

Yek jê jin, 7 girtî bûn; ji bilî jinê, yên din nîzanîbûn kî bi wan re dipeyive, lê baş dizanîbûn bê dixwaze çi bibêje.

Di encama hewldanên Mazdek de rahîban biryar dan ku guhdarî wan bikin. Di hizûra qazî de mehkemeyeke nîşandanê çêkirin.

Otorîteyeke wisa mezin a rahîban çêbibû ku di mijara olî de bêyî bi kesî bişêwirin, îcar dema sûcdarên olî bûna, bêyî guhdarî kesî bikin biryar didan. Bi qaziyan jî didan erêkirin.

Mazdek Bamdad ê ku xwe nêzî qral kiribû, zorî dabû wan. Yan wê hemû guhdarî bikirina û darazeke adilane pêk bianiyana, yan jî wê bi qral re bihatana rûyê hev!

Beriya ku girtiyan bînin salonê, ew birin ser bîrê û paqijiya wan kirin. Bi rojan tî-birçî dihatin êşkencekirin. Bi setilên hespan av vexwarin.

Dema ketin salonê, serê xwe rakirin û li asraqê mêze kirin. Gelek debdebe dîtibûn, lê asraqeke wisa bilind domahiya jiyana xwe nedîtibûn.

Ruxmî ku li Gundeşapûrê diman jî nebihîstibûn di nav kelheyê de avaniyeke wisa jî heye. Stûnên mezin, şibakeyên cîlakirî û li beramberî wan rêzeke rahîbên kal!

Hayê Xorremê ji vê rewşê çêbibû û ketibû rê. Piştî baranê bêhna pir xweş ji axê dihat. Lê wê nikarîbû ferq bikira. Dosta wê ya ji dil û can û mamosteya wê di xeteriyê de bû. Ewqas lez dabû Mohr ku cara yekem dikira bibehiciya. Mohr cara yekem dibû şahid ku Xorrem ewqasî bi hêrs, aciz û lezgîn e.

Hê ew li ser rê bû rahîban karên xwe qedandibûn.

Rahîbekî got:

-Me guhdarî kir çi bû, hemû derewan dikin!

Qazî Darî İyaz ji rahîban xwest lazim e ev kar li gorî usûlê wê bibe û divê rahîb aram bin.

Herî dawî cezayê mirinê li hemûyan birîn.

Mazdek li ser vê ji bo dîsa biçe ba qral ji wir veqetiya. Çi dikir wê bikirana, lê diviyabû rê nedaya vî cezayî. Berevajî, wê rahîban hêzeke mezin bi dest bixistana, li her derê hikmên keyfî bidana û civak êsîr bigirtana.

Rahîban çûyîna Mazdek wekî firsend dîtin, ji qazî xwestin ku tavilê hikum bixe meriyetê. Li ser vê qazî bang li fermandar kir, emir kir ku fermana kuştinê demildest bê pratîzekirin.

Li gel mijê, bêhna xwînê jî daketibû nav kelheyê. Hema hema hemû eskerên li ber derî disekinîn dikuxiyan. Eskerên li kadînê jî hewl didan bi kotekî girtiyan derxînin derve.

Ew anîn ber derî. Qurmê li hundir jî derxistin. Eskerê ciwan ê ku rahiştibû qurmê darê bi dizî digiriya.

Ji pişt ve destê girtiyan girê dan. Bêyî bisekinin, li pey hev stûyê zilaman birîn. Dema dor hat jinê, li sekna wê ya wekî aliman mêze kirin û xemgîn bûn.

Di vê jinê de ku wekî dijmineke Xwedê nas nake dihat vegotin, ti nîşaneyên dijminahiyê his nekiribûn. Nizanîbûn bê wê çawa cezayê pêk bînin. Teredut kirin.

Fermandarên wan ji bo karibe vê hewaya dudil belav bike, hewl da ji jinê re xeberan bide, lê dema li çavên wê yên tijî bawerî û hezkirin mêze kir, nikarîbû temam bikirana, heçkû felç bibû, ji nişkê ve sekinî.

Jineke pir bi rûmet û serbilind bû. Mîna ku çavên wê li devereke dûr bû.

Heta wê demê hîç nefikirîbû ku bê wê çawa mirina xwe pêşwazî bike. Tenê carekê di nav malbatê de gotibû his dike wê mirin ji nişkê ve rêya xwe pê nexe û wisa jî bibû.

Bîranînên mezin ên salan di ber çavan re derbas bûn. Diyarê xwe yê di xeyalên xwe de zindî kirî û li hevjînê xwe fikirî.

Fermandar enceq dikarîbû bi îşareta çav emir bide, piştre eskerê bi rolê celad rabûye şûrê xwe rakir jorê.

Jin, li şûna nifiran li celad bike, mîna duayan dike got:

"Bila Xwedê başiya di hundirê te de rizgar bike!"

Dema sarbûna şûrê ku li patika wê diket his kir, çavê xwe girt. Piçek porên wê yên spî, bi şûrê xwînî zeliqî.

Cenazeyên bêyî serî, li pey erebeyek textîn ya li pey du hespan bar kirin û di nav gel re derbas kirin, li derveyî bajêr avêtin meydanekê. Merasîmên pîroz ên ji bo miriyan jî qedexe kirin.

Çaxê ku Xorrem gihişte bajêr, her tişt qediyabû. Çû mala doktor. Hewaya şînê hebû…

Jina hatibû kuştin, hevjîna Naûman, dayika gel, jina zana Sûrem bû. Dest jê berde kûrahiya wê bê fêmkirin, bibû qurbanê kesayetekî belengaz ê nikarîbû sir bigire. Ya herî bi êş jî ev rebena jî ji dara wê bi xwe bû: mîna kurmê darê ji darê be.

Dibêjin ku di zemanekî de qralên du welatên cîran her tim ji hev re diyariyên tijî sir dişandin û di nav xwe de lîstoka zekayê dilîstin. Qralekî bi peykertiraşê xwe yê herî behremend sê peykerên mirovan ên dişibin hev dane çêkirin. Di navbera her yekî de ferqek hebûye, lê ji bilî wî û peykertiraş ti kesên din wê ev ferq nizanîbûna.

Qral, ev peyker bi nameyekê ji bo qralê din wekî diyariya rojbûnê şandiye. Di nameyê de gotiye ev hersê peyker dişibin hev, ji nav wan yek jî ji yên din bi nirxtir e û jê xwestiye vî bibîne.

Keyfa qral ji diyariyên rojbûnê re hat. Lê çiqasî li peykaran mêze bike jî ji ber ku di nav wan de ti ferq nedîtiye nikarîbûye pirsa di nameyê de jî bibersivîne. Li ser vê bang li hemû peykertiraşên li welatê xwe kiriye, lê wan jî nedîtiye. Li ser vê qral pir tengav bûye. Hunermendekî ciwan ê ku ji ber muxalefeta wî kiriye xistibû zindanê hate bîrê. Behreya wî ya hunerî û zekaya wî li ser zimanan bûye. Dema ku qral bêçare ma jî bang li ciwanî kiriye.

Hunermendê ciwan, dema dîtiye di nav peykeran de ferqek tine ye, têleke pir zirav girtiye destê xwe û xistiye guhê peykerê yekemîn. Têl ji guhê wî ketiyê û ji devê wî derketiye. Xistiye guhê peykerê

duyemîn, ji guhê din derketiye. Têla xistiye guhê peykerê sêyemîn jî qet derneketiye derve; heta texma dilê wî daketiye û li wir sekiniye. Sirê meselê hel bûye. Qral li ser vê rewşê hunermendê ciwan serbest berdaye û mîna bersiveke spasiyê nameyek ji qralê cîran re şandiye:

"Mirovê ku tiştên ji guhî wî dikeviyê ji devê wî derdikeve, ango sir naparêze ne maqûl e. Ya ji guhekî dikeviyê ji guhê din derdikeve, ango guhdarî nake, ew mirov jî ne qebûlbar e. Mirovê ku tiştê di guhê wî re dikeviyê di dilê xwe de vedişêre mirovê herî bi qîmet e."

Sûrem û hevalên wê ji ber kesekî ne meqbûl hatibûn kuştin.

Yê ku bêyî di ferqê de be dayik û hevalên wê dane dest, ji bilî kurê Sûremê yê lewçe Nîbîrû pê ve ne kesekî din bû. Dema ku di nav qelebalixê de pesnê dayika xwe dide sirên wê kifş dike û pêvajoya kuştina wê dide destpêkirin.

Sûremê ji bo nêzîkatiya kurê xwe gotibû, "ramûsana Yahûda". Nîbîrû wê ti carî ev fêm nekiribana. Dihate gotin, piştî xwarina şeva dawî, Yahûda di nav qelebalixeke êrîşkar de Hz. Îsa maç dike û îfşa dike. Ya ku Nîbîrû kirî jî ji vê ne cudatir bû.

Ji ber ku îspatên rahîban jî gotinên kurê jinê bûn, her kes bi rehetî qeneh kiribûn.

Hincetên rahîban qûralên olî bûn, lê bi kuştina Sûrem û hevalên wê re peyama xwe dan ku li dijî otorîteya rahîban û statuya dihkanan nîqaş çêbibe û li dijî wan şîreta serhildanê were dayîn, dê cezayê wê mirin be.

Hîna li naverastê ti îsyan tine bû, lê ji ber îhtîmala îsyanê mirov kuştibûn. Ne diyar bû ku bê wê ev rewş bandoreke çawa li gel bikirana.

Her wiha, yek ji kuştiyan jî jin bû, vê jî dikarîbû rê li ber encamên nayên payin vekirana. Niha tenê dihat dîtin ku wijdanên mirovan êşandine.

Jineke zana ya ku wateya navê wê "demsal" bû, hat kuştin, hemû demsal ji vî welatî xeyidîn, zilam ji ber şerma xwe ketin binê erdê.

Demek dirêj bêdengiyek li ser bajêr peyda bû.

Mazdek çawa ji ba rahîban çibû, berê xwe dabû cem Qral Kûbad. Gotibû girtî bêsûc in, daraz ji bo nîşandanê ye, heta li wan jî nehatiye guhdarkirin û jê xwestibû mudaxeleyî rahîban bike.

"Çavê ruhaniyan sor bûye. Tevî otorîteya qral jî bi xwe ceza didin, û wê navê Xwedê xerab derxînin."

Qral îqna kiribû û qasidê wî xistibû rê. Feqet rahîban firsend nedan ti destwerdanê û çalakiya xwe ya tarî pêk anîbûn. Armanca wan ne tenê gel, ji bo qral jî peyamdayîn bû.

Di nav gel de hêrseke îsyanê ya mîna volkanê çêbibû.

7 can, bûn 7 lehengên gel…

Qral cara yekemîn li beramberî peyamê ket nav tirsê.

Dema ku Mazdek bi bûyerê hesiya, cara yekemîn fikirî ku hemû têkiliyên xwe yên li ba rahîban qut bike û bikeve nava gel.

Û li Gundeşapûrê hat nîqaşkirin ku heyfa qetlîameke ku cara yekemîn ji ber nîqaşa fikrê pêk hatiye, divê careke din bi fikran bê rakirin.

Yek hebû ku bi tolhildana qehremanên gel dîn û har bibû, ji her kesî cudatir difikirî: Ji wan qatilên gelê mezlûm divê bi heman şeklî hesap bê pirsîn, bersivên ku wê nikarîbana ji bîr bikin diviyabû bigirtana.

Artêşeke wî tine bû, lê bi xwe mîna artêşekê bû. Bi navê dayika xwe ya di nav gel de, bi dengê xwe yê xweş navdar bibû, dihat nasîn. Digotin kurê Şanazê. Ti kesî navê wî yê rast nizanîbû. Berê hesinkar bû, şûrên pola çêdikirin.

Li ser xatira dayika xwe ku ji bo stranan nebêje ji aliyê walî gef lê hatibû xwarin û ji ber vê jî dema ku di nav gel de stran digotin ji aliyê eskerekî mîna parsekekî serxweş li xwe kiribû bi derbên xençerê hatibû kuştin, bibû ozanekî gerok.

Piştî demeke kurt, cesedê walî bêyî serî, li ser doşeka walî hatibû dîtin. Ti kesî fêm nekiribû bê çi bûye. Li kû derê li serê wî geriyabin jî nedîtine!

Li kû derê neheqî hebûya ew bi saz û gotina xwe tanîn ziman, lê dema tarî diket jî şûrê xwe yê tolhildanê dikşand. Bi xwe jî nizanîbû çend kuştî li pey xwe rêz kirine.

Dostaniyeke wî li gel doktor û hevjîna doktor a qetilkirî hebû. Dema xebera qetlîamê girt, tevî ku li warekî dûr bû jî bi hêrsa tolhildanê ket ser rê.

Ti kesî fêm nekir bê çawa diket bajêr û derdiket.

Qazî Darî İyaz li ser nivînên xwe hatibû şûrkirin û kuştin! Piştî vê bûyerê kurê Şanazê û Mazdek hevdu nas kirin.

**Daweta Beg, Hestiyê Kûçik, Şervanên Kewyarê!**

Def û zirneyan ji bo daweta kurê Ferwer lê didan. Dawet wê bi rojan dewam bikirana, ev roja yekemîn bû.

Li hewşa qonaxê bi dehan xezal, zebra û hêştireke mezin hatin serjêkirin. Dema di sîtilan de dihatin kelandin, bêhna wê li pozê gundiyên li ser zevî dixebitîn diket. Meraq dikirin, dema navbera nîvro bihatana dayîn gelo wê ji vê xwarinê bidana wan jî?

Rahîbê kal ê li cem beg rûniştî bi îşteheke mezin goştê li ber xwe qedandibû. Tevî birûcotên stûr jî gepên wî yên pembe û qelew dîmenekî pêkenok dida.

Dema ku xwarina dawetê li mêvanan dihate belavkirin, li ser navê gundiyên li zeviyan du kes hatin û xwarin xwestin. Rahîbê bû şahidê vê, got:

-Way, way, way! Beqê dîtine ku hesp tên nalkirin, lingê xwe jî dirêj kirine! Begê min, tu yê van gundiyan fêrî tiştên wisa nekî. Binêre, bêyî fedî ji xwarina dawetê dixwazin.

Ferwer, li ser van gotinan hîqehîq keniya. Dema dikeniya jî wisa bang li xizmetkarên xwe kir:

-Goşt bidin beqan jî!

Ruhaniyê bi teqwa got:

-Efendî, tu çi dikî, hûn ewqasî rû bidin gundiyan, sibe we bi tiştekî nahesibînin. Ji bo kûçik dar lazim e!

Ferwer:

-Pêwîst nake tu ewqasî bitirsî, meraq neke, ma em ê hestiyan ji bo heywanên kovî bihêlin? Heywanên me yên kedî hene. Ji bîr neke, ji taska kûçik re hestî divê!

Du gundiyên ji van axaftinan bêxeber jî ji ber ku goşt dane wan keyfxweş bûn. Bi sîtilek tijî hestî ji wir veqetiyan. Tenê hestî mabûn!

Heman şevê beg bang li van herdu gundiyan kiribû. Cara yekem ew dawetî odeya xwe dikir. Bi keyfxweşiyeke mezin çûn. Beg mîna began ew pêşwazî kirin. Ewqasî pir keyfxweş bibûn ku fêm nekirin ka beg dûvdirêj ji wan re çi dibêje, çi ji wan dixwaze, tenê ji mezinbûn û şatafata qonaxê bandor bibûn û ji keyfa gêj bûn û ji bo vegerin xanîkên xwe yên feqîr derketin.

Herdu jî xizmên hev bûn û malên wan jî li kêleka hev bû. Dema vegeriyan dîmenê pê re hevrû bûn dikarîbû mirov dîn bikira: Malên

wan hatibû şewitandin û bibû xwelî. Tecawizî jinên wan hatine kirin, zarokên wan li dora dayikên xwe qîjewîj digiriyan. Danê sibê dema def û zirneyê lê dida, wan gund diterikand. Di rê de hatibû bîra wan û fêm kiribûn bê beg çi gotibû: "Mirov ji begekî xwarinê naxwaze, eger beg bide, mirov digire!"

…

Ji nav dewletê heta nava civakê her kes cihê cihê kiribûn. Li jor tebeqeyên bijartî, li jêr jî yên hestiyan!

Li herî jor "Şahenşah" hebû, hemû esilzade bi rê ve dibir.

Piştî wî jî ruhanî yanê rahîbên ku jê re "Atorbanan" dihate gotin hebûn.

Şervanên bi navê "Artêştaran" jî tebeqeyeke cudatir bû.

Burokrat û sekreterên bi navê "Dabîran" jî cihê xwe di nava tebeqeyeke civakî de girtibûn.

Tevî oldaran, ji bo hemû prens, esilzade, arîstokrat, derdorên dewlemend bi giştî di maneya esilzade de "Bozorgan" dihate gotin, ji bo tebeqeya gel jî bi giştî "Vasteryoşan" dihate gotin.

Di nava tebeqeya gel de jî di asta jêr de cihêbûn hebûn: Rêveberên qedemeya jêr a ji ziriyeta Aryenan tê; "Esilzadeyên Azadan" bûn ku bingehê yekîneyên siwariyan pêk tanîn, ji wan re "Hur" dihate gotin û herî dawî jî hemû gundiyên li derveyî Aryenan di rêzê de bûn.

Ev nîzam di dema Persan de hatibû avakirin. Helwest û nêzîkatiyên her tebeqeyê jî bi hûrgilî hatibûn diyarkirin û sînorên wan hatibûn xetkirin. Wisa lê kiribûn ku di demên destpêkê de her kesên ji tebeqeya jor hevdu ji lêvên hev maç dikirin, lê ev ji bo tebeqeya jêr qedexe bû. Dîsa jî yên xweziya xwe bi wan tanîn guhdarî qedexeyan nedikirin!

Mirovên li her tebeqeyê xweziya xwe bi yên tebeqeyeke jortir tanîn. Heta ji bilî rahîb û gundiyan her kesî di cil û bergên xwe de teqlîda tebeqeyek jortir dikirin.

Cihêbûna jê re tebeqeyên civakî digotin, dibû sedem ku ev tebeqe hemû cewherên xwe yên civakî ji dest bidin. Gundî jî mecbûr diman wekî koleyan xwe li jiyanê ragirin, bi terzê koleyan nanoziko bixebitin.

Ev tebeqebûna li ser civakê hatibû ferzkirin, mîna emrê Xwedê bû, ji aliyê qral dihate parastin.

Wezîfeya sereke ya qral ew bû ku her tebeqeyeke civakî di nav sînorên wê de bihiştana. Ew ê çînekê çîneke din nepelçiqandana. Ji vê re jî "edaleta qral" dihate gotin. Halbûkî ji ber vê yekê her tim dewlemend dewlemendtir dibûn û feqîr jî feqîrtir.

Şatafateke wanî mezin hebû ku mirovan digotin qey gel di nava bereketê de dijî. Halbûkî ev şatafat hemû di serî de gundiyên zîrek ên Farsan, li ser xwêdan, can, xwîna gel hatibû avakirin.

Mînak, hevrîşimên Sasaniyan kef bi devê hemû dewlemendên cîhanê dixist.

Reng, neqş û qeyimbûna mehfûrên jê re Xalîçe yan jî ferş digotin aqil didan sekinandin.

Bi têkelên tevlî nav ava cehtir û giyagewrik dikirin, rengekî qehweyî yê nerm, ji tetre yanî bistiyên spîndaran rengê zer û sor, ji koka ilibada jî rengên şîn çêdikirin û gelek benên bi rengên cuda bi kar tanîn, mîna welatê kulîlk û xeyalan, mefhûrên xwe dixemilandin.

Xalîçe û mefhûr di bin kontrola dewriyeyan de bi karwanên mezin dişandin diyarên dûr. Dihat gotin ku qralên wisa hene, tenê ji bo bibin xwedî xalîçeyeke Îranê ya 2x2 metreyan dikarin nîvê welat bifiroşin. Taybetmendiyê esas ê ku pelepûçk dida lêvan jî esas ew bû ku tim û tim dihat raçandin. Ne mimkun bû ku bêyî destên biçûk hebûna di vê ziraviyê de û wisa gurayî karîbûna birêsin.

Temam, lê kê dirêsa, kê diafirand? Kur û keçên temen biçûk ên gel bûn ku wekî koleyan korbûna çavên xwe dabûn ber xwe û dixebitîn!

Dîsa, mîneral û madenên dewlemend ên gelên Ermenî û Kafkas wekî dixwestin bi kar tînin, lê ti feydeya van dewlemendiyan nedigihişt gel.

Şatafat, şatafata qesrê bû. Gel jî li her derê di şûna rondikan de xwîn dirijand. Feqet li şûna barandina xwînê yên îsyan dikirin jî hebûn. Hem jî ya wan a herî navdar jî jin bû. Navê wê Kewyar bû.

Kewyar jineke wêrek bû û serî li hemberî vê rejîma neheq rakiribû. Hevjînê wê ji aliyê eskerên kumik sor hatibû kuştin.

Li ba du kurên xwe yên mezin û keçeke xwe ya ji wan mezintir, li çiyê diman. Navê wê mîna efsaneyekê ji çiyayekî digihişt yê din, ji gund digihişt yê din, ji bajar digihişt bajarê din.

Dihat gotin ku ji bo tola hevjîna xwe rake dijî û bi çendan caran rêya derebegan û axeyan biriye, xerac ji wan girtiye, heta li dijî eskerên qral şer kiriye.

Digotin, keç û kurên wê mîna qertelan her yek serê çiyayekî digirin, bêyî destûra wan ti kes nikare ji derbendên çiyê derbas bibin. Bi taybet jî dema digotin ji dewlemend digirin û didin feqîran pir keyfxweş dibûn. Dîsa digotin, bi demê re gelek şervanên egîd tevlî wan bûne, mîna aşûtê mezin bûne û wisa nîsk dikirin gîsk û li ser diaxivîn.

Êdî ji bo wan “Kewyaran” dihate gotin.

Kewyar dihat maneya, “notirvan, dost, parazavanê çiyê”.

Digotin hadê havînî temam, lê zivistanê ti zindî nikare li ser wan çiyan bijî. Lê, koma Kewyaran bi şer jiyana xwe dewam dikir.

Dilekî ku bi agirê întiqamê disot, ne berfê, ew ê cemed jî bihelandana. Agirê tolhildana Kewyarê têrê dikir ku çiyayên berfî, lûtkeyên cemedgirtî derbas bike. Nîşanî hemû dinyayê dida bê jineke wêrek dikare çi bike.

Bajarî jî ditirsiyan ku di der heqê wê de şaşomaşo biaxivin. Bi ser bajaran de girtibû, bi qasî axeyan tirs û xof xistibû dilê waliyên sedrapiyê jî.

Hemû gundiyên li binarê çiyan bi saya wê ji zilma axe û waliyan xelas bibûn.

Xorrem ji dema ku navê wê bihistîbû lê tehsîr bibû û her tim li şopeke wê digeriya. Qehremana zarokatiya wê Kewyar bû.

Bi çendan caran li gel Mohrê çûye qûntarên çiyan, derbendên teng bihurandine, ketiye dolên tarî û kûr; dema havînî nedîtiye, dema berf ketiye lê geriyaye, lê dîsa jî ti şopa wê nedîtiye.

Ew qeçaxa çiyayî kî bû? Gelo dibe ew jî Kewyaran bûya?

Carina ji hebûna wan guman dikir, digot qey çîrokek egîdiyê ya gel e. Lê belê, ew çîrokên ji zarokatiyê di serî de mabûn ewqasî zindî, ewqasî nas û ewqasî nêz bûn ku her tim li pey şopa wan jî digeriya.

Li pey çiyayên ku “Şervanên Kewyarê” lê diman, dîsa ji bilî çiyayên din ti tiştek tine bû.

Gundên çiyê mîna stêrkan kom bi kom di nav çiyan de belav bibûn.

Dema mirov çiyayên li pey çiya derbas dikirin, heta deştê diçûn û bi rojan dimeşiyan, xwe digihandin paytexta Xanedanê Sasaniyan.

Başûrê paytextê li diyarên Ereban, bakurê wê jî heta çiyayên Medan diçû.

Her çiqasî dihat gotin ku ji ber geliyên biadan ên Dîcleyê paytext li wir hatiye avakirin jî xakên hevşib bi bereket li milê Ermenîstanê jî

hebûn. Li wê derê bi qasî ku têra çar împaratoriyên wê demê bikirana genim dihatin çandin. Piştî dihat komkirin jî ti kesî nizanîbû çi bi serê vî genimî tê.

Bi heman şeklî li rojhilatê Êranşehrê jî xakên pir berdar hebûn. Çima îleh geliyê Dîcleyê?

Sedema wê ya esasî ew bû ku dixwest hem têkiliyê li ba alema Ereban deyne hem jî eşîrên azad ên Medî di bin kontrolê de bigire. Ji ber vê jî di nav artêşa xwe de cih dabû wan, di nav fermandariyan de li wezîfeyên girîng bi cih kiribûn.

Hevjînê Kewyar jî di dema xwe de wekî kurê van fermandaran yekî hatiye dinê, dema mezin bûye jî rêya xwe bi xwe diyar kiriye, bûye mamosteyekî gerok.

Heta ku malbata wî qelebalix bûye her geriyaye; fêr bûye, fêrbûnên xwe bi gelê feqîr re parve kiriye. Dema hatine halê ku êdî nikarin malbatî bigerin, li bajarokekî nêzî Çiyayên Medan bi cih bûne.

Ji bo bajarokan “Bahş” digotin û nûnerên dewletê qet ji wê derê jî mehrûm nediman.

Li bajarok du mamosteyên ku di bin emrê qral û rahîban de dixebitîn hebûn. Bi qasî ku bikaribin Kewyar bê mêr bihêlin, zarokên wê bê bav bihêlin fêrî fesadiyê bibûn.

“Li şûna ku hewl da ji bajarok dest pê bike û cîhanê biguhere, ji qral dest pê bikira wê ne baştir bûya?”

Xorrem, bêyî ku bersiva vê pirsa li malê tim û tim dihat ziman bizane, di hafizaya xwe ya zarokatiyê de qeyd kiribû.

## BEŞA DUYEMÎN: DI ŞEVAQA ŞER DE

### Gerdûneke Nû

Li milekî jinên li haremê li milekî jî jineke mîna Xorrem bi îrade û bîrewer! Ji bilî Xwedê, li her derê serikên herî nakok ev bûn. Wateya windayî ya jiyanê di vê nakokiyê de veşartîbû. Bi saya wê wateyê dikarîbû bihata fêmkirin bê mirovahî ji kû derê hatiye kû derê. Êdî eşkere derketibû ortê wê çi bihatana redkirin çi jî bihatana qezenckirin. Heke cîhaneke lazim bû bihatana guhertin hebûna, çawabûna vê jî wê bi nakokiyên derdiketin kifş bibûna. Bi ser van nakokiyan de çûyîn ne kîsê her kesî bû. Ji bo ew kesên lêgerînvan deriyekî ezmûnê hatibû vekirin.

Yekî ku bizaniya li haremên Sasaniyan çi diqewime, ew ê pê re bizaniya ku li vî welatî têkiliyên jin-mêr, zewac an jî malbatê jî her tim wê di bin siya qesrê de bûna. Derbaskirina wê, bûyereke mîna ji nû ve bûyînê mezin bû.

Mazdek hatibû werçerxa jiyana xwe. Tevî ku li nav malbata wî hurmet ji jinan re dihat girtin jî, lê ji ber bandora ola riziyayî û derdorên qesrê nikarîbû ew darazên neyênî yên li cem wî çêbûne bi temamî derbas bike. Tirsa wî ya ji zewacê li milekî, hê di der heqê jinan de ew tirsokiya xwe derbas nekiribû û Xorrem nas kiribû. Mesele ne zewac bû, zanebûna hevjiyana li ba jineke azad û bi îrade bû. Ji bo karibe vê bi ser bixe, pêdiviya wî bi rênîşêneriya Xorremê hebû. Ev fikir her çiqasî ji bo lê xweş hat ketibe bîrê jî dema ku kûrahî, ziravî û cudahiya Xorremê dît, di demeke pir kurt de ji dil û can bi vê bawer kir. Têkiliyeke serketî dihat maneya jiyaneke serketî.

Piştî ku Xorrem nas kiribû, fêm kir ku hemû zanebûnên wî nîvco ne. Encama gihiştiyê tam nikaribe pênase bike jî digot, “Kesên ku heqîqeta di dilê jinekê de nizanibin, ti tiştî nizanin” û hewl dida Xorremê nas bike.

Têkiliya wan dikarîbû li dijî rejîma haremê û zewaca kolewarî serhildaneke mezin bûya.

Di bingehê hemû zewacên kolewarî de feraseta haremê hebû. Avakirina haremê resmîkirina qirkirina jinê bû. Mazdek li beramberî rastiya jinê ya ku li haremê hatiye bicihkirin, xwe bêçare didît û nizanîbû wê çi bikirana. Lê ji dema ku Xorrem nas kiribû bi hêvî bibû. Ji destpêkê ve his kiribû ku wê bibin hevrêyên hevdu.

Her çiqasî fikirîbe ku hezkirina xwe bi saziya zewacê îfadekirin ne pir watedar e jî, li şûna ku li dijî darazên civakî bi awayekî qeba raweste, dixwest têkiliyeke hezkirinê bijî û bi vê boneyê jî îdealên xwe yên civakî bide jiyankirin. Herî zêde jî di vê mijarê de cesaret ji Xorremê girtibû.

Zewaca Mazdek û Xorremê her çiqasî ji ber qetilkirina Sûrem û hevalên wê hatibe taloqkirin jî herî dawî pêk hatibû. Zemanê di ser qetilkirina wan re borî hêrsa wan kêm nekir, lê ji bo biryarên nû bigirin jî demeke têra xwe dirêj bû.

Herî zêde jî keyfa Dayzerê ji zewaca wan re hat. Ewqas xatirayên bi êş demek dirêj nehiştibû çavên wê yên xweşik bikenin. Bibû xwedî kurekî zana yê mîna Mazdek û keyfxweşî bi Xorremê re çêbibû. Vê jî dîsa çavê Dayzerê ronî kiribû.

Bereketa xwezayê wê salê ji her demê zêdetir bû. Gundî cara yekemîn ewqasî sûd ji xwezayê digirtin. Li bajaran ji ber berhemdariyê hewayeke cejnê çêbû. Qade cara yekem derketibû rêwîtiyên bi hizûr.

Ji bo Mazdek û Xorremê deriyên gerdûneke nû vebûn. Li hembêza çiyan, li cihekî şînkahî yê ku gurmegurma avê jê qut nabe bi cih bûn. Dostên wan ên li wir ji dil û can bi wan hatin girêdan. Cihekî ji vir rehettir û ewletir jî tine bû.

Mazdek pêşî ji zewacê ditirsiya. Tevî vê jî wexta Xorrem li balê bû, êdî digot tiştekî jê bitirse nemaye. Her çiqasî hê nediyar bû ew ê gerdûneke çawa ji hevrêtiya wan çêbibûna jî his dikir ku ber bi gerdûneke nû ve ketine ser rê.

Ev eşqa bextiyar a di gerdûneke nû de gelo wê mîna xeyalekê kurt bûna yan jî wê bêdawî bûna?

Ji bo ku karibin civaka eşqê ava bikin bi hev re ketibûn rê. Her tişt girêdayî serketinên wan ên civakî bûn.

Dema tîrêjên ewil ên rojê lê didan, dûvdirêj mêzeyî hev kirin. Ruxmî hê nû bextewerî nas kiribûn, lê di çavên wan de hizna cihêbûnê hebû.

Mazdek dizanî ew ê nikaribin pir zêde li vir bimînin. Ew ê li ser navê wekheviya civakî biketana nav têkoşîneke mezin. Têkoşîna li dijî ruhaniyên sexte û axeyan wê dê qet ne rehet bûna. Tew îcar qet nikarîbûn hêzeke eskerî ya mîna împaratoriyê mezin bigirtana beramberî xwe. Dixwest li milekî civakê rêxistin bike li milekî jî qesrê di bin bandora xwe de bihêle û encamê bigire.

Ji ber vê jî got, “em zêde nesekinin, biçin.” Xorremê jî got, “li vir mayîn ne windahiya wext e. Em dikarin demekê li vir bimînin û têkildarî civak û jiyanê fikrên xwe kûrtir bikin.”

Ne wê rojê ne jî piştî wê di vê mijarê de li hev nekirin. Di têkiliya wan de mijara destpêkê ya bi nakok mayîn an jî nemayîna li wir bû. Her kû nîqaşên wan berfireh bû, Xorrem qeneh bû ku li wir bimînin wê ji bo wan sûdmendtir be. Dema Mazdek jî fikirî ku ji bo hinekî din nakokiyên li qesrê dijwar bibe bimîne wir wê sûdmendtir bibe, ew jî razî bû li wir bimîne.

Roj mîna ku dibûn şahidê ji nû ve avabûna giştî gerdûnê. Tevî ku li gerdûnê koletî tine bû jî çawa dibû ku mirov dikarin hevdu bikin kole? Mijarên nîqaşa wan ji bo helkirina pirsgirêkên jiyanî bûn ku dewleta Sasaniyan pir zehmet kiribû. Mazdek cara yekemîn şîroveyên wisa yên felsefe û olê dibihîst ku têkiliyên wan ên civakî û jiyanê ewqasî zindî nd. Ji ber vê yekê jî pir qîmet dida nîqaşên Xorremê.

Xorrem jî di nîqaşan de bi her nakokiyeke nû re coş dibû, bi her bersiveke nû keyfxweş dibû. Şîroveyên wê yên bawerî û felsefeyê bandoreke mezin li Mazdek kiribû.

Bawerî û felsefe ne dijberê hevdu bûn, hebûna hev pêk tanîn!

Lê belê, baweriya di perestgeha dewletê de dihate fêrkirin têkildarî mirinê; baweriya di nava civakê de jî têkildarî jiyanê bû.

Baweriya civakî çavkaniya hêz û hêviya bindestan bû. Felsefe jî karê mirovên azad bû û azadbûn jî beriya her tiştî bawermendî lazim dikir. Ji vê re digotin bihevrebûna dil û aqil.

Û niha tam jî di vê demê de dilê wê yê ji bo rizgariya civakî dişewitî jê re digot bikeve nav liv û tevgerê, lê aqlê wê jî digotê lazim e zêdetir nîqaş bike.

Niqaşên felsefî ji milekî ve xwedî taybetmendiyeke azadkirinê bû. Dema ew û nîqaşên siyasî di nav hev de bûna leztir encam dida, bendên li pêşiya aqil hildiweşandin.

Li ba Sasaniyan siyaset ol bû. Li derveyî olê axaftin çênedibûn. Ol kiribûn amûrê herî baş ê kontrolkirina civakê. Feqet di encama vê de çîna ruhban xurt bibû. Wisa jî di navbera du navendên hêzê de hevsengiyek çêbibû. Yek di bin nûnertiya qral de bû, ya din jî hêza di destê çîna ruhban de bû. Nakokî û pevçûnên wan vekirî yan jî girtî her tim hebû.

Mazdek, dewleta Sasaniyan baş nas kiribû. Zanebûna wî ya olî kûr bû. Nîqaşkerekî baş bû. Dîroka Sasanî û xanedaniyên beriya wan jî baş dizanî. Bi hostatî dikarîbû ji nakokiyan sûdê wergire. Bi manewiyata xwe jî bandor li her kesî dikir. Îcar ev serêşên wî jî nebûna! Bi taybet jî serê sibê dema şiyar dibû, bi serêşeke pir mezin çavê xwe li rojê vedikir. Heta hinekî bi ser xwe de dihat wextek diçû. Di kêliyên wisa de di ber xwe de digot, “ji vî serê diêşe ti tiştek çênabe!” û ji ber van azaran gazind dikirin.

Di salên ewil ên Xanedaniya Sasaniyan de mîna hêviyeke nû li welat çêbibe, keyfa gel hatibû. Împaratoriya Romayê meydan ji dinyayê dixwest. Di bin Xanedaniya Partan de Êranşehr di rojên tarî û zor re derbas dibû. Ziriyeta Sasanî îdîa kiribû ku ew ê nasnameya Îranê ya ji dema Îskender ve hatiye windakirin ji nû ve zindî bikin, û wisa jî xwe kiribû hêviya gelên Îranê. Lê wekî her sîstema serwer desteka gel ji bo qayîmkirina desthilatdariya xwe bi kar anîn, dûvre jî di nav statuya xwe ya nû de gel li tebeqeya herî jêr bi cih kirin û xistin bin kontrolê. Li dijî vê nîzama xerabûyî fîlozof-pêxemberekî mîna Manî mezin derketiye, lê belê ew jî bêrehmî hatibû qetilkirin.

Pêwîstî bi fikir û pêşengên bibin hêviya gel hebûn. Xorremê ji zarokatiya xwe ve digot lazim e gel li dijî vê sîstema xerabûyî serî rake. Xeyalê wê yê herî mezin jî ew bû ku bibe mîna şervanên efsane yên ji bavê xwe guhdarkirî. Dema ku Mazdek nas kir, bawer kiribû ku hevrêyekî wê yê bikaribe li balê şer bike çêbûye. Pêwîst bû ev têkiliya li ba Mazdek ji ya xuya dike jî wirdetir xwedî wateyekê bûya. Bawer dikir ku hevrebûna wan ne tesadufî ye.

Xorremê ji destpêkê ve gotibû ku lazim e armanceke vê têkiliyê hebe. Ji ber ku ne li pey jiyaneke besît û têkiliyeke besît bû, derdekî wê yê mîna lêgerîna bexteweriyê tine bû. Li gorî wê diviyabû lêgerîn ne li pey bexteweriyê, lê li pey azadiyê bûna. Dibe ku rêya vê di nav êşan re derbas bibûna û jixwe jinan êş dikşandin. Ti kesên bi qasî jinan êş dikşand tine bû. Hemû jinan êş dikşandin. Mirovekî xwedî armanc dikarîbû xwe li êşan ragire. Lê jinan xwe li êşan jî ragirtana

nedigihiştin ti bexteweriyê! Bextewerî, ji bo kesên wisa bûn ku dizanîn îradeya xwe nîşan bidana û xwe li beramberî hemû êşan ragirtana. Lê belê, pêdiviya jinan ji vê jî wirdetir bû: Nikarîbûn di bin vê rejîma xerab de bijiyana! Ji bo vê jî wê li gel Mazdek biketa rêya têkoşînê.

Mazdek têkildarî dilsoziya bi armancakê wekî wê difikirî, digot bextewerî jî li ba êşê heye. Ew bi xwe jî bi eşqa heman xeyalî dil ketibûyê, bexteweriya wan jî girêdayî vê armancê bû. Çiqasî serketî bibûna dikarîbûn ewqasî jî bextewer bibûna.

Xorrem hemû nîqaşên xwe girêdayî pirsgirêkên civakê pêş dixistin, ji ber ku mêzekirina Mazdek a ji bo olê jî li gorî vê diguherî, pê keyfxweş dibû. Girtîbûna olî, bandor li nêrînên Mazdek ên di der barê rastiyên civakî de kiribû. Her ku li cem Xorrem nîqaş dimeşandin jî ji van bandoran xelas dibû.

Li erdnîgariya wan ne nîqaşan, lê bûyeran bandora arastekirinê dikir. Lê wan bi xwe bi sebreke awarte û bi rojan nîqaş dikirin.

Di navenda nîqaşa Xorremê de cihê jinê yê di civakê de hebû, Mazdek jî zêdetir tebeqeyên di nava civakê de hatine avakirin dixist lêpirsînê. Digot ji ber ol hatiye xerakirin, tebeqebûnên ku bûne çavkaniya hemû neheqiyan, pêş ketine. Xorrem, ji bo ku karibe wî bikşîne nava cewherê civakê pir hewl da. Heger nêrînên wê yên têkildarî jinê derneketana pêş ew ê ti hewldanên guhertinê serketî nebûna. Ji bo sedemên vê jî digot hebûna civakî xwedî xisleta jinê ye. Mijara nediket serê Mazdek jî ev bû. Rojekê dema nîqaş dikirin, Xorremê got:

-Di felsefeya Yewnan de ku pir pesnê wê tê dayîn, her tişt heye, lê jin tine ye.

Her çiqasî Mazdek têkildarî felsefeya Yewnan li Gundeşapûrê hin tişt bihîstibin jî bi qasî Xorremê zanebûna wî tine bû.

-Heta ku em heqê Zerdeşt nedin, em nikarin heqê felsefeyê jî bidin. Şaşiya Yewnaniyan jî ev e, nexwestin Zerdeşt nas bikin. Tevî nas dikirin jî înkar dikirin, heger wisa nekirina, dibe ku wan jî wekheviya jin-mêr biparastana, jin li derveyî sîstema ku jê re dibêjin demokrasî nedigirtin.

Xorrem:

-Mesele ne tenê ew e; ma mirov ji bo fikrekî ku cihê jinê tê de tine ye, bi rastî dikare felsefe bibêje? Guman tê de ye! Bi dîtina min

mirov ji piraniya wan zilamên di nav cîhana Yewnan de cih digirin bibêje fîlozof jî wê ne rast be.

-Çi ye wê çaxê, mirov çi bêje?

Keniya. Mîna ku dixwest bi henekan rewşê rave bike. Nêzîkatiya wê ne biçûkdîtin bû, lê diyar dibû, henekî jî dipeyivî:

-Nav ne ewqasî girîng e, naverok girîng e. Feqet wekî nav jî ser meselê, mirov dikare bibêje "pederzofî". Ango zaniyariya bav an jî zilam.

-Piştre dilê Bavo Qade nemîne!

-Na, yên ku behsê dikim, ne bavê kedkar, bi nirx ê malbatekê ye; terzekî fikrê ye ku jinê li derve dihêle, tenê aîdî zilam e. Ji bo felsefeyê gotibûn, "hezkirina zaniyariyê" lê, di nav cihana Yewnan de mirov ne hezkirina zanyariyê, enceq bibêje "zaniyariya zilam" dikare rastiyê baştir rave bike. Jin tine ye! Di wê felsefeyê de cihê jinê tine ye. Bi gotineke hê rasttir, heye, lê dîsa jî tine ye!

Herî dawî Aspasîa ya ji Miletê mînak da û got, "heye, lê tine ye!"

Mazdek destpêkê got ev paşpêşiyek e, bi gotinan dilîze, lê dûvre dema ku Xorremê cihê jinê ya di cîhana Yewnan de ne tenê bi mînakên fîlozofên demê, ji mîtolojiyê jî dan û wisa rave kir, vê carê di girîngiya rewşê de gihişt.

Mazdek digot, "jin û mêr li ber çavê Xwedê wekhev in", bi demê re bi saya Xorremê fêm kir ku statuyên civakî di aleyhê jinê de çiqasî hişk in, ev jî esas terzê avakirina hemû desthilatdariyan e.

Ji ber bandora ku perwerdeya wî ya olî li ser çêkiribû, bi kûrahî fêmkirina meseleyên civakî hinekî wext digirt. Di encam de fêm kir ku heta di feraseta wî ya olî de guhertin çênebe ew ê nirxdaraziyên wî yên civakî jî neguherin.

Dema ku Mazdek armanca çanda avakirina haremê fêm kir, asoyê wî fireh bû. Dîsa bi saya Xorrem karîbû ol û felsefeyê bigihîne hevdu.

Jiyana civakî her çiqasî bi dîwarekî hişk ê baweriyê hatibe hûnandin jî guhertinên berçav-neberçav tê de çêdibûn. Mazdek bi saya ezmûna xwe ya li paytextê, ev guhertina lez a di nav jiyana bajarê qelebalix de dîtibû, hewl dida sedemên vê fêm bike. Her wiha ferq kiribû ku statuyên civakî yên li gundan ewqasî kûrbûyî li bajaran ewqasî bi çav nedihate dîtin. Baweriyên olî û şeklên îbadetê, heta çavkaniyên tirsê bi xwe jî her diçû diguherîn.

Yên ku li gund bi mirin û agirê dojehê dihatin tirsandin, li bajêr bi zindanê, êşkence, birçîbûnê dihatin tirsandin. Lê belê armanca tirsê li her derê eynî bû: Êsîrgirtina Fikran!

Nîqaşên wan ên li wê mala biçûk û feqîr ji nîqaşên felsefeyê yên li Gundeşapûrê heqîqîtir bûn. Ji ber ku têkiliya wê bi jiyanê re hebû. Ji bo fikrekî ku ji jiyanê naxuliqe nedigotin felsefe.

Dema derdiketin ser wan çiyayên ku dor li wan girtibûn û li tama mehên biharê dinêrîn jî nîqaşên xwe yên felsefeyê nediqedandin. Têkildarî temenê darberûyê nîqaş kirin. Zanayê kal ê gund behsa darberûyên nêzî milyonek salî kiribû. Bi vê bawer nekirin. Piştre kalo dersek baş da wan: Heger qurm û şaxên wê bi firtoneyên dijwar jî bişkên, bi brûskan bişewitin jî bi saya kokên xwe darberû her tim dikarin xwe nû bikin. Bawer kirin!

Felsefe, mîna darberûyê xwedî kokên saxlem bûn û dihişt ku jiyan şîn bibe.

Fikrekî xwedî şax û reh! Ev terzê fikrandina nerm a ku pêdiviya wan pê hebû, di cewherê jiyana civakî de hebû. Diviyabû dîwarê tirsê yê ku nedihişt were dîtin were rakirin.

Li gorî Xorremê jiyana civakî jiyaneke wisa bû ku dikarîbû felsefeya gerdûnê herî baş biteyisandana. Wekî çawa di gerdûnê de serdest û bindest tine ye, diviyabû di jiyana civakî de jî tine bûya. Ev ji ber fikir û baweriyên berevajî bûn ku li derveyî civakê, bi zorê li ser civakê ferz kirine û bi hezar dek û dolabî pê dane qebûlkirin.

Di xwazaya civakê de beşên serdest û bindest tine bû. Yên ku baweriya olê berevajî kiribûn, tebeqeyên sûnî jî wekî emrê Xwedê pêşkêş kiribûn. Rakirina vê hişmendiya şaş tenê bi baweriya olî mimkun nedibû. Diviyabû baweriya olî û felsefe bigihiştana hevdu.

Mazdek, ji ber ku niha xwedî heman fikrên Xorremê bû, bi heyecaneke mezin dagirtî bû.

Li gel vê, li ser mijareke ku Xorrem li ser nafikire jî difikirî: Bibe Xwedan Zarok!

Mazdek dixwest bibe bavê zarokan!

**Sirên Guhertina Dinyayê, Gotinên Brîndarkirinê**

Çaxa ku ronahî û tarîtî li sînorê bakur û başûr gihiştibûn hev, şer dest pê kiribû. Di şerê Xwedayan de ji bo mirovan jî hatibû emirkirin ku aliyê xwe diyar bikin.

Li milekî xwedayê ronahiyê Ahûra Mazda yê ku mirovan wekî Hurmuz bi bîr tanîn, li milê din jî xwedayê tarîtiyê Ehrîman. Ti şerî ewqasî dirêj neajotibû. Ti kesî jî nizanîbû wê kengî biqede…

Li gorî Mazdek ji bilî xwedê li her derê şer hebû.

Her ku nîqaşên Xorrem û Mazdek têkildarî hebûn, avabûn, jiyan, guherînê pêş diçûn, Mazdek his dikir ku ketine nav şerekî mezin. Her çiqasî zoriyê bide sînorên aqil jî dizanîbû ku ew ê ev şer tenê bi aqil nehatana qezenckirin. Ji ber ku Mazdek digot hebûn ew ê bi sînorên aqlê mirov neyê fêmkirin. Her çiqasî bi mejiyê xwe yê têkildarî gerdûn û teşbîha mirov bawer be jî hisên wî digotinê ji gumanên xwe neqere.

-Heke di şerê aqil û baweriyê de lazim be mirov aliyekî bigire, ez ê aliyê baweriyê bigirim. Ya bêkêmasî bawerî ye, ne aqil e. Aqil bi tecrûbeyên civakê çêdibe û her tim dikare şaş bibe. Bawerî jî bi têkiliya xwedayî ya ku civakê li cem hev digire, civakê dike civak û şaş nabe. Wateya em lê digerin dibe ku di nav baweriya xwedayî de be.

Xorrem:

-Bawerî baş e, lê aqil dikare wê baştir jî bike. Kîjan aqil? Aqlekî çawa?

Dema ev pirsîn keyfa Mazdek hat. Mîna ku bersivên pirsên wê dîsa di nav van pirsan de veşartî bû. Li gel vê mûtleqbûna di terzê fikrandina wî de jî bi pirsekê kifş bibû. Rûyê wî şor bû, şerm kiribû.

Xorrem nirxandina xwe ya li ser aqil dewam kir:

-Aqil, bi tecrûbeyên civakî çêdibin, lê aqlê azad bi felsefeyê mimkun e. Ma bêyî felsefe em ê çawa karibin xwe bigihînin agahiya gerdûnê? Zerdeşt bi saya felsefeyê hêza wateya mirov eşkere kir. Ev jî veguherî hêza civakî. Felsefe, hêza wateya mirov e. Ne pêwîst e mirov li cihekî din bigere. Ji derveyî civakê "wateyeke" din tine ye!

Ne civaka bêkêmasî ne jî mirovê bêkêmasî heye. Fikrandina bêkêmasiyê û bêkêmasîbûn ne heman tişt in.

Mazdek li ser van gotinan, sira ku çima ji hevrêyên Manî re “Bêkêmasî” dihate gotin pirsî.

Têkildarî Manî tijî agahî û şîroveyên Xorremê hebûn. Di her nîqaşê de şîrovekirina wê kûrtir û piralîtir bibû. Ji ber vê jî digot mirovê dixwaze Manî fêm bike tenê bila xeyalên baş, rast û xweşik ên ku jiyanê watedar dike bifikire bes e. Bi şeklekî hevşib bersiv da pirsa Mazdek jî:

-Manî bawer dikir ku xeyalên bêkêmasî enceq bi mirovên bêkêmasî re pêk tên. Yên xwedî jiyaneke ji rêzê nikarîbûn berê xwe bidin armancên mezin û ferqa xwe deynin ortê. Ji ber vê jî ji bo ku ferqa hevrêyên xwe diyar bike û hedefa daniye pêşiya wan bikirpîne, navê “bêkêmasî” yan jî “bijartî” li wan kiribû. Ev hedefek bû. Nedihat wê maneyê ku bêkêmasî ne.

Aqlê ku Mazdek jê şik dikir, aqlê li cem mirov bû. Bawer dikir ku aqlekî şaşnebar ê gerdûnê heye û ev aqil jî ji bilî Xwedî ne tiştek bû. Ji ber vê jî digot, “aqlê mirov têra her tiştî nake, ji bo têrê bike, lazim e em di rêkurta Xwedê de biçin.” Dema li ba Xorremê nîqaş dikir, carina bi xwe bawer xuya dikir, lê carina jî li beramberî pirs û ravekirinên Xorremê ji nişkê ve ew xwebaweriya wî tine dibû. Di rewşên wisa de êdî xwe avêtina bextê “ketina rêkurta Xwedê” jî nikarîbû kêmasiyên wî veşartana. Qalibên fikir û baweriyên ewqas demê pê bawer, êdî hildiweşiyan.

Her çiqasî baweriya wî bi zaniyariyên wî bihatana jî şîrovekirina van pir girîng bû. Bi saya Xorremê li pêş wî gerdûneke nû vebibû. Her tim bi hezkirinek mezin lê dinêrî, li beramberî vegotinên wê wekî çawa di zêhnê wî de deriyên nû vedibûn, her wiha hezkirina wî jî zêde dibû.

Agahiyên Mazdek pir bûn. Xorrem jî xwedî hêzeke kûr a şîroveyê bû. Mazdek lîderek bû û di nav esilzadeyan de mezin bibû, Xorrem jî jineke ji gel bû. Mazdek jê re behsa qanûnên dinyaya maddî dikirin; Xorrem jî her ku fêrî agahiyên vê dinyaya nedîtî dibû, zêdetir hez ji Mazdekê xwedî manewiyata xurt dikir. Mazdek têkildarî jinê nû nû ronî dibû. Xorrem jî bi şewqa jina azad ew ronî dikir, bi ruhê jinê mîna ku ji nû ve Mazdek diafirand.

Bi saya tetmîna fikrî û ruhî ya ku tevlî jiyana xwe dikirin, tenê mêzekirina hev, hêdîka bi hev bûn, his kirin jî têra keyfxweşiya wan dikir. Dîsa jî kontrol her tim di dest Xorrem de bû.

Xorremê digot qey ew keyfxweşiya ku şevan dema porê Mazdek miz dida pê re çêdibû û xeyalê civaka ku bi fikrên wan teşe bigire ew ê têra Mazdek jî bike, lê xeyalên Mazdek ên bûyîna bavê zarokan hebû.

Dema pirsî, "ma tu naxwazî zarokekî me çêbibe?" êdî alîkariya tiştên ku Xorrem heta wê rojê fêr bibûn nema; tenê ew û hisên xwe man.

-Zarokek!

-Erê, zarokek, dûvre zarokekî din! Bihar tê, berxik diberin, tov hêşîn dibin. Eşq dişibe biharê! Zarok jî dişibe kulîlkên li baxçe. Ma çima gelek zarokên me çênebin?

-Gelek zarok!

-Em ê bi hev re bûna û ji azadiya xwe neqeriyana, bi çêbûna zarok jî ew ê azadiya me neqede!

-Ma mesela me ne azadiya takekesî ye ku? Gelek pirsgirêk li holê hene, çavê mirov ditirsînin!

Bi vê gotinê Xorremê pê da hiskirin ku ji bo mijara zarokanînê ne hazir e, lê bi temamî jî red nekir.

Mazdek, vê carê israra xwe bi pênaseyên eşqê domand:

-Zivistanê dema ku tu yê tam di bin berfê de biqerise, bikeve xewa mirinê, tam di wê kêliyê, ha di wê kêliya dawî de te ji spîbûna berfê re got xweşik, ev eşq e! Em ê çima bitirsin? Zarokên me çêbibin ji bo ayendeya me jî baş e.

Tersî Mazdek, Xorrem ewqasî pê ne bawer bû. Ji bo wê ewqasî ne rehet bû ji bo vê dinyaya ku pê re têdikoşe zarokekî bîne. Ji ber ku nedixwest Mazdek bêhêvî bike û heta bîne asta ku fikareyên wê fêm dike, ji bo mijara zarokanînê ne got erê ne jî na.

Mijara zarokanînê, zêdebûn û heta cinseltî di navbera herduyan de veguherîbû mijara têkoşîneke veşartî û kûr. Xorrem bi nîqaşa zarokanînê ketibû ferqa vê.

Dem hebûn xeyalên zarokan dikir, lê niha cuda difikirî. Di nav xwe de daxwazên wê yên bûyîna dayik xeyalên wê dixemilandin, lê fikrên wê ew hişyar dikirin û digotin, "na".

Bi saya dermanekî ku Asara ji Gundeşapûrê şandî xwe ji ducanîbûnê diparast. Hevjînê wê jî ev dizanî.

Di baweriya Zerdeşt de jin bi awayekî sûnî biketana pêvajoya adetê (biketa cilan) sûc bû. Di Avestaya dest Sasaniyan de ku piştre guhertine û wisa nivîsîne, li beramberî sûcê çêkirina dermanê ku

ducanîbûnê asteng dike û bikaranînê ji bo jin û mêr herduyan jî cezayê qemçiyan hatibû pêşbînîkirin. Carekê bi hinceteke wisa jinek girtibûn, li pêş çavê gundiyan heta ku cilên li ser wê parçe parçe bibin qemçî kiribûn û tevî ku jin hê di qemçiyê 30'yî de miribû jî heta 40'î temam kiribûn. Zilam ji ber reviyabû ji ceza xelas bibû, lê dema ku tiştên hatine serê jina xwe bihîstibû jî xwe kuştibû. Tirsa wî ne 40 qemçî bûn, ji bo ku li ber çavê gundiyan gûrûra wê neşkê reviyabû. Nefikirîbû ku ev ê li meydana gund werin serê hevjîna wî.

Ji bo ew kesên ku dermanekî wisa peyde dikin jî heman ceza hebû. Her wiha ev guneh li exîretê jî bêyî ceza nedima.

Mazdek ji ber vê sedemê destpêkê bi fikara bû, lê dûvre gotibû ev derman mûcîzeyeke Xwedê ye!

…

Dema dibû şev hewaya vê nahiyeyê diguherî, dibû wekî cemedê. Havîn û zivistan ferq nedikir, ev cihê biçûk ê li binarê çiyê hemû şevan sar bû. Tiştên ku ew germ dikirin "dostên" parazvan û fikrên dewlemend bûn.

Mala wan ji bo wan ji qesrê bi qîmettir bû. Ji bilî betaniyeke hirî ya hinekî stûr tiştekî wisa karibin xwe pê germ bikin tine bû. Bi çend doşekên kevn û yek-du kelûpelan mal ava kiribûn. Ne feqîr bûn, lê her tiştên xwe li nav gelê feqîr parve kiribûn.

Li mala wî cihî, li ser her ocaxeke pêketî, xwarina wan hebû. Piştî ku biryara bihevrebûnê dan û şûn de li vî cihî ketibûn malê, ji bo li hespên wan mêze bikin dildar derketibûn, têkiliya xwe bi cîhana derveyî xwe re heta asta herî kêm anîbûn.

Meh û demsal derbas bûn. Gelê wir hê jî fêm nekiribûn çima ewqasî têkiliyên wan bi derve re qut e, lê ji ber li ba wan bûn pê keyfxweş bûn.

Li vê devera ku her roj dişibin hev, salek fena rojekê bû. Tenê ferqeka ku kelecan dida, keyfxweşiya rojên xweş bû, û di demê komkirina bacê de tirsa tehsîldaran bû. Li gorî dewlemendiya wan ji her kesî bi qasî ji sisiyan yekê bacên giran dihatin komkirin.

Li nahiyeyên jê re "Dehestan" digotin, tehsîldarên dihatin ba rêveberên herêmî xwe dixistin şûna hem Qral hem jî Xwedê û dilê wan çawa dixwest wisa nêz dibûn.

Gelê nahiyeyê jî carina xwe li vê çîleya ku digotin demkî ye, radigirtin û henekê xwe bi cehaleta wan dikirin. Ev jî ji bo roj, meh û salên naguhere, bibû tinaza naguhere.

Xorrem, wê pirsa nerehetî dida ya di mejiyê wê yê zarokatî de mabû bi zimanekî henekî ji Mazdek re pirsî:

-Li şûna ku ji nahiyeyê dest pê bike û cîhanê biguhere, mirov ji qeşmerê qral dest pê bike wê ne baştir be?

-Heger xwe bigihîne qeşmer, erê! Qeşmerek ji qralekî zûtir diguhere, karê wî ev e!

-Ya qral biguhere? Wê çaxê jiyan diguhere?

Mazdek dizanîbû bersiveke yekser a vê pirsê tine ye:

-Heke jiyanên me di dest wî de be, biguhere wê çi bibe neguhere wê çi bibe? Ma diguhere? Erê, dikare biguhere. Di cewher de dibe ku fikrên qralan neguherin, lê dema bê hesabê wî her qral dikare ji ola xwe jî biqere!

-Ya bernede?

-Qralê Romayê dînê xwe guherî, yên cudatir jî guhertin. Qralê Êranşehrê jî dikare biguhere, eger berjewendiyên wî li ser textê be, çima nebe?

-Ya neguhere?

-Wê çaxê lazim e qral bi xwe were guhertin!

Xorrem, cara yekemîn li vir ferq kir ku di bin gotina "bi qral dest pê bikira" de wateya "kuştina qral" heye. Di carekê de ket nav xeyalan. Yên ku wê demê li ser vê mijarê nîqaş dikirin, dibe ku li pey kuştina qral bûn. Qet li vê nefikirîbû. Vê nîqaşê daxwaza Mazdek a çûyîna bajêr dîsa geş kiribû.

Sirên ku dikarîbûn dinya biguhertana di nav nîqaşên demê de xwe di hafizaya wê de bi cih kiribûn. Gotinên mîna, "ti fikir bi tena serê xwe nikare dinyayê biguherin, şer lazim e" bihîstibû. Hewl dida bîne bîra xwe. Li pêş hafizaya wê daxwaza Mazdek a çûyînê hat û eliqî. Di bêdengiya kêliyê de his kirin ku yek li ber deriyê wan e.

Mazdek dikira tiştek bigota, bi destê xwe jê re got hiş û dûvre ji nişkê derî vekir.

Ew û tehsîldarê meraqdar hatin rûyê hev.

Gelo bi dizî li wan guhdarî dikir? Heke qiseyên wan bihîstibe, serê wan wê çaxê ketiye belayê!

Bi qeşmerî got:

-Bi qasî me bihîstiye ji vê malê ji bo qralê qralan ti tevkarî çênebûye.

Ew, ne ew kesên ku li malan digeriyan û bac kom dikirin; wan bac ji rêveberiyên xwecihî digirtin û dibirin ji bo garnîzona sedraptiyê. Xorrem tevî ku ev rewş dizanî jî got:

-Ka bikevin malê, hûn çi dixwazin bigirin û bibin!

Xorrem bi awayekî tinazok mêze dikirê, wî jî ji navbera derî wisa li hundirê mala yekçavî nêrî, lê tiştekî ku karibin bigirin nedît.

Memûrekî akçeyeke di nav destê xwe de avêt ber Xorremê.

-Mêrê te yê tiral heta karekî dibîne hûn ê bi vê îdare bikin. Gotinên milet rast bûne, hûn feqîr in, bêyî ku mêrê te bixebite, ma hûn çawa dijîn?

Mazdek bi hêrs ji cihê xwe rabû, heta ku hat ber derî memûr çûn.

Balaberzê ku akçe avêtibû dema diçû di bin çavan re li Mazdek dinêrî.

Dema ku ew dûr ketin, Xorrem hêdîka Mazdek dehf da hundir û bi ken kete hundir. Akçeya di dest xwe de nîşan kirê.

-Êdî pêwîst nake tu biçî qesrê. Binêre, qesr ji bo me alîkariyê dişîne!

Xorrem, wê rojê fikrên xwe hemû jê re negotin. Bi xwe jî ji fikrên xwe ne bawer bû.

Li gorî nêrîna wê diviyabû Mazdek ji karên olê jî ji qesrê jî dûr bisekine, bi hev re bikevin nav civakê. Ewqas pê re parve kiribû. Helbet wê tiştên din jî li dûv vê bihatana.

Dema ku fikrên xwe di xeyalên xwe de zindî dikir, tirsa ku ji Mazdek dûr bikeve dema dihat bîra wê, wekî girêkekê di qirka wê de dieliqî. Li gel Mazdek bibûn dostên pir baş ên nîqaşê. Nebûna dostekî nîqaşê ji bo Xorremê fikar çêdikirin.

Mazdek jî di çûyîna paytextê de bi biryar xuya dikir.

Biryareke hevpar zor bû. Mazdek dixwest li ser bingehê ku ji berê ve amadekariyên wê dikirin têkoşînê bimeşîne. Xorrem jî bawer nedikir ku ev pir zêde encamê bide, li ser vê jî bi têrkerî nîqaş nekiribûn, amadekariyên pêwîst nekiribûn, lewre jî digot îhtîmala şaşiyan bikin pir zêde ye. Hê diyar nebibû ku wê çi bikin, çawa bikin. Her tişt pir şêlû bû.

Piştî nîqaşa bi rojan, Mazdek ket nav bêdengiyekê. Ruxmî domahiya rojekê hîç neaxivîbû, ji nişkê ve bi helwesteke tûj got ez ê biçim. Xorrem li ser vê gotinê, helwest nîşan da:

-Tu ji nîqaşê direvî! Tu xwe temambûyî his dikî? Reva ji nîqaşê xwe temam hesibandine. Pêşketin, pêşdeçûn sekinandine. Hê me

diyar nekiriye bê em ê çi jî bikin. Ew ê çi bihatana kirin me yê bi hev re bikirana, lê naxwe heta vê derê bûye. Jixwe te biryara xwe daye. Biçe! Ez ê nebim asteng.

Li ser vê dema ku Mazdek got; “ji bo ku em karibin li vê dinyayê cihekî ji bo xwe çêbikin, divê em bi hev re biçin. Ji bo te jî wê ya herî baş ev be” û israra xwe domand, nerazîbûneke qet ne li bendê bû dît:

-Mîna ku te li ser navê xwe biryar daye têra te nake, tu hewl dide li ser navê min jî biryarê bide. Heger tu li vir bimaya me dikarîbû ji bo piştre biryar bi hev re bidana. Roja yekemîn me hevdu dîtibû bavê min ji te re gotibû lazim e tu ji siya qesrê xelas bibî. Nîqaşa li qesrê wê kêrî çi were? Nîqaşa rast li vir e, di nav gel de ye! Ew ê çi were kirin, lazim e bi gel re bê kirin!

Wextê ku Xorremê dît biryara Mazdek neguheriye, mîna ku girêkek ketiye qirikê hewl da daqurtîne:

-Nîqaş tine be, ez jî tine me. Biçe û min jî ji bîr bike.

Diyar bû, ev gotin bêdilê xwe gotibû. Dîsa jî têra birînkirina Mazdek kiribû. Birîndarbûna şêrekî enceq ewqasî bibandor dibû. Bêyî tiştekî bibêje ji malê derket û çû.

Ji ber Mazdek bi serê xwe biryar dabû qehirî bû, lê pirsgirêk esas piştî vê dest pê dikir; xeyalekî wan hebû. Ditirsiya zirar bigihêje vê.

Di vî karî de şaşiyek hebû. Lazim bû wisa nebûya. Armanca wê, domandina vê ortama nîqaşê bû. Hê li nîqaşê têr nebibû. Li gel vê, piştî bûyerên hatin serê Sûremê jî, li gorî fikra wê diviyabû bi tedbîr tevbigeriyana. Esas herî zêde jî ji ber vê sedemê hewl da wî bisekinîne, lê gotinên wê bandoreke ters lê kiribû.

Mazdek çibû. Gelo wê firsendeke telafîkirina vê çêbibûya? Lazim bû negotana “ji bîr bike”, lê bi gotinekê her tişt nediqediya. Mazdek mirovekî zana bû, dizanîbû ev gotin ji bilî nîqaşa wê kêliyê ne xwedî wateyeke cuda bû. Ji ber vê jî Xorremê jî dizanîbû ku telafî milekî hêsan bû. Piştî ku baweriya di navberê de saxlem bûna, dikarîbûn her şaşî telafî bikirana. Gelo wê careke din ew bidîtana? Ha, ev nediyar bû. Vê nediyariyê Xorrem xemgîn dikir û dixist nav fikaran.

Bi gûrûr bû. Fikara xwe tepisand…

**Pençeşêr!**

Mazdek dema fêr bû ku ji bo çûyîna paytextê karwanek amade ye, ev firsend nirxand.

Li cem tehsîldarên ku ji aliyê Garnîzonê wekî erkdar ji bo paytextê dihatin şandin, tevlî nav qefîleyê bû. Piştî derketin rê, memûrekî gotin jê re gotin:

-Way way way, esilzadeyê me yê tiral biryara xebatê daye!

Mazdek bersiv neda. Gut, hêrs û xemgîn bû. Di ser de jî serêşa wî hebû.

Memûr ji bo qeşmeriyê hespa xwe nêzî hespa wî kir.

-Tu yê li cem me were Tîzponê? Tu yê li wir winda bibî. Tu yê nikaribî careke din li jina xwe ya xweşik vegerî.

Mazdek ji bo ku karibe hêrsa xwe hinekî kêm bike, dilê xwe yê şkestî hinekî derman bike bi vî zilamê safik re axivî:

-Begê tehsîldar ê pençeşêr, çav qertel, destpêkê destûrê bidin ku we silav bikim. Dûvre ez ê pirsa we bibersivînim.

Keyfa memûr ji van pesindayînan hat. Bi taybet ji ber ku lepên wî şibandibû lepê şêran û jê re pençeşêr gotibû, dît ku li dora serî wî bilbil digerin. Mazdek domand:

-Niyeta min a vegerê tine ye. Ez ê bang li wê jî bikim.

-Wa, tu wisa dibêjî. Tu yê kar bibînî, bixebitî û wê jî bînî. Çi kar ji destê te tên, tu dikarî çi karî bikî?

-Hin kar ji dest min tên, lê piştî ku ez bi Şahenşahê me Kûbad re axivîm, ez ê biryarê bidim.

-Tu bi çi cesaretê navê qralê me tîne ser zimanê xwe. Tu li kû, qral li kû?

-Niha qralê me bêriya dostê xwe, yanê bêriya min kiriye. Dibe ku dema ez ne li ba wî bûm li wê qesrê ji ber tenêtiyê porqiran pê re çêbibe.

Tehsîldar ecêb aciz bû:

-Tu çawa der heqê qralê me de wisa dipeyive, niha ez ê hedê te fêrî te bikim!

-Zehmet neke Pençeşêr, ez hedê xwe dizanim. Ez niha li cem te dipeyivim, ne li ba qral, ji ber vê ez pir rêzdar diştexilim. Dema ez çûm ba qral bê ez çawa pê re dipeyivim, dixwazî were û bibîne.

Keyfa wî ji navê “Pençeşêr” re hat û di ber xwe de got ev zilam dîn e, ji nav diranên xwe yên ji ber hêrsê kilît bûne, di qirika wî de çiqasî tûk hebû hemû bi hîqehîq pijikand derve.

Enceq dînekî dikarîbû têkildarî qral tinaz bikirana!

-Ma tu yê xwe pir pê re aciz bikî?

-Erê, jixwe ez pir aciz bûme!

-Çima?

-Gelê wî di nav feqîrî û belengaziyê de ye, lê li wê qesrê ew guhdarî gotinên rahîbên durû û fermandarên qeşmer dike, ji ber vê.

Hîqehîqek bi tehsîldar ket. Yekî ne dîn bûya û ev gotin bikirana wê ew ji eyar bikirana.

Bi cesareta ji dîno girtî, wî jî domahiya rê çi xeber hatin ber devê wî, bi tenê bi şeklekî ku Mazdek bibihîse ji bo qral, rahîb, hemû esîlzade, memûrên bacê, ji xwe re, ji hespan, ji rê re gotin.

Piştî her xeberekê jî bi awayekî tewş dibû hirehira wî, ken pê diket. Dema ku ew wisa li pişt karwanê dikeniyan, yên li pêşiyê diçûn jî bêyî ku meseleyê fêm bikin bi wî kenê wan ê dînoke dikeniyan.

Bi saya van kenan Mazdek serêşa xwe ji bîr kiribû.

Dema hatin bajêr, fermandarekî garnîzonê yê ku Mazdek Bamdad nas dikir, wate neda cilên wî yên feqîran û hat pêşiyê silav dayê.

Yên di nav karwanê de bi şaşwazî dinêrîn. Bi refakata fermandar ber bi qesrê ve ketin rê. Karwan jî ketibû pey wan. Ew ê hesab bidana xezîneyê û dûvre jî veqetiyana.

Mazdek, piştî ku li mala kevirî cilên xwe guhertin, hat ba Pençeşêr.

Di nav cilên nû de destpêkê Mazdek nas nekir.

Mazdek ji hevrêyê xwe xwest ku pê re were ba qral. Bi wî re hevpeymanek danî. Ew ê li cem ti kesî behsa jina wî nekirana, Mazdek jî wê behsa xeberên wî nekirana!

Dîsa jî reng û rûçikên zilam zer bûn. Fikirî ku bi guhertina cil û bergan jê re kemîn daniye. Niha ew ê bibin cem qral, hemû xeberên di rê de jê re gotine yek bi yek werin rêzkirin û heke qral lê were rehmê jî wê serê wî bihatana jêkirin.

Tenê bi vê jî karîbûna jê xelas bibûna baş bû, dibe ku qet rehm lê nekiribana û zimanê wî yê xeber dane bihatana jêkirin, dûvre zarokên wî bianiyana, li ber çavên wî êşkence li wan bihatana kirin, dûvre jî hêdî hêdî ji eyar bikirana…

Dema ku xeyalên êşkenceyên cur bi cur dikirin, ji nişkê ve xwe di nav eskerên qerase de li ber deriyê qral dît.

Piştî ku Mazdek ket hundir, di vê pêvajoyê de fikirî wê xwe çawa biavêje ber lingên wî, çawa bexşandinê jê bixwaze.

Mazdek çima xwestibû qala jina wî neke? Heke ew li ser soza xwe bisekine, behsa xeberan neke, wî yê jî ji ti kesî re, heta ji qral re jî behsa mala wî û jina wî nekirana.

Ew kêliya ku di jiyana xwe de xeyalê wê jî nedikir, lê niha li bendê bû, hat. Derî vebû û destekî îşaret dayê û jê xwest bikeve hundir.

Çawa ket hundir, xwe avêt erdê, lingê zilamekî ku fîstanekî reş û dirêj li ser bû maç kir. Zilam bi lingê xwe ew dehf da. Lê, hê serî wî di ber de, bi nefeseke bi zorê ji qirikê derdiket kire miremir:

-Qralê min, qralê min!

Mazdek ji milên wî yên fireh girtin û rakir ser lingan. Di guhê wî yê mezin û bipirç de bi pistepist got:

-Ev efendiyê rêzdar ne qral e, Pêşwazîkar e, wê me bibe cem qral.

Ji mêvanan re hat gotin ka wê li cem qral çi bikin, çawa biaxivin. Yên ku di hizûra qralê qralan de li gorî van rêzikan tevnegeriyana dikarîbû biketana zindanê jî. Mazdek ev hemû bi çendan caran guhdarî kiribûn. Dema ketin hundir, qelebalixa li kêlekê rûniştî ew jî şaşwazî kiribû. Gelo ketibûn nav civînekê?

Qral li ser texta xwe ya bi mucewheran xemilandî rûniştiye, destekî xwe di kêlekê re berdaye û bi gurzê wekî serê gayekî girtiye, bi destê din jî taca xwe ya şemldar a ku serê gayekî jî nikarîbû tijî bikirana û ji jor de bi zincîreke zirav a zêr hatibû daliqandin, hewl dida sererast bike.

Qral ji texta wî ya dûr silav kirin û yek bi yek rêzik pêk anîn.

Pençeşêr cara yekemîn qral ji nêz ve didît. Cara yekemîn hundirê qesrê jî didît. Çokên wî dilerizîn, şelwerê wî yê xeteke sor li kêlekê bû û remza qraliyetê bû, mîna alayekê dihejiya. Her çiqasî serî wî li ber wî jî bû, di binê çav re jî li tombizê qral dinêrî.

Mazdek sebebên hatina xwe got, ji bo ku ji memûrê li ba xwe aniye pirsekê bike û wî bide axaftin, destûr xwest.

-Ji memûrê rêzdar ê qraliyetê rîcayeke me heye. Gelo bi dengekî bilind, ji bo hemû endamên rêzdar ên qraliyetê karibin li vê salonê bibihîzin, hûn dikarin behsa rewşa warên ku hûn lê geriyane û we dîtine bikin?

Hûn, memûrê bacê yê vê qraliyeta esilzade ya parazvanê heft cîhanî ne. Ji we pê ve kî dikare bizane çi dikeve qirika gel û çi ji bêrîka wê derdikeve?

-Ronahiya Ahûra-Mazda, qralê me yê mezin, şahenşahê me bila temendirêj bin, rewşa gel pir baş e, silavê hemûyan heye.

Pevrekenînek çêbû. Piştre bi çend dengê kuxikê bêdeng bûn. Memûr hemû edebên axaftinê yên jê re hatibûn gotin ji bîr kiribû. Çi hatibe bîrê, hinekî jî tevlîhev kir û got. Mazdek ket navberê:

-Kê silav li qralê me kir? Wisa nekin, rastiyê bibêjin.

-Rastî, ez rastiyê dibêjim, rewşa gel baş e.

Dengekî hêdî yê xirîniyê ji qirka qral derket. Nav dilê Memûrê ku ev deng bihîst qetiya, xwe ji nişkê ve deverû avêt erdê.

Qral:

-Rastiyê bêje. Heke ziravê te tine be ku tu karibî rastiyên dikarin te bidin serjêkirin bibêjî, soza min e, ew ê kes destê xwe nede te. Bêje!

-Qralê min, qralê me…

Piştî ewqas hişyariyan jî dîsa ji bîr kiribû, diviyabû ji bo qral bi xwe wekî qral xîtab nekirana, û gelek tiştên din jî her wekî vê ji bîr kiribû.

-Ma te gotinên min nebihîstin?

-Min guhê xwe daye gel ez xulam. Min ew bihîstine. Bi saya efendiyê me dijîn. Nan dikeve mala wan. Xew dikeve çavên wan. Bi saya efendiyê me.

-Cuda?

-Cudatir jî saxî û başiya we ez xulam, qralê me yê gewre.

Dîsa pevkenîn çêbûn, lê vê carê awirên cidî yên qral ew bêdeng kirin.

-Em ji wan kesên ku karên wan û nanên wan tine ne bacê kom nakin ku ji bo dilrehmiya efendiyê me bibînin.

-Wekî van çiqas kes hene?

-Em biçin kû derê, têra xwe yên wisa hene.

-Ser meselê çiqas? Gelo dibe bi qasî nîvê welat be? Baş vebêje, rast bibêje, yan jî tu yê min aciz bikî. Dema encam rastî be edalet jî zirarê nabîne!

-Nîv kêm e ez xulam, ji derveyî esilzadeyan di destê pir kêm kesî de kar û li malê nan heye. Em li her diyarî van kom bikin û li gel hev

rêz bikin, ew ê heta çar aliyê cîhanê, cihên ku qudreta we têrê dike biçin.

Fikirî ku qudreta qral kêm gotiye û li ser zêde kir:

-Li heft aliyên cîhanê!

Dema ku qral Kûbad berê xwe da şêwirmendên xwe, memûr jî derxistin derve.

His û pis ji şêwirmendan dernediket. Meraq dikirin ka Mazdek bi vê xwepêşana bêhurmet xwestiye çi bike?

Qral awirên xwe yên tûj dabû ser wan û riha xwe miz dida. Heta dest bi axaftinê kir, demek dirêj derbas bû. Dengekî biçûk jî ji salonê dernediket. Her kesên dûr-nêz nefesa xwe girtiye, mîna ku dengê bêhna kê derkeve wê hideta qral li ser bûya, çikandina hilma xwe dabûn ber çavên xwe û wekî bistê mabûn.

Qral cara yekem nirxandineke wisa dibihîst. Hem jî ji devê memûrekî ji rêza herî jêr.

Hêrsa xwe tepisand û bi daxwaza wekî zanayan xuya bike, giran giran, gotin bi gotin kirpand, di dawiya her hevokê de sekinî, dawa qeftanê xemrî yê qedîfeyî û biriqokî yê ku li ser cilê spî yê gul neqişkirî li xwe kirî, sererast dikir û diaxivî.

-Me ev text ji bo feqîriya gel danenî, me ji bo pêşketina vî welatî daniye.

Spartekên me yên ev text li serê bilind dibe, mîsogeriya me ya dadê ye.

Ew ê her kes sînorên xwe bizane, lê ew ê gel jî neyê pelçiqandin. Ew ê karê her kesekî, li malê jî nan hebe. Hekena, wê ronahiya xwedê me biterikîne, dawiya me tarîtiyeke bêdawî be.

-Ji ber vê ez vegeriyam başê başan, mezinê me yê rêzdar ê ku ronahiya Xwedê hildigre.

Ji ber ku Mazdek bêyî destûr axivîbû, di nav salonê de bilebilek çêbû. Bi saya vê bilebilê dema her kesî firsend nirxand û nefesa xwe berda, li salonê bayek çêbû.

Di nav rahîban de her çiqasî mîna Mazdek çendek kes hebûn ku Gata jiberkî dizanîbûn jî, lê mîna wî yê ku bizanin her gotina wê di kîjan beşê de ye û di kêliyê de bibêjin, der barê olên berê de xwedî agahiyek berfireh bin, tine bû.

Mazdek dema diaxivî serî li Gatayan dida, feqet ev wekî mecbûriyetekê dihesiband. Fikra xwe ya esasî jî heta dema wê

nehatana wê negotana. Wî jî mîna Manî başên di her dînî de dijmartin.

Li gorî wî êdî edalet bi vê ola hatiye xerakirin pêk nedihat. Şerê ronahî-tarîtiyê li her derê wisa hatibû belovajîkirin ku nakokiyên di nav civakê de jî xwe spartibû vê û hatibû normalîzekirin.

Li beramberî vê çepandina tirsnak, Mazdek ketibû ser rêyeke cuda. "Şer li her derê bû, ji bilî Xwedê!"

Ev fikir nû bû û dumendiya xwedayî red dikir. Xwedayê ronahî û tarîtiyê tine ye, tenê Xwedayê Ronahiyê heye, Xwedê ronî ye, ya din bozorgan û ruhanî bi xwe ne, ruhekî tarî û xerabûyî ye.

Bi van fikrên nû civak ronî dikir, li qesrê jî qalibên ola kevn bi kar tanî.

Dema ku Mazdek dît qral nerehet nabe, guhê xwe neda himehiman û dewam kir. Tiştê tenê fêm nekiribû ew bû ku çawa ji nişkê ve ewqasî dengê nefesê çêbibû.

-Ji ber ew kesên ku îdareya welat xera dikin, ne adil e ku li ber çavê Xwedê navê mezinê me were xerakirin.

Li vê salonê her kesên ku mîna min dikarin sebra guhdarkirina evîndarekî olê û mirovî nîşan bidin dizanin ku qudreta Qralê me ji ber edaleta Xweda Ahûra-Mazda ye. Li gorî di pirtûka pîroz Avestayê de hatiye nivîsandin, li welatê bêdad ronahiya olê nabiriqe. Wisa biçe dawiya me tarîtî ye.

-Pêwîst e çi bikim, bibêje!

-Hûn çi pêwîst dike, jixwe dikin mezinê me yê rêzdar, yên di xizmeta we de bi qisûr em in.

Ya ku naveroka ola me vala dike, çavbirçîtî ye ku xakên Mala Pîroz ne ji bo edaletê, lê ji bo şatafatê bi kar tîne. Dengekî dibêje, "Ev ne ol e, ev ne ol e; ji bo parastina ola xwe rabe!" her şevê min ji xewa min şiyar dike.

Heger qanûnên dinyayê bikevin destê esilzadeyan wê çaxê cihê olê çi ye?

Heke qanûnên olî bibin qanûnên berjewendiyên takekesî wê çaxê qanûn li kû dimîne? Lazim e em ewil ew kesên ku dînê me diçepînin bînin ser rê.

Himehimên li salonê veguherîn dengên bilind ên devavêtinan. Bi îşareta serşêwirmend her kes bêdeng bû.

Qral fêm kiribû ku bê Mazdek dixwaze çi bibêje.

Tenê got, “Vegere ser wezîfeya xwe û ola me ji zaniyariyên xwe yên mezin bêpar nehêle.” Nîqaş qedand û xwest muzîkjen werin.

Bêyî şahîniya bi muzîk nikarîbû şevê birazê.

Mazdek jî heyranê muzîkjenên hosta bû, lê piştî van nîqaşan nikarîbû zêdetir li wir bimaya. Dema derket, gotinên ku qral bi bêdengî gotin, ji lêvên wî xwendin: “Min bi tenê nehêle!”

Halbûkî qral di wê kêliyê de tiştek negotibû.

Mazdek, Pençeşêrê ku ji baxçeyê qesrê derbasî xazîneyê û ji wir jî derbasî ba memûran bibû dît, spasiyên xwe anî ziman. Dema veqetiyan jî destê wî girt û wisa çû.

Memûr, ji ber ku fêm kir yê destê wî girtiye yekî ji dil e, keyfxweş bû. Ji dema ku ji ba qral veqetiyabû li gel xwe digot ew ê ber bi kîjan diyarê dûr bireve, lê niha his kir ku li payeyek bilind a qesrê dostekî wî heye û dilrehet bû. Dema ber bi warê xwe ve kete rê jî di xeyalê xwe de sekna wêrek a ku Mazdek li beramberî qral nîşan daye zindî kir. Dilê wî jî bi cesaretê tijî bû. Bi heyecana ku wê biçe ji malbat û hevalên xwe re behsa qiseyên xwe yên li ba qral bike, hespê xwe da bezê.

Mazdek jî dema bi tenê ma, li gel xwe digot, “gelo min destpêkeke pir zû kir?” Ji bo ku bersivek rehet bide, got, “her hal Xwedê wisa xwest” û fikareyên di serê xwe de avêt milekî. Dîsa jî wextê ku diçû mala xwe ya berê ya kevirî, li gel xwe digot:

-Her tişt di dema xwe de digihêje encama xwe; mêweya xam bê ronî ye, beriya madê, dil û zêhnê xerab dike.”

Ne ji guhertina fikrên qral Kûbad, lê ji sûdgirtina qral a hesabên siyasî emîn bû.

Di warê guhertina fikrên wî de jî pir neyênî nedifikirî. Ji bo vê jî baweriya xwe bi başî û hêviya di nava her zindiyekî de tanî.

Di şeva yekemîn a vegerê de bi hevjîna xwe ya hêja, hevrêya xwe Xorremê fikirî. Dema ku xeyalê wê dikir û gotinên wê yên dawî di nav xwe de dubare dikir, dilinî bû. Ne ji ber tirsa serneketinê, lê ji ber ku ev gotin ji Xorremê bihîstibû careke din dilê wî êşiya û ji çavên wî rondik herikîn, ket xewê.

Ka ew ê cihêbûna wan çiqasî dewam bikira, wê qedera welat ev diyar bikira.

**Li Perestgehê Zîleke Nelirê!**

**Çi tiştên bêhna dinê didin**
**Diêşîne**
**Nexeyide, dixwazim tu bizanî.**

Feqîrî, sefalet çiqasî zêde dibû, qûralên olî jî ewqasî zêde dibûn, berpirsiyariyên wê ewqasî giran dibûn.

Mazdek, di nav malbateke oldar de mezin bibû û di nav de qûralên dînî nerm bûn. Dema ji wir derbasî nav perestgehê bibû simbêlê wî hê nû xwê didan. Tevî ku hewl da bi nêzîkatiyên xwe yên nelirê ji roja yekemîn ve balê nekşîne ser xwe jî hêna roj nebibû şev di nav sedan şagirtî de navê wî dihate gotin.

Ji rojan sor bû, ango Yekşem. Roja tavê bû. Ji bo wan rengê herî germ sor bû. Roja herî germ, roja ku jiyanê dest pê dikir.

Di teqwîma Zerdeşt de tenê roja 11'emîn a her mehekê roja tavê bû. Lê wan bi demê re her roja Yekşemê ya her hefteyê wekî roja tavê bi bîr anîbûn.

Wê roja, henekeke di nav şagirtan de wê bibûya wesîleya hevrêtiyeke saxlem. Hê ne mimkun bû vê bizanin.

Mîna ku li her kesên nû hatî dikirin, wê henekek bi şagirtê nû jî bikirana, ew biçûk bixistana û keyfxweş bibûna.

Ji şagirtan yê temen herî temen mezin, wê ebayê mamosteyên Mûbed li xwe bikira û biketa nav rolekê.

Bang li yê nû hatî kir.

-Dema tu hatî vê derê, te her tiştên aîdî dinyayê li pey xwe hişt?

-Min hişt.

-Heke te hiştibe, ew cilên li ser te çi ne?

-Cilên aîdî vir hebin, demildest diguherim ez xulam.

-Helbet tu yê biguherî, hem jî niha. Cilên xwe ji ber bike, bila biçin bişewitînin, ew qirêjiyên te yên dawî. Piştî wê em ê yê nû bidin te.

Mazdek şaşomaşo bibû, li dora xwe dinêrî. Şagirt çarmêrkî bi şeklekî du rêzan li ser erdê rûniştibûn. Mîna pûtên ku hezaran salan qet nekeniyane disekinîn.

Yekî bi birhên xwe, çav û serê xwe îşaret dayê, jê re îma dikir ku çi tê gotin bike. Yekî din di guhê wî de got eger neke wê ji bo wî ne baş be.

-Heger tu yê ji xwe nekî, derkeve biçe! Û bizane, tu derkeve, tu yê careke din ji bo vî mekanê pîroz neyê qebûlkirin.

Mazdek tengav bibû, ji eniyê dilop bi dilop xwêdan diketin çavên wî û dişewitandin. Cilên xwe danîn û li ber xwe girtin. Laqên xwe bi hev vekirin, xwest cirifandina çokên xwe veşêre.

Sê parçe cilên xwe ji bo şewitandinê da kurikekî keçel. Di wê kêliyê de bû qiyamet, her kesî dest bi ken kir.

Dema ku fêm kir çi hatiye serî, cilên wî danê. Li xwe nekir!

-Zû li xwe bike, niha dengê biçe Nevîllî, ew ê jî were vir, te wisa bibîne te xwariye.

Ma Nevîllî kî bû? Mazdek nikarîbû di bin vê biçûkxistinê de bimaya! Li ber nekir. Cirifandina wî jî derbas bû.

Dema derî vebû, mîna ku Deryasor vebibû, bi şeklê du rêzan li herdu milan vebûn. Mazdek şûtîtazî li meydanê ma.

Mîna ku li ser wî ji qûmaşên Hind cilên forsdar hene, wisa serê wî tîk, singa wî li derve, kêmekî xwe zivirandiye kêlekê, herdu destên wî li pişt wî, mîna ku poz dida nîgar disekinî.

Ji nişkê ve çavê Nevîllî ji hêrsan sor bû.

-Ev çi ye! Kê ev dîn aniye vir? Hûn hemû çawa li vir rûniştine û temaşeyî vî dikin? Kanî cilên vî?

-Cilên li pişt min, qirêjiyên dawî yên ku min ji dinyayê anîbûn, ji wan xelas bûm, diviyabû bên şewitandin, mamoste wisa got.

Nevîllî pirsî, rewş fêm kir, li ber çavê her kesî cezayekî bi îbret da ew ê ku rola mamoste kiriye.

Ji Mazdek xwest cilên xwe li ber bike. Ji bo mamoste jî got xwe tazî bike û heta dema xewê jî li ber derî şipiya bisekine. Dema li ber derî disekine jî hemû duayên dizane bibêje, yan na wê cezayê Xwedê mezintir be.

Ceza teqez bû, ne mimkun bû nehatana pêkanîn. Îtîrazê dikarîbû bi qewitandina ji perestgehê encam bidana. Qewitandin jî dihat maneya careke din derneketina nav civakê, li her derê wekî gunehkarekî jiyanê, ji koleyan jî xerabtir bûyînê.

Dema ku Nevîllî çû, Mazdek ji mamosteyê sexte xwest cilên xwe li xwe bike. Bang li her kesî kir:

-Bila di nav me de bimîne!

Ne mimkun bû di nav wan de bimîne. Roja din serê sibê Nevîllî pê hesiya ku ceza pêk nehatiye û yê bûye sebeba wê jî ew kurikê nû hatî ye.

Mazdek piştî wê rojê her tim ji wî kurikê lîstokvan re got “mamoste”.

Nevîllî çend rojekê bêdeng ma. Vê bêdengiyê her kes ditirsand, lê ji ber ku Mazdek nizanîbû wê çi bibe, rehet bû û tevî dizanî yê ew ispiyon kiriye di nav wan de ye jî, qet nekir xem û bêyî îstîsna bû hevalê her kesî. Pir kêşîner bû, dikarîbû her kes li dora xwe kom bikirana, zanebûna wî, henekên wî, nêzîkatiya wî ya roja yekemîn a wêrek û hevaltiya wî ya bi mamoste re têra vê kiribû.

Nevîllî nikarîbû vê nêzîkatiya ku zirarê dide otorîteya wî efû bikirana. Diviyabû herdu jî ji perestgehê werin avêtin. Feqet ji ber ku dizanî Mazdek kurê kê ye, ji Sermûbed xwest ku çareyekê ji bo vî karî bibîne.

Oldarekî mîna Nevîllî durist jî di nav nîzameke wisa de ku cudakarî asayî bibû, dikarîbû ser meseleyê bigire.

Çare hat dîtin. Herdu jî bûn berpirsê paqijiya avdestxaneyên perestgehê.

…

Nevîllî dema ku ew roj tanîn bîra xwe aciz nedibû. Heta li beramberî baweriya wî ya pak li gorî rahîbên îro rêz jî digirt. Gelek tişt jê fêr bibû. Derbaskirina gûrûra xwe ya takekesî û nefsa xwe deyndarê wî bû.

Heta wê rojê terbiyekirina nefsê di ser her tiştî re didît. Lê bi saya Nevîllî fêr bû ku ev tenê pêla yekemîn e. Veguherînên ruhî û zêhnî zortir bibûn.

Bi saya vê îradeya wî xurt bibû, mejiyê wî mîna mêşan zehî dida. Ewqas ji bo perestgehekê zêde bû. Beriya Manî, şagirtekî wisa ne hatibû dîtin ne jî bihîstin.

Ji nîzama şahenşan heta rahîban, ji sîstema perwerdeya perestgehê heta mesafeya mezin a di nava tebeqeyên civakî de ti tiştekî ku lê nepirsiyabû nehiştibû.

Rahîb çi bandora dixwestin dikarîbûn li dihkanan bikirana û li beramberî qral hevsengî ava dikirin. Ma kê dikarîbû ev hevsengî xera bikirana?

Mazdek Bamdad, dînê roja yekemîn ê perestgehê bû. Piştî perwerdeyê jî di nava rahîban de mertebeya xwe ya dînîtiyê parastibû. Nelirê bû! Tevî vê jî bibû yek ji mezinên koma Mûbedan.

…

Piştî îdamên li Gundeşapûrê ruhanî danîn pêşberî xwe. Li her derê digot ew sextekar in, durû ne, ji bilî berjewendiyên xwe li tiştekî din nafikirin, olê xerab dikin û ev jî di nav gel de bi sempatiyeke mezin dihate pêşwazîkirin.

Wêrek bû, di gotina rastiyan de mîna serê hesin ê rimekê vekirî bû. Lê çi bikira jî nikarîbû guhertina vê nîzamê bidîta. Qiseyên wî mirov nedixistin nav liv û tevgerê, tenê hinekî dilê wan rehet dikir.

Gotinên wî bi qasî ku bikarîbû her kêliyê serê wî li ser bikin rast û xeter bûn. Feqet çiqasî rast jî bûna dilê wî bi xwe jî rehet nedibû. Diviyabû rêyeke din hebûya. Di pirsa "Çawa" de eliqîbû mabû. Lavayên demekê yên ku Zerdeşt ji Xwedê re kiribûn hatin bîrê. Pirtûka xwe derxist û xwend:

"Kam nemôi zam kuthrâ nemôi ayeni
pairi xvaêtêuş airyamanascâ dadaitî
nôit mâ xşnâuş yâ verezênâ hêcâ
naêdâ dahyêuş yôi sâstârô dregvantô
kathâ twâ Mazda xşaoşâi Ahurâ"

(Divê ez birevim kîjan welatî? Ji bo birevim divê berê xwe bidim kû derê? Wan ez ji malbat û klanê qewitandime. Ne civaka ku ez endamê wê me, ne jî rêveberên derewkar ên welat bi min bawer kirin. Te çawa bidim bawerkirin Ahûra Mazda?)

Piştî vê, fikirî ku li hevrêya xwe ya herî zêde bi wî bawer dikir, neheqî kiriye. Lêgerîna hêviyê dewam dikir, ew jî difikirî ku bê neheqiyeke çawa li Xorremê kiriye. Dibe ku herduyan jî neheqî li hev kiribûn. Encama gihiştibûyê ev bû, lê dîsa jî xwe sûcdar his dikir. Di ser de jî fikirî ku dema li ba wê bû xurttir bû. Bi saya nîqaşên wê aqil û dilê wî mezin dibû, lê niha mîna ku li cihê xwe dijmart.

Di nav van fikran de ji mamosteyê ku hevalê wî yê yekemîn ê li perestgehê bû, rîcayek kir. Diyar kir ku dixwaze ji mafên xwe yên xezîne û xakên perestgehê sûdê wergire û miqtarek alîkariyê ji bo Xorremê bişîne û vê jî enceq dikare bi saya wî bike.

Mamoste, wekî çawa hevalê xwe neşkand, her wiha dixwest Xorremê jî nas bike. Emanetên li qorika hespê kirî heta dawiya emrê Xorremê jî têrê dikirê.

Çaxê ku Mazdek hevalê xwe bi rê kir, şîreta xwe jî lê kêm nekir:

-Li xwe miqate be, dema em ji hev veqetiyan, bi gotinên xwe yên tûj dikira serê min bifirandana! Ji bîr neke, destpêkê helbesteke xweş diyarî wê bike!

Çûn û hatina bajarokê ku Xorrem lê bû, hema hema nêzî hefteyekê wext xwar. Destpêkê agahiyên ku li ser rê ji dostan girtiye ragihand.

Ji bo Mazdek neqehere, jê re behsa halê Xorremê yê zeîfbûyî nekir. Lê diyar bû, ji îrade û sekna wê pir bandor bibû.

Hinekî li ser jî zêde kir û got di warê fîzîkî de jî pir baş xuya dike.

Mazdek gotinên Xorremê pir meraq dikirin, bi dil û can guhdar dikir. Gelo dilmayîbûna wê dewam dikir?

Mamoste got, ti dilsarbûneke wê tine ye, li beramberî wî xwedî hezkirin û rêzdariyeke mezin e. Bi rêbaza xwe ya şaîrane wisa fêm kiribû. Mamoste, wekî çawa hosteyê wêjeyeke dînî ya bi navê "Mezdîsna" bû, her wiha helbestvanekî navdar jî bû. Ji derveyî wî di nav Farsan de bi rehetî ji kesî re nedigotin helbestvan. Têkildarî helbesta Farisî, tenê navê yek-du kesî di nav qesrê de dihate gotin. Ji ber ku xwedî his û hestên kûr ên dikarin bibin serafê merivan bû, eleqedariya wî ya helbestê jî li pêş bû. Gêrçî wî tersê vê îdîa dikir, digot; "Ji helbestvanekî çêtir ti kes nikare razên di dil de bizane."

Ji bo ew kesên ku xweziya xwe bi helbetvanan tanîn jî bersiva wî hebû: "Heke wextê ji dayik bû ne helbestvan be, piştre nikare bibe! Êşên ku wê bikşîne nahêle bibe helbestvan!"

Têkildarî vê mijarê hemû tiştên tanî ziman tenê ev bû. Helbest çi ye, jê kê re helbestvan tê gotin, pir zêde bi pirsên mîna van re mijûl nedibû, li şûna wan helbestên xwe digotin. Di her helbestê de her çiqasî der barê pêşerojê de fikrên xwe tanî ziman jî, lê teqez der heqê mirovan de nediket nav darazan.

Bi saya helbestvanî û tecrûbeyên xwe, rastiya li pey hal û hareketên mirovan ji her kesî baştir his dikir. Jê re pir zêde zehmet

nebibû, fêm kiribû dilê Xorrem nemaye, berevajî bi hesrata Mazdek bûye.

Di mijara pere û alavan de jî Xorremê nêzîkatiyeke bi rûmet a ku Mazdek şermî dike, raber kiribû.

Hemû pere û alav red kiribûn, gotibû heger bixwaze dikare van li gel belav bike, lê ew bi xwe nêzîkatiyeke wisa xweş nabîne, pêwîstiya wê ne bi maddiyatê, lê bi dostaniyê heye.

Xorremê dema rewşa Mazdek pirsîbû, Mamoste bi helbestekê bersiv dabû.

Wê jî diyariyên maddî hemû red kirin û vê helbestê wekî diyariya herduyan qebûl kiribû. Li wir, di nav gel de bextewer bû. Jê re gotibû li vir çandeke piştevaniya civakî ya ku bi dinyayan nade pêş ketiye û ev jî bi saya jinan serxistine.

Mazdek her hûrgilî pê da dubarekirin. Herî dawî jî ji keyfa serê mamoste maç kir. Li helbesta gotî pirsî. Mamoste got; “helbest qebûl kir, diyariyên te şûnde vegerand; divê meriv li firtoneya helwestê binêre, ne selameta helbestê”.

Piştî vê bûyerê, cara yekemîn Mazdek li şûna pirsa “çawa”, pirsa “çima” pirsî. Bi rojan bi tena serê xwe ma û fikirî.

Çavkaniyeke mezin a hemû xerabiyan hebû. Ev çi bû? Çavkaniya çavbirçîtiyê, çavnebarî, bê evînî, feqîrî, saxtetiya ketiye nav olê…

Diviyabû ev sebeb ji bilî hestê mirov ê “xwedanbûnê” pê ve ne tiştekî din bûya. Yê dida keyfxweş dibû, lê yê her tim digirt, xerabî jî li hev kom dikir. Ji ber vê yekê ruhên wan tarî bûn.

Ji bo tarîtiyê kêmbûn-zêdebûn ferq nake, bikeve kîjan ruhî, heta bi dest nexe dest jê bernade. Hestê milkiyetê jî wisa ye, bi kêmekî dest pê dike, lê bi demê re tarîtî zêde dibe.

Dewlemendan nedidan, lê digirtin. Heger qralek hebûya ku karîbûya mal-milkên wan ji dest wan bigire û li feqîran belav bike, dibe ku nîzam biguheriya.

Lê, ti carî wê qralekî wisa çênebûya. Wê çaxê lazim bû çare ne li qesrê, di nav civakê de bûya. Xorrem mafdar bû.

Ji hedefa xwe ya guhertina fikrên rêveberên qesrê neqeriya, lê gihişt wê encamê ku divê di têkiliyên xwe yên qesrê de bi pîvantir û bi mesafe bibe.

Ji her demê zêdetir nêzî fikrên Xorremê yên derbarê civakê de bibû.

Diviyabû destpêkê mirov biketana rê, fikrên nû bipejirandana. Wisa jî wê bêterîqet nemana.

Piştre jî rêwiyên vê rêyê fêr dibin bê bi kîjan şeklî dijîn, li gel roniya Xwedayî çawa têkiliyê datînin; çawa nêzî zindiyan, heywanan, nebatan dibin; li cem mirovên din çawa pêwendiyê datînin; ango rêzikên jiyanê fêr dibin.

Fêrbûnên ji vê jiyanê di zêhn û jiyana kes de her tim rê li ber guhertinan vedike. Xwe ji hemû ruhên tarî yên mîna çavbirçîtî, çavnebarî, ezezîtiyê pak dike. Fêr dibe ku wekhevî, xwişktî-biratî, hezkirin, parvekirin marîfetê herî mezin e.

Û herî dawî jî bi hisên xwe yên hundirîn digihêje têrbûna Manî'vî, ango heqîqetê.

Mazdek, Manî bi rêzdariyeke mezin bi bîr anî; xweşiktî, pakbûn, paqijî, kerameta di ruhê mirov de wekî "hêza Manî'vî" bi nav kir.

Li beramberî dinya maddî, raseriya dinyaya manewî bi navê Manî bi nav kiribû û wisa jî hurmeta xwe ya mezin û pêşengbûna wî danîbû ortê.

Di encam de got ku rizgarî di ronîbûna civakê de ye; bi saya vê wê karibin serî bi nexweşiya milkiyeta taybet derkevin.

Civak, ji bo jiyana hevpar ne xerîb bû. Dema serî li dijî rejîma koletiyê rakirana jî wê birçî nemana.

Dema ku xakên aîdî gel ji destê zorbeyên bihatana derxistin û bihatana çandin, ew ê feqîrî jî ji nav rûpelên dîrokê rabûya.

Feqet ev mijar jî mîna parastina wekheviya jin-mêr, mijareke zor û hesas bû. Yên jê bandor bibûn jî ji ber milkiyeta taybet tijî pirsgirêkên wan hebûn.

Dema ku li ser tinekirina milkiyeta taybet dihizirî, cara yekemîn xwe pir bi tenê his kir.

## Xewn!

Li derdora wî çend kesên wekî Xorrem hebûn ku karibin nîmetên dinyayê bidin milekî û di her mijarê de destekê bidin wî?

Got, “Pir kêm, pir pir kêm!”

Vê tenêtiyê ew tirsand.

Wextê ku li mala xwe ya kevirî radiza, xewnek dît. Kevirên ew xaniyê ku bi destê xwe çêkirî, yek bi yek ji cihê xwe dipengizîn, dema diketin erdê jî ji keviran xwîn diherikîn.

Dema kevirek radikir û bi cih dikir, yekî din diket, ev ketin leztir bû û êdî nikarîbû pê re bigihişta.

Kevir kom bûn, xwîna ji keviran herikî kom bû, heta gihişt çoka wî pê li keviran kir û ji nav wê gola xwînê derket.

Her çiqasî bi nefeseke rehet şiyar bibe jî ji ber serêşa xwe bi zorê çavên xwe vekirin.

Hê bi ser xwe ve nehatibû, dîsa jî demildest çû ba hevalê xwe yê mamoste û jê re vegot. Mamoste got ev peyameke pîroz a xwedayî ye.

Piştî vê xewnê, Mazdek got êdî wextê min ê ketina nav liv û tevgerê hatiye.

Şevê dîsa heman xewn dît. Vê carê ferqek hebû, dema ji gola xwînê derdiket, kevir jî li pey wî hatin. Her ku ew pêşde diçû, xwîna ji keviran diherikî jî sekinî. Kevir hemû ji nav gola xwînê derketin û hatin ber lingê wî kom bûn.

Wisa his kir ku heger dostekî ku karibe pê re nêrînên xwe parve bike nebîne, ew ê di nav gola xwînê de bifetise. Bêyî bisekine, dîsa vegeriya cem mamoste. Şîroveya xewna wî kirin, dûvdirêj nîqaş kirin.

Mamoste fêm kir ku ew fikrên wî heta wê rojê qet nehatine ziman, ango fikrên nû ne. Guhdar kir, her ku guhdar kir jî his kir ku ji dil girêdayî Mazdek dibe, tiştên guhdar kirî di dilê xwe de neqş kir û herî dawî gotê ew wekî pêxemberan e:

-Tu yê avahiyekê hilweşînî û avahiyeke din lê bikî!

-Hilweşandin û avakirin!

-Erê, tu yê hilweşînî û ava bikî. Ango tu yê vê nîzamê biguherînî! Mizginiya vê jî Xwedê dide!

-Dibe ku avakirin û guhertin lazim be! Tu çi dibêjî?

-Dema hilweşandin pêwîst bû, tu yê hilweşînî, lazim e tu jê nerevî. Yê ku ev di xewna te de ji bo te got Xwedayê me ye. Tu ji bo vî karî hatiye hilbijartin!

Dostekî baş ê Mazdek çêbibû. Wê rojê jî bibûn hevrê.

Bi wê rehetiya samimiyetê û heyecana fikrên nû, Mamoste gote Mazdek biçe ba Xorremê.

Mazdek li dij derneket. Gotê ew bi xwe dereng jî maye.

Di xewna xwe de dîtibû lazim e avakar be. Diviyabû ewil ji xwe dest pê bikirana.

Bi kelecaneke mezin bi rê ket. Heçkû bi fikrên xwe wê derkeve pêşberî milyonan kesî diçû ba Xorremê. Ji bo tepisandina kelecana xwe çend caran rêya xwe dirêj kir.

Çaxê ku hazir his kir jî, li heman cihê ku ji Xorrem veqetiyabû, li heman malê hevdu dîtin. Xweşikbûna vê hevdîtinê enceq helbestvanekî mîna dostê wî mamoste dikarîbû vegotana, lê ew jî li wir ne hazir bû.

Piştî ku hinekî berîkirinên xwe derman kirin, dûvdirêj behsa serpêhatiyan kirin. Beramber hevdu efû kirin.

Xewna xwe ji Xorrem re got. Xorrem ji xewnê zêdetir bi fikran re eleqedar dibû.

Demek bû, ew û xeyalên xwe, fikrên xwe mabûn. Niha hevrêyekî ku karibe pê re nîqaş bike li cem wê bû.

Şevê, dema Mazdek dixewiya, Xorrem jî ji şibakeya malê mêzeyî stêrkan dikir. Piştî demekê, di nav xwe de dest bi axaftinê kir. Ne diyar bû ka bi Xwedê re, bi stêrkan re, bi xwe re dipeyive.

Wextê tariya herî zêde ew wext bû ku herî zêde stêrk hebûn û herî zêde dibiriqîn. Mîna ku destê xwe dirêj bikira wê li stêrkan bikeve, yan stêrk nêzî wê bibûn yan jî ew derketibû asîmanan.

Dema di nav stêrkan de digeriya, got gelo çima heta niha ji hev ewqasî cihê mane. Layiqî vê çi hebû? Got, “neheqî ye!”

Li vê mala gundê çiyê, di “tenêtiya xwe” de têkildarî pergala gerdûnê pir fikirîbû, çavên wê ronî bibûn.

Carina fikiriye ku neheqî li Mazdek kiriye, carina jî ew pir xemsar dîtiye. Çûbû û venegeriyabû! Demek dirêj di nav van nakokiyan de mabû.

Herî dawî fêm kiribû ku ev pirsgirêka wan a têkiliyê ya ku li beramberî fikrên mezin û armancên mezin ketinê, ne tiştekî wisa ji rêzê ye.

Dibe ku li beramberî hêrseke kêliyê nikarîne bi xwe! Dibe ku ti tiştekî di kêliyekê de tine be. Ev rewş têkildarî tinebûna bersiva kêliyê bû. Encameke wisa jê derxistibû ku heke ji ber asta zêhniyeta civakî û pirsgirêkên girêdayî vê, têkiliya xwe wekî pirsgirêka du kesan bigire dest wê şaş be. Ruhê demê ev pêwîst dikir.

Bêyî ku ruhê demê were fêmkirin, bersivdana kêliyê ne mimkun e. Dema gihişt vê qeneetê, dilsoziya xwe ya armancê xistibû ber lêpirsînê, fêm kiribû mirovekî xwedî îdîayeke mezin nabe wisa bijî.

Dibe ku destpêkeke şaş kiribin. Heger karîbûna bi têrkerî nîqaş bikirana, dibe karîbûna cudahiyên xwe yên fikrî jî hel bikirana. Wisa nebibû. Sedema vê jî dibe ku ezezîtiya wan be. Her çiqasî nikarîbûna ji van fikrên di serê xwe de xelas bibûna jî, ji ber ku ji bo destpêkeke nû firsend çêbibû, keyfxweş dibû.

Ji bo karibe pirsgirêka vê têkiliyê bi rêkûpêk pênase bike pir mijûl bû, lê tam nizanîbû wê li kû derê îdealên mezin bi cih bike. Di encam de şaş bû û rewşeke hêja tine bû ku bi vî şeklê bi pirsgirêk bidomînin.

Mijar, ne tenê pirsgirêka têkiliya di navbera herduyan de bû; li holê pirsgirêkên dêwasa yên civakî hebûn. Nikarîbû ev ji hev cuda bikirana. Pirsgirêkê bi du kesî re dest pê nedikir û bi du kesan jî nediqediya. Heta gihiştibû vê encamê jî çend tayên spî ketibûn serê wê.

Ji nîqaşên Mazdek zêdetir ji civakê fêr bibû.

Dema ku his kir, fêrbûnên wê yên ji komeke biçûk bedelî hemû zaniyariyên cîhanê ne, biryar dabû ku li wir heta têrê bike bimîne û ji wir veneqete. Niha jî dixwest vê ezmûna xwe bi komên mezintir re parve bike. Biryar da ku li ba Mazdek biçe.

Êdî, çi li wir bima çi jî li gundê xwe bima, wê ti ferqa wê tine bûya. Halbûkî gundê xwe derbas kiribû, diyarê xwe derbas kiribû, heta têkiliya xwe ya du kesî jî derbas kiribû, ketibû nav rêwîtiyeke gerdûnî.

Cewherê gerdûnê ya ku di komekê de dîtibû, eger karîbûya di hemû koman de derxistana ortê, wê çaxê ti împaratorî nikarîbû bi wan. Xwest bi van fikran zemanê bixe nav kefa destê xwe.

Piştî vê wê her kêlî pir bi qîmet bûna.

Heger li cihekî bimaya û bidîta her tişt xwe dubare dike, ti hêzê wê nikarîbûna ew li wê derê bigirtana.

Biryarên xwe ji nişkê ve nedigirt. Zeman, firsend didayê ku fikrên xwe kamil bike. Niha Mazdek jî li wir bû, wê karîbana bi hev re biryar bigirtana. Ew ê careke din ji hev veneqetiyana. Di navbera wan de hevrêtiyeke têkoşînê ya pir hişk û nahejê dest pê dikir. Ev, bi xurtî his dikir.

Xewna Mazdek bibû rastî! Ji ber ku wê li ba Xorremê biketana ser rê, xwe wekî di xewnê de his dikir. Keyfxweşiya wî ji her halê wî diyar bû. Mîna zarokan şadiya xwe diyar dikir. Nikarîbû li cihê xwe bisekiniya, mîna perperokan baskên xwe dibir û tanî. Çaxa ku Xorremê gotê bêriya vî halê wî yê sempatîk kiriye, keyfxweşiya wî zêdetir bû.

Beriya ku ji wir veqetin, li nav nahiyeyê geriyan û xwestin her kes heqê xwe helal bike. Li gorî wan, gelek tiştên xwe deyndarî wî gelî bûn. Heta ku ji nav wan kesên ku rondikên çavan dirijandin veqetiyan, zehmetî kişandin. Piştî derketin ser rê jî demeke dirêj nikarîbûn gotinekê ji hev re bikin.

Wextê gihiştin ba mamoste ber bi êvarî bû. Tevî Xorrem bûn mêvanên wî.

Mamoste, ji ber ku di Mazdek de guhertin çêbibû, keyfxweş bû. Mîna ku mizgîniya guhertina cîhanê ye, herdu jî pîroz kir. Ji bo wan helbesteke nû got.

Piştî hatina Xorremê, têkildarî wekheviya jin-mêr, mamoste qederek tiştên din fêr bû. Ji bo ku dixwest fêrbûnên xwe ji heval û hogirên xwe re bêje, nema dikarî li cihê xwe bisekine. Pir zêdê xwe negirt. Bêyî destûra wan, li sûkê-bazarê, mehelê, li gund li her devera ku gel lê ye, fikrên nû vegotin.

Fikrên nû ji çîrokên gerê yên mamoste jî zûtir berbelav bûn. Xeyalê, “hilweşandin û avakirinê” jiyaneke nû da dilê pelçiqandî yê gel. Zindîbûna civakê ewqas lez pêş ketibû ku Mazdek bi xwe jî şaşwaz bibû.

Halbûkî fikrê Mazdek ne “hilweşandin û dûvre avakirin” bû. Wî tenê hewl dida sedemên ku dibin sebeba rejîma xerab sererast bike, dixwest kevirên belave li cihê xwe rûnên. Helbet ev jî ne karekî rehet bû. Dest ji hilweşandina avahiyê berde, behsa guhertina wê kirin bi serê xwe jî dikarîbû bibûya sebeba kuştinê.

Hêna Mazdek fikrên xwe yên têkildarî siberojê bi giştî rave nekiribû, lê peyama guhertinê di nav civakê de belav bû.

Dostê wî yê mamoste, mîna şagirtekî rola xwe lîstibû. Her ku mamoste gotina di Avestayê de ya dibêje, “wê yekî ji mirovekî baş jî baştir were û rizgariyê pêk bîne!” bi bîr dixist, piraniya mirovan digotin Mirovê Pîroz, Mazdek bi xwe ye.

Gel ket nav kelecana rizgariyê. Nêrînên Mazdek wekî rêgezên rizgariyê li ser zimanan geriyan:

-Xakên çandiniyê, malê hevpar ê her kesî ye.

-Mirov wekhev in.

-Ji niha û şûn de em ê nebin koleyên Dihkanên xwînmij.

-Em ê wekî koleyan di xizmeta ruhaniyan de nexebitin.

-Em ê xizmeta ola xwe bikin, ne xizmeta esilzadeyan.

-Em ê bibin yek, li dij derkevin.

Di mijara dijderketinê de wêrek bibûn, lê wê çawa bibûya, nizanîbûn.

Bi hêviyê hatibûn rapêçan.

Gotina herî zêde dihat dubarekirin jî ev bû: “Wê yekî ji mirovekî baş jî baştir were û rizgariyê pêk bîne!”

Di demeke kurt de sohbetên berfireh ên ku Mazdek bi xwe yekser bi koman re kiriye, belav bûn.

-Em ji ronahiyê hatine, em ber bi ronahiyê ve diçin, em ê bi ronahiya xwedê re bibin yek. Ronahiya xwedê her mirov wekhev kiriye.

-Di ola me de kuştina mirovan tine ye. Ronahiya Ahûra-Mazda li gel her zindiyî heye. Yê ku mirovekî bikuje, ronahiya wî, ango xwedê bi xwe dikuje.

-Li ba heywanan jî ronahiya pîroz heye. Lazim e heywan neyên kuştin. Divê goştên wan neyên xwarin.

-Lazim e her kes bixebite. Xak pir camêr e, dikare her kesî têr bike. Pêwîst e zirar negihêje xakê, pir zêde tehde lê neyê kirin.

-Jin-mêr wekhev in.

-Şaş e zêdetirî jinekê jin were anîn.

Fikir li rêyekê digeriyan ku bibin çalakî. Ronahiyê her kes radipêça.

Fikrên nû yên ku di demên tarî de ronahiyê belav dikin, mîna aşûtê mezin dibin û bi lez belav dibin.

Herî dawî dev û civatên gel ên li gundan jî guherîbû.

Keçên ciwan ên li ser kaniyê kom dibûn, cara yekemîn wekheviya jin û zilam dipeyivîn.

Ava kaniyê cara yekemîn bû şahid ku ciwanên li serê li dora helbestên evînê kom dibûn, qiseyên siyasî dikin. Û geştir herikî.

Mizgîniya ku dibêje, “wê yekî ji mirovekî baş jî baştir were û rizgariyê pêk bîne!” pêk hatibû. Mazdek hatibû! Gel pê bawer bibû.

## Mala Hevpar a Gel: Hemeganî

Li beramberî çîna serwer, ku piştî hemû piç û pariyên berxwedana mirovan qedandin jî ji bo ku karibin çokê lê bişkînin serî li dek û dolabên nedîtî didin, hewl didin ruhê wan teslîm bigirin û bikin koleyên xwe yên sernerm, fikrê “wekheviyê” çawa ku hêviyek ava kir, her wiha bi xwe re cureyekî nû yê wêrekiyê jî anîbû. Gundiyan cara yekemîn bêyî ji dihkanan bipirsin, destûra wan bigirin, dest bi kar kiribûn, di nav xwe de nîqaş dikirin û bi serê xwe biryara xwe didan.

Mazdek û Xorremê xwe di nav deryayeke nû ya hêviyê de dîtibûn. Ev derya, deryayeke wisa bû ku ew diparastin, deryayeke bêdawî ya gel bû!

Mazdek, dema ji bo armancên xwe karibû qesr bi kar bianiya li qesrê dima. Êdî ev jê re dibû tehdeya herî mezin. Dîsa jî ji bo armancê xwe li vê zehmetiyê radigirt.

Çaxa vedigeriya nava gel ew kêliyên eziyetê hemû vediguherîn keyfxweşiyê. Ew û Xorrem li maleke deştê bi cih bibûn, lê li wir sabît nedisekinîn, li gelek gundan diketin nava gel, li bax, baxçe, zevî, di nava jiyanê de ew rêxistin dikirin, perwerde dikirin û hewl didan kesayetên azad, kesayetên bi fikrên nû gurçûpêçkirî ava bikin. Di nav van xebatan de carina rastî esilzadeyan û awirên wan ên gefxwar jî dihatin, lê dîsa jî durûtiya wan, destpençe mêzekirina wan û rûntêdana wan bi nefret temaşe dikirin.

Samimiyeta gel jî li cem wan keyfxweşiyeke bêterîf ava dikir, dihişt ku bi asoyekî nû li ayendeya xwe binêrin.

Dihesibandin ku li ber destê gundiyan ti nirxekî komkirî yê maddî nemaye, lê dema ku malên gel ên hevpar li gundan ava dikirin, bûn şahid ku hin malên jiyanî yên ku gundiyan ji axe û rahîban veşartîne derdikevin ortê. Ev nirxên maddî giştî, ji bo bikaranîna hevpar a gel dihatin pêşkêşkirin, dibe ku bi qasî mezextineke rojane ya li mala begekî jî tine bûya, lê xwedî nirxekî pir bilind ê manewî bû. Êdî malên hevpar ên gel hebûn, jê re “hegemanî” digotin, pêwîstiya kê hebûya ji vir sûd werdigirt û jê jî girîntir piştevaniya manewî ya gel bi saya vê mala hevpar pêş diket. Bûyereke ji vê mezintir nedibû. Leza berbelavbûna vê bûyerê jî pir zêde bû, di

demeke pir kurt de li her aliyê welat hatibû bihîstin û hewldanên bi terzên hevşib dest pê kiribûn.

Ev malên hevpar ên ku li gundan gel bi dil û can diparastin, ji bo Mazdek û Xorremê jî firsend ava dikir ku karibin gel bi awayekî komî perwerde bikin.

Di perwerdeyekê de wextê herdu jî li ba hev bûn, Mazdek gotibû "dinya, mala hevpar a hemû mirovan e", lê Xorrem ketibû navê, gotibû, "ne ya hemû mirovan, ya hemû zindiyan e" û sererast kiribû. Ev bûyer di nava gel de bi pirolekirinên cur bi cur belav bû. Wisa lê hatibû ku carekê Mazdek bi vî şeklî bihîstibû: "Xorrem ji Mazdek re gotiye ku eger tu hebûnên din ên xizmeta mirovan dike li milekî bihêle, ez jî dikarim te berdim!" Wekî çawa li beramberî vê meselê ecêb mabû, di nav xwe de keyfa wî jî dihat. Teqdîra gel her tim ji bo fikrên mezintir bû!

Li heman gundê ku ev bûyer lê belav bibû, hat nîqaşkirin ku fikrên nû bi xwe oleke nû ye yan na. Bawerî bi ola berê nemabû. "Ji bilî zilmê ma me çi dît ku em li pey rahîban biçin. Ya ku Mazdek aniye ola nû ye û di oxira vê olê de em amade ne ku canê xwe bidin!" Ev gotin li ser zimanan geriya, gihişt gund û bajaran.

Her çiqasî berteka perestgehê nediyar bû jî dîsa jî dihkan ketibûn nav liv û tevgerê. Hêj tirsa xwe neanîbûn ser ziman, lê dîsa jî bi qasî ku karibe wan bixe nava liv û tevgerê mezin bibû.

Yekîneyek eskerî ya di bin emrê dihkanan de avêtin ser gundê deştê yê ku Xorrem û Mazdek ava kiribûn û mala yekemîn a hevpar a gel lê bû.

Ruxmî ku hêna tîrêjên rojê nû diket ser gund, lê her kes li ser piyan bûn. Embar hatibûn paqijkirin, êm û av dabûn mirîşk û dîkan, şivanan keriyên xwe derxistibûn derveyî gund, cotkar çibûn zeviyan.

Beriya tav derkeve, dîsa wekî her tim hemû gundî çûbûn ser karên xwe. Ji ber vê yekê dema ku esker hatin jî ew li meydana gund pêşwazî kirin. Yên çûbûn ser zevî û baxçeyan jî bi lez û bez hatin û xwe gihandinê.

Wekî amûrê parastinê jî çi ketibû destê wan hilgirtibûn û bi xwe re anîbûn. Di dest hinan de das, di dest hinên din de bivir hebû. Yên rahiştibûn bêr, termox, daran jî hebûn. Li pêşiya hemûyan Serwer û hevjîna wî Ferîha sekinîbûn. Di hembêza jinê de pitika wê hebû.

Tevî nîşaneya feqîriyê, cilên gundiyan ên pînekirî jî, hinarokên wan sorik bû.

Siwaran heta xwe gihandin ber wan jî, ji bo ku gundiyan bitirsînin û belav bikin, hespên xwe radikirin pêdarê, çep-rast ajotin, lê bêfeyde bû, yek kesî jî ji cihê xwe nelîst. Esker ecêb mabûn. Berê çawa yek-du ji wan didîtin, vî miletî xwe li quncikan vedişart, çi bibû ji wan? Çawa dikarîbûn biwêrin? Ev cesaret ji kû û kê girtibûn? Di ser de jî heta ji wan dihat qîr dikirin, xeber ji axe û began re digotin. Cîgirê fermandarê yekîneyê ev wekî zêdegavî dît, dest avêt şûrê xwe û kişand. Dengê şûrê pola yê sar li hewayê olan da, wê demê hemû deng, qîrewîr sekinîn. Di heman demê de Ferîha pêsîra xwe derxist û şîr da pitika xwe. Zaroka dest bi girî kiribû, bêdeng bû.

Eskerên ku vê nêzîkatiya Ferîhayê dîtin, matmayî bûn. Hesp jî mîna ku bibûn peykerên ji kevir. Teyrê li asîman wekî qerisîbû. Ji bilî dengê hilma hespan, tenê dengê mirçemirça devê pitikê dihat. Dema ku jinê serê xwe ji ber xwe rakir, çavê wê yê sor ê berevajî rûyê wê yê henûn dîtin. Dema ku cîgirê fermandar şûrê xwe spart gepên Serwer jî, jinê mîna ku tiştek nebûye mijandina pitika xwe domand. Li meydanên şer jî cesareteke wisa mezin nedîtibûn.

Ferîha li pêş qelebalixê ji her kesî dirêjtir xuya dikir, lê di esas de ne wisa bû, wisa li eskeran hatibû. Mîna heyveke şevê bû. Pitika xwe ya bi pêsîra xwe ya spîbozî dimêtand, danîbû ser milê xwe yê çepê. Darê qalin ê ku spartibû çîpê xwe, xwe kêmekî xwar kir û bi destê xwe yê rastê girt. Fermandarê yekîneyê fêm kir ku ev darê serê wî fireh, şûnikekî cilan e. Bi dara ku ev şûnik jê çêdibin, mertal jî dihatin çêkirin. Li beramberî derbên şûr jî qeyîm bûn.

Cîgirê wî dixwest bi şûrê xwe gundiyan parçe bike, lê çavê fermandar çibû ser Ferîhayê. Ferîha, mîna abîdeyeke dêwasa li ber çavan mezin bibû. Xwe xist şûna pitika ku bi îşteheke mezin pêsîra dayika xwe dimêje. Ji bo ku ji şîr qut bibe gundiyan çi lêdan lê kiribûn. Bi xwe jî gundiyek bû. Beriya bibe esker tenê bi çend salekî berê jî şîrê dayika xwe dimêt. Li ser rê, zevî, li meydana gund li kû dilê wî biçûbayê, xwe diavêt pêsîra dayika xwe. Bîranînên fermandar di ber çavan re derbas bûn û Ferîha xist şûna dayika xwe. Ew wisa di nav xeyalan de kûr çûbû, ji piştê hespek bi lez û bez nêz bûye, eskerê li serê bi dengekî ku gundî nebihîzin jê re got gundiyên li gundên derdor jî mîna yên li vir çi dîtibin xistine destên xwe û bi bez hatine wir. Fermandar hespa xwe ajot ser girikekî li piştê. Bi çavê xwe jî dît ji çar aliyan ve qelebalixên mezin bi lez û bez ber bi wan ve tê.

Bendewariya tiştekî wisa nekiribû. Ji bo ku rê li ber bûyerên encamên wê nehesabkirî veneke, plana xwe ya tirsandina gel îptal kir.

Emrê vekişandinê da eskerên xwe. Cîgirê wî dema ku şûrê xwe ji gepa Serwer kişand, xwîn jê hat.

Serwer yekî navsere bû û rûspiyekî gel bû; her kesî wekî "bavê gel" xîtabî wî dikir û nûnerê yekemîn ê mala hevpar bû. Ji bilî çend dilop xwîna ji gepa wî ket, pozê ti kesekî jî xwîn nebû.

Ev xweparastina gel dihkan dîn kiribûn. Ketin nav dek û dolabên ku karibin qesrê bixin bin zextê.

Mazdek jî dema dît ku fikrên wî li her derê bi lez û bez belav dibe û li gelek deveran rê li ber hewayeke îsyanê vedike, ji bo bizavdarkirina qral ket ser rê.

**Li Qesrê Şerê Fikrî!**

Di nav qesrê de çeliqandineke mezin hebû. Bi rojan li perestgehê nîqaşên germ çêdibûn û agirê van nîqaşan li qesrê jî diteyisî.

Her kesî fikrên qral meraq dikir.

Ji bo ku Mazdek neçe cem wî, serî li gelek derewan dan, lê dîsa jî nikarîbûn ew asteng bikirana.

Kûbad gotê têkildarî mijarê lazim e li pêş çavê her kesî nîqaşan bike. Li odeya text lê, li ba giregiran kom bûn û ewil pirsa xwe ji Mazdek kir:

-Te oleke nû îlan kir, çi diqewime? Dibêjin ew ê gel rabe ser piyan!

-Gel rabûye îsyanê, lê ne ji ber min e. Yên sûcdar li vir in, li vir wezîfeya xwe ya şêwirmendiyê nakin, li tinebûna edaletê mêze dikin, li cem vê jî erka xwe ya olî nakin, ne aliyê gelê bindest, lê aliyê neheqan digirin.

Ji bo mijara ola nû jî, mezinê me yê rêzdar, ronahiya Xwedê ji ser welat kêm nekin!

Na! Gotinên min ji bilî vegera li cewhera ola me pê ve ne tiştekî din e.

-Çi ye ev cewher, ya ku te her digot, ol nebe amûrê karên dewletê ye?

-Bila ronahiya Xwedê her tim li ser we be, mezinê me yê ronîdar, destûra we hebe, tişta ku ji her demê cudatir çi ye, ez ê bêjim.

Qral li şêwirmendên xwe mêze kir. Hemûyan meraq dikir. Hinekan jî hesab dikirin ku wê çawa karibin Mazdek tengav bikin.

Dema ku Mazdek destûr girt, got:

-Ji xuliqandinê ve pergala gerdûn û civakê li ser esasê wekhevî, aştî û hezkirinê hatiye avakirin.

Xwedê hêz daye mirovan, lê hin kes hene ku ji bo vê wekheviyê xera bikin vê bi kar tînin.

Derew xistine şûna rastiyên olî û di bin barên giran ên olî de gel kirine kole. Bi qasî ku mirovan ji melekeyên wan ên muhakemeyê dûr bixînin jî pelçiqandine. Ji ber vê yekê pergal xera bûye.

Heger mirov serî ranakin, ne ku ji ber ji vê nîzamê dilxweş in, ji ber ku fen û fûtên hatine serê wan fêm nakin, serî ranakin.

Eger ji bo xwe Seriyekî bibînin, wê çaxê wê bi coş tevlî vê jiyanê bibin. Ha wê demê jî ew ê her tişt biguhere.

Ev gotin ji şûr jî tûjtir bûn, ji bo hinên li wir jî ji mirinê xerabtir bûn.

Sexteyê herî pêş ê ruhaniyan jî li wir amade bû. Destûr xwest û pirsa ku têra îdama Mazdek bike pirsî:

-Eger ji xwe re "serekî" bibînin, Mazdek Bamdad dibêje, Vasteryoşanê ku tenê ji bo Xwedê, perestgehên wî yên ronî û xakên wî yên biadan xizmetê bike hatiye erkdarkirin wê îsyan bike?

Kirpandina "serî" bi îma got. Mîna ku bibêje, "ew serê îsyankar ne tu bi xwe bî?"

Mazdek dizanîbû nikare bi rehetî ji nav vî karî derkeve. Zaniyariya xwe ya dînî da axaftin. Di baweriya wî ya dînî de wekheviya mirovan hebû. Bêyî wekheviyê kevneşopiya civakê, exlaq û îradeya wê nikarîbû bihatana parastin. Nêrînên xwe yên dînî ya ku tiştên kevn û nû xerman kiribû, rave kir:

-Ez behsa hêza Xwedê dikim, ya ku dibêjim Serî jî ronahiya Xwedê ye. Ronahî me hemûyan ronî dike. Eger di nav tarîtiya maddeyê de winda nabe, ji ber ku hêza ronahiyê ji ya madeyê mezintir e. Ew, di heman demê de hilgirê roniyê, di her kesî de dijî; hêza mirovî jî ji vir tê. Ronahiya bêdawî ya Xwedê rûyê erdê bi başiyan tijî kiriye, lê mirovê ku madde li gel xwe kom kiriye bûye çavkaniya xerabiyan. Enceq Seriyekî adil dikare ronahiya Xwedê hilgire û pêşengiyê ji mirovan re bike.

Qral wer fêm kir ku li vir behsa wî tê kirin û ji van gotinan keyfxweş bû. Ji Mazdek xwest ku hemû fikrên xwe eşkere bibêje.

Mazdek mîna ku nîqaşên ol û hebûnê yên ji mêj ve hatine jibîrkirin bi bîr dixe, heta destpêka mijarê çû û axaftina xwe domand:

-Hewa, av, agir û xak heyvanê gerdûnê ne. Xwedê bi van ve hebûn afirand.

Xweda pergaleke vê gerdûnê çêkir. Xebitîna gerdûnê bi 4 Seriyan pêk anî. Hêza ku li her Seriyekî bar kiriye, hêzeke wî bi xwe bû. Her seriyek wisa jî bi hêzeke Xwedayî rabû û dest bi rêvebirina gerdûnê kir.

Hemû gerdûn bi saya 4 marîfetên pîroz û mezin ên Xwedayî tên birêvebirin. Ev hêzên Ahûra-Mazda ne û ev 4 Seriyên ku ronahiya wî hildigirin jî hemû seriyên din araste dikin.

Çi ne ev hêz?

Niha tiştên ez ê bêjim dikare her kesî şaşwaz bike, lê bila ti kes nebêje min, ev gotin di nav pirtûka pîroz Avestayê de tine ye.

Mazdek bi gotinên wisa jî îhtiyada xwe paşguh nedikir. Ruxmî ku cewherê baş ê olî ji her kesî zêdetir diparast jî lê niha ji bo bi dijberiya olî nehatana sûcdarkirin, li ser devê kêrê dimeşiya.

Şîroveyên xwe domandin:

-Ji van 4 hêzan a yekemîn, MOBAD e, ango daraz e, Serê darêzger e.

Tewsiyeyê dide me ku em bi çavkorî bi tiştekî ve bawer nekin, bikaribin başî-xerabiyê ji hev cuda bikin, li dijî şaşiyê li ber xwe bidin.

Ya duyemîn, HERBAD e, ango fêmkirin, Serê li ser rêya fêmkirinê ye. Bidarizîne û fêm bike! Fêmkirin baş e. Pênasekirina baş û xerabiyê ye, kifşkirina başiyê ye.

Gotinên têkildarî fêmkirinê hinekî ruhaniyên sexte hejandin. Ew wisa fêr bibûn ku her kes li beramberî jiberkirinên wan serê xwe bitewînin. Ji bo fêmkirinê jî hêza şîroveyê lazim bû. Ev jî dikarîbû bibe sebeba lêpirsîna li otorîteya wan. Ji ber ku Mazdek di ferqa vê de bû pir zêde li ser vê mijarê nesekinî. Tenê bi bîr xist.

-Ya sêyemîn, SERPAHHAD e, ango Serê Pêşeng e, fermandar e. Bidarizîne, fêm bike û wekî çawa tu ew tiştên fêmkirî diparêze, bi îradeya xwe jî bixe meriyetê!

Dema ku Mazdek ev got, berxwedana gundê ku mala yekemîn a hevpar lê ava kiriye anî bîra xwe û pêwîstî pê dît ku kirpandineke taybet ji bo îradeya gelê xizan bike:

-Li dijî nîzameke ku gel neparêze, gel ji bo xwe li rêyên xweparastinê digere! Ma kî dikare bibêje ev îrade ne îradeyeke Xwedayî ye?

Mazdek her ku dipeyivî tonê dengê wî jî bilind dibû. Herî dawî dema hat ser hêza dawî ya Xwedayî, coşa wî gihiştibû lûtkeyê:

-Ya çaremîn, RAMÎŞGAR e, ango Serê Coşê ye. Hûn vî navî li stranbêj û muzîkjenan jî dikin, lê hûn maneya wê nizanin; şadî, coş, moral û nirxên civakî yên di çavkaniya van de vedibêje.

Bidarizîne, fêm bike, biparêze û bi coş bixe meriyetê. Piştî van hemûyan tu dikarî xwe bigihîne sirê jiyanê!

Ev hemû çi vedibêjin? Xweda ev hêz ji bo ku mirov hevdu bipelçiqînin çênekiriye.

Hûn qebûl bikin jî nekin jî her baweriyek xwedî beramberiyeke civakî ye. Hêzên Xwedayî nîşanî me didin ku lazim e em çawa jiyana xwe araste bikin. Ev rêgezên me yên jiyanî ne.

Lazim e girêdayî van em carekê serî bidin serê hev û hêzên xwe yên rêvebirina jiyanê pênase bikin; van jî em dikarin wekî parvekirina hêzên Xwedayî bibînin.

Min behsa çar seriyan kir. We hemûyan bihîst. Ev hêzên Xwedayî ne. Di bin van hêzan de jî hêz hene. Ew jî Xwedayî ne û jiyana hemû mirovan eleqedar dike.

Di bin venêrîna 4 Seriyên min behskirî de 7 Seriyên din hene. Di bin venêrîna 7 Seriyan de jî 12 Serî hene.

Hemû ji bo parastina pîroziya jiyanê dixebitin. Yek ji wan jî zirardayîna mirovan, heywanan, nebatan napejirîne. Ev kar wisa pêş dikevin û edalet pêk tê.

Ji bo van hêzên ku pergala Xwedê diparêzin, kî dikare bibêje ne adil e?

Baş e, îcar me çi kir?

Em ji edaletê dûr ketin. Her seriyek, seriyên pîroz ji bîr dike û hewl dide xwe têr bike. Em vê bibînin û li cewhera ola xwe vegerin.

Ev gotin ne li gorî feraseta Zerdeştî ya xerabûyî bû. Sînorên olê bi rêzikên pir tûj û hişk hatibûn diyarkirin. Lê Mazdek şîrove dikir. Nikarîbûn li beramberî vê bêdeng bimînin. Lê yek jî newêrîbû li gel Mazdek bikeve nav nîqaşeke olî. Berê di nav xwe de nîqaş meşandibûn û ji vir jî rewş dizanîn.

Wextê ku Mazdek gotinên xwe diqedand, serşêwirmendê qral ket dewrê.

Şêwirmend Lîrîda, dijminê herî har ê Mazdek bû. Wî jî baş dizanîbû ku nikarîbû bi nîqaşa olî zora Mazdek bibe. Ji bo ku li ser kevçika dilê Mazdek bixe, mijara mal û jinan avêt ortê:

-Me bihîst ku Mazdek Bamdad dibêje her cure dewlemendî, xak, milkê dihkanan, jin, çi li dinyayê hebin, malê hevpar ê her kesî ye. Têkiliya van û ola me çawa datîne û me li derveyî dîn dihesibîne?

Mazdek, mebesta zilam fêm kir. Pirs ne ji bo fêmkirina tiştekî bû, ji bo ku karîbûya di serê guhdaran de darazekê ava bike hatibû pirsîn.

Mazdek, dema ku gotina “derveyî olê” bihîst, xeteriya meseleyê his kir. Ji ber ku her kesî dikarîbû li ser mijara jinê êrîş bike, di vê derbarê de kurt bersiv da.

-Jin û mêr, heman ronahiya Xwedê hilgirtine. Wekhev in. Li malê, zevî, li her derê…

Dema ku gotina “li her derê” kirpand, ev dihat maneya meydanxwestina ji her kesên wir.

Di nav civatê de dengê mirqandinê bilind bû. Jin, di siyasetê de hîç cihê xwe tine bû, wekî siya zilamên ku dewlet bi rê ve dibirin jî nedihatin hesibandin, tenê xizmetkarên zilaman bûn, lê ev gotinên ji bo wan hatibû gotin hêrsa her kesên wir rakir. Hinek derketin û gotin kufriyan dike, hinekan jî bi pozbilindî fitrata jinê bi bîr xistin. Gotinên herî giran jî ji devê yê herî kal derketin:

-Dema jin dimirin naçin ba roniyê û wekî mirovekî din venagerin dinyayê, wekî heywan vedigerin, ji ber ku ruhên wan tine ye. Tu çawa dikarî zilamê ku ronahiya Xwedê hilgirtî û jina bê ruh wekî hev bigire dest?

Li ser van gotinan, Mazdek keysa xwe ya bersivdayînê dît û bi tonekî destnîşankirî û terzekî hişyarker got:

-Bila hurmeta we ji bo jina ku em anîne dinyayê hebe, efendîno. Ronahî ji welidandinê tê, ji jinê tê.

Ronahiya wê tine be, ruhê wê tine be, çawa dibe ku di zilam de ronî çêdibe, ruh çêdibe? Em ruhên xwe deyndarê jinan e! Yên ku wekî xwe nêzî jinan nebin ruhên xwe winda kirine!

We di kîjan qanûna Xwedê de xwendiye ku ruhê jinê tine ye? We li kû bihîstiye? We çawa baweriya xwe bi derewên wisa anîne? Çi heqê we heye, hûn jinê dixin rewşeke ji ya heywanan jî xerabtir?

Zilam nikarin ne jinê ne jî ruhê jinê terîf bikin. Em dikarin ji bo darekê bibêjin dar e, lê ji bo jinê, jin bi xwe dikare terîf bike.

Her wiha, kê gotibe jin mîna malan hevpar in jî derew kiriye. Ya ku jin û zarokan dixe şûna malan feraseta we ye. Ez dibêjim ku divê pirjinî nebe, lazim e jin bi îradeya xwe biryar bide, zarok jî di bin venêrîna wê de bin. We jî hin derew bihîstine û dibêjin ku ez dixwazim jinan mîna malan hevpar bikim. Ma hûn nizanin ev derew e? Wisa bibûya, ma min dikarîbû bigotana zilamek tenê dikare bi jinekê re bizewice, nikare mîna malan gelek jinan bigire ba xwe?

Hûn pir nizanin, dibe ku we ji bîr jî kiribe, lê Qulingên Spî yên pîroz jî yekjinî-yekmêrî (monogam) ne.

Çima zilam ji bo heq dibînin ku gelek jinan bikin hevjînên xwe? Ma hûn dikarin bibêjin di Avestaya pîroz de tiştekî wisa heye?

Ez li vir cewherê ola me diparêzim, lê hûn hatine ji min re bêbextiyên ku we li çep-rast guhê xwe dayiyê dibêjin. Ev çawa biratiya olî ye, baweriyeke çawa ye?

Ez dibêjim ku em xwe ji derewan biparêzin, guhê xwe li bêbextiyan bigirin, bila nefsa me nekeve pêşiya me, ji devê me gotinên xerab dernekevin, hekena, rojek were wê ji ber derewan roniya Xwedê ji nava me derkeve û biçe, heta dawiyê jî em ê mehkûmî tarîtiyê bimînin.

Yên ku ev gotin wekî tehdîd fêm kirin, rabûn ser piyan.

Wekî ku wê di nav lehiya hêrsê de bifetisiyana. Ne li porên xwe yên spî ne jî li qesra lê ne mêze kirin, kulm û xeberên xwe dan hev. Heke qral neketana dewrê, ew ê dawiya meselê xerab bûya. Got:

-Yên li vir hatine gotin ne emrê Xwedê ne. Helbet, Mazdek bi niyeteke pak fikrên xwe anîn ziman.

Mazdek got:

-Emrê Xwedê ye!

Qral şaşomaşo bû. Wî dixwest ortamê nerm bike, lê dijderketina gotinên wî, hem jî li pêşberî hemû şêwirmend, ruhanî, fermandarên wî, nikarîbû bihatana efûkirin.

Mazdek qet ranewestiya û domand:

-Ez dibêjim emrê Xwedê ye, emrê ola me ye, hilgirê ronahiya mezin! Bi destûra we dixwazim ji her kesî bipirsim:

Kesî ji we Avesta nexwendiye heye? Ez nabêjim, ev di Avestayê de dinivîsin. Her kes wekhev e!

Lîrîda bi hêrs ket dewrê:

-Niha tu rabûye dibêje, mezinê mezinan, qralê qralên, efendiyê me yê mezin û koleyek wekî hev in?

Her çiqasî qral ji vê pirsa şêwirmend Lîrîda nerehet bibe jî ji Mazdek xwest bibersivîne:

-Erê! Pêxemberan xwe ji koleyan cudatir nedîtine, kole azad kirine.

Ez dibêjim her kes wekhev e, nabêjim eynî ne. Her kes ronahiya xwedê hildigire, lê her kes ne eynî ye.

Careke din bi bîr dixim ku ez dibêjim her kes wekî hev in, nabêjim her kes eynî ne. Eger rave bikim:

Behreyek min heye, yê te deh behreyên te hene, dibe ku deh qat hêza te jî hebe, lê ev nayê wê maneyê ku heqê te heye tu min bipelçiqîne.

Di ser de jî heger deh devê ocaxekê hebin, ya din sê devê wê hebin, herdu jî nabin heman tişt. Kî çiqas pêwîstiya xwe pê hebe lazim e karibe ewqasî bi dest bixe.

Pêwîst e mirov muhtacî hev nebin, ti kes li ser ti kesekî din serdestiyê neke. Lazim e her kes wekî hev bin. Ez vê dibêjim.

Ma ji bilî parçeyekî penîr çi yê Zerdeşt hebû?

Mazdek ji bo zora qral neçe gotinên xwe bi pirseke ku pesnê wî dide qedand:

-Li mertebeya pêxemberiyê edalet heye. Li şûna qralekî ku li vir ji bo ev qesr û text li ser edaletê were avakirin hewl dide, fitnekarên ku ji bilî xwîn û nefretê behsa tiştekî din nakin dikare bibe tercîha me?

Qral, ji ber ku bi pêxemberan hate qiyaskirin nerm bibû, lê nizanîbû wê dawiya vê nîqaşê biçe kû derê.

Ji Mazdek xwest bi kurtî daxwazên xwe bîne ziman. Lê Mazdek got mijarên zor nikarin bi raveyên kurt werin îzahkirin û ji bo serbest biaxive careke din destûr xwest.

Dema destûr girt, vê carê vekirîtir û wêrektir peyivî:

-Bi qanûnên xwe gelê xizan biparêzin. Zêdehiyên ku bi neheqiyê hatine bidestxistin ji bo her kesî wê bibin bar. Dema ku mirov ji dewlemend bigire û bide ew ên ku tiştekî wan tine ye, dewlemend wê ji birçîna nemire. Di tiştên neheq de ronî tine ye. Ruhê kesên ku naxwazin wan ji destê xwe derxînin jî bêronî ye.

Ew in ku pergala adil xera dikin.

Ji bo wan ya girîng ne ar e, lê kar e. Nîzameke ku xizmeta bêaran dike, nabe pergala Ronahiya Xwedê.

Em ola xwe bidomînin, îbadetên xwe bikin, lê ne ji bo berjewendiyên hinan!

Gel, bi kedeke mezin rizqekî derdixîne, em nehêlin mezinên ol û xakê di bin navê bacê de kom bikin.

Em nehêlin ku êdî gel bêyî beramber xizmeta wan bike. Ev koletî ye. Koletî, înkara edaleta xwedayî ye. Em, ew ên ku dînê me dikin amûrê bincilkirina bêariyê kifş bikin.

Di serî de ji bo min, em hemû îmtiyazên oldaran rakin. Xizmeta ji bo civakê, xizmeta ji bo Xwedê ye. Em ji wan kesên ku xizmeta civakê nakin, hemû rayeyan bistînin.

Mazdek, careke din diyar kir ku jin û mêr wekhev in û wisa dawî li qiseyên xwe anî.

Dema axaftina wî qediya, bêhn lê çikiyabû. Wekî ku ew ê gaveke din serê wî bihatana jêkirin, dar ji binî ve birîbû.

Dema ku qral fêm kir ew ê ortam germtir bibe, emrekî ku kesek ne li bendê bû da:

-Mazdek Bamdad, dostekî me yê rêzdar e, di nav mezinên me yên olî de yekî li pêş e. Ne dijminê me ye.

Yê dost wekî dijmin nebînin.

Tiştên ku bawer dike û diparêze, her çiqasî ne li gorî kesên vir be jî, tenê fikr in. Fikrek nikare civakê rake raperînê. Netirsin! Bihêlin, bila li her derê wekî dixwaze fikrên xwe eşkere bike!

Şêwirmendan dizanîbûn ku qral şaş e, lê tîr ji kevanê derketibû.

Qral, wê kîna ku li pişt çavên bi hêrs disekinî, baş nas dikir. Ji bo ku wan nerm bike, cara dawiyê axivî:

-Hûn dizanin esas lazim e hûn ji çi bitirsin? Tirsa we ya esas lazim e dûrketina ji dîn be, dûrketina ji edaletê be. Divê em ji wan barên me li ser pişta gel kirine bitirsin ku dikarin di bin xwe de bieciqînin.

Ha, ji van bitirsin! Ji neheqiyên dikarin bibin sedema îsyanê bitirsin!

Ji vê çend îsyan dikare derkeve, çend kes dikare serê xwe jê xelas bike, diyar nabe. Ji ber vê yekê, guhê xwe bidin Mazdek Bamdad. Hûn ê qîma xwe bi çi bînin, bi îsyana gel yan jî bi bawerî û fikrên dostê me Mazdek Bamdad?

Piştî axaftinê destên xwe li hev xistin û cemeet belav kir.

Serê Mazdek dikira ji ber êşê biteqiya, lê dîsa jî di bin simbêlan de dikeniya. Zafera xwe ya yekemîn bi dest xistibû. Li beramberî ewqas dijminî, piştevaniya qesrê qezenckirin ya herî aqilane bû. Rojekê wê pêwîstiya wan bi qesrê jî nemaya. Dema bi van difikirî çavên wî şewq didan.

Qral Kûbad jî Mazdek wekî çareyekê dîtibû ku karibe hem ruhanî û esilzadeyên bûne tehdîd ji taqat bixîne hem jî hêrsa gel kêm bike. Ew girtibû bin baskên xwe.

Qral Kûbad bi parastina Mazdek zafera dawî ya jiyana xwe qezenc kiribû.

Belgeyên dîrokî yên ku ev nîqaşa dîrokî tê de tomarkirîne hatine veşartin. Nivîserên derewçîn, xasûk, hîlekar piştre bi temamî bi armanca reşkirin wisa behsa vê kêliyê kirin:

Mûbedê Farsî:

“Te dewlemendî ji bo raya giştî mubah kiriye. Mirov, karûbarên xêrê yên mîna ribat, pirê ji bo ku karibin li axîretê bigihêjin xelatekê dikin, ne wisa?”

Mazdek: “Erê”.

Mûbed: “Baş e, dema ku dewlemendî di nav mirovan de hevpar bibe, wextê ku xêrekê bikin, ew ê xêra vê ji bo kê were nivîsandin?”

Mazdek li beramberî vê pirsê neçar mabû bêdeng bibe.

Mûbed: “Li milê din te jin jî mubah kirine. Jina ku piştî li cem 20 zilamî ket têkiliya cinsî û ducanî ma, wextê ku zarokê xwe anî dinê, ew ê bavê vî zarokî kî be, bêje?”

Mazdek li beramberî van pirsan xwêdan dida.

Mûbed dewam kir:

“Tu dixwazî mal, jin û ziriyetê texrîb bikî. Ew melîkê li ser textê, kurê Melîk Fîrûz e. Hikumdarî, mîna ku ji bo bavê wî bûye, ji bo wî jî ji bavê wî mîrate maye.

Niha 20 kes li ba jina hikumdar bikevin têkiliya cinsî, zarokê were dinyayê wê yê kê be, tu çi dibêjî, kî dibe xwediyê wî zarokî? Di rewşeke wisa de ziriyet naqede? Dema ziriyet biqede, ma mafê hikumdariyê ji dest vî xanedanî dernakeve?

Rewşa serdestî û bindestiyê, girêdayî dewlemendî û xizaniyê ye. Ji bo ku cihê yên mezin û biçûk diyar bin, bivênevê lazim e yekî feqîr di xizmeta yekî dewlemend de be.

Halbûkî, eger mal li raya giştî were parvekirin, ew ê li cîhanê ferqa mezin û biçûk nemîne, gelek mirov wê bibin fena padîşah.

Wisa jî ti maneya padîşahiyê namîne, qanûna hikumdariyê jî derbasdar nebe. Niha tu hatiye vir ji bo ku şahîtiyê ji Acem bistîne û cîhanê tevlîhev bikî?”

Li ser van gotinan, Mazdek şaşomaşo ma û nizanîbû çi bersivê bide. Civat jî ji ber bêdengiya Mazdek şaşwazî bibû.

Kûbad ji Mazdek re got: “Bersivê bide!”

Mazdek: “Bersiva wê, tavilê serê wî ji gewda wî qutkirine”

Kûbad: “Hema wisa, bêyî ispat nabe serê yekî were jêkirin.”

Yên ku ev derew nivîsandin, wekî rastiyên dîrokî jî pêşkêş kirin, hebûn. Halbûkî kî dikare li beramberî qral, behsa qralîçeya qralîçeyan bike û bibêje 20 zilam biçin balê. Ev bi serê xwe jî ji bo kifşkirina derewan bes bû.

Di her hevokeke din de, her gotineke din de derew eşkere li ber çav bûn.

Ji ber ku Mazdek yekjinî diparast, bêbextiyên di mijara jinê de lê hatibûn kirin jî zelal datanî ortê. Jixwe ji bilî ew kesên ku di dilê wan de baweriya bi tirs a olî hebû pê ve ti kesên din bi vê bawer nekirin.

Mazdek, nûnerê edaletê, wekheviyê, rastiyê, exlaqê bû. Li ba ew kesên ku dixwestin bi derewên xwe wî reş bikin jî tiştekî wisa tine bû. Roj, li ser Mazdek dibiriqî…

## Derdê Hekîm

Wekî çawa erdê bejî hesreta baranê dikşînin, hesreta dostan jî ket dilê Xorremê. Warê xwe û hezkiriyên xwe bi eşq bi bîr anî.

Li beramberî şatafata paytextê, xwezayîbûna warê wê û samîmîbûna mirovên wê, hesreta wê zêdetir dijwar kiribû.

Beriya ku havîn biqediya wê biçûna xwişka xwe Asara bidîtana. Dikarîbû serdana dê û bavê xwe jî bikirana. Demek dirêj bû ew îhmal kiribûn.

Dema ku dil bi hesretê tê pêçan, di nav rehikan bi xwe de jî beza hespan çêdibe. Hespên ku ji ba jî leztir…

Ji bo ku ji aliyê cinawirê bêdiran ê bi navê zeman nayê daqurtandin, ket nav liv û tevgerê.

Hevdîtina wê û Asarayê, ne bi qasî ya yekemîn be jî dîsa jî bi ihtîşam bû. Xwarziya wê zewicî bû, xwişka wê jî xwe dabû karê hekimtiyê, hema hema tê de pispor bibû.

Hekim Naûman bibû mirovekê hêrsokî, xwe berdabû, porên wî yên spî milên wî jî derbas kiribûn. Ji ber ku xwe pir kişandibû nava xwe, êdî pir zêde bi rûdanan re jî eleqedar nedibû, halbûkî li her deverekê hewaya îsyanê hebû.

Li kolanan, li dijî eskerên qral eşkere êrîş pêk dihatin, ji bo guhdarkirina oldaran ti kes nediçûn.

Hayê hekîm jê hebûna jî pir zêde pê re mijûl nedibû. Êdî nediket pey gihayên şîfadar, bi derdê ti kesî re eleqedar nedibû. Kurê wî Nîbîrû jî nebûna, wê rûyê mirovan jî nedîtana.

Dema Xorrem hat Gundeşapûrê, Hekîm dilinî bû, bîranînên hevjîna wî Sûremê careke din li ber çavên wî zindî bibûn.

Demek dirêj bû, devê wî bi kêrê jî nedihat vekirin, lê niha nizanîbû hiş be. Tevî ku pir kêm firsenda axaftinê dida Xorremê jî, ji her hevokeke wê enerjiyeke teze digirt û ciwan dibû.

Nîbîrû, amadekariyên zewacê dikir û ji karên bavê xwe hez nedikir. Bi saya bavê xwe karwankar nas kiribûn û wisa dest bi bazirganiyê kiribû. Ruxmî ku dayika wî Sûrem û hevalên wê di rûyê wî de hatibûn kuştin jî, ew wekî însanên ku li pey xeyalên vala dibeziyan, bi bîr tanî. Bibû yekî ewqasî bêhurmet.

Heqîqetên civakî bi qasî misqalekê jî ne li ber çavê wî bûn. Her tim xeyalên wî qezenckirina pereyên zêde bû. Mayina wî ya li cem bavê wî jî, tenê ji bo sûdgirtina ji navê wî yê bi prestîj bû.

Di peydekirina cilên herî baş de bibû pispor. Ji ber ku ji bo bazirganên cawan miştêrî didît, ji qumaşên herî baş par didanê, terziyên herî baş jî dixistin xizmeta wî. Li dora xwe zivirandina keçên ciwan wekî lîstokê didît.

Ger hekîm destê xwe ji jiyanê nekişandibana, dikarîbû bi kurê xwe re mijûl bibûna, lê sarbûna wî ya li beramberî kurê wî hîç derbas nebibû. Îcar hayê kurik ji rewşa wî ya niha hebû yan tine bû, ev jî bi serê xwe nediyariyek bû.

Nîbîrû, li şûna ku ji vê guhnedêriya bavê xwe nerehet bibe, berevajî pir keyfxweş dibû. Ji ber venêrîna bav li ser serî tine bû, dilê wî jî li cih bû.

Wisa xuya dikir ku ji ber ku Xorrem bi bavê wî re mijûl dibe û tê mala wan, keyfxweş bûye. Zindîbûna bavê wî kêmekî jî be hestên mirovî bi wî re jî pêş xistibûn. Feqet vê rewşê zêde dewam nekir. Piçek başî jî pê re nema, bi gotineke rasttir, derket ortê ku ew dîmenê “başiyê” rûpoşek e.

Fikirî ku jineke mîna Xorrem ya dişibe abîdeyên xweşiktiyên berê, ew ê yekî mîna wî lewend red neke.

Bi wî halê xwe yê bedew, ku keçan bi heyranî pesnê wî didan, pir bawer bû. Van hemûyan hisekî wisa pê re çêkiribû ku dikare li gorî dilê xwe nêzî Xorremê bibe.

Xorrem ketibû xwaringeha malê, ji bo xwarinekê çêbike li derdorê dinêrî. Ard, gûz, mast, biharatên cur bi cur, hêk û nivişk hebû. Dikarîbû bi van borekên xweş çêbikirana.

Wê malzeme kontrol dikirin, ji nişkê ve herdu destên Nîbîrû li nava wê geriyan.

Milên wî yên xurt, mîna baskên qertelekî Xorrem rapêçabûn. Destekî xwe avêt qirikê, lêvên xwe bi guhê wê kir û gotê, “bila deng neçe bavo!”

Xorrem ji bo qîr neke xwe bi zorê digirt. Dema ku xwest ji nav lepên wî derkeve, neynûkên wî yên mîna lepên hirçê li qirikê badayî ew êşand. Dema ku ji ber tirsa canê xwe, xwe avêt pêş, cilên wê heta singa wê çiriyan.

Lê zivirî û şîmaqek dawşandê. Li ser dengê sîleyê hekîm hat. Çawa ket xwaringehê, çavê wî li kêra li ser masê ket û çawa dest avêt kêrê li qirika kurê xwe xist. Kurik ne got him ne jî gum û ket xwarê.

Xwîna ji qirikê dipejikî heta rûyê Xorremê hat. Ji bo ku xwîna Nîbîrû bisekinîne, dawa cilê xwe danî ser qirika wî.

Hekîm matmayî bibû. Li kurê xwe yê li ser erdê dirêjkirî mêze kir. Li perpitîna Xorremê nêrî.

Xorrem digotê mudaxele bike, lê di guhê hekîm de tenê dengekî zingîniyê hebû, fêm nedikir çi dibêje.

Xorrem bi destekî xwe birîna Nîbîrû digirt, bi destê din jî Hekîm girt û hejand û ew anî ser hişê wî.

Li ser vê Hekîm kêra di destê xwe de mîna pîzot girtibû avêt.

Ketibû nav panîkê, ji Xorremê re got xwe bide paş. Malzemeyên tibî yên li ber dest bi kar anîn, mîna Xorremê wî jî xwe pir bir û anî, lê vala bû…

Xorrem şaşwaz û bi hêrs bû, got;

-Ew şîmaq besî wî bû. Te çi kir!

His û pis ji hekîm derneket.

Tevî ku baş dizanîbû, wê kêrê wisa behejîne wê bibe sebeba çi jî, li xwe heyirî mabû, çawa wisa kiribû. Li odeya tijî xwîn, li Xorremê û li destê xwe mêze kir:

-Ev sûcê min e! Sûcê min e! Demek dirêj min ew bi serî wî berdabû. Sûcê min e!

-Amadekariyên dawetê dikir, heyf, heyf bû, diviyabû wisa nebûya.

Hekîm li cihê xwe, destê xwe xist bin serê xwînî yê Nîbîrû û danî ser çokên xwe, dûvre jî serê xwe ber bi singa wî ve xwar kir. Giriya. Porên spî yên xwînî bûne daket ser rûyê Nîbîrû.

Xorremê jî nikarîbû bi firmêskên çavên xwe. Serê xwe danî ser milê Hekîm û giriya. Her ku îskînî pê diket, rondikên ji çavan diket jî vediguherî mîna lehiyekê.

Hekîm, cara yekemîn Xorrem bi vî halî didît. Li ser vê xwest hinekî Xorremê teselî bike. Tevî ku stêrk ji çavên wî jî dihatin xwar, ji Xorrem re digot negirî.

Wê kêliyê Xorremê xwe avêt stûyê Hekîm, bi hev re giriyan. Rondik gihiştin xwîna li ser textên li bin xwaringehê raxistî.

Mîna ku mihek ser jê kirine, ji qirika Nîbîrû pir xwîn hatibû.

Wisa hêsanî bi ser xwe de nehatin. Ewil, Xorremê got lazim e cenaze derbasî odê bikin. Bi hev re bi zorê wisa kirin. Dûvre jî Xorrem ket xwaringehê û hewl da xwînê paqij bike. Her çiqasî demek dirêj pê re mijûl bû jî xwîna li ser zemînê dernediket.

Hekîm, ji ber tecrûbeyên xwe yên pîşeyî û temenê xwe, dizanîbû wê ev xwîn bikeve texteyan û demek dirêj şopa wê jê neçe. Ji Xorrem re got zêde pê re mijûl nebe.

Xorrem dema ket odeyê, dît ku Hekîm, xwîna li ser rûyê kurê xwe paqij kiriye û qirika wî jî pêçaye. Heçkû tiştek nebibû. Mîna zindiyan xuya dikir.

Hê jî baweriya wê bi van rûdanan nedihat.

Dema hat bîrê Sûrem pir ji Nîbîrû hez dikir, dîsa çavên wê tijî bûn.

Vê carê hekîm mudaxele kir:

-Ew qet neşîbiyabû me!

-Dîsa jî kurê we bû. Di hundirê wî de başî tine bûya, ma ewqas zemanî li ba we dima? Ya ku berê wî da fikrên xerab çavbirçîtiya bazirganan bû. Heyf bû, yadîgara Sûremê bû, heyf!

-Çawa ji nişkê ve çavên min reş bûn, hê jî min fêm nekiriye. Dibe ku di nav min de li dijî wî hêrsek kom bibû. Destê min bişkestana, negihiştaba wê kêrê.

-Çima hêrsa te hebe? Tiştekî kêliyê bû, te nêzîkatiya wî ya bêaqilî ferq nekirana, dibe ku tiştek jî nebibûna.

-Na, hêrsa min a kombûyî ew kuşt. Ruxmî ku dayika wî di rûyî wî de çû mirinê jî qet wijdanê wî nerehet nebû.

-Niha wê çi bibe?

-Divê em wî binax bikin. Alîkarî pêwîst e.

-Ez bang li Asara bikim.

-Em wê jî neqeherînin. Em ji cîranan re bibêjin bes e.

-Na, ne lazim e hayê her kesî ji vê meseleyê çêbibe.

-Temam, ne pêwîst e bêhurmetiya li dijî te her kes bizane, lê bizanin min ew kuştiye wê çi bibe? Ji niha û şûn de êdî ne xem e!

-Na, wisa nebêje, Ez ê xeberê bidim Asara. Tu bisekine.

Hekîm bersiv neda, nehat fêmkirin ka pejirandiye yan na, bêdeng bû. Mîna ku ketibû nav valatiyeke kûr.

Dema ku Xorrem ji malê veqetiya dudil bû. Ji ber fikara wê, digot hekîm dikare xwe bikuje, bi lez û bez tevgeriya. Ji Asara re mesele got û ji bo ku meseleya esas ji ti kesî re nebêje ew tembîh kir.

Bi alîkariya Asara û hevjînê wê cenaze rakirin.

Nasên wan, li şûna dawetê ji bo cenazeyê kom bûn. Ti kes pê nehesiya çawa miriye.

**Kevî**

Girtiyekî împaratoriyê hebû ku wekî sirekî ji her kesî dihate veşartin.

Mîna ku ev împaratorî bi saya vî girtiyî li ser piyan mabû. Heger ew dîl negirtana, wê nikarîbûna xwe bigihandana şervanên efsanewî.

Ew û şervanên wî ewqasî xurt bûn ku dikarîbûn împaratorî hilweşandana.

Firsenda qirkirina wan jî dema Kevî dîl girtibûn bi dest xistibûn. Ev hemû jî beriya salan pêk hatibû.

Piştî qetlîaman, dihat gotin ku Kevî jî bi êşkenceyê hatiye kuştin.

Kevî, dostê Qade yê samîmî bû. Dema ku bi mirina wî hesiya, cara yekemîn dest ji xebatê berda, zêdetirî sê mehan ji mala xwe derneket, bi ti kesî re nepeyivî.

Qade pir zêde behsa karê xwe nedikir. Piştî sal di ser xebera kuştina dostê wî re derbas bûn, şevekê deriyê wî lê xist.

Gelo têkildarî karê wî rewşeke lezgîn derketibû?

Dihat zanîn, li ba karwanan digeriya û karên biçûk ên bazirganiyê dikirin.

Carina Mazdek didît, digotê karên baş dike û her tim ew ê piştgiriya wî bike, wisa ji hev vediqetiyan.

Mazdek jî kengî tengav bibûna, dizanîbû ku spartekekî wî yê fena zinaran saxlem heye.

Dema ku nîqaşên li qesrê dijwar bûn, his kiribû ku her kêlî dikare serê wî bikeve belayê û bibe qurbanê komployekê.

Yên li dora Kûbadî digeriyan, her roj nerehetiyên xwe zêdetir tanîn ser ziman. Wisa bibûna dikarîbû wekî berê nehatana qesrê û heta dikarîbû qet nehatana. Girtina hin tedbîrên din lazim dît.

Bi fermandarê Kurd re, ku bi Kûbad bawer bû û ji dil piştgirî didayê, axivî. Heger tiştek bihatana serê wî yan jî bihatana girtin, jê re got lazim e hayê şervanên Kewyarê ji vê rewşê çêbike.

Laser di artêşa qraliyetê de dema şervanekî ciwan bû li dijî şervanên Kewyarê şer kiribû û digot qey ew bi temamî qediyane.

Diyar kir ku pê bawer nake. Bawer nedikir ku hêna jî ti kesên ji wan saxmayî hebin. Herî dawî wextê îqna bû jî pirsî ka wê çawa xeberê ji wan re bişîne. Mazdek, mehfurkerê qesrê nîşanî wî da.

Ecêb ma, çawa têkiliya Kewyaran û mehfurkerê bi salan bi rehetî diket qesrê û derdiket hebû. Jê jî wirdetir, qet nedihat hişê wî ku têkiliyên Mazdek li ba wan hebe.

Dema ku Mazdek sirê xwe parve kir, wê çaxê sirekî mezintir, sirê herî mezin ê împaratoriyê jî nas kir:

Fêr bû ku girtiyê ji her kesî tê veşartin û li zindana veşartî ya qesrê tê ragirtin kî ye.

Laser dizanîbû ew kî ye. Bi çavê dijminan lê dinêrî. Demekê êşkence jî lê kiribûn.

Çaxê ku Mazdek wekî dost behsa Kewyaran kir, wî jî fêm kir ku heta wê rojê çiqasî şaş fikiriye û behsa girtî kir.

Mazdek bi guhê xwe bawer nekir. Vê carê dora şaşwazbûyînê ya wî bû.

Nikarîbû ev firsend ji dest bidana. Lazim bû ji bo wî tiştek bikirana. Heger di nava kêliyê de biryar nedabana, dibe ku careke din firsendeke werê neketibana destê wî. Dikarîbû biketana nav xeteriya herî mezin a jiyana xwe.

Heke ji bo girtiyê veşartî hewl bidana li ba Kûbad bipeyive, ev hewldanan wî teqez wê bihatana bihîstin û rê li ber kuştina girtî vekirana. Ji bo alîkariya wî rêyeke din hebû.

Şeva piştî qisekirina wî û fermandar Laser, dîsa ew dît û jê xwest ku planekê amade bike. Pêwîst bû di firsenda ewil de ew bidana revandin. Laser gotê ev îş ne rehet e, lê belê ew ê xwe bide bendê.

Hêna nû ji ba Laser çû, derket baxçe, dît ku li her derê dengê muzîkê heye û qesir ketiye nav şahiyê.

Dema ku biryareke di kêliyê de lazim bike û di vir de dudiliyek çêbibe, dikare firsendên pir mezin jî bi xwe re bibe. Berevajiya vê jî dikare encamên dîrokî bi xwe re bîne.

Hisên wî gotinê dikarin vê şevê vî karî bikin. Hema şûnde vegeriya. Cihê girtî ji Laser pirsî. Diyar kir ku lazim e wî derxînin.

Laser ev kar li xwe girt, wê nehiştana ewlehiya Mazdek biketana xeteriyê. Jê re got li derve bisekine.

Li qatê jêrê yê zindana qesrê, deriyek hebû ku li tuneleke veşartî vedibû û li ber jî 2 eskeran her tim nobed digirtin.

Bang li eskerên ber derî kir. Wezîfeyek da wan û ew ji wir dûr xistin. Ket hundir û girtî derxist. Qapûtê dirêj ê ku fermandar li ber dikin ji xwe kir û da wî.

Dema ku eskerên li ber derî nobed digirtin vegeriyan jî, vebûn û girtina derî ferq nekirin.

Yên li ber deriyê zindanê di tarîtiyê de nobed digirtin jî silav li wan kirin. Piştî pê bihesiyana yê ku silav danê ew zilam e ku ji zindana veşartî û parastî ya qesrê reviyaye, êdî wê çend roj, çiqas wextî sax bimana ne diyar bû.

Her çiqasî Mazdek bi hisên xwe bawer bû jî, lê qet texmîn nedikir ev kar wê ewqasî hêsan be.

Yek ji mezintirîn şervanê Kurd revandibû.

Wê şevê piştî baranê her derê bajêr bibû mij û moran.

Bêhnek wisa tund a lexemê hebû ku difna mirov dişewitand û hilma mirov diçikand.

Mîna ku dehlîzên veşartî yên qesrê xera bibûn û bêhn li bajêr belav bibû. Ev bêhna ku ji layê qesrê dihat, her ku ji qesrê dûr diket jî kêm dibû, wê heta dawiya jiyana xwe jî ji bîr nekirana û wekî bêhna nîzama riziyayî di serê xwe de bi cih bikira.

Baranên payizê bi xwe re serma jî anîbûn. Vê bêhna pîs a ku baranê jî nikarîbû pê, hemû bajar teslîm girtibû.

Li ser rêyên herî mîna ku yek li pey wan e, bi lez û bez dimeşiyan. Çiqasî dûr ketibin jî wê bêhnê ew dişopandin.

Kolanên paytextê bibûn herî. Sibe derketina tavê jî nediyar bû.

Mazdek bawer dikir ku çalakiyên mezin bi xwe re encamên mezin tîne. Roj wê ne li ser paytextê, lê li ser Şervanên Medan hilatana. Efsaneya ku wekî miriye dihate zanîn, bi pêşengên xwe li kolanên tarî yên paytextê digeriyan.

Ji nişkê ve li pişt wan dengê “Hey!” hat û pê veciniqîn. Wextê ku wê ji mehkûm re bigotana “bireve biçe”, du zilamên girboxe hatin û li pişt wan sekinîn. Heyfa xwe li wê keda xwe ya revandina girtî anî. Ji aciziyan lêva wî diricifî.

Yê bi rih, xençerek hilgirtibû. Mazdek heyecaneke wer mezin girtibû, negot ka ev zilamên qral in yan na, di ser de nehat bîrê li rûyê wan jî binêre. Lê ew zilamê revandibûn li nava çavê van zilamên wekî qatilan mêze kir. Tevî tarîtiyê jî çavê wî dibirî û derbas dikir. Çiqasî ji van awiran tirsiyabin jî, yên xençer girtî ji wan xwest çi tiştên nirxdar li ba wan hebin derxînin. Mazdek li bêrîkên xwe mêze dikir, lê ji nişkê ve mehkûm bi hemleyeke nedihat payin xençer ji dest dizek girt. Vê hemleyê çavê dizan tirsand û ew dan revandin.

Wextê wan tine bû li reva dizan mêze bikin. Bi lez û bez rêya xwe domandin. Xençer mabû di dest mehkûm de. Dema ku xwe gihandin hespan, di siwarbûna hespê de qederekê zehmetî kişand. Di nav dîwarên kevir de bi salan mabû, vezelokîtiya çîpên wî nemabûn. Gelek nexweşî girtibûn. Diyar bû dewletê dixwest wî hêdî hêdî bikuje.

Demek dirêj ew wekî rehîne bi kar anîbûn; gotibûn heger li ser wan êrîş çêbibe wê vî zilamî bikujin. Wextê ku demekê êrîş bi ser wan de nehatine, ango ji van şervanên efsanewî ti şop nemaye, wê çaxê ew jî di hundir de ji bîr kirine, bi gotineke rasttir, di hundir de ji bo were jibîrkirin hiştine.

Gotibûn miriye, lê rastiya meselê esas ev bû: Digotin wê rojekê kêrî me were, heta îradeya wî bişkê em di zindanê de bigirin. Ev hemû planên mejiyê xasûk ê Şêwirmend Lîrîda bûn. Lê girtî ji dîwarên zindanê jî qeyîmtir derketibû!

Temenê wî mezin bibû, li nav zindanên qesrê hatibû “jibîrkirin”, lê di nav gel de navê wî di nav sirên herî germ ê hafizayan de taze bû.

Wateya navê wî bi xwe jî dil fireh dikirin:

“Çiyayê Berfî!”

Piştî wê, ev nava ji bo goşeya bilind a ku berfa bi salan li ser hev dibare, nahele û bi firtoneyê hişk dibe jî gotin, heta ji bo cihên wekî goşeyên çeman jî heman nav bi kar anîn: Kevî!

Kurê Kewyar, Kevî, yek ji pêşengên herî xurt û navdar ê şervanên Kewyarê bû!

Di zindanê de jî hêviya wî qet neşkestibû. Lê qet nehatibû bîrê wê bi vî şeklî, di ser de jî ji aliyê Mazdek ve were revandin. Her tişt pir lez qewimîbû. Mîna xewnekê bû. Niha jî li ber deriyê dostê xwe yê qedîm Qade bû.

Di vê baranê, mij û moranê de, îcar hê roj jî hilnehatibû, deriyê Qadê lê dabû û bi şeklekî xwezayî Qadê ev wekî rewşa xêrê fêm nekiribû. Rewşeke têkildarî karê wî bi xwe jî nikarîbû bibûna hincet ku deriyê wî di vê wextê de lê bide. Lazim bû tiştekî jê jî wirdetir bûna. Xençera xwe da pişta xwe û ber bi derî ve meşiya. Dengê hespan ji derve dihat.

Dûvre Dayzer jî hat heta ber derî. Dema ew gihiştê, derî vebibû, mêvan ketibûn hundir:

Mazdek û kalekî bê mil!

Bawer nekirin yê li beramberî wan Kevî ye.

Herî dawî ew li Reyê dîtibûn. Nêzî 30 sal di ser re derbas bibûn. Dîsa jî li ser xwe bû. Tenê ferqek hebû, di êşkenceyê de milekî wî çibû.

Gepên wî çûbin xwarê, çavên wî ketibin kortikê jî bi sekna xwe ya tîk heybeta xwe ya berê nîşan dida.

Vê carê jî ji ber ku Mazdek ew wisa di carekê de ji zindanê revandibû, şaş mabûn.

Pir tişt hebû dixwestin li ser bipeyivin. Wê şevê dê ranezana.

Piştî paqijî û xwarinê, Kevî got:

-Ti kes mane?

Qade got, “Helbet mane!”

Ronî hat rûyê Kevî. Piştî salan fêr bibû ku ji qebîleya wî kesên sax hene û ji nişkê ve 30 salan ciwan bû.

Zemanê, berê şervanên Kewyarê ji çiyayên Medê dabû deverên dûr.

Li ser qebîleyên azad ên Kurd zexteke mezin hebû. Fikrên Mazdek herî zêde di nav wan de belav dibû. Îsyaneke li wir dikarîbû hemû qedera împaratoriyê biguherîne. Ji bo pêşiya vê bigirin jî di warê eşîran de polîtîkaya zext û hevsengiyê bi awayekî şidiyayî dihate pêkanîn.

Ji ber ku zextê tenê bi serê xwe têrê nedikir, nêzîkatiyên ku karibin wan bikşînin nava xwe jî nîşan didan. Ji bo vê qehremanên destana Rustemê Zal jî kiribûn malê xwe. Halbûkî wan nûnertiya karakterên berxwedêr ên eşîrên azad ên Kurdan dikirin.

Gel û dîroka Kurd nikarîbû tine bihesibandana, ji ber ku raperîneke ji ber vê yekê dikarîbû dawî li împaratoriyê bianiya. Ji ber vê yekê ji derveyî konseya qraliyetê di her qedemeya împaratoriyê de ji bo ku Kurd çalak bin rê vekiribûn. Li şûna tine bihesibînin, wekî rêbaz diçepandin, di kontrolê de dihiştin û dikirin dûvikekî xwe.

Kewyaran, tevgereke qebîleya azad bû ku wekî dewama kevneşopiya eşîrên azad ên Kurd mabûn.

Mazdek, wextê pê hesiya hê ji wan gelek kes dijîn û heta hin ji wan li bajar, di nava wan de dijîn, fikirî ku wê êdî pişta wî neyê erdê. Êdî pê bawer bû, revandina Kevî wê hêzeke mezin bidana têkoşîna wî.

Roja din ji bo balê nekşîne, wekî hayê wî ji tiştekî tine ye, vegeriya perestgehê. Serêşên wî nemabûn. Êdî li wir rojên wî yên dawiyê bûn. Dema çû baxçeyê qesrê bêhna mirinê hatê. Lê tevî ku

serê sibê jî bû ti êş di serî wî de tine bû. Rojên piştî wê jî wê serêşên wî venegeriyana. Tenê hin rojan wê hinekî biteviziyana, ewqas. Bi xwe jî fêm nekir çawa ji nişkê ve serêşên wî tine bibûn.

Nermijokbûna ji ber şahiya qesrê mayî, bi qetlîamê re xwînî bibû; bêhna xwînê ketibû ser qesrê.

Çar eskerên nobedar ên zindanê û deriyê tunelê, fermandarê wan û fermandarê yekîneya muhafizên taybet a qesrê Laser, li Baxçeyê Biçûk bi êşkenceyê hatibûn kuştin.

Ne li benda rewşeke wisa bû. Fêm nekiribû çima Laser ewqasî zû kifş bûye. Hayê wî jê tine bû ku duh şev li ber çavan Kevî derxistiye derve. Halbûkî di demeke pir kurt de Kevî anîbû derve. Lazim bû ji vê lezê fêm bikira mesele çi ye. Her tişt eşkere pêk anîbû. Vê bizaniya wê karîbûya ji bo Laser jî li tedbîrekê bigeriyana. Ewqasî pê xemgîn bû ku ket nav nivînan.

Laser, daxwaza Mazdek wekî emrekî ku divê fedaiyane were pêkanîn girtibû dest. Wisa jî karîbûye tiştên bi serê Kevî de anîne bide efûkirin û wijdanê xwe bide rehetkirin.

Mirovê yekemîn bû ku ji bo Mazdek canê xwe feda kiribû.

Di oxira mirina dostekî xwe yê dilsoz de bibû xwedî sirekî mezin. Li cihê ku zilmên mezin hebûna, sirên mezin jî çêdibûn…

## Îtibar

Derbendên berfgirtî derbas kir, xwe gihand çiyayên xemrî yên bi mij, bîranînên wî li ber çavan zindî bûn.

Li van çiyayên ku wekî qertelekî dijiya, hêna jî qîrîna tolhildana dayika wî Kewyar holan dida.

Wextê gihişt mintiqa jê re Şkêrê Xezalan dibêjin, xençera destikê wê şikiyayî ya ji dest diz girtibû ji ber xwe derxist. Xaka li ber kevirekî kola.

Ruxmî baranê jî lê kiribû, dîsa jî hişk bû. Kola û kola. Westiya, sekinî. Dûvre dîsa kola. Çaleke heta çokê vekir. Fêm kir ku cihê şaş dikole.

Li dor kevir zivirî. Ji ber ku roj derneketibû, cih tevlîhev kiribû. Li cihekî wirdetir, çû ser kevirekî bilindtir û mêze kir. Cihê gencîneya xwe tespît kir.

Herî dawî li vî cihî dayika xwe Kewyar dîtibû, li Şkêrê Xezalan. Dûvre ji ber îxanetekê dîl ketibû dest.

Her îxanet bi êş bû, her îxanet ji yekî wekî dost dihat zanîn dihat, lê vê carê girantir bû: Îxaneta Bira!

Wextekî egîdek bû, li ba Kevî ketibû şer. Herdu bira jî ji dê û xwişkên xwe fêrî şer bibûn.

Dema ku Kevî hatibû girtin, fêm kiribû tê de îxanet heye. Bi salan ji xwe re pirsîbû, “Çima?”

Birayê wî jî ji nav îxanetê derneketibû û di dest esilzadeyan de bibû pêlîstokek.

“Çima?”

Nikarîbû bersivê bibîne, ti wateyê bidê.

Dûvre rojekê, tiştek bû û xwe kuşt.

Kevî ji şêwirmend bihîstibû. Xemgîn nebibû, lê pirsa “çima?” di serî de êdî bibûn du lib. Çima îxanet kir û çima xwe kuşt?

Piştî reviyabû, vê carê ji devê Qade rastî bihîstibûn.

Beriya xwe bikuje, xwestiye Kevî bibîne, lê derew kiribûn, gotibûn, “Kevî naxwaze te bibîne” û destûr nedabûnê.

Heta wê rojê rastiyeke din jî nizanîbû, birayê wî bi çavkorî dil ketibû jinekê. Ev jî ji devê Qade bihîst.

Qade, birayê ku îxanet li Kevî kiribû qet nedîtibû. Lê bi qasî karîbû bişopîne jî têkiliyên wî hebûn.

Yekî sedema îxaneta wî jê pirsî bû, wî jî gotibû: “Mirovek çiqasî egîd jî be li beramberî hezkiriya xwe stûxwar e!”

Kevî li ser vê yekê gotibû, “Serî li ber wê tewand û dûvre jî li beramberî civakê stûxwar ma. Ma ev çi hezkirine? Ew jin eger ne sîxureke perwerdekirî ya qesrê be, ne kesekî din e!”

Şkêrê Xezalan hemû rabirdûya wî li ber çavê wî zindî kiribû.

Her ku xeyalên xwe zindî kirin, mîna ku xwîna wî hemû rijiyabû bin wî tehtî zer bibû.

Gelo di îxaneta birayê wî de para wî jî hebû? Bi salan pirsa vê kiribû, ruxmî ku encamek jê dernexistibû jî nikarîbû xwe ji sûcê dûr bibîne, bi pirsên bêbersiv yên ku porên wî spî kiribûn, salên xwe derbas kiribû.

Dema fêm kiribû di nav meseleyê de jinek heye, cara yekem ji bo birayê xwe qeherî bû, dilê wî şewitîbû.

Birayê wî ne wekî şervanekî Kewyar miribû. Xwekujî xerab bû, tarî bû, ruhê xwe dana destê tarîtiyê bû.

Tevî vê jî di dîroka wan de wê cara yekemîn tiştek bikirana.

Di kevneşopiya xwe de wê cara yekem xwekujiyekê, wekî helwesta qezenckirina rûmeta xwe binirxandana, wekî çalakiyeke rûmetê bihesibandana.

Ev fikrê Qade bû…

**Bahoza Esleyê!**

Mirovahiyê ti carî eziyeteke wisa nedîtibû!

Esle, ji ber ku Mazdek Bamdad ew red kiribû, ev wekî eziyeteke mezin a ku xweda jî nikarin hilgirin dinirxand. Dema navê Xorrem bihîstibû dikira dîn bibûna.

Havîn qediyabû. Dema pelên ewil ên payizê ji daran diketin, baranên ewil jî hatibûn.

Baran ji axbanan qehweyî diherikî, ji çavên Esleyê jî hê zelaltir, hê paqijtir…

Di bin ban de sihêrbazeke kevnare dîtibû, hewl dida bizane gelo behreyên wê hene û wê karibe Mazdek lê vegerîne.

Jina sêhrbaz li nav çavên Esle yên qehweyî Îranî nêrî û çirûskên nefretê dît.

-Keça delal ez li fala agir dinêrim. Di nav avê de mirov nikare li fala agir binêre. Di nav meseleyê de şewitandin heye.

Ne falbaz, sêhrbaz bû. Esle vê dizanî û fêm kir gotina wê diçe kû derê: Ji bêrîka êlekê xwe tûrikek derxist û avêt hembêza wê, got:

-Bila ji min hez bike, bi min were girêdan!

-Sêhreke bide hezkirin tine ye, di demên berê de dihate gotin, lê heke tu xizmeta min dixwazî, ez ê rastiyê ji bo te bibêjim. Sêhreke bide hezkirin tine ye. Sêhra dana revandinê, nefretkirinê, heta kuştinê heye, lê sêhra hezkirinê tenê gotegot e.

-Ma çawa nabe?

-Ji ber ku saxtebûna hezkirinê nabe, ji ber vê ye…

Ji ber van gotinan dilê Esle mabû. Dema ku hemû hêviyên wê winda bûn û çûn, vê carê felaketa hezkiriyê xwe xwest.

Li bendê bû sêhrbaz bixurên ku mirovan gêj dikin, dermanên mirovan ji ser hişên wan dibin, gihayên jehrî bidinê, lê jinê tenê du şîret lê kirin:

-Kuştina mirovekî rehet e, lê kuştina hezkiriyê xwe xwestin, zor e. Dilê te ranake. Heke tu bêjî bila hinekî din jî jê hez nekin, çareya vê heye. Ya ku qehremanekî dikuje ne tîr e ne jî jehr; mirin nikare qehremanan bikuje! Lê, ziman dikuje! Bila bikeve nav çerxa felekê, wê çaxê felaketên bi serê wî qehremenî de tên naqedin!,

Ya ku Esle ji vê fêm kirî ew bû ku Mazdek were reşkirin, îtibara wî were xistin!

Hevjîna Qral Kûbad, Walîdeya warîsê textê Xusrev, ango Qralîçeya Qralîçeyan ewqasî safik bû ku Esle çawa bixwesta dikarîbû pê bilîsta û ji bo xerabiyên xwe bikirana destik.

Gotina, “Mazdek dibêje lazim e jin jî wekî malan hevpar be!” li ser zimanan digeriya.

Tenê yek-du caran Esle, Mazdek û Qralîçe anîbûn ba hev û vê têrê kiribû:

“Kûbad li dijî fikrên jirêderketî yê Mazdek nayê. Heta ewqasî bi baweriya wî ya jirêderketî hatiye girêdan ku heçkû bûye koleyê wî. Ji ber vê jî ji bo ku Kûbad karibe dilsoziya xwe îspat bike, jina xwe ya Qralîçeya Qralîçeyan û Mazdek xistine nav heman lihêfê, daniye ser heman doşekê!”

Bêbextiyek, enceq ewqasî xerab dibû.

Esle gihiştibû mexsed miradê xwe!

Bêyî li encamên wê mêze bike, bi îftîrayekê bahozek dabû destpêkirin, ti kesî jî li çavkaniya vê bêbextiyê nepirsîbû; bajar, deşt, diyarên her dûr jî bi vê îdîayê tijî bibûn.

Heta wê demê navê Mazdek Bamdad qet di vê astê de nehatibû bihîstin. Ji her derê, her beşên ku nav û îdîa dibihîstin bertekên cur bi cur dihatin.

-Heke esilzade dibêjin, vir e!

-Heke esilzade êrîş dikin, wê çaxê Mazdek Bamdad leheng e!

-Çi dibe bila bibe, kî wisa li ser jinan bipeyive, dijminê olê ye! Bi Mazdek bawer nekin!

-Yekî wisa li ser jinan bipeyive, em li pey naçin. Di ser de jî zewicî ye!

-Mazdek dostê feqîran e, dixwazin bêbextiyan lê bikin!

-Êdî nabe qral li ser wê textê rûnê!

Ev fikrê dawî bi destê esilzadeyan qederekê hat nepixandin û ji bo bigihêje guhê qral rê vekirin.

Beriya wê hayê qral jê tine bû ku ewqas tişt di derheqê jina wî de tên gotin. Têkildarî gotinên li ser wî jî tenê qiseya, “nikare li ser textê bimîne!” bihîstibû.

Tecrûbeya Kûbad hebû, dizanîbû ev gotin niyeta esilzadeyan diyar dike. Talûkeya mirinê jî xwe dabû ber derî yan jî dikarîbûn wekî li apê wî kiribûn, çavê wî jî kor bikirana.

Cara yekemîn wisa his kir ku lazim e textê dewrî kurê xwe bike. Lê belê, Xusrew kesekî kîndar bû û dikarîbû li dijî Kûbad bêhurmetî bikirana. Ji ber vê jî her çiqasî fikrekî wisa bi Kûbad re çêbibe jî tê de ecele nekir.

**Stargeha Veşartî**

**Çima bi dizî digirîn mirov,**
**Ruxmî di nav du çeman de tine ye kesê negirî?**

Xorrem di nava civakê de bi qasî ku neyê hişê Mazdek zêde dixebitî. Heger ji siya qesrê xelas bibûna dibe ku ew jî mîna Xorremê bihiziriyana. Civak ji bo raperîneke mezin amade bû!

Bi saya vegotinên Xorremê, bi taybet jî dayikan ji her kesî zêdetir û bêdudilî bawer dikirin ku Mazdek oleke nû tîne, pêxember e.

Bi saya vê baweriya nû coşeke mezin di nava gel de çêkiribû. Bi saya piştevaniya manewî wateyeke nû dabû jiyana wan.

Kaosa li nav qesrê diqewimî, li gundan, taxan, li nava gel bibû şahî û dîlan. Ji çaviyên civakî azadî dipejiqî.

Ji nav Esilzadeyên Azadan, ku ji tebeqeyên jêr ên civakê dihatin hesibandin, lê ji ber behreyên wan ên şer hebûn ti kesî nikarîbû bi rehetî belaya xwe di wan de bidana û bingeha yekîneyên siwaran ava dikirin, layingirên Mazdek derdiketin.

Bi qasî bêtirsiya wan, bi zalimtiya xwe jî li her derê navdar bibûn. Ji wan re “Hur” dihate gotin, ev jî bes bû ji bo meyla wan vebêje. Ji ber vê yên ji nav wan fikrên Mazdek hembêz kiribûn, bêtirs xebitîn, hazir û amade xwe dan benda her şerî.

Di nav esker û fermandaran de jî yên ku eşkere destek didanê hebûn. Jixwe li ser dilê gel texta xwe danîbû. Lê ti kesî bi qasî dayikan ji dil û can destek nedida.

Dayikan ji kûrahiya dilê xwe his dikirin ku siberoja civakê di bin destê qral, esilzade û ruhaniyên sexte de reş e. Ev tarîtî bi qasî ku bikaribe hemû cîhanê daqurtîne dikarîbû mezin bibûya. Ji ber ku çavnebariyên wan xelas nedibû.

Xorrem bêyî ku xwe derxîne pêş, behsa Mazdek dikir. Di serî de dayik, hêviyên giştî civakê zindî bibûn. Ruxmî ku misqalek hêviya rizgariyê bi wan re tine bû jî, vegotinên Xorremê ji bo wan bibû lutifa

Xwedê. Dayikan di nava xwe de eynî mîna ji Mazdek re digotin, ji Xorremê re jî digotin “pêxember”, lê ji ber ku Xorremê xwe bi vê re aciz dikir, pir zêde dubare nedikirin, tenê dema lê guhdar dikirin, digotin ew bi xwe mîna guhdarî pêxemberekê dikin jê bandor dibin.

Ji ber ku dayik bi baweriyeke wisa tijî bibûn û keyfxweş bibûn, hemû civak jî zindî bibû. Li her malê, her meheleyê, li her gundî mîna hewayeke cejnê hebû. Li ba her kesî bendewariyeke ku wê tiştên nû bibe û jiyana wan biguhere çêbibû.

Li malan, meheleyan, gundan, ji derveyî mehremiyeta malbatê, her tiştên xwe parve dikirin. Çandeke kevn careke din digihişt cewherê xwe û wateya xwe. Parvekirin, îbadeta herî mezin bû!

Di nav dayikên Gundeşapûrê de Asara jî rol dilîst. Guhertina wê keyfa Xorremê jî tanî. Ew bi tenê nehişt.

Bi hev re diçûn gundên derdor, li ba jinan qise dikirin. Dît ku hê beriya biçin gundan fikrên wan tên axaftin.

Tiştên şaş dihatin zanîn, sererast dikirin, zanebûnên xwe jî kûrtir dikirin. Bibûn mamosteyên gel, lê gel jî mamostetî dikir. Ji ber ku fikrên civakî pêş ketibûn û bi lez belav bibûn, keyfa Xorremê hatibû.

Hezkirina Xwedê qezenc kiribûn. Dibe ku dayik mafdar bûna; Xwedê dixwest bi destê wan oleke nû bîne. Bi van fikir û nêrînan, têkildarî olê zêdetir hêvîdar bû.

Ji ber ku dayik ewqasî bi hêvî bibûn, li gel wê jî asoyên nû ava dibûn. Di nava civakê de bi hemû rêxistinbûnan re mijûl dibû. Biçûna kû derê li wir guhertineke civakî pêk dihat.

Jixwe hemû wextê xwe jî ji bo civakê xerc dikir; li ba wan bi her cure pirsgirêkî re mijûl dibû, bi hev re îbadet dikirin û li gorî rêzikên nû yên olê jî rêya her kesî ronî dikir.

Nizanîbûn zeman çawa diherike û diçe. Bêyî westan û rawestan dixebitîn, guhdarî betilandinê nedikirin. Nêzîkatiyên xweş ên civakê şadî dida wan, nakokiyên wê jî liv û tevger zêdetir dikir.

Lê belê, carina ew hêza ku karibe van nakokiyan hel bike di xwe de nedidît. Her tiştên ku nikarîbû wateyê bidiyê wekî pirsgirêk dima. Jê jî girîngtir, ji ber ku di civakê de zilam li pêş bûn, nakokî kûr bûn. Li gel vê tenê bi rêzikên olî bersivdana nakokiyan jî ne mimkun bû.

Herikîna civakî li kû derê kûr bibûna, li wir xwe xurttir his dikir. Pirsgirêkên herî seresere, herî besît xuya dikirin jî yekser bi destê zilaman dihatin afirandin û watedayîna van, tew îcar derbaskirin, hema hema ji hilweşandin û avakirina împaratoriyekê zortir bû.

Tiştên li gundekî hatin serê wê, di vê mijarê de wê berê wê bidana lêpirsînên kûrtir.

Ev gund, hatibû wê astê ku dikarîbû li ser navê jiyana hevpar hema hema bibûna mînak. Lê hevparî tenê di asta maddî de dima. Çawa rewşeke wisa derketibû ortê, Xorrem bi xwe jî tê de şaş mabû. Dema xwest şaşiyên wan bi wan bide fêmkirin jî heqeretên herî mezin ên di jiyana xwe de nedîtine lê kirin.

Hemû aboriya gund li ser baxçeyan bû. Tevî ku jin jî tevlî hemû xebatan dibûn, lê di rêkûpêkkirina jiyana ekonomîk de bi temamî zilam berpirs bûn. Êdî jin nediçûn "Mala Hevpar".

Dema ku şaşiya vê meselê ji jinan re digot, jineke navsere wisa axivî:

-Em ji halê xwe keyfxweş in. Di nav ewqas karî de em ê berpirsiyariya zilaman jî bigirin ser xwe? Bila ew bikin.

Xorrem:

-Ev kar ne karê zilam e. Hûn bi hev re dixebitin, lê encama wê tenê zilam diyar dikin. Ji ber vê jî di her kêliya jiyanê de gotina wan derbasdar e. Hevparî, wekhevî ne ev e.

Dîsa heman jin wekî ji ser hişê xwe çûyî dest bi gotinê kir:

-Xwişka min, hurmeta me ji bo te heye. Em naxwazin te bişkînin, lê tu qarişî têkiliyên me û mêrên me nebe, wê baş bibe! Tenê maye tu bibêjî em di nav nivînan de çi bi mêrên xwe re bikin! Ma wisa dibe?

Dûvre bû hîqehîqa wê û dewam kir:

-Di van mijaran de em bi tecrûbe ne! Hefsarê hevjînên me di dest me de ne. Tu bixwazî dikarim ji bo te behsa nav nivînan bikim. Em vî karî baş dizanin, tu xeman nexwe. Tu li karê xwe binêre! Heke te ji mêrê xwe fêm bikirana, te ew bi tenê nedihişt, wisa bi tena serê xwe li naverastê nedigeriya! Heger tu veqetiyabe bêje, tu bixwazî em dikarin li vir ji bo te mêrekî bibînin!

Hîqehîq ewqasî bilind bû, zêde bû ku dengê wan gihişt malên din ên gund.

Mîna ava keliyayî ji serê Xorremê hat rijandin. Nizanîbû çi bibêje. Ne li benda gotinên ewqasî ketî bû. Heqaret lê hatibû kirin. Di nav van hestan de pir çewisî. Lê bi heman şeklî wê jî bersiv bidana, wê biketana heman astê.

Di ser de jinên din jî li beramberî van gotinan ti bertek nîşan nedabûn; kenê wan jî ji bo ku rewşa wan nîşan bidaya bes bû. Xorrem destpêkê nizanîbû wê çi bike. Bêdeng li cihê xwe rûnişt.

Jinan dîtin ku li beramberî hîqehîqan Xorrem nakene, pir cidî ye û esas aciz bûye, bi xwe jî kenê xwe sekinandin.

-Dilê te ma? Bila dilê te nemîne, em wisa ne, rehet be, derdê me ne li gel zilaman e, derdê me li gel ruhaniyên sexte, esilzadeyên pozbilind û xwînmij, li gel qesrê ye.

Li ser ewqas heqaretê, gotina “rehet be” tam pê li demara Xorrem kiribû. Dîsa jî aciziya xwe kontrol kir. Bêyî tiştekî bibêje, ji wir derket û çû.

Ew roj, wê di dema îsyanekê de jî were bîrê û heta wê demê jî wê ev êşa wê her zindî bimaya.

Li ser navê dîtina rastiya civaka xwe, her çiqasî giran û zor jî be, derseke mezin girtibû.

Piştî vê bûyerê, tirsiya ku hewldanên heta wê demê vala biçin.

Dibe ku tiştên nû, tiştên cuda bikirana. Bi kesên ku jiyana hevpar li şûna îbadetê tanîn cih û wekhevî pir qeba digirtin dest, ev kar wê zehmet bimeşiyana. Milên wan ên hevpar ew bû ku hemû jî ji nîzama feqîrî û zilmê nerazî bûn. Dibe ku hêrseke bikaribe vê nîzamê xera bike rêxistin bikirana.

Nîqaşên li balê bi vî şeklî dewam kirin, wê got lazim e bi xwe biçe ba Mazdek. Êdî dem hatibû ji bo dawiyê li nîzama zilmê bînin agir berdin fitîla raperînekê. Diviyabû Mazdek li şûna bi qesrê re mijûl bibe, bala xwe bidana ser îsyana gel. Lazim bû çi ji destê wê dihat bikirana û Mazdek bianiya nava gel. Bi îsyaneke mezin dikarîbûn vê nîzamê hilweşînin.

Xorrem li gel xwe dihesiband ku di nav gel de potansiyeleke werga çêbûye. Pêwîst bû teqez ev ji Mazdek re bigotana û ew qeneh bikirana.

Li cem Hekîm û Asarayê çûn paytextê.

Lê li paytextê vê carê hewayeke cuda hebû. Herî dawî dema ji wir derketibû, ew der ne ewqasî aloz bû. Di nav gel de bêhizûriyek hebû û ev jî li sûkê-bazarê li her deverê diyar dibû.

Ji kîjan nasên xwe dipirsîn bê ka Mazdek li kû ye, her yekî navnîşaneke cuda nîşan dan. Çûn kîjan adresê fêm kirin ku Mazdek hatiye wir û çûye. Pir westiyan. Fikar bi wan re çêbûn, bêhêvîtî çêbû. Tirsiyan ku qaza-belayek hatibe serî.

Dema fêr bûn Qade li bajer e, keyfa wan hate cih.

Lê belê, çi heye ku ev Qade, Qadeyekî din bû. Şaş bûn, yekî ku heman navê bavê wan lê hebû. Wî jî got ev leqebê wî ye; tê maneya

“pêşeng, rêveber”! Spasiya vî zilamî kirin. Cara yekem bihîstibûn ku wateyeke wisa ya vî navî heye.

Bavo Qade jî nedîtibûn. Niha dilê wan tijî fikar, lingê wan jî bêtaqat bibû.

Mazdek pê hesiyabû ku ew li bajêr in. Bi xwe ketibû rewşeke zoriyê, zilamên rahîban ketibû pey. Tevî vê jî diçû kû derê Pençeşêr pê re bû, ji bo wan biparêze jî ew wezîfedar kiribû.

Xorrem ferq kir ku zilamekî lep mezin li pişt wan e û mîna ku wan dişopîne. Heçkû ew nas kiribû. Hinekî li ser fikirî, nehat bîrê.

Pençeşêr mîna siya wan ketibû pey wan.

Çima ev bajar ewqasî mezin çêkiribûn? Geriyan negeriyan neqediya. Herî dawî jî westiyan. Li ser serê kaniyeke bi hewiz rûniştin.

Asara bi şeklekî gilî û gazind ji Xorremê re got;

-Em wisa bê xeber werin vî bajarê mezin, tiştê were serê me jî ev e.

Li cihê xwe kir ofinî pofinî û movikên lingê xwe miz da.

Hekîm jî bêdeng bû, tenê ji ber ku li cem wan bû, dilşad bû. Êdî ji ber çi bû nizanîbû, lê mîna wan xwe westandî his nedikir.

Pençeşêr xwe nêzî wan kir. Hema li kêleka Xorremê li ser tabûreyeke textîn rûnişt.

Mîna ku ti eleqeya wî bi wan re tine ye, av li rûyê xwe dikir, lê guhê xwe dabû wan.

Fikar bi Xorremê re çêbûn, ditirsiya ku tiştek hatibe serê Mazdek. Fikrên xerab hatin û di serê wê de bi cih bûn.

Pençeşêr dema ferq kir ku çavên Xorremê tijî rondik bûne, dilinî bû, tam wê pê re bipeyiviya, lê wezîfeya wî hate bîrê.

Ew ê mîna hafiyeyekî li pey wan bûya, ew ji her cure xerabî û belayê biparastana. Heta ji bajar derketana jî wê pey wan bernedana.

Xorrem, hewl da li jora dara serwê ya li ber hawizê binêre. Wisa hewl da nehêle rondikên wê werin xwarê.

Dema çavên wê li jor bûn, dît gelek talde bi ser wê de tên, ji nişkê ve veciniqî.

Pençeşêr dereng mabû.

Qelebalixa hatibû ba wan, ew xistibûn nava xwe û wekî sê grûban belav bibûn û berê xwe dabûn cihên cuda!

Pençeşêr nizanîbû wê biçe kîjan milî. Hema ketober xwe da pişt grûbekê. Ew nedîtin, xwe gihand grûba din, li wir jî tine bûn, gihişt grûba sêyemîn jî, lê dîsa nebûn. Fêm nekir ka ev kî ne.

Koma qelebalix bi layên cuda lez belav bibû. Xwe gihandibû hin komên din jî lê ev ne ew ên li ber hawizê bûn. Serê wî tevlîhev bû.

Ji ber şopa wan winda kiribû, panîk pê re çêbû, ji bo agahiyê bide Mazdek ket rê.

Hê ew meydana ku hawiz lê ye derbas nekiribû ku Sermûbedek û li balê jî siwar û peya bi dehan eskerên qesrê dîtin. Mîna ku li hinekan digeriyan. Heçkû wan jî tiştên li pey bûn nedîtibûn û ji ber vê ketibûn nav panîkê.

…

Gûrûba qelebalix a ku di nav sûkê de navê Mazdek gotibû û ew ji nav kolanên teng heta vir bi lez anîbû, ji nişkê ve winda bibû.

Tenê du kes mabûn, yên din çûbûn. Yek bejnkurt, awir tirş, hişk û li ser xwe xuya dikir. Yên din rûpêçayî bû. Çavên wî yên xweşik xuya dikirin.

Xorrem yekî wisa çav xweşik qet nedîtibû. Destpêkê mane neda çima mîna jinekê rûyê xwe pêçaye û ji ber vê tirsiya. Lê wextê ku ji pişt wî paçî peyv herikîn û bi çavên xwe jî watedar kirin, hinekî din bêhna wê hat ber wê.

-Ev der ewle ye, veneqetin ji vir, mezinê me yê rêzdar, Mazdek Bamdad Hemedanî wê li vir we bibîne.

Ji ber behsa welatê wî Hemedan kiribû, bala wan kişandibû. Cara yekem dibihîstin xîtabeke wisa ji bo wî dikin.

Nedihat fêmkirin gelo ev der malek bû yan jî cihekî terikandî mîna perestgeheke kevn bû.

Dîwarê hilweşiyayî derbas kirin, ketin hewşeke ku mîna hezaran salan ti kes neketibûyê. Dibe ku hewşa malekê bûya yan jî ya perestgehekê. Kevirên wê kevz girtibûn, li ser perwazên derîşibakeyên mezin ên ketibûn kêleka dîwêr gihayên zer, kesk zîl dabûn, qurmê daran bi deviyan hatibûn pêçan.

Dema ku "çav xweşiko" û hevalên li balê ji ber çav winda bûn, li derdora xwe nêrîn. Bi qasî ji xirbeyên dîwaran dihat fêmkirin, ev der her çi bûya, lazim bû cihekî mezin bûya. Bermahiyên şkestî yên ku ketober li hawirdorê belav bibûn û şibandin guldank û kûpan, li derdor tijî bûn.

Bêyî ku destê xwe bidin tiştekî, mîna ku di bin lingên wan de morî hene û naxwazin bêşînin, bi gavên hêdî li her derê mêze kirin. Her yekê ji wan têkildarî vê derê û bê ji bo çi hatiye bikaranîn şîroveyên cuda kirin.

Kûpên şkestî yên di rengê kîremetê de ku jê re Karmît digotin, mahzena şarabê anî bîra Hekîm.

Asara şiband dibistanekê, li gorî wê ev ne parçeyên kûpan bûn, depoya avê ya dibistanê bû!

Xorrem jî bal kişand ku li vir avahiyeke kevntir hebûye û parçeyên kûpan jî li gorî wê nûtir in, îdîa kir ku ev der xaneke kevn e.

Heger cihê şarabê bûya, diviyabû di bin erdê de bûya. Dibistan bûya lazim bû odeyên wê ewqasî mezin nebûna. Xan bûya, lazim bû ne di nav van kolanên teng de bûna!

Wan ev nîqaş didomandin, dîtin Mazdek li ber wan sekiniye. Ferq nekirin ji kîjan milî, ji kîjan dîwarî hatiye. Mîna ku ji ezmanan ketî ecêb ecêb lê mêze kirin. Mazdek milên xwe vekirin, ji hekîm dest pê kir û yek bi yek ew hembêz kir.

Dûvre bi ecele got “lazim e em bikevin hundir!”, perwaza şkestî ya li ber dîwêr zîl avêtiye girt, hêza xwe dayê û paşde kişand.

Ji erdê deriyek vebû. Ji pêlikên kevir daketin. Hekîm bi awayekî ji xwe bawer got:

-Mîna min gotî, ev der mahzena şarabê ye, nawîs e!

Feqet, hinekî li jêrê dîtin ku odeyeke biçûk heye, ji çar aliyên wê ve tirêjên rojê lê didin û wisa kêmekî ronî dibe, di hundir de jî doşekek û çend parçe eşyayên malê hene.

Mazdek got, “em ketin saxlemiyê!”

Ew ê ku paç li dora rûyê xwe gerandibû jî behsa ewlehiyê kiribû. Talûkeyeke çawa hebû gelo van behsa ewlehiyê dikirin?

Mazdek pêwîst dît ji wan re rave bike:

-Ji bilî min ti kes nayê vir.

Xorremê got;

-Yên din? Ew kî bûn?

-Ew dostên me ne! Dema em li vir in, ew jî derdorê kontrol dikin.

Gotin li sûkê zilamekî gir jî li pey wan bû.

-Ew jî dostê me ye, ji bo parastina we li wir bû. Lê hayê wî ji wan eskerên ku ji bo hatibûn şandin tine bû. Dema ku dostên me ev bihîstin, ji bo ku we ji wir derxînin nesekinîne, jê re jî negotine.

Hûn nizanin çi bûye, ne wisa?

Ji ber ku we li her devera bajêr bi germahiyeke dostanî her pirsa min kiriye, we têra xwe bal kişandine. Hema hema kêm mabû hûn biketana destê rahîban û eskeran!

Xorrem, hê jî bawer nedikir talûkeyeke wisa derbas kirine. Çi bibû gelo, Mazdek ewqasî tersî qesrê ketibû?

Mazdek, di demên dawî de li qesrê çi qewimiye, anî ziman:

-Êdî bandora berê ya Kûbad nemaye, em mane li ber rehma rahîb û esilzadeyan. Li bajêr, dema em li nav gel in, em rehet in, lê ji ber eskerên li pey me, em vê stargeha veşartî bi kar tînin.

Xorrem:

-Hayê me jê tine bû, ewqasî tevlîhevî çêbûne. Xwezika te hayê me jî jê çêkirana. Tu bihatana ba me wê baştir bûna.

-Ev rewş pir zû çêbû. Di firsenda ewil de me yê hayê we jê çêkira. Em dikarîbûn bihatana ba we. Hatina we xeter bû. Dîsa jî ji ber hûn li vir in, ez keyfxweş im. Ew ê careke din firsendeke me ya wisa çêbibe, nizanim.

Xorrem dîtibû, bixwazin jî nexwazin jî derbasî merheleyeke nû bûne.

Wê jî di vê navberê de çi qewimîne ji Mazdek re got.

Lazim bû di navbera wê û Mazdek de sir nemabûna. Kirinên kurê hekîm û serpêhatiya wî ya xerab jî bi xemgînî got.

Herî zêde Mazdek li ber vê rewşê ketibû. Destê xwe danî ser destê hekîm, xemgîniya xwe anî ziman.

Dûvre Xorremê behsa tecrûbeyên xwe yên li gundan kir. Dayik bibûn pêşengên civakê. Cesaretê zîl dabû, mezin bibû û lez berbelav dibû.

Zindîbûna ji gundan heta bajaran çêbibû, arastekirineke pêşengî dixwest. Lê, bîranîna xwe ya li gundekî jî jê re got. Bê çawa xeyalên wê şkestine. Ev kar wê ne wisa hêsan bûya.

Piştî nîqaşên dûvdirêj, Xorremê got xebatên nav civakê yên ji bo zanekirinê ji her tiştî bi qîmettir in.

Ji bo rojên piştî wê hin plansazî çêkirin.

Hekîm û Asara wê dîsa vegeriyana Gundeşapûrê, li wir bibûna têkiliyên wan; ji bo ku karibin têkiliya pêşengên ku neçar dimînin xwe di nava gel de veşêrin bi Mazdek û Xorremê re çêbikin wê tevneke ku bikaribe lez tevbigere ava bikirana.

Her çiqasî tecrûbeya Asara ya têkoşînê tine be jî, têkiliyên wê yên gel baş bûn. Ji ber vê jî dikarîbû tevkariyên girîng bikirana. Li Gundeşapûrê navên pêbawer nas dikirin.

Hekîm jî dikarîbû çûnhatina navbera bajaran û agahdarkirin bi lez û bez pêk bianiya.

Mazdek bi qesrê re mijûl dibû, Xorremê jî rêxistinbûna nava gel çêkiribû. Xorrem rêxistinbûna pêşeng a di dema Manî de dizanîbû, ji bo ku karibe vê pêşdetir bibe, pêşketîtir bike jî bingehekî xurt çêkiribû.

Pêşengên bijarte û pêşengên civakê pev re tevdigeriyan. Ji ber ku wekî berê li navendekê kom nebibûn, her herêm di nav xwe de kom dibû, rêveçûn dinirxand û biryarên xwe ji bo hemû pêşengên civakê yên li gundan radigihandin.

Hedefeke ewqasî mezin a rêxistinbûna civakî, hunereke mezin dixwest, li gund-bajaran pirsgirêkên pêşengiyê derdiketin ortê.

Dema ku ji ber pirsgirêka pêşengiyê pêkanînên şaş dibûn jî rê li ber bertekên civakê vedikir.

Xorrem dema ku digot her kes wekhev e, nedigot her kes eynî ye. Mirovên cuda xwedî pêdiviyên cuda bûn û hunerên wan ên cuda hebûn.

Yên ku ev fêm nedikirin, carina kar tevlîhev dikirin. Ji nû ve komkirin jî pir zehmet dibû.

Tevî ku di kevneşopiyên civakî de her kes li ber çav tê girtin jî, lê ji ber zext û çepandinên bi salan ên qesr û rahîban ev demara civakî zeîf bibû.

Her çiqasî lawaz bibe jî demara heyî her kêlî li her derê zîl dida, hafizaya civakî bi awayekî gur û geş zindî dibû.

Civaka mezinbûyî, dihat maneya têkoşîna mezinbûyî. Ji ber ku jinan di nav vê têkoşînê de cih digirtin, civakê jî wêrekiya xwe ya herî mezin qezenc kiribû.

Pêşengên civakê dayik bûn, lê li her derê jin nikarîbûn derketana pêş. Hê jî bandorên berê giraniya xwe didan hiskirin.

Li her devera ku jin derdiketin pêş, cesaret û bawerî didan her kesî, lê li gorî giştî hêna pêşketineke sînordar hebû.

Çavkaniya herî mezin a hêviya Xorremê, hêza jinan bû. Bi vê boneyê wê hêza civakê derketana ortê. Ev bi çavê xwe didît, fêm dikir ku bûyerên şahidiyê jê re dike xwedî bingehên kûr ên dîrokî ne.

Heger li dora qesrê bimaya, neçûna nav civakê, ew ê nebûna xwedî fikir û hêviyeke ewqasî mezin jî.

Jinên ku di nav civakê de ketibûn tevgerê, tenê cesaret nedidan, dihişt ku fezîletdar jî bin. Ev çawa dibû? Û çawa dikarîbûn li hemû dinyayê berbelav bikirana? Ev destpêkê di nav xwe de, dûvre li her derê bi her kesî re nîqaş dikirin.

Nîqaşan mirov zane dikirin, jê wirdetir ji bo ku karibin jiyana heyî ya koledar red bikin cesaret dida wan.

Li bajarekî, li beramberî hezar zilamî, dema jinek tevlî nîqaşan dibû, ji hemûyan zêdetir bandor dikir.

Bi tena serê xwe nîqaşkirin, axaftin jî ji bo jinê şoreşeke mezin bû. Civak wisa diguherî.

Zilaman, dema fêm dikirin zanebûnên şaş û çepandî yên olê di ruhê wan de bi cih bûye û lewma jî wekî heywanekî nêzî jinê dibin, nêzîkatiyên xwe diguhertin.

Bi saya Xorremê, ne tenê jin, êdî bawer dikirin ku ruhekî heywanan jî heye.

Dema ku jinek di nava civatekê de dipeyivî, îrade û baweriya xwe datanî ortê, darazên bi kok dihejandin, bandoreke erdhejê di mejiyê wan de çêdikirin.

Di vê civakê de wer bawer dikirin ku piştî mirinê wê dîsa vegerin vir, û tenê zilam dikarin wekî mirov dubare vegerin. Hunera herî mezin a rahîbên ku Avestaya heqîqî tine kiribûn, derewên têkildarî jinê bû. Civak jî bi vê dabûn bawerkirin û ev jî hunereke mezintir bû.

Ji bo jinan jî digotin, piştî mirina wê ruhê wê wekî mirovekê venagere, enceq wekî heywanekê dikare jiyana xwe ya duyemîn bijî. Koletî jî jê re zêde didîtin.

Halbûkî, berevajî hemû vegotinan, hinek bawermend hebûn ku digotin hêz û mezinahiyeke mezin a jinê heye. Ev jî ji bo Xorremê bibû spartekeke baş.

Têkildarî hêza civakî ya jinê ku çavkaniya wê ya hêzê ye, ji bilî hisan ti kesekî pir zane tine bû.

Xorremê ev his bi zanebûnê strabû û ji her kesî re jî digot. Her ku tecrûbeyên xwe radigihand, asoyê Mazdek jî fireh dibû.

Jinê hêza xwe ji karakterê xwe yê civakî digirt. Zilam jî erkê xwe li ser civakbûna lawazbûyî ava dikir. Ji ber vê yekê jin zû dibûn yek, zilam jî zû dijberî hev dibûn, lez belav dibûn.

Her kesên ku hêza pêkhêner li ba jinê didîtin, bi rêzdarî nêzî pêşengiya wê ya têkoşînê dibûn.

Dijminê herî mezin ê jinê, cehaleta tarî bû. Dewleta ku ev tarîtî afirandibû, îdîa dikir ku ruhê jinê tine ye, ji eşyayekî ferqa wê tine ye û jinên ku pêşengiya civakê dikirin reş dikir.

Jinên ku Mazdek û zilamên wî “revandine” ji olê derketine, yên guhdarî wan dikin jî gunehkarên herî mezin bûn. Ji bo Xorremê jî gotinên nayên ser ziman digotin.

Lê çi bikirana jî nikarîbûn pêşî li serhildana jinê bigirtana.

Yên ku îdareya dewletê di dest xwe de digirtin hemû artêşên xwe seferber bikirana jî wê nikarîbûna jinên ronîbûyî îdare bikirana.

Ev nîqaş û fikrên nû careke din hiştibûn ku Mazdek xeyalên xwe berfirehtir bike.

Sînorê pêşketinê tine bû. Sînorên hişk li derveyî projeya Mazdek a guhertinê bû.

Teqîna zêhnî rê li ber teqîneke civakî vekiribû. Gotina Qade hat bîrê, di dema xwe de ji siya qesrê xelas nebibû. Ev jî di encam de anî û bi nebesiya xwe ya daneheva têkildarî civakê girê da. Xorrem nebûya, wê neketana ferqa van.

Niha civak û qesr hatibûn dijî hev. Ew bi xwe jî li cihekî krîtîk bû.

Rêveçûnan pêwîst dikir ku Mazdek hinekî din bi baldarî tevbigere.

Wextê komên biçûk ên bi fikrên nû teşegirtî li dorê bûn, hêna talûke nehatibû ber derî. Lê niha qelebalixên mezin ketibûn hereketê.

Her ku rizgarî nêz dibû, xeterî jî mezin dibû.

## BEŞA SÊYEMÎN: AGIRÊ AZADIYÊ

### Rojên Raperînê

Tebeqeyên jorê, dewlemendbûna xwe li ser pişta mirovên ku roja xwe bi pariyek nan derbas dikirin, qezenc dikirin. Di ser de ew bi tiraliyê sûcdar dikirin û ev encam wekî jêhatîbûna xwe dinirxandin. Ji fikrên biçûk ên ne li gorî wan, îcar ji nêzîkatiyeke biçûk a ku wê jiyana wan biguherîne nefret dikirin. Piştî ku rehetiya wan xera nekir, dikarîbûn bibûna parazvanên herî mezin ên hemû fîlozofên cîhanê. Ji dîmenekî herî dîndar heta mirovekî herî camêr dikarîbûn biketana her rolê. Heke yekî ku bixwestana dest li wan bide derketana jî, ha wê demê cinawirê di hundirê wan de derdiket ortê.

Belê gel? Gelê feqîr? Gelê ku di bin lingan de hatiye hiştin, di bin zilmê de dinale, kirine mehkûmê jiyaneke koledar? Dema gel şiyar dibe, ne lehî ne jî aşût dikare raperîna gel rave bike. Gelê ku jê re cahil digotin, nedixistin şûna heywanekî jî, hestiyekî kûçikan jî lê zêde didîtin, êdî şiyar bibû. Kêr gihabû hestî!

Li pêşiya hişmendiya şiyarbûyî ti tişt nikarîbû bisekiniya. Her çiqasî Mazdek ji bo îsyanê nexebitîbû jî Xorrem bi daxwazeke wisa bû û di encam de hişmendiya gel ronî bibû, diket ferqa hinek tiştan. Êdî Mazdek bi xwe jî nema dikarîbû li pêşiya vê herikîna nû bisekiniya.

Helbet, Mazdek ya hêsan hilnebijartibû. Şerê fikrî ji hemû şeran zehmettir bû. Şerê fikrî, ku li qesrê diqewimî, ne besît bûn, feqet heman fikir li gundan bi kelecaneke germ hatibûn pêşwazîkirin, terzekî jiyanê yê piştevan û berxwedêr derxistibû ortê.

Tovên serhildanê jî van fikran danîbûn. Lê armanc ne “hilweşandin û avakirin bû”. Hewl dabû nû bike, ji bo ku ya guhertina wê pêwîst dikir biguherîne kar dikir. Her çiqasî hemû hewldana wî ji bo vê jî bû, di dilê gel de agirê îsyanê pê ketibû. Ti kes nikarîbû jê re bibûya asteng. Dema ku agir bi fitîlê ketibû, Xorrem di nava gel de bû.

Bûyer çêbibûn û hêrsa gel derxistibûn lûtkeyê.

Agahiya ku rahîb û dihkanan li Gundeşapûrê yek jê jin, 7 kes îdam kirine, li her derê belav bibû.

Gel ev cinayet wekî agahiya qetlîameke mezin û zilmên mezintir li dijî xwe ditîbû.

Ji bo ku karibin pêşî li vê bigirin, di nav xwe de nîqaş dikirin. Kuştina qazî cesaret bi wan re çêkiribû. Ji bo ku hêrsa mezinbûyî bi cesareteke mezintir mîna volkanekê biteqe tenê çirûskeke biçûk bes bû.

Gotinên Mazdek ên der heqê ol û statuyên civakî de li ser zimanan belav dibû. Êdî li her devera welêt însanên wisa hebûn ku digotin wê serî li ber vê nîzama neheq netewînin.

Di nava gel de agahiyek hebû û ji her tiştî zêdetir bandor kiribû: Dihat gotin ku Qral Kûbad hatiye ser dînê Mazdek! Tevî vê jî esilzade, rahîb û dihkanan xwîna gel dimêtin. Heger qral jî li aliyê wan bûna, wê çaxê dikarîbûn bi rehetî li dijî dewlemendan serî rakirana.

Di rewşeke wisa de ti kesî nikarîbû bi wan feqîrên bindest bigirtana. Êdî dema tolhildanê hatibû!

Li çend deverekê zeviyên dihkanan hatin şewitandin. Ev agahî bi lez berbelav bû.

Gelê ku bi baweriya Mazdek û sekna wêrek a Xorremê serî rakiribû, wekî berteka yekemîn dest danenîbûn ser malên dewlemendan, lê şewitandibûn.

Her fikrên nû ji bo wan dibû çavkaniya heyecaneke mezin, her çalakiyeke biçûk dibihîstin jî bi dehan qatan mezin dikirin, belav dikirin û didan bihîstin.

Bi taybet jî fikrê ku hemû mal û milk aîdî gel e, ji gundan heta bajaran hiştibû ku gelê feqîr zindî bibe, bibe xwedî cesaret û hêviyê.

Di nava gel de êdî girîngiyeke tebeqeyên civakî nemabû. Tiştên aîdî wan nedana, wê bi xwe bi zorê bistendana. Mirovên ku bi xeyalên wisa şîdet barkirî tijî bibûn êdî nikarîbûn bihata zevtkirin.

Di nava demeke kurt de hejmara bûyeran zêdetir bû. Hê li ortê bûyereke wisa mezin tine bû, lê eskerên dihkanan ketin nav liv û tevgerê.

Yên xwediyê xakê tirsiyabûn. Wekî çawa bi tirsa ku wê her tiştên di dest wan de biçe tevdigeriyan, her wiha di ber de jî garnîzon dikişkişandin.

Hin garnîzonan êrîşî gel kiribûn û qetlîam kiribûn. Agahî belav dibûn, digotin çend dihkan û zilamên wan jî li cem eskeran êrîşî gundiyan dikin û qetlîaman pêk tînin.

Vê carê, mezinên wan jî ji bo ku ev agahî bi şeklekî pirolekirî belav bibe bi taybet hewl didan. Hesab kiribûn ku wê wisa çavê gel bitirsînin û biçewisînin.

Lê tersê wê bû; ti tiştekî ku gelê feqîr ji dest bide tine bû, li şûna ku xwe bidin paş, bi hêrsekek mezin tijî bûn û wisa li her deverekê ketin nav liv û tevgerê.

Li dijî nîzama zorbetî û zilmê hewayeke îsyanê çêbibû. Ji ber ku mirov hatibûn ba hev, wêrekî jî zêdetir bibû. Li hin gundan dewlemendan hemû malên xwe berdabûn û reviyabûn.

Li ser vê, hêviya gel zêdetir bibû, ji bo ku karibin heqê xwe bistînin û dawiyê li nîzama mêtingeriyê bînin, her tişt dabûn ber çavên xwe.

Esilzadeyan hayê qral ji meseleyan çêkirin û alîkariya eskeran jê xwestin.

Lê qral gote wan ev îsyan ne li dijî wî ye, ji vê jî esilzadeyên ku gel bêzar kirine berpirs in. Yên ku zêdetir israr kirin jî bi bersiveke kurt bêdeng kir:

-Li naverastê ti îsyan tine ye!

Kûbad dixwest tirsa îsyanê baş bikeve nav dilê esilzadeyan.

Tenê ji bo ku li hin sedrapan hejmara eskeran bê zêdekirin emir da, ji bilî vê tiştek nekir.

Canê dihkanan ketibû xeteriyê. Çiqasî ji paytextê alîkarî xwestibin jî lê dîsa jî bi tenê mabûn. Ji ber vê jî pir kesên wisa reviyan. Li her deverên ku ev reviyan jî xakên heyî bêyî ku xwîn birêje ket destê gundiyan.

Yek ji dihkanên bi zorbetiya xwe navdar jî Ferwer beg bû. Ewqasî bi xwe ewle bû ku bawer dikir bi çend zilamên xwe ve dikare hemû gundiyan bêdeng bike. Her tim ji wî tirsiyabûn. Guhdarî wî kiribûn. Wê newêrîbûna derketina ber wî!

Mîna ku yê ew xistibûn şûna beq û kûçikan ne ew bû, li gel xwe digot, “bi salan min zikê wan têr kir, min hişt ku karibin li malbatên xwe binêrin, wê begekî wekî min ji kû bibînin!”

Ji bo ku bizane ev fikrên wî şaş in, pir zêde wext derbas nebû. Agir bi hemû gundan ketibû, hat xwe da ber deriyê wî jî. Îmana

gundiyan çikandibû; hemû xizmên wan gundiyên ku êşkence li wan kiribûn û qetil kiribûn li hev kom bûn. Niha dema hesabxwestinê bû.

Gundî li hewşa mezin a qonaxê kom bûn. Her tiştên ku dikarîbûn wekî çekê bi kar bînin jî girtibûn destê xwe.

Ferwer beg wekî kevirekî lê hatibû, ji tirsa newêrîbû serê xwe ji şibakeyê derxîne.

Gundî ji bo lihevkirinekê hatibûn.

Digotin, “Xakên em diçînin ji me re bihêle. Yê din bila ji te re bimînin, besî te ne!”

Dema ku deng ji Ferwer beg nehat, vê carê hewl dan deriyê qalind ê ji dara qaçê vekin. Mîna deriyê kelheyekê saxlem bû.

Ji bilî gundekî, hemû gundên derdor xistibûn bin kontrolê. Ev jî di bin destê Ferwer begê zorbe de bû.

Hemû eraziyên gund aîdî Ferwer beg bû. Tiştekî ku dest danenîbû ser nemabû. Tevî ku didît raperîn geş bûye jî bi sê zilamên xwe ketibû mala mezin û hewl dida otorîteya xwe ya xwînî bidomîne. Dema ku dora qonaxa wekî qesrekê hat girtin, cara yekem his kir ku êdî hatiye dawiya rê.

Di nav wî gelî de yek hebû ku li dijî malbata xwe jî serî rakiribû. Ti kesî bendewariya wêrekiyeke wisa jê nedikir, lê bibû yek ji pêşengên îsyanê: Perwa!

Perwa ji nav qelebalixê xwe da paş. Li dora malê geriya, li piştê dît şibakeyeke biçûk heye, dikare ji wir bikeve hundir.

Ji bo ku karibe bi wê şibakeyê rapelike, li derdorê çavê xwe li dirênceyekê yan jî tiştekî mîna wê gerand. Dema nedît, dîsa vegeriya nav qelebalixê û bang li ciwanan kir. Xwest derkevin ser milên hev û kûleyekê çêbikin. Wisa di ser milên wan re xwe gihand şibakeyê û xwe berda milê din, ket hundir.

Dema ket hundirê malê, ferq kir ku ber bi jêr ve dirênce dadikevin. Hê nû hatibû serê dirênceyan, zilamên Ferwer ew ferq kirin.

Hema hema li pişta wî bûn. Mîna firiyabû xwe gihand derî. Her çiqasî ji piştê li texma dilê xwe kêrek xwaribe jî xwe gihand derî û ji piştê vekir.

Dema yên li pêşiyê xwe dan derî, vê carê herdu baskên derî jî vebûn. Qelebalixê dît Perwa di nav xwînê de ye û berê xwe da zilamên Ferwer. Dema ku Perwa diket erdê, wan jî berê xwe dan hundir.

Piştî hewldaneke zêde û berhevdaneke xwînî her sê zilam jî li erdê çît kirin. Wê çaxê hinek kes jî ji gel mirin. Tevî vê jî kesî xwe neda paş. Dema ku laşê xwînî yê Perwa li erdê dîtin dîn bûn.

Ferwer li odeya xwe ji bo ku xwe veşêre li cihekî digeriya. Lê, bi pehînan derî vebû.

Çavê Ferwer jî mîna deriyê odeya wî vebû. Zimanê wî lal bû.

Xwîn rijiyabû. Qelebalixê întiqam dixwest.

Bi çengê Ferwer girtin û derxistin derve. Li malê geriyan, lê ti kesên din tine bû.

Malbata xwe şandibû cihekî din. Jixwe li wir jî bûna niyeta gundiyan tine bû bela xwe di wan de bidin. Lê xwîn rijiyabû.

Dema ku zimanê Ferwer vebû, vê carê li ber wan geriya. Di nav gundiyan de, ji ber ku cilên wî parçe parçe bibûn, wekî mirîşkeke rût mabû.

Qelebalixê berê xwe da milê bîrê. Li ser bîrê darekî saxlem danîn. Ferwer li ser bîra beqan daliqandin. Piştre laşê wî yê mîna mirarê keran giranbûyî û nepixî bi ben girêdan û ji qirikê li pey xwe kaş kirin.

Gotin, ew ê wekî heywanekî vegere dinyayê. Hemû heywan derxistin û meytê wî avêtin axûrekî.

Dest danîn ser heywan, mal, eşyayên wî û di nav xwe de parve kirin. Ketin nav malên kurê wî, birayê wî û apê wî jî. Bi dewlemendiya wan hemû gundên li welat dikarîbûn xwe têr bikirana. Ewqas dewlemendî ji bavê xwe girtibûn. Helbet wê birçî nemana!

Û dema ku ev dewlemendî bihatana parvekirin jî li cihê biçûnayê wê dîsa birçî nemana helbet!

Di heman wextî de li nav bajêr qelebalixek mezin kom bibû, dûvre bibûn du beş, ber bi perestgeh û garnîzonê ketibûn tevgerê.

Komek, bêyî mêze bike ka rahîb li hundir in yan na, li beramberî perestehê agir berda agirgedeyê.

Heger agirgehek hatibana pêxistin, êdî wê ti kes nikarîbû li beramberî gel bisekiniya. Agirgeha pêketî, dihat maneya şewitandina baweriyên korbûyî, rêzikên sexte yên olê, koletî û tirsê. Ya ku hatibû şewitandin, bêhêvîtî bû!

Hêvî mîna tavê hilhatibû. Gelê ku agir berdabûn agirgehê “hêvî” dîtibûn.

Koma din berê xwe dabû garnîzonê. Eskerên ku bi xedariya xwe ve hatibûn naskirin derketin pêşiya wan. Lê hêrsa gel ji xedariya wan

jî mezintir bû. Koma herî qelebalix a ji gundan kom bibû ev bû, hejmara wê bi hezaran bû. Di nav wan de çavkaniyeke cesaretê hebû. Ji ber vê jî ji bo mirinê amade bûn, ji ber ku ya di nav wan de dayika hêviyê bû.

Xorrem, serê vê komê dikşand!

Xwîna yekemîn, eskerên ser sor rijandin. Ji tîrên wan 3 lib li singê ketibûn. Wê kêliyê qelebalix li cihê xwe sekinî.

Ya ku xwîna wê rijiya jineke pîr bû. Keça wê jî di nav qelebalixê de bû. Dema hat ser serê wê, laçika xwe derxist û xist nav wê xwîna li erdê, li serê xwe girê da. Hat ba Xorremê sekinî.

Li pêşiya wê Pençeşêr sekinîbû. Di dest wî de şûrekî mezin û stûr hebû. Li kêlekê jî Ardil Şanaz hebû. Dema ku şûrê xwe ji kalana neqşkirî derdixist, yên li piştê ji keyfa qîr dan.

Çavê Xorremê li jinekê ket, ku hewl dida ji ber destê Pençeşêr xwe bigihîne Xorremê. Bi çavê xwe bawer nekir: Ew jin bû, beriya demeke kurt li ber gundiyan heqaret lê kiribû, henekê xwe bi her tiştî kiribû.

Rondik ji çavên wê dihatin xwarê, xwe avêt hembêza Xorremê, lêborîn xwest. Di kêliyeke wisa de nêzîkatiyeke wisa, Xorrem qet ne li bendê bû. Bêyî tiştekî bibêje, tenê destê jinê yê kêrgirtî rakir jorê û ji qelebalixê re got “bimeşin!”

Ji nav qelebalixê çend kesekî cenazeyê dayikê danîn milekî, yên din bi îşareta Xorremê meşiyan.

Ji nişkê ve wekî pêla behrê bi ser eskeran de çûn.

Tiştên ji ber şûrên Pençeşêr û Ardil Şanaz diman, gundiyan bi xençer, dar, bêr-teviran dan ber xwe. Di demek kurt de ketin nava garnîzonê.

Beşa haremê dîtin. Cariyeyên hundir ji xwe tirsiyan, lê ew derxistin derve. Gotin êdî ew azad in, bixwazin dikarin li cem wan jî werin. Hin ji wir reviyan çûn, hin jî tevlî wan bûn.

Garnîzon dişewitî, Xorremê got, “Tola Dayê Sûremê hat rakirin!”

Nizanîbûn çend termê eskeran li pey xwe hiştine.

Miriyên xwe rakirin û berê xwe dan gundan. Wê rojê yek jê jineke kal, 4 kes miribûn.

Ardil Şanaz ji lingê xwe giran birîndar bibû. Ji ber ku dest ji birîna xwe berda û pêşengiya raperînê domandibû, lingê wî bibû kangren. Dema lingê wî dihat jêkirin jî bi qasî jê hat bi dengekî bilind stran gotin.

Ji ber ku Ardil Şanaz birîndar bibû, demekê vekişiyan û bêdengiyek çêbû.

Agahiya ku garnîzonek hatiye şewitandin, bi dehan esker hatine kuştin; mala dihkanekî û xakên wî hatine talankirin û agahî jê nayê girtin, di demeke kurt de gihişt heta qesrê. Bû sebeba nîqaşên germ. Ji bo ku qral eskeran bişîne zexta li serê zêde kirin.

Pir wext neket navberê, bihîstin ku li her derê agirgeh hatine pêxistin, bi ser harêman de hatine girtin û cariye birine.

Gotinên mîna, "Mazdek malên me yên pîroz dişewitîne, dest datîne ser xak û jinên me, em li benda çi ne? Em bigirin, cezayê wî bibirin, bikujin!" qesir rapêçabûn.

Xorrem gotibû bila ti kes destê xwe nede sê agirgehên qadîm. Ev der bi saya "dostan" diparast. Ji derveyî van, li ser hemû agirgehan, Zerdeştiyên sexte desthilatdariya xwe ava kiribûn û her yek kiribûn navendeke zilmê. Ji ber vê jî gel digot dema ev der bên tinekirin wê ol jî rizgar bibe û wisa êrîş kiribûnê.

Mazdek jî nizanîbû wê îsyan bigihêje kû derê, got piştî vê merheleyê êdî lazim e pêwendiyê li ba qesrê deyne, di hin mijaran de bi rahîb û esilzadeyan re bipeyive, li hev bikin û têkildarî vê mijarê li cem hevrêyên xwe nîqaş meşandin.

Piraniya wan heq danê, lê beşekê jî digot lazim e em nesekinin, heta dawiyê biçin. Xorrem jî yek ji van bû.

Heger bisekine, wê esilzade li her derê êrîş bikin û gel dikarîbû vekişiya.

Hewayeke wisa çêbibû ku êdî Mazdek nikarîbû ti axayekî bikşîne ba xwe. Dema ku dihat ber çavên wan wê hemû dewlemendiyên xwe ji dest bidin û bên kuştin, li dijî Mazdek hemû bibûn yek. Karê wan tam zehmet bibû.

Kêliyek krîtîk a biryardayînê bû. Dema ku nîqaş dihatin kirin, ji qesrê xeberek nebaş hat û ji bo gel hat ragihandin:

Qral Kûbad ji textê xwe kişandibû, li şûnê kurê wî Xusrew bibû xwediyê textê! Demsal bibû zivistan. Teqwîmên mîladî sala 531'ê nîşan didan.

**Lêgerînên Dawiyê**

Tevgera raperînê ya gel mezin dibû. Lê li ba xwe pirsgirêkên mezin jî tanî, bi taybet mijara şîdetê ji ber çavên Mazdek nediçû.

Sedrapiyan jî tundî bi kar tanîn. Gel jî bersiv dida vê. Mazdek dît ku her roj li beramberî şîdetê zêdetir şîdet tê bikaranîn, ji bo hemû alîgirên xwe xebereke nû şand.

Da xuyakirin ku kuştina mirovan gunehê herî mezin e û her kî di vê mijarê de lê guhdarî neke û hema wisa zirarê bide mirovan ew ê ji xwe nehesibînin.

Ev daxuyanî dikarîbû bi lez belav bibûya, lê belê gundiyên serî hildayî hêdî hêdî belav kirin. Dîsa jî Mazdek herî dawî kontrol xist destê xwe.

Wer dihesiband ku ji ber zexta rahîb û esilzadeyan Kûbad ji textê qeriyaye.

Hinan digotin ev destketiya mezin encama têkoşîna wan e, halbûkî Kûbad piştgiriya Mazdek kiribû. Tevî kesên ku ji ber hêrsa kombûyî nikarîbûn encamên siyasî yên bûyeran jî rastbînî binirxandana, Mazdek pir hestiyar nêz dibû û hewl dida bûyeran baştir fêm bike.

Hatibûn merheleyeke pir krîtîk. Heger desteka wan a li qesrê ji dest biçûna, dibe ku her tişt ji nişkê ve berevajî jî bibûya.

Neçar ma ew kesên ku bi şeklekî şaş keyfa xwe ji her bûyerên li qesrê tîne hişyar bike.

Got, ji ber ku Kûbadê di her mijarê de îqna bûyî ji textê daketiye, îhtîmal heye rûhanî û esilzade bi bandortir bibin û ji ber vê jî lazim e her kes zêdetir bi tedbîr tevbigere.

Talûkeya herî mezin jî dikarîbû ji hikumdarê nû bihatana.

Qralê nû, kurê Kûbad, Xusrew bû. Ruxmî ku zêdetirî sê mehan li ser textê jî bû hê ne diyar bû wê çi bike.

Welat ji serî heta binî dikeliya. Agirên îsyanê hêdî hêdî dor li qesrê jî digirt.

Xusrew, wekî temen ji Mazdek biçûktir bû. Lê pir azwer bû û li gorî nêrîna wî heger di dema îsyanê de li ser textê rûniştibe, xwîn nerijiyabana nedibû.

Şêwirmendên wî digotin lazim e li dijî dijminên olê hemû artêş bikeve nav tevgerê. Lê di serê wî de planeke cudatir hebû.

Bavê wî piştgiriya Mazdek kiribû. Bi saya vê jî rahîb, esilzade û hemû hevrikên xwe kiribûn bin destê xwe.

Wî bi xwe jî dikarîbû polîtîkayeke hevşib bişopandana! Bi gotineke rasttir, dikarîbû dîmenekî wisa bidana û encameke leztir bigirtana.

Binvebinve li her deverê ev agahî belav kir:

"Li beramberî Mazdekiyan wê Xusrew jî polîtîkaya bavo bişopîne, heger dawî li îsyan û tevlîheviyê bînin wê wan sûcdar neke!"

Esilzadeyên ev bihîstin, ziravqetî bûn û hewl dan hejmara eskerên xwe zêde bikin. Oldaran jî li her derê fitne û fesadî belav kirin.

Agahî beriya her kesî gihişt Mazdek û hevrêyên wî. Ji ber ku li paytextê bûn, li ber pozê qesrê bûn.

Ji bo ku rewşê tam fêm bikin, tedbîrên ku karibe dijwariya îsyanê kêm bike pêş xistin.

Piştî ku Xusrew hinekî rewş nerm kir, vê carê jî xwest yekser ji bo Mazdek agahiyê bişîne.

Xusrew, dostaniya wî û bavê xwe bi bîr xist, garantî dayê ku dikare fikrên xwe li her derê azad biparêze û bi banga aştiyê Mazdek dawetî qesrê kir.

Tevî ku ji ciwantiya wî ve ew nas dikir jî, lê hîç nizanîbû çiqasî bawerî bi gotinên Xusrew tên.

Li milê din jî eskeran bi ser gundan de digirtin û mal dişewitandin. Dema ku ev bang bihatana nirxandin, dibe ku zexta mezin a li ser gel bihatana bidawîkirin.

Di ser de jî raperînê peyama pêwîst dabû. Ji bo guhertinê lihevkirinek çêbibûya, ev rewş wê ji bo her kesî ya herî bi xêr bûna.

Fikarên Xorremê zêde bûn:

-Tu neçe, komek dikare destpêkê biçe û niyetê wan fêm bike. Çûyîna te pir bi rîsk e. Em nikarin vê rîskê bidin ber çavê xwe.

-Yê ku hatiye dawetkirin ez im. Ez neçim, niyeta qesrê jî nayê fêmkirin.

-Heger tu biçe dibe ku tu venegere, em nikarin pê razî bibin.

-Temam, em hinekî din bifikirin û rewşê bişopînin, lê em nikarin demê pir zêde dirêj bikin.

Dema ku Mazdek nerm nêz bû, Hekîm jî nêrînên xwe gotin:

-Ne îro ne sibe ne jî demeke din hevdîtineke wisa çêdibe! Ez bi temamî dijber im. Îsyanek çêbûye, wê bixwazin tola wê hilgirin.

Dûvre mamoste peyivî. Got Mazdek çi bike bila bike ew ê li balê be.

Mazdek ji bo ku hinekî wextê dirêj bike, liv û tevgera xwe li gorî ku heçkû ne li bajêr e û ji ber vê yekê agahiya hatiye şandin negihîştiyê, eyar kir.

Bi rojan xew neket çavên wî. Fikirî. Di vê navberê de xwe da benda dengekî ji Çiyayên Medê. Dihat gotin ku hêzeke mezin kom bûye û wê biharê bikevin tevgerê.

Li ser van gotegotan lêkolîn kir, ka rast in yan na. Heger hêzeke şerker hebûna, lazim bû xwe bigihandana wan. Lê belê, ev gotegot heta dawiyê jî wekî gotegot ma.

Dostên wî dikarîbûn li bajêr ew biparastana, lê ji bo ku karibin îsyanê bigihînin merheleyeke dîtir hejmara şervanên wan têrê nedikir.

Ji Çiyayên Medê jî agahî nedihat. Di vê rewşê de dikarîbû çi bike?

Zeman dest xistibû qirika wî, dişidand û digot “biryarê bide”.

Êrîşên eskeran sekinîbû. Ji bajaran jî agahiyên cuda nehatin. Mîna ku hawirdor aram bibû.

Herî dawî biryar da ku biçe. Heger di nav meseleyê de dek û dolab hebûna jî rêyeke din a fêmkirinê tine bû.

Heger ne lîstok bûna, rêveçûna meseleyê wê li gorî dilê wî bûya. Heger fen û fût hebûna, enceq li gorî vexwendinê tevbigeriyana wê karîbûna kifş bikirana.

Her çiqasî nikarîbû dostên xwe îqna bike jî biryara xwe ya çûyînê neguhert.

Dostên wî jî xwestin pê re bikevin nava qesrê, lê Mazdek qebûl nekir. Heger lîstokek hebûna, di nava qesrê de dostên wî jî nikarîbûn tiştek bikirana û ew ê jî biketana xeteriyê.

Di her kêliya jiyana xwe de rîskên mezin hatibûn pêşiyê û bi ser wan de meşiyabû. Vê carê jî wê paşde gav neavêtana.

Lê belê, hevalên nêzî wî gotin ew ê wî bi tenê nehêlin û helwest nîşan dan. Yan wê bi hev re biçûna yan jî wê Mazdek neçûna. Dema bi hev re bûna, her çiqasî pirsgirêka ewlehiyê ji ortê ranekiriba jî herî kêm ji bo rêzdariya Mazdek û doza wan ev neçarî bû.

Mazdek nikarîbû heta dawiyê li dijî vê nêrînê bisekiniya. Ji kesên nêzî wî komek amade kirin. Komeke ku dikare samimiyet û cidiyetê bide avakirin, komeke biryardar û komeke ku ti kes newêribe destê xwe bide wan!

Xorrem û ti jinên din wê neketana nav vê komê. Gelek sebebên vê hatibûn gotin.

Hê beriya îsyana gel dest pê bike, bi hinceta mijara jinê xwestibûn Mazdekî reş bikin. Li gel vê, kevneşopiyên demê rê nedida ku li ba jinekê tevlî qebûla li qesrê bibin.

Xorrem wekî jineke pêşeng dikarîbû biketana nava komê, lê ji ber ku tevî Mazdek herdu jî wê biketana rîskê, her kes li dijî vê derket.

Hêvî û dudilî di nav hev de bûn. Ev mirovên wêrek ên meydan ji zeman dixwestin hemû tirs danîbûn milekî.

Ew ê biketana nava dilê împaratoriya tirsê, li qesrê qralê nû bidîtana û eger bikarîbûna wê li ser navê gel hevpeymanek çêbikirana.

Tevî ku nedihat zanîn li qesrê çi li benda wan e jî her tişt dan ber çavê xwe û derketin meydanê.

**Komplo û Qetlîam**
**Tobeya gur mirina wî ye!**
**(Gotina Pêşiyên Kurdan)**

Tava ku wê îhtişama paytextê derxistana holê dikira hilata. Lê li gelê ewr jî kom dibûn. Kêm mabû bihar bihata. Hema hema meha Adarê nîvî bibû.

Çend parçe ewrên spî yên ku asîmanê şîn dixemilandin, mîna şivanekî kal ê rihspî û mihên wî xuya dikir.

Hewayeke hiznê hebû. Nediyar bû ji ber ewran e yan jî ji ber strana ku ji milê çem dihat.

Dengê strana ku ji qeyikên masîgirên li ser ava Dîcleyê bilind dibû, diyar bû aîdî kê ye.

Di serê sibê de dengê ti kesî mîna yê wî wisa gur nedibû. Kesê ku hê "rêya dengê wî" venebibû, lê wisa qîrewîr ji qirika wî derdiket, diviyabû spêdê bi dengê xweş enceq strana xwe ya herî dawî bigotana!

Masîgiran hez dikirin serê sibê û êvarî stranan bibêjin.

Ew, ji ber ku ji şevê ve derketibû derve, serê sibê dengê wî beriya yê her kesî vebibû.

Ji qesrê jî dihat fêmkirin ku strana "Çiyakanî" dibêje û dengê dawiyê yê "î"yê dirêj dike. Gel ji vê stranê hez dikir. Behsa çiya dikir.

Masîgirê Kurd, di strana xwe de digot ku li vê dinyaya ku mîna mehsiyê xerabûyî madê mirov tevlîhev dike û her kesî jehrî dike, tenê cihek paqij maye; ew jî çiya ye. Tekane dostê ku mirov bikaribe pê re sirên xwe parve bike û pişta xwe bidiyê, çiya ne.

Stran ji dil û can digot:

"Çiya sirê min vedişêrin! Çiya derdê min fêm dikin!

Çiya welatê yara min, çiya çîleya hezkirina min…"

Wezîfedarên ku li xwaringeha qesrê ketibûn nav xebateke zêde, bi melodiya vê stranê dilê xwe miz didan.

Xwarinpêjên ku piraniya wan Belûc û Kurd bûn, bihîstibûn wê kî bibe mêvan û ji bo ku karibin xwarinên herî xweş amade bikin, hemû hunerên xwe seferber kiribûn.

Yên kevn ji bo ku wê careke din mêvanan bibînin, yên nû jî ji ber ku wê cara yekemîn bibînin bi heyecan bûn.

Li odeyên qesrê hewayeke keyfxweşiyê hebû. Keçên Esleyê yên li qesrê ji her kesî zêdetir ketibûn nav kelecanê. Esle jî ketibû nav pencikên nexweşiyeke bêderman.

Dema ku ji dûr ve mêvan xuya bûn, eskeran xwestin bikevin navbera wan û gel. Bi qîrkirina mamoste hemû tirsiyan û vekişiyan. Heta qesrê bi hezkirinên gel meşiyan.

Piştî têketina yekemîn a qesrê, gel li derve ma. Li ser hespên xwe heta Baxçeyê Mezin hatin.

Li pêşiyê Mazdek, li ser hespa kumêt Mohrê bû. Li rastê mamoste û li çepê jî Pençeşêr hebû. Tevî yên li pey wan jî bi giştî 12 kes bûn.

Ji ber heybeta wan ezman dilerizî. Ewr çep-rast direviyan, roj jî li ser destê Mazdekê ku bi destikê xançera xwe girtî dibiriqî.

Lîrîda ew pêşwazî kirin, bi edayeke lewçe û bin pozan got ew ê nikaribin bi çekan bikevin nava qesrê.

Heta wê demê ti kesî nebihîstibû Mazdek xençerê bi xwe re digerîne.

Ji dema ku hevdu nedîtibûn, pir guhertin çêbibû. Li ser wî cilekî mîna cilên merasîmên ola kevn, lê bêtir dişibiya cilên gel, cilekî spî û du qat ji hiriyeke qeba, hebû.

Tayên spî ketibûn porê wî, tevî ku simbêlên wî belave bûn jî bi temamî lêvên wî girtibûn. Riha wî bi qasî porê wî spî nebibû, tayên spî mîna don lê daye dibiriqî. Sekna wî ya tîk zindîbûneke cuda dida wî.

Gote wî ne ji bo şer, ji bo sohbetê hatine û xançer jî yadîgareke dostan e, nedayê. Bi rastî jî yadîgara Keviyê Kewyaran bû ku ji zindanê xelas kiribû. Li destmaleke bi neqşên sor pêçayî li ber wî ma.

Li gel yên din tiştekî wekî sîleh bihatana hesibandin tine bû. Ji bo aştiyê hatibûn wir.

Texmîn dikirin ku ji bo hevdîtina li ser xwarinê wê derbasî salona mezin bibin, lê ew derbasî Baxçeyê Biçûk ê li pişt qesrê kirin.

Ne ji ber ku baxçe biçûk bû, tenê navê wê ev bû. Her çar aliyê wê bi dîwarên bilind girtîbû, li zemînê jî heman kevir hatibûn rêzkirin û ruxmî navê wê baxçe jî bû darek lê tine bû.

Li gorî adetên gel, sifre li erdê hatibû raxistin. Ev helwest dihat maneya rûmetdarkirina wan!

Di nava xwarinên cur bi cur de xwarina savarê ya li ser siniya mezin û adeda Medan bû, bala wan kişand. Wekî mesajeke dostên wan ên li qesrê fêm kirin. Li hev nêrîn û keniyan.

Beriya qral bihatana heke li ser sifrê rûniştana, wê ne li gor adetan bûya. Gotin wê li benda wî bimînin.

Dema şêwirmend Lîrîda xwe da paş, ji çar aliyê baxçe esker peyda bûn.

Bi qasî ku rûyê rojê bigirin zêde bûn. Fêm kirin, lîstok e.

Her çiqasî yên bi şervantiya xwe navdar hewl dabin Mazdek biparêzin jî ti rêya derketinê tine bû. Di nava çar dîwarî de mabûn.

## “Tu Dikarî Gel Hemûyî Qetil Bikî?”

**“Dil cewher haristan e**
**Feryada lal derdistan e**
**Ya di nav xwîna sor de zîl dide**
**Di dawiya dawîn de gulistan e”**
**(Mamoste)**

Ji ronahî û germahiya rojê mehrûm hiştin, di nav dîwarên kevirî û kifnikî de tî-birçî hiştin, ew ji hal xistin. Xwestin piştî vê derxînin derve, lê tirsiyan ku piştî gel bi meseleyê bihese ji nişkê ve nerazîbûnê nîşan bide û îsyanek çêbibe. Dixwestin hema demildest vê meseleyê bi dawî bikin.

Dîsa jî lazim bû ti kesî ew di halekî bi heybet de nedîtibana! Her yek li cihekî cuda radigirtin. Ser û cilên wan bibû toz. Li ber ronahiya zenûn li hev mêze kirin. Yên çavên wan bi hev diketin keniyan û silav dan hev. Di nav wan de êşkence tenê li yekî kiribûn. Dema ku bi vî halê êşkencekirî ew ditîn, dilê hemûyan êşiya.

12 egîd bûn, tirsa mirinê ji dilê xwe qewitandibûn û di ber dozekê de diçûn mirinê. Ev doz wê bi kuştina wan ebedî bimana!

Komplo anîbûn serê wan. Xistibûn nav kemîneke namerdane. Lê wan jî ev îhtîmal hemû dabûn ber çavên xwe û wisa hatibûn.

Mirin jêneveger bû. Bi mirina xwe wê deriyên jiyaneke nû vekirana.

Ji rojan Duşem bû, ango reş! Roja mehê bû, roja reş! Li gorî teqwîma kevn roja 12’emîn bû.

Rojeke reş bû. Wateya vê reşê ji rengê reş cudatir bû. Reş hebû dijberê spiyê, ev rewşa me gotî jî hebû; dijberê başiyê, rastiyê, bedewiyê, wijdanê.

Li hewayê bêhna bajarekî riziyayî hebû. Di bin lingên wan de dinyayek hebû ku wê bi kuştinê bihatana paqijkirin.

Li ser girikekî dirêj û fireh, ku gel dikarîbû ji dûranî jî bibîne, çalên kûr li kêleka hev hatibûn kolandin. Li gorî kevneşopiyan, miriyê xwe datanîn ser qûleyên ku bi keviran hatine lêkirin. Ji bo ku ruhê wan serbest bimînin, miriyên xwe datanîn vir. Xusrew niha tersê wê dikir û dixwest heqaretê li wan bike.

Destpêkê tehsîldarê kevn Pençeşêr anîn ber çalekê. Li beramberî qesra zilmê ya ku demekê xwe diavêt ber lingê wê, niha bi serbilindî, bi rûmet û azad çik disekinî. Bi vê gûrûrê li dinyayê mêze dikir. Keyfa ji vê digirt nikarîbû bi peyvan bianiya ziman. Dîsa jî nikarîbû gel ji wan gotinên ku heqê qral in mehrûm bike:

"Niha hûn li bendê ne ez ji eskerên we, qesra we, silaleya we xeberan bidim. Lê ev ne bendewariyeke rast e. Ez ji Mazdek fêr bûme, xeberan nabêjim. Ez navê we jî bibêjim, wê dîsa devê min xera bibe."

Wisa dest pê kir, û gotina xedar a ku ti qral nikare ji bîr bike kir:

"Eger daşik bibûna hesp, wê qral jî bibûna zilam!"

Atfê memûrbûna xwe ya berê bi henekî got:

"Erz dikim!" û qedand.

Milên wî bi nava wî girêdabûn, bi qinabeke qalind girê dabûn. Lingên wî jî heman şêweyî hatibû girêdan. Dema şêwirmend bi çavê xwe îşaret da, du eskeran ji lingê Pençeşêr girtin û hewl dan rakin jorê. Ew qalibê wî yê mezin xistin xwarê, lê nikarîbûn rakirana.

Du eskerên din xwe gihandin alîkariya van eskeran; çi kirin nekirin nikarîbûn rakin hewayê. Pey xwe kaş kirin, serberjêr dehf dan wê çala teng. Hêdî hêdî çal tijî ax kirin. Nîvê laşê wî li derve ma.

Pençeşêr dev û çavên xwe girtin, ji nav tarîtiyê re derbasî dinyayeke ronî bû. Li her derê ewrên spî hebûn. Xwe gihand wan ewran û wekî mirovekî azad raza.

Dûvre Şêrdil anîn.

Şêrdil, tirs û xof xistibû dilê wan fermandarên har ên li qesrê, egîdek bû, rêberekî gel bû, şervanekî baş bû û yek ji hevrêyên ku Mazdek herî zêde pê bawer bû. Yê ku êşkence lê hatibû kirin, ew bû. Tevî vê jî ti tiştek ji heybeta wî kêm nebibû.

Yên li derdor kombûyî gunehên xwe bi gotinên wî yên xweş anîn. Bi dengên "niç niç" pêsnê bedewtiya çavên wî dan. Hevokên ku ji bo bexşandina xwe bixwaze qîr kirin.

Heta wê çaxê ti eskerên qral ên ku rûyê wî dîtibûn, sax nemabûn.

Wekî "pûşîkirî" dihat bîranîn.

Şêrdil, serê xwe di ser milê xwe re bi zehmetî ber bi Mazdek ve zivîrand. Qure bû. Di çavên wî de piçek hizn, piçek xemgînî jî tine bû.

Bi dilovanî û rêzdarî li Mazdek nêrî û got:

“Ji bo min şeref bû!”

Wê kêliyê ji bo ku Şêrdil bixînin xwarê, eskeran ji piştê ve bi devê ko yê şûr li çokên wî dan. Tevî vê jî xwe li ser piyan girt. Lê eskerekî derba dawî bi devê tûj ê şûr lê da. Çokên wî hema hema nîv bi nîv jê bûn û êdî nema dikarîbûn wê gewda wî hilgirin. Bi êşeke erjeng a ku xwe li hemû xetên rûyê wî da der, di nav xwînê de ket ser erdê.

Kef bi devê şêwirmend ket, ji bo ku wî û gel biçûk bixîne, got:

-Gundiyê dera hane! Şerefa te bi qasî xizmeta te ya ji bo efendiyê te ye. Yên xizmetê nakin, ew ê wisa bibe.

Li ser gotinên şêwirmend, di çavên Şêrdil de roniyeke polayî çêbû. Tevî ku herdu lingê wî yên pev girêdayî di nava xwînê de mabûn jî, destê xwe ji bo çokên xwe kir spartek û dîsa rabû ser piyan.

Ji ber rabibû ser piyan, şêwirmend şaş mabû. Li nava çavên wî nêrî. Lê ji ber çavên wî yên bi hêrs agir ji ber diçûn, tirsiya, berê xwe guhert.

Wê kêliyê Mazdek qîrek da:

-Ji gundiyekî şerker azadtir û bi şereftir ti kes tine ye! Tu çi bextewer e mirovê azad!

Li ser van gotinan Şêrdil serbilind bû, keniya, ewqasî keyfxweş bibû ku heke karîbûya bimeşiya wê biçûna Mazdek hembêz bikirana û wisa bimirana; xwest cara dawî wî bibîne, lê eskeran bi mertalên xwe li pêşiyê bendek çêkirin.

Yên ku lê dinêrîn, serê xwe tewandin, ji şerman ketin bin erdê. Piraniya wan gundî bûn û ji bo xwe qet şer nekiribûn. Heta piraniya wan di hemû emrê xwe de ji bilî xulamtiyê tiştekî din nekiribûn. Hinekan berê xwe dan vî egîdê ku şermên wan li rûyê wan daye, xeber jê re dan û xwestin rastiyên xwe yên şermîn veşêrin.

Dema ku eskeran Şêrdilê wêrek serberjêr dehf dan çalê, îskeîska giriyê jin û zarokan hate bihîstin.

Li ser vê şêwirmend ji eskeran xwest lez bikin.

Eskeran li pey hev çendekên din avêtin çalan.

Ji bo her yekî temaşekirina binaxkirina hevrêyên xwe azabekî mezin bû, lê biryardariya ku ji bo dinyayeke azad hazir in bedelê bidin, di rûyê wan de diyar dibû.

Dema dor hate Mazdek, nûr ji rûyê wî dibariya, mîna ku hemû roniya Xwedê lê kom bibû.

Xusrew, mirovên ku xistine bin axê bi destê xwe nîşan dayê û jê re got:

“Va ye, mêweyên ew tovên te yên jehrî!”

Mazdek jî gotê:

“Ma tu dikarî gel hemûyî qetil bikî?”

Xusrew li cihê xwe req ma. Nizanîbû çi bêje. Destê xwe bi lez hejand û ji eskeran xwest ecele bikin.

Dilê wî nikarîbû gotineke Mazdek jî rake. Ew tov li ser singa hemû gelî hatibû çandin. Dema hizra vê kir hejiya. Li wê derê, li pêşiya efserên qesrê ditirsiya bikeve erdê û rezîl bibe.

Mazdek pêwîst nedît gotineke din bibêje. Gotina ku dihişt têkoşîna wî wekî tevgereke gel derbasî dîrokê bibe bi awayekî sade û mezin anîna ziman bes bû.

Jixwe bi çalakiya xwe tovên azadiyê yên ku wê li ser singa gel zîl bidin danîbûn.

Dema avêtin çalê, xençera li noqê ji ber ket. Ewr ketin tevgerê. Ewrekî reşê mezin, bi qasî ku pêşiya tavê bigire hat û li ser serê wan sekinî.

Dema Mazdek binax dikirin, qral û yên li balê jî bêdeng bûn. Tirseke bêterîf ketibû dilê wan. Tirsa wan ewqasî mezin bibû ku dixwestin demildest hemûyan bikujin.

Yên mabûn jî serbejêr xistin nav çalan û ser wan tijî ax kirin.

Yek bi lingekî bû. Lingekî wî di şer de çûbû, ev egîd Ardil Şanaz bû, bi navê dayika xwe dihat bîranîn.

Wê çaxê “Şanaz” terzekî stranê bû. Navekî li cih bû ji bo dayika wî ya dengxweş û bîranîna wî. Piştre ji bo kesên dihatin hezkirin û bi rûmet ev nav hat bikaranîn. Ew hem ozanek bû hem jî hostayekî hesinkar bû. Şûrên herî baş ji ber destê wî derdiketin. Bi stranan dil, bi şûran kelhe fetih dikirin.

Di kêliya xwe ya dawî de gotina, “Ozanek dikare împaratoriyekê hilweşîne, lê hemû artêşên împaratorekî jî werin nikarin çokê li ozanekî bişkînin!” berz kiribû.

Lingê yekî jî pir kêm xuya dikir. Diviyabû ev jî Peştûn Mûsayê ji Gerîşkê bûna ku bejna wî kurt bû, laşê wî qeyîm bû, qet nedikeniya û her tim birûcot bû. Di nav hevalên wî de ji warê wî Gerîşkê zêdetir, ji ber hêzdarbûna wî jê re "Kurê Topiz" dihat gotin. Di oxira wekhevî û azadiyê de bi wêrekî ketibû nav hemû şeran, çûbû kû derê li wir bûye çavkaniya wêrekiya gel, bi tena serê xwe bi sedan gund rêxistin kiribû. Wê rojê, yên ku li rûyê wî nêrîn, cotek çavên bi hêrs dîtin ku wê heta dawiya emrê xwe ji bîr nekirana. Mûsa li beramberî mirinê neket nav dudiliyeke biçûk jî. Axa bi ser dakiribûn û lingê wî yên li derve mabûn hê jî diliviyan. Çavê mamoste li axê ket. Dema bîr bir hê dijî û di bin axê de êşê dikşîne, çavên wî tijî rondik bûn.

Mamoste hiştibûn herî dawî. Milên wî vekirin. Dibe ku ji ber çavên wî tijî bibûn, maneyên cuda jê derxistibûn.

Di dilê xwe de got li derdorê ti kesên wisa bi qîmet tine ku bêjime wan, "li şûna ku min mirina Mazdek dît, herdu çavên min jî kor bibûna baştir bû". Li wê xaka li ser Mûsa ya diliviya dinêrî û di ber xwe de dipeyivî. Ji nişkê ve eskerên li balê ketin tevgerê û benên li lingan girêdayî jî vekirin.

Mamoste mane neda vê. Xemgîniya wî, êşa ling û destên wî yên tevizî pê dabû jibîrkirin. Şêwirmend dema rondikên wî dibîne, dibêje qey ew ji mirinê tirsiyaye.

Yên temaşe dikirin jî şaş mabûn. Ew Fars bû. Gelo di nav Mazdekiyan de sîxur bû? Çima serbest berdan? Qelebalixê di nav xwe de şîrovên wisa dikirin. Şêwirmend Lîrîda banga bêdengbûnê kir.

Dema bêdengî çêbû jî got:

-Tu hem ji xwîna me yî hem jî mirovekî oldar î. Heger tu naxwazî ruhê te jî mîna yên van kesên bêdîn bikeve nav tarîtiyê, cihê dijmina ola me Xorremê bibêje, bibêje ku Qralê Qralan, Şahenşahê me te bibexşîne, yan na, tu dizanî wê çi were serê te!

Dema ku mamoste mesele fêm kir, vê carê bi dengekî bilind bang kir:

-Ev xak bi serê ronî yê Mojdeg Hemedanî hat pîrozkirin! Ev xak e ziriyeta min, ola min, eşqa min, jiyana min!"

Ji bo Mazdek, di wateya "Mizgînber" de gotibû "Mojdeg". Vê xîtabê bala her kesî kişand. Îşaretek bû, wekî pêxemberekî li Mazdek dimêzand.

Ji ber ku mamoste dizanî piştî van gotinan wê wî lez biavêjin çala mirinê, beriya bêdengî xera bibe, mîna ku li pey Mazdek îbadetê dike, berê xwe da roja ku di nav ewran de winda dibû, destên xwe rakirin jorê, bi dengê xwe yê hestiyar û dawidî dewam kir:

"Gelek roj ava bûn û hilatin, wê zehf ava bibin û hilên. Tu li ewrên reş nenêre. Wê roj were ji wê xaka pîroz Rojeke nû hilê! Heger ev tava li ser vê xakê diçe ava, sibe hilneyê, hûn bi ser ketine! Heger roj hilê û bibe sibe, Mojdeg! Mojdeg! Mojdeg!"

Dema ku navê Mojdeg li pey hev rêz dikir, eskerên li pişta wî sekinîbûn bi pehînan li çokên wî dan û dehf dan. Ji ber serê wî li kevir ket, binê çalê tijî xwîn bû.

Dema ku dilopên baranê ketin ser wê xaka xwînî, çala dawî jî tijî ax kirin.

Xaka li ser Mûsa hê jî diliviya…

Sala 532, 12'ê Adarê, piştî nîvro di nav wê tofanê de baranek dijwar bariya, Xusrew emrê xwe yê dawî da wezîrên xwe:

"Kilseke baş bi ser wan de werkin ku careke din şîn nebin! Çi tiştekî Mazdek li pey xwe hiştibe lazim e were tinekirin!"

Êdî ji gotinên mamoste çi fêm kiribe, wisa bersiv dabû.

Di wê demê de Esleya li ber sikratê bû û nehatibû fêmkirin çima wisa nexweş bibû jî nefesa paşîn da.

Brûskan lê da, ji dilê însanan feryadên bêdeng hil dibûn, bi wan feryadan asîman qelişî. Dema qelebalix belav bû, li meydanê tenê zarokekî çavreş mabû. Ji ber girî spîka çavê wî û derdora wan sor bibû. Her çiqasî nizanîbû yên hatine qetilkirin kî ne jî, navê Mazdek bihîstibû. Kurê hostayekî mehfûran bû, li bajar diman, bi xwe jî bi destên xwe yên biçûk, bi tiliyên xwe yên zirav mehfûr dirêsan.

Li ser serê çala ku Mazdek avêtinê, xençera bi destmala zêr pêçayî û neqşên sor li serê bû, rakir û xist ber xwe, bi bez ji wir dûr ket. Wê xençer ji bo bavê xwe bibirana, ku li malê her tim bi rêzdarî behsa Mazdek dikir.

Fermandarên qesrê, hespên bilind, saxlem û bi heybet ên Mazdek û hevalên wî ji xwe re hiştin.

Şêwirmend Lîrîda li ser emrê qral xwest hespa kumêt Mohrê ji destê fermandar bigire.

Fermandar wekî xenîmeteke şer xwedî li hespê derket û nedayê. Lê belê, her tiştên aîdî Mazdek wê bihatana tinekirin. Emir teqez bû.

Dema anî hewşa qesrê, çawa birûskê lê da, Mohr jî rabû pedarê, hîrehîreke bi êş jê hat, hema hema dikira xwe ji destan xelas bikirana û bireviyana.

Ji ber dijwariya firtone û baranê çavê şêwirmend bi zorê vedibûn. Dixwest eziyetê bi hespê bide kişandin. Hekena, dikarîbû bi eskerekî jî bidana kuştin.

Hefserê wê bi darekê girê da. Zirxê starê yê bi şeklê rûbereke ji metalê zirav ku jê re “zrêhekî sîmîn” digotin, ji ser pişta hespê avêt erdê. Destê xwe yê çepê avêt stûyê Mohrê. Xençera tûj a di destê xwe yê rastê de li qirikê da.

Çavên Mohrê heta dawiyê vebûn. Zikê wê yê li ber baranê şil bibû, bênavber radibû û dadiket. Şeyîna wê veguherîbû orîneke. Veguherîbû zelzeleyekê. Nema karîbû ew laşê xwe yê pîrbûyî zêdetir hilgire. Dema bi ser lingên xwe yên paşîn de ket, lingên pêşî hê nîv çemandî bûn.

Ji bo ku dawiyê li vê orîniya bi êş bîne, destê xwe ji wî cihê kêrê xist nav qirika Mohrê. Demarên ku beşek wan qut bibû û yên hê qut nebûne di destên xwe de kom kir û kişand. Demarên ku wekî desteyeke ben derxistin derve, bi xençera xwe ya xwînî cara dawî birî.

Li erdê, hespa ku di nav xwînê de çavên wê bi saw vebibû hebû, Mohr hebû, lê wî di xeyalê xwe de ev hemû anîbûn serê Xorremê…

Dema ku Xorrem û hekîm li bajêr li mala dostekî xwe bûn, fêr bibûn Mazdek û hevrêyên wî ketine zindanê û ji bo karibe wan rizgar bikin jî li çareseriyan digeriyan. Lê çi heye di wan rojan de Qesra Sasaniyan bi çembereke ewlehiyê ya nehatî dîtin dihate parastin. Ne tenê qesr, dora bajêr jî tijî esker kiribûn.

Xorrem, wê şevê raneza, dûvre got çi dibe bila bibe dixwaze ji vê malê derkeve û tiştekî bike. Eger hekîm asteng nekirana, wê ji malê derketana û beriya bigihiştana serê kolanê jî wê bihatana girtin.

Xorremê di ber xwe de digot, “min dizanî, min dizanî wê wisa were serê wî! Min got neçe, lê min nikarîbû asteng bikira” û xwe sûcdar dikir. Hekîm jê re got, niha ew bi xwe jî ketiye heman şaşiyê, û wisa karîbû ew bidana sekinandin.

Her çiqasî aqlê Xorremê ji berê ve rastiya meseleyê dîtibû jî ruhê wê yê narîn di nava êşê de diperpitî. Dizanîbû wê Mazdek û hevalên

wî werin kuştin, lê dil neda vê bîne ber çavê xwe. Diviyabû ji wir sax derketana. Diviyabû çareyeke vê meselê hebûna.

Îsyana gel dikarîbû kuştin asteng bikirana, lê nikarîbû xwe bigihîne ti kesî. Amadekariyên ku ji bo rojeke wisa kiribû çûn kû derê? Ji ber ku ji ti kesî deng dernediket, wate nedidayê.

Esas diyar bû her kes li kû derê ye. Ji bo ku zirarê nede Mazdek û hevalên wî yên dîlgirtî, çalakiyên ku plan kiribûn jî sekinandibûn û xwe dabûn bendê. Ne ku Xorrem ev nizanîbû, lê mîna ku her tim li benda mûcîzeyekê bû, xwe dabû benda xeberên nû. Lê çi heye ku xebera hatî xebereke roja reş bû.

Dema ku ew roja reş hatibû, têlên dilê wê qut bûn. Fêr bûn ku wê Mazdek û hevrêyên wî derxistina pêşberî gel. Hekîm dîsa ji bo ku Xorrem neçe bû asteng.

Li odeya xwe geh diçû jêr geh diçû jor, ji nişkê ve qidûmên wê şkestin û li ser doşekê dirêj bû. Bi şeklê nîv şiyar nîv ji ser hişê xwe çûyî heta êvarî nikarîbû ji odeyê derketana.

Hekîm jê re gotibû wê nikaribin li ber çavê gel tiştekî bi wan bikin û wê xwediyê malê bi xeberên xêrê vegere, lê Xorremê gotê ew bi van gotinên teseliyê bawer nake. Lê çavê wê tiştekî cudatir digotin!

Gotinên hekîm kêm be jî di nava Xorremê de hêviyek ava kiribû, nîşaneyeke heyecanê di çavê wê de çêbibû. Dema ku hekîm ev rewş ferq kir, dilxweş bû.

Wê rojê çi qewimîbû, wê ber bi êvarî ji xwediyê malê fêr bibûna.

Ev dostê wan ê xwediyê malê, masîgir bû û wê rojê mîna her kesên ku li pêş qesrê kom bûyî, wî jî temaşeyî wê hovîtiyê kiribû.

Dema hat malê, Xorrem bi heyecanekê ji nav nivînan derket û berê xwe da derî. Ji çavê masîgir mîna kaniyê rondik diherikîn. Dema ku Xorremê ew di wî halî de dît, qîr da û ji ser hişê xwe çû…

## BEŞA ÇAREMÎN: XWEDIYÊN DIL

### Piştî Firtoneyê

**Çiyayiyên ku sirgûnî deştê hatine kirin**
**Zehf giriyan**
**Kendalek tine bû xwe tê de werkin**

“Ma mirov diqedin?”

Di serê her kesekî difikirî de ev pirs hebû. Ma mirov bi kuştinê diqedin? Mîna Mazdek gotî, hemû gel dikare were qetilkirin?

Şervanên Kewyar dibêjin ku “me li kîjan çiyayî baskê xwe vekiribe, li wir mirin xweş e.” Her çiqasî yên ku dizanîbûn li bajaran wê werin qetilkirin xwe kişandibûn çiya jî yên hayê xwe ji vê tine bûn, şer didomandin.

Şerê li dijî sîstemeke wisa, ku hemû bedewîtiyên li ser rûyê erdê kiribû qurbanê xwe, ne hêsan bû. Lê belê, bedelê wê qetlîamên mezin jî bin, her fikrekî nû yê diketin dil û mejiyê mirovan, wateyên nû li hebûna mirovan bar dikirin û dibû enerjiya çêker a ji nû ve avakirina jiyanê.

Bi saya herikîn û guhertina ku ji gerdûnê ber bi mirov, ji mirov ber bi gerdûnê ve xwe her tim nû dikir, hebûn pêk dihat. Mirinê, tenê ev guhertin berçav dikir.

Mazdek û hevalên wî ji mirinê netirsiyabûn. Lê asta qetlîama ku piştî wan were serê gel, texmîn nekiribûn. Xorremê ev ji mêj ve his kiribû.

Ji bo ku Mazdek têkiliya xwe bi qesrê re zû qut bike, zehf nîqaş kiribû. Dîsa wekî çawa di vexwendina dawî de komploya qesrê his kiribû, her wiha fêm kiribû ku ev qetlîam wê bi pêşengan re sînordar nemîne.

Firtoneyeke ku zadên teze qir dikir rabibû. Ti hêzeke li pêşiyê bisekine tine bû. Xorrem ji bo ku gel xwe biparêze xwestibe xeberekê bişîne jî dema pê hesiya li seranserî welat heman rojê qirkirineke mezin dest pê kiriye, fêm kir ku dereng mane.

Hestên hêrs û tolhildanê têra ravekirina vî haletê ruh nedikir. Kêliyeke wisa bû ku dil hatibû asta sekinandinê, aqil felc bibû. Rast biryar girtin, bibû meseleya hebûn-tinebûnê. Ji bilî ku demildest bi awayekî veşartî ji bajêr derkevin û li dûr şopên xwe bidin windakirin, pir zêde vebijêrkên wan tine bû.

Hekîm, Asara îqna kir ku li Gundeşapûrê bimîne.

Her çiqasî hevjînê Asarayê ji ber nexweşiyê miribe jî li ba malbata wî bû. Herî kêm dikarîbû ji bo ewlehiyê bimana. Derketina rê tijî rîsk bûn, nizanîbûn çi li benda wan e.

Xatir ji Asara xwest û ber bi Gundeşapûrê bi rê kir. Dûvre çû ba dostên li benda wî.

Li kolanên pişta paytextê bi gavên lez dimeşiyan, hatin heta stargeha ku hekîm şibandibû nawîsê(mahzena şarabê). Vê carê di nav kesên ew anîbû de ew ê "Pûşîkirî" tine bû. Heta kêliyeke din wê Mazdek jî nehatana. Wê pêwîstî nedîtana biketana stargehê jî.

Di bin firtone û baranê de li ber sermayê sekinîn. Pir wext derbas nebû, rênîşanderên wan bi sê hespan hatin. Dema xatir ji dostên xwe xwestin û bi rê ketin, Hekîm got:

"Hesp dimire, kûçik cejnê dikin! Wê roja wî jî were!"

Domahiya rê careke din nepeyivî.

…

Piştî demeke kurt, firtone kêm bibû, dilopên dawî yên baranê diketin. Rê dirêj bû, rêwîtî ber bi bajarê Reyê bû.

Çi ecêb bû: Tevî ku di heman rêyê re berê jî derbas bibûn, lê wekî cara yekem tê re derbas dibûn his dikirin, her tişt li wan pir xerîb dihat. Dinya ne dinya berê bû…

Li ser rê li ber xanekê sekinîn. Li wir axaftinên der barê Mazdek de careke din agir bi dilê wê xistin. Bêdeng, dûvdirêj giriya.

Gundî û bazirganên li xanê li dora maseyekê rûniştibûn, digotin piştî Mazdek û hevalên wî, bi heman şeklî ji niha ve bi deh hezaran kes hatine qetilkirin. Nizanîbûn ev çiqasî rast e, çiqasî gotegot e, lê eşkere bû, li her derê qetlîam hebû.

Xusrew, hesab kiribû ku qetilkirina Mazdek wê rê li ber raperîneke mezin veke û ji bo ku vê potansiyelê tine bike jî bi deh hezaran kesên ku pêşî tespît kiribûn, di nava çend rojekî de dabû qetilkirin.

Yên li ser maseyê dema ku behsa îhtîmala raperînekê kirin dengê xwe kêm kirin. Tevî vê jî Xorremê guhê xwe da wan û çavên wê tijî bûn.

Kêliyên dawiyê yên Mazdek, tiştên ku Lîrîda anîbû serê Mohrê, bi gotinên “ax û wax” heyfa xwe lê tanîn û digotin.

Xorremê helbet cara yekem ev tişt nedibihîstin. Giriyê wê jî ne ji ber vê bû. Her baran dema ku ewrê wê dihat wê ji neçarî biketana. Di rê de pir tijî bibû.

Dema ku hekîm careke din li wê xanê bihîstibû di kêliyên dawî de mamoste ji bo Mazdek gotiye “mojdeg” wî jî nikarîbû bi rondikên xwe bigirtana. Xwediyê xanê dema dît ew digirîn, gumanên wî çêbûn, hekîm neçar ma manewrayekê bike. Rehber wekî kurê xwe, Xorrem jî wekî bûka xwe nîşan da, got, “neviyê min ji ber nexweşiyê mir!” û bala wî belav kir. Dema ji xanê derketin dîtin ku di çavên Rehber de jî rondik kom bûne, lê xwe bi zorê digire.

Heta gihiştin deriyên Reyê jî gotinek ji devê wan derneket.

…

Rey, paytexta dawî ya dema Partan bû. Îhtişama wê ya berê nemabû; dûrî navenda dewletê, wekî gundekî mezin lê hatibû. Piştre wê hema li bakurê vê derê bajarê Tehranê bihata avakirin.

Li vir hem dostên Rehber hem jî dostên hekîm hebûn. Li vir eleqeya ji bo zanista tipê zêde bû, dibistaneke pêşketî ya hekîmtiyê lê hebû.

Avaniya wê ya mîmarî jî li gorî taybetmendiyên klasîk ên dema Partan bû. Avaniyên ku bi kemerên pir bilind hatibûn lêkirin, aqil disekinandin. Firehiya kemerekê digihişt heta 20 metreyan, bilindahiya wê jî heta 30 metreyî diçû. Mirov bi rehetî dikarîbû fêm bikira ku demekê bajar bi şatafata Partan dibiriqî.

Dema ku Xanedantiya Sasanî xwedî li dema Persan derketin, xwestin hemû şopên aîdî Partan jê bibin. Her çiqasî bajar li cihê xwe jî bû, lê şatafata dewletê jê dûr ketibû. Esas ev halê wê xwezayîtir bû û ji bo zanist pêş bikeve jî hewaya pêwîst dabûyê.

Ji ber ku ji paytextê dûr bû û qederek alîgirên wan lê bûn, ev der hilbijartibûn.

Bêyî ku xwe diyar bikin, demekê li Reyê man. Xwediyê malê jî beriya îsyanê bi demekê hatibû vir û bi cih bibû.

Avahiyeke kevn bû, lê gelek odeyên wê û baxçeyekî wê yê mezin hebû. Ji ber vê jî bi rehetî tê de bi cih bibûn.

Xorrem nikarîbû li cihê xwe bisekiniya, dixwest xwe bigihîne hevrêyên xwe yên saxmayî. Lê, nikarîbû ti agahî bigirtana. Tiştên erjeng dibihîstin. Vê jî bêsebriya wî zêdetir dikir.

Eskerên Xusrew li her derê qetlîam dikirin, alîgirên Mazdek didan ber şûran, xizmên wan diavêtin hepsan, agir berdidan gundan.

Fêr bibûn ku bi deh hezaran însan dane ber şûran.

Daxwazên guhertina civakî bi xwînê dihatin tepisandin, Xorrem jî heta tayê porê xwe ketibû nav bêçaretiyê. Hin caran bêhêvî dibû û ji xwe re dipirsî, "gelo her tişt qediya?"

Ji bo ku karibe bi tendurist bifikiriya, pêdivî bi hevrêyên xwe didît. Dixwest wan bibîne, li gel wan nîqaşan bike. Dostê wê hekîm jê xerabtir xwe kişandibû nava xwe û bêdeng bibû.

Xorrem, carina digot ziraviya di ruhê xwe de winda kiriye, ji ronahiya xwedê dûr ketiye, di olê de jî tiştekî rehmê yê ku karibe xwe pê bigire nemaye. Di vê rewşê de his dikir ku dike dîn bibe û zirarê bide xwe. Di wê kêliyê de bi hekîm re eleqedar dibû û hewl dida hemû ruhên tarî biqewitîne.

Her çiqasî hêza moral û fîzîkî li ba hekîm kêm bibû jî, lê zanebûn û behreya wî ya hekîmtiyê hê wekî xwe bû. Dema alîkarî dida dostên xwe wekî ji nû ve zindî dibû, heta demekê bi ser xwe ve dihat, xwe bi jiyanê digirt, lê dûvre dîsa derbasî gerdûneke din dibû û hemû deriyên xwe li dinyayê digirt. Tenê ji derveyî îstîsnayekê: Di dema herî girtî de jî ti carî Xorrem îhmal nedikir, xwe ji ewlekariya wê berpirs didît. Rehberên wan, hevrêyên wan di vê mijarê de pir baldar bûn, lê hekîm dîsa jî xwe berpirs didît.

Bihîstibûn ku li hin gundên derdor qetlîam çêbûne, lê li navenda bajêr tenê çend kes avêtine zindanê. Li vê derê jî her kêlî dikarîbû tiştek biqewimiya.

Derdê Xorremê di wê kêliyê de ne ewlehiya wê bû, digot ew ê têkoşîna ku di oxirê de bedel dane çi bibe. Di vê mijarê de demeke dirêj cir û cedel kirin.

Hestên tevlîhev û zehmetiyên ku ji ber nizanîbû wê çi bikin, piştî demekê guherîn.

Wê nekirana şîn! Kesa xwedî hedefekê, ne wextê xwe, ne jî pêwîstiya xwe ji bo şîngirtinê dibû.

Eger pirsgirêkeke ewlehiyê hebûya û di vê mijarê de lazim bû baldar bibûna, wê ji bo zindîkirina bîranînên hevalên xwe ev

bikirana. Wê sax bimana ku karîbûna tolê hilînin! Wisa jî wê karîbûna nav, fikir û xeyalên Mazdek heta dawiyê zindî bihiştana!

…

Gotina, “her tim destpêkirinên nû dibin. Her tim ji nû ve destpêkirin mimkun e” rehet bû, lê piştî qetilkirina pêşengan û bi hezaran alîgiran, ti tişt wekî berê nedibû.

Her çiqasî qetilkirina Mazdek û hevrêyên wî ne dawiya têkoşînê jî bûya, dawiya pêvajoyekê bû. Dikarîbû bibûya destpêka rêyeke nû, lê ev jî girêdayî şeklê têgihiştina Xorrem ji bo rewşa nû bû.

Ji bo Xorremê rêya nû rêyeke veşartî bû. Du wateyên vê hebûn:

Yek, digot wêdetirî wateyên xuya dikin wateyeke din heye, ya din jî ew e ku karibin bi şeklê qetlîam bi ser wan de neyê veşartî bimînin.

Rêya bi qetlîamê hatibû qepatkirin, heman rê bû ku berê digotin vekirî ye. Halbûkî ew rê tijî hîle, komplo, fen û fût, xwîn û qetlîam bû.

Dema ku Mazdek digot “em ê nekujin!” diviyabû tenê qala rewşên li derveyî şer dikir.

Li dijî nîzameke xwînê ya qetil dike, dikuje, tine dike tu ji bo parastina xwe dikarî neçar bimîne û bikuje. Heger tu vê nekî tu yê tine bibî û biçî!

Baş e, lê artêşên Xorremê tine bûn. Berê li gundan ruxmî bav, birayan jî bi zorê komeke jinên ciwan tanî ba hev. Niha bi qasî wê jî komek li balê tine bû.

Nizanîbû kes maye yan na. Tevî ku dilê wê diêşiya, hêza pirsînê li cem xwe peyda nedikir. Derketina ji Reyê jî ji bo wê wekî xeyalekî dûr bû êdî. Wekî di zindaneke binerde de ye, di binê bîreke kûr de ye, bê tevger, bê nefes, bê çare mabû.

Heke hêzên wê yên sêhrî hebûna, wekî karê yekem wê hemû mirî sax bikirana.

Heke mirî wekî mirovên din vedigeriyan, ev rast bûna, gelo wê çaxê ruh û fikrên wan jî bi xwe re tanîn? Wê çaxê diviyabû li ser vê erdê tijî alîgirên Mazdek bûna. Çi bi ruhan, fikran dihat, piştî mirinê ew bi kû ve diçûn?

Ev nîqaşên di serê wê de carina pir dirêj dibûn, li ser cênîkên wê êş zêde dikirin, bi rojan ew dixist nav nivînan.

Gotinên Mazdek hatin bîrê, “Mirovahiyê hê behra herî mezin a tenêtiyê nedîtiye. Her ku exlaqê vê alemê li ba hev digire ji hev de bikeve, li şûna qaîdeyên Manî’wî rêzikên bêruh ên maddeyê cih bigirin, wê çavbirçîtî, ezezîtî, takekesîtî normal bibe û ha wê demê wê tenêtiya erjeng dest pê bike.” Di rewşa herî xeternak de jî hêviya Mazdek hebû:

“Ha ji bo rizgariya mirovahiya ku di nav tenêtiyeke wisa de digeveze, tekane çare çareya avabûna hemû gerdûnê ye.

Her kesî ew çare ji bîr kiriye, lê ew çare her tim di nav hafizaya gerdûnê de cih digire. Navê wê çareyê yekîtî ye.”

“Ol ji bo wekhevî û yekîtiyê ye, ne ji bo pelçiqandina mirovan e!”

“Heger wekhevî û yekîtî tine bûna, wê çaxê mirov jî tine bûn!”

Wanî digot.

Her ku fikrên wî dihatine bîrê, piçekî be jî hêviya wê çêdibû û piştre fikrên cur bi cur li pey hev rêz dibûn:

Yekîtiya di navbera mirov û xwedê de, yekîtiya di navbera mirov û xwezayê de, yekîtiya di navbera mirov û mirov de dikarîbû bibûya çareya her tiştî.

Mazdek digot ku, “lazim e serdestiya mirov li ser mirov bi dawî bibe!”

Dema ku got serdestiya mirov li ser mirov, hemû jinên ku êş dikişandin dihatin ber çavê Xorremê.

Li gorî Mazdek xerca ku civak li cem hev digirt, exlaq bû. Bêyî exlaq, yekîtî jî nedibû.

Eger ti tiştên heyî tine nebûna, wê çaxê çawa dibû exlaq, yekîtî û civak tine bibûna? Ev jî tine nebûne, tenê xerab bûne yan jî mîna me neçar mane xwe veşêrin!

Xwe veşartin!

Çawa, çima, heta kengî?

Xwe veşartin?

Mazdek digot, “Ma ne xezîneyên herî bi qîmet yên veşartî ne?”, “Hêna min gotinên xwe yên herî xweşik negotine”.

Ji bo ku efsûna wê xera nebûna, dest lê neketana, xeyalên xwe yên herî xweşik taloq dikirin, nedigotin.

Wateyên herî bedew, yên veşartî bûn. Ew jî kûr bûn. Xezîne li kûrahiyan bûn. Ji bo dîtin û derxistina wê, daketina kûrahiyan pêwîst

dikir. Dema dihatin derxistin jî çavê her kesî diqemişandin. Hin dixwazin heqê wê bidin hin jî dixwazin bidizin.

Xezîneya herî mezin, hêza watedayîna mirov e. Ew xezîneyeke wisa ye ku ti kes nikare bidize.

Xorrem, li beramberî xatirayên bi êş ên qetlîamê hewl dida bi hêza wateyê li ser piyan bimîne.

Heger biketana pey întiqameke besît, dikarîbû zirarê bide çend esilzadeyên qesrê û derdorê.

Lê tirsa esasî ya qesrê civak bû, civaka bi fikrên nû ronî dibû. Wê çaxê mijûlbûna bi civakê watedartir bû. Dema gihişt vê qeneetê, ji xwe re got, “ronîkirina civakê wê tolhildana herî mezin be.”

Domahiya rojan, şevan lêpirsînên wê dewam kirin.

Li Gundeşapûrê zanîngehek hebû. Carina li ba mamosteyên wir nîqaş dikir. Li wir navê fîlozofeke jin û perwerdekarekê bihîstibû. Hypatîa. Pir meraq kiribû.

Rojekê hekîm ji van mamosteyan re got:

“Hypatîa, Xorrema felsefe û zanistê ye. Xorrem jî Hypatîaya civakê ye!”

Dihat gotin bi lîncê hatiye kuştin. Ev trajediya beriya sed salî û şibandina hekîm, bandoreke mezin li Xorremê kiribû. “Bûna Hypatîaya civakê” berpirsiyariyên mezin li wê bar dikirin. Gelo wê bikarîbana ji binê vî barî derketana?

Piştî sed salan, lazim bû qedera Hypatîa a ku digotin “hatiye lînckirin, bi keviran hatiye kuştin” nehatana serê ti jinê. Ji bo vê jî destpêkê lazim bû bizanîbûna xwe biparêzin.

Ketina nav civakê, rêbaza herî baş a xweparastinê bû. Bi xwe spartina çavkaniya zilmê, qesrê, ti kesî nikarîbû xwe biparastana. Bi qasî ku ji qesrê hêrs dibû, ji ber ku nikarîbû Mazdek qeneh bike ku neçe qesrê, ji xwe jî hêrs dibû.

Li holê meseleyên bi axaftinê bên helkirin tine bûn.

“Çanda lîncê” dewam dikir. Mazdek û hevalên wî di encama heman zêhniyeta lîncê de hatibûn qetilkirin. Jin, gundî, jixwe her roj, her kêlî bi lîncê re hevrû dibûn.

Dîsa, ji devê bazirganekî Ereb têkildarî jinên li heman bajarî tiştek bihîstibû, hema hema her roj êş û hêrsa dilê wê zêdetir dikir.

Dewlemendên xwedî kole gotine ku:

“Her sibe li jina xwe bide! Heke tu sebeba wê nizanibe jî ew dizane!”

Tiştê ku dilê wê birîn dikir jî ew bû ku jinan ev gotin bimane digotin, dikeniyan û di nav xwe de dubare dikirin.

Mejiyê wê nedigirt, çawa ewladê însanekî gotineke wisa erjeng bike. Mirovekî xwedî dilekî, xwedî aqlekî çawa dikarîbû wisa bifikiriyana? Diviyabû ev bi temamî îmaneke jirêderketî, baweriyeke kor, oleke nelirê bûna. Oleke ku dibêje jin ne mirov in, gunehkar in, van weezan dide, van şîretan dike!

Heta ku baweriyeke bêhêvî ya nayê lêpirsînkirin, bi korî pê ve tê girêdan, bi pîroziyeke sexte hatiye pêşkêşkirin nebe, ti xerabî nikarin domdar bibin. Nikarin ewqasî normal werin dîtin û berbelav bibin.

Êdî lînc ketibû her malê. Herî zêde jî vê pirsgirêkê serê Mazdek mijûl dikir. Diyardeya “malbatê” exlaqê xwe ji dest dabû. Karên herî bêexlaq di nav malbatê de dihatin kirin, lê ev jî di bin navê “pîroziya malbatê” de çêdibûn. Her cure sepanîna vê ya li civakê diteyisî jî di bin navê rûberekî ol û exlaqekî sexte de dihat veşartin.

Zilamê ku jin di malê de heps dikir xwe mezin didît, dibû xwedî namûs; li ser navê mezinî û îfetê mafê lînçkirina jinê qezenc dikir. Bi lînçkirina jinê hemû bênamûsî dihatin bincilkirin.

Mafê lîncê mafekî Xwedayî bû. Ti kesî nikarîbû dest vî heqî bidana. Kole jî ewqasî nedihatin pelçiqandin.

Hammûrabî serwerbûna zilam li ser jinê kiribû qanûn. Lê ev jê jî wirdetir çibûn. Di qanûnên wî de jî mafê lîncê tine bû. Bi qisasî hebû: “Yê tecawiz bike, tê kuştin!”

Niha jî mafê zilam hebû ku haremê ava bike. Halbûkî di qanûnên Hammûrabî de jî hevjîna duyemîn girêdayî qûralan bû. Wisa dihat nivîsandin:

“Heger zilamek jinekê bîne, ev jin jineke xulam bide wî û li zarokên wî binêre; enceq, tevî vê jî zilam bixwazibe jineke din bistîne, destûra wî nayê dayîn; ev zilam nikare jineke din bigire!”

Di ser de jî zilamê ku bixwestana veqete, lazim bû ji cihêzê jinê tiştên mane û para wê ya bax-baxçe jî bidana jinê. Piştî wê jî jin dikarîbû bi dilê xwe bizewice. Ev qanûn ji bo sîstema koletiyê bêdawî bibin hatibûn derxistin. Dîsa jî ji qanûnên Sasaniyan ne hişktir bûn.

Kole jî xwedî hin mafan bûn. Niha heqekî jinê bi tenê jî tine bû. Li beramberî vê mafê zilam ê lîndkirinê hebû. Di vê rewşê de lazim bû me bi xwe qanûnên xwe çêkirana!

Karaktera berxwedêr a rastiya jinê ku ji textê xwedawendan hatibû xistin û di hareman de hatibû hepskirin, di dilê xwe de his dikir. Rastiya jinê rastiyeke wisa bû ku nikarîbû teslîm bihatana girtin. Tenê hatibû tepisandin û ji bo ji nû ve derkeve ortê xwe dabû bendê.

Tevî ku şiyarbûna civakê pir li paş jî bû, bi saya şiyarbûna jinê pêş diket. Di nav civakê de ku li dijî sîstemê serî rakiribû, ji ber taybetmendiya demê zilam li pêş xuya dikir. Esas, qanûna jinê bi şeklekî neyekser hikmê xwe pêk tanî. Ya ku civak ji hundir ve bi rê ve dibir û li ser piyan digirt, jin bû.

Xorremê navê "erêkirina jinê" li vê kiribû. Tiştê ku jê re erêkirina jinê digot, dişiband çanda dayikê, digot dayik dayikên civakê ne. Li gorî wê, peyva dayikê, dihat maneya piştevanî û jiyana hevpar.

Bêyî piştevaniyê civakê nikarîbû xwe li ser piyan bigirtana. Piştevanî, çanda bingehîn a jinan bû. Dema jinan taybetmendiya xwe ya herî esasî bi piştevaniyê îfade dikir, ev ne tenê li dijî dinyaya serdest a zilaman dibû spartekeke hêzê, di heman demê de li dijî jina kevneşop jî helwestek bû.

Heger piştevanî tine bûna, civakîbûn jî nedibû. Qiseyekê her tim li ser devê her jineke biçûk-mezin dubare dikir: "Heger jin ji jinê dûr bikeve wê bibe koleyê zilam!"

Ji bo civak bibûna civak, enceq bi saya jinan dikarîbû mimkun bûna. Ji ber vê, neyekser bûna jî bandora jinê dewam dikir. Ev rola neyekser bi pênaseya Xorremê, rola "erêkirinê" bû. Ti tiştekî ku jinê erê nekirana, wê di nava civakê de nehatana qebûlkirin! Di warê exlaqî de milekî wê yê bi qîmet hebûna jî, ev rê rêyeke neyekser bû, têra azadiya jinê nedikir.

Li beramberî qetlîamê jinê wê çawa hebûna xwe biparastana? Xwe tenê di pozîsyona "erêkirinê" de girtin, statuyeke çawa ya civakî dida jinê? Lazim bû ev pozîsyon derbas bikirana. Ji bo pirsîna hesabê qetlîamê, roleke pêşeng lazim bû. Lê pêşengiyeke wisa dikarîbû rêya qetlîameke nû jî vekirana.

Mijara veşartîbûnê her tim derdiket pêşberî wê. Ev jî dibû sebeb ku carina li pişt perdeyê bimîne, carina jî bikeve pozîsyoneke paş ya wekî "erêkirina neyekser."

Qetlîam bi serê wê de hatibû. Fikareya wê ne qetlîam bû, wê çawa bikarîbûna bi awayekî rast hesabê wê bipirsiyana.

Her çiqasî li beramberî xatirayên bi êş ên qetlîamê zoriyan bikşîne jî, êdî bawer dikir ku heger li dijî vê qetlîamê karibe hêrsa mezin a avabûyî rêxistin bike, ew ê karibe dawiyê li nîzama zorbetiyê bîne.

Fikrên ku heta wê demê ketibûn ferqa wan, ew li ser piyan girtibûn. Niha fikrên cudatir û mezintir di serê wê re derbas dibûn. Pêwîstî pê hebû ku bi fikrên ku ti împarator nikarin dest bidinê û serî pê re derkevin, rêxistinbûneke nû ya civakî pêk were.

Ji ber ku li her derê civak parçeyî bû, cesaret hatibû rahîb, esilzade û qral. Wisa jî li gel xwe hesibandibûn ku tepisandina berxwedanê wê rehet be. Ji ber vê yekê pêşengên wan bi komployê qetil kiribûn.

Armanca Mazdek ew bû ku karibe zêhnan ronî bike, terzê fikrandina heta wê rojê dihat bikaranîn, biguherîne. Li gel vê, tevî ku veşartî jî bû, wê tevneke şidiyayî ya civakî ava bikirana. Fikrên nû û tevneke civakî! Hêza hov a monarşiya dinyaya zilaman wê nikarîbûna li ber vê bisekiniyana. Ronîbûna civakê wekî çawa wê qedera hezaran salan a xerab û tarî biguhertana, wê hezar salên li pêşiyê jî bixistana bin bandora xwe. Tevna rêxistinbûnê jî wê berxwedana wan mimkun bikirana.

Vê fikrandinê niha di mijara piştevaniya jinê de Xorrem gihandibû merheleyeke pêşdetir. Yekîtiya jinên ku di hemû tebeqeyên civakî de hebûn, bi piştevaniya jinê mimkun bû. Tinekirina van tebeqeyan wext dixwest, lê ji bo piştevaniya jinan pir zêde zeman hatibû xerckirin. Piştî vê êdî nikarîbûn kêliyekê jî bisekinin.

Di nav wê civaka wê de fikrên bi vî şeklî heta wê rojê, ne hatibû bihîstin, ne jî xeyalkirin. Dema ku dijmin ew tiştê ku nayê xeyalkirin bibîne, wê îradeya wî bişkê, jin jî mîna ku ji hemû wextên windabûyî tola xwe radikin wê bi coşeke nû tijî bibûna.

Xorrem, civak dişiband kombûna fikrên kevn û nû. Heta yek nebûna, lingê ya din li hewa dima. Kevneşopî red nedikir, lê digot lazim e ya heyî jî bê guhertin.

Ji dema ku hêza fikrê nas kiriye, bawer dikir ku civak wê bi saya fikrên nû ji hemû êşên xwe xelas bibe.

Dema Mazdekê ku emrê xwe dabû teşedayîna van fikran, li balê bû, xwe bihêztir his dikir; niha ne bêhêz bû, lê tenê bû. Tenêtiya xwe jî tenê dikarîbû bi fikra civakî derbas bikirana.

Fikra civakî, şêweyê fikrandina jinê bû.

Êrîşa herî mezin a li dijî Mazdek pêkhatî jî di mijara nêzîkatiya jinê de bû. Li beramberî parazvaniya wî ya wekheviya jin-mêr, bêbextî lê hatibûn kirin. Ev rewş esas ji Mazdek zêdetir, tirsa li beramberî jinê îfade dikir.

Piştî qetlîamên ku Xusrew dabûn kirin, zext êdî bêsînor bibûn. Li beramberî vê bi heman şeklî domandina berxwedanê dikarîbû zirareke mezintir bida. Ew ê berxwedan parçeyî bimaya û heger dubareya rabirdûyê bûya, wê tenê ji bo guran bibûna neçîreke rehet.

Berxwedana bûyî, ne bi armanca hilweşandina împaratoriya Sasanî bû. Hedef kiribû ku di zêhniyet û jiyana civakî de guhertinekê bike. Tevî vê jî bi qetlîamê hatibû tepisandin. Berxwedaneke ku karîbûna hedefa xwe mezin bike, terzê xwe biguherîne, xwe biparêze û domdariya xwe pêk bîne, dikarîbû encam jî bigirtana.

Dewletê ew kiribûn hedefa xwe. Niha jî wan dikarîbû dewlet bikirana hedef. Ev jî mimkun bû, enceq xanedaniya Sasanî biçûna jî, wê xanedaniyeke din bihatana ser dewletê û heman nîzama zilmê dewam bikirana. Heger civak rêxistî bibûna, dikarîbûn dawî li pêvajoya xanedanên zorbe bianiyana.

Ji ber vê jî wê Xorremê têkoşîna xwe li qadeke li derveyî dewletê bimeşandana. Ev jî nava civakê bû.

Nava civakê, derveyî dewletê bû.

Ji ber zexta li ser civakê dike jî wê di her firsendê de dewleta zorbe bikirana hedef, lê rêxistinkirina civakê her tim esas bigirtana.

Mazdek hewl dida li dora feraseteke olî yekîtiya civakê çêbike, Xorremê jî wê wisa bikirana, lê ferqek hebû; wê bi rêxistinbûneke civakî ya ku dewlet nikare hilweşîne, têkoşîna xwe bidomandana.

Xorremê digot “helwesta dewletê çi dibe bila bibe, lazim e civak jiyana azad esas wergire.” Bawer dikir ku ruhê azad ê civakê ji dewletê jî bi hêztir e.

Qanûnên civakê ruhê civakê bûn û ev jî ji aliyê jinê ve hatibûn hûnandin. Ji ber vê yekê qanûnên civakê qanûnên azadiyê bûn. Civaka nû jî enceq dikarîbûn bi qanûnên azadiyê yên bi pêşengiya jinê bihatana avakirin.

Qanûn, ol bû. Xorrem di vê mijarê de zehmetî dikşand…

Heta oleke jinê tine bûna, li beramberî oleke xerabûyî xwe ragirtin zehmet bû.

Li gorî esasên olî ti şensê jinê tine bû. Ti olên heyî xîtabî jinê nedikir. Oleke ku bikarîbûna xîtabî hemû mirovahiyê bikirana, lazim bû enceq oleke jinê bûna.

Ola jinê bi çanda civakî ya xwedawendên demê hatibû teşekirin. Ev çand, çanda jinê bû. Bi vê bawer dikir.

Ji Mazdek jî kûrtir ferq kiribû ku hêzeke cuda ya jinê heye. Siya qesrê nehiştibû ev milê Mazdek kûr bibe, lê Xorrem ji ber ku hem bi xwe jin bû hem jî jiyana di nava civakê de esas girtibû, hişmendiya wê ya azadiyê û hestên wê kûrtir bibûn.

Yên ku wê yekîtiya civakê pêk bianiyana jî jin bûn.

Wextê li gundekî di sohbeteke xwe de gotibû "heta jin nebin yek civak nabe yek!" ji bo wê sempatiyeke mezin a jinan çêbibû. Bi xwe jî texmîn nekiribû ku ev gotin wê di vê astê de bandorê çêke. Li ser vê lêhûrbûnên xwe kûrtir kiribû û gihiştibû encameke wisa:

"Dostaniya jinan a ji bo hevdu, bi hêz e, samîmî ye, parvekar e, distrîne û pêkhêner e! Ruhê jinê ruhekî pêkhêner e!"

Di mijara yekîtiya civakê de nîqaş dimeşandin, guhdarî nêrînên her kesî dikir.

Yekîtî, piştevanî bû. Jiyana hevpar a civakê li ser piştevaniyê hatibû damezrandin. Ji ber ku ruhê piştevaniyê ya ku xerca yekîtiyê ye, zeîf bibû, jiyan jî ji bo jinan zortir bibû.

Bi saya "jiyana hevpar" û "piştevaniyê" ku dibêjin "çanda dayikê" dikarîbûn yekîtî pêk bianiyana.

Dema ku li derdora xwe ev gotin û wateya wê vedikir, asoyên mirovan fireh dibû, bi hestên ku heta wê rojê his nekiribûn, tijî dibûn.

Ev piştevaniyeke jinê bû û îsyaneke jinê bû.

Di encam de gihişt fikrekî wisa ku bêyî piştevaniya jinê wê jiyan nebe, lê bi tena serê xwe piştevanî jî wê li beramberî împaratoriya bi hezaran salan a zilam nikaribe encamgir be.

Piştevanî, yekîtiyê tîne, yekîtî jî hêza têkoşînê!

Ya ku wê ji yekîtiyê fêm dikir, yekîtiya jinên têkoşer bû. Ji bo jiyana hevpar piştevaniya jinê bi vî şeklî pênase kiribû. Ne mimkun bû ku jina têkoşînê neke yekîtiyê ava bike.

Fikra ku jin ji bo têkoşînê bibin yek, îsyana herî mezin bû û wê nehatana temirandin. Bi saya vê wê çanda civakî zindî bibûna, berxwedan pêş biketana û dawî li tebeqe, cihêkariya di nava civakê de bianiyana. Fikra ku wê ruh û can bidana hemû berxwedanên ku wê "bi sed salan bidomiyana" jî ev bi xwe bû.

Xeyalê ku jin yekîtiyeke têkoşêr ava bikin kelecan dida wê, dihişt ku xwe bi jiyanê bigire.

Jinên ku baweriya Mazdek jî diparastin hebûn, lê ew jî ji hev qut bûn. Bixwestana têbikoşin jî di nava civakê de winda dibûn. Civaka di nav de winda dibûn jî hatibû tepisandin.

Bi deh hezaran zilam û hejmareke nayê zanîn jin hatibûn qetilkirin.

Dibe ku ji ber vê yekê, fikra ku nikarîbûn Mazdek û hevrêyên wî biparêzin agirê di dilê wê de mezin dikir, li milekî êş dida, li milê din jî fikrê yekîtiyê yê ku wê jin pêşengiyê bikin jî mîna deriyê rizgariyê li ber çavê wê her mezin dibû.

Çiqasî pirsîn jî tam fêr nebûn çend jin di qetlîamê de hatine kuştin. Hejmareke mezin a jinan di qetlîamê de hatibûn kuştin û piraniya van jî pêşengên civakê bûn. Dîsa jî zilam zêdetir hatibûn qetilkirin. Li gorî devên fermî roja yekem 12 hezar zilam hatibûn qetilkirin, lê hejmara rastî ji du qatê vê jî zêdetir bû. Rojên piştî wê ev hejmar qederekê zêdetir bibû.

Çiqasî zilam zêdetir hatibin kuştin jî, firtoneya bi qetlîamê destpêkirî derba herî mezin li jinan xistibû. Dara ku hemû jinan xwe pê girtibûn, wekheviya jin-mêr bû. Firtoneyê ev dar şikandibû. Êdî wextê tevgera jinan hatibû.

Xorrem ne alîgir bû ku ev firtone bisekine. Digot, “wextê mirov di neqebeke teng de be, wekî dawiya dinyayê hatiye li mirov tê, lê dema ji wir derdikeve, tu fêm dikî ku hêjayî ewqasî zor û zehmetiyê bûye. Tenê tu wê xîretê raber bikî!” Û fikrê ketina nav liv û tevgerê diparast.

Hekîm bi xwe jî digot, “bisekine”, lê Xorremê digot, “Wê ev firtone kêm nebe, kêm bibe jî wê firtoneyeke din rabe! Vê carê em ê firtoneyê rakin, wê sed salan dewam bike!”

Hekîm di mijara zeman de pir zêde ne hêvîdar bû. Dizanîbû piştî ewqas rûdanan, wê gewdeya wî ya kal nema karibe xwe li ber ragire. Tenduristiya wî xerab dibû. Ti dermanî nikarîbû bandora zeman asteng bike. Tenê teseliya wî saxbûna Xorremê bû.

Di demên dawî yên emrê xwe de ji bo wî rûmeta herî mezin ew bû ku li ba Xorremê dimîne. Bawer dikir ku ti ferqa xwedawendan û Xorremê tine ye.

Digot ji îro û şûn de rizgarî wê ne bi destê pêxemberekî zilam, bi pêxembereke jin yan jî bi destê Xwedawendekê pêk were.

Di mijara ol û baweriyê de nedişibiya hinên din. Fikrên ku nedihatin bîra ti kesî dihatin bîra wî. Li gorî wî ti ferqa jiyaneke bê dîn û îman ji jiyaneke nebatan tine ye.

Hekîm mirovekî bawermend bû, lê li gorî dema xwe lêgerînên wî yên cuda hebûn. Gelek pêxemberên zilam hatibûn û çûbûn, ji wê demê û şûn de çiqasî werin û biçin jî bêyî hêza pêxembereke jin yan jî xwedawendekê rizgarî wê her tim wekî xeyal bimana. Her çiqasî ferqek di navbera pêxembereke jin û xwedawendekê de nedîtibe jî, ev fikra wî carina aliyê xwedawendan digirt. Ti gumanê wî tine bû, ev xwedawend Xorrem bû.

Dema ku ev fikrê xwe li Reyê ji hevalên xwe yên hekîm re got, pirsek ji wan kir: “Ma ne xwedawend be, çi ye?”

Hekîm dixwest bi van pirsên xwe ve pêşiya nêzîkatiyên şaş ên zilaman li beramberî Xorremê asteng bike. Xorremê bixwestana, helbet dikarîbû dilê xwe li zilamekî vekirana, lê meyla nêzîkatiya şaş li cem zilaman zêde bû. Ji ber vê yekê pêdivî didît ji wan re behsa Xorremê bike, nehêle dilê Xorremê bihêlin, bişkînin. Her çiqasî dizanîbû Xorrem li beramberî bûyerên wisa xurt e jî, cardin li gorî xwe tedbîr pêş dixistin.

Bi xwe li gelek bajaran geriyabû, ev der jî dizanî. Lê Xorrem hatibû bajarekî biyanî. Her çiqasî jiyana vir bi hin milên xwe ve dişibiya jiyana bajarên din jî, dîsa jî milên wê yên xweserî xwe hebûn. Zexta li ser wan li gorî deverên din kêmtir bû. Dewletê, yekser zext li ser vir nedikir û alîkarî jî dida.

Alîgirên Mazdek ên li bajêr dema qetlîam bihîstibûn xwe veşartibûn. Xorrem ji bo ku zirar negihêje wan, demek dirêj ne li wan pirsî ne jî bi wan re mijûl bû.

Rojekê hekîm ta girt, germahiya laşê wî bilind bû, nexweş ket, agahî da hekîman, lê ti kes nehat. Kurê xwediyê malê, Hoşengê 16 salî, dema ti kes nehat, bi xwe mudaxeleyî kalo kir. Ew li pişt erebeyeke hespan kir, birin dibistana hekîman.

Xorrem jî li balê çû. Tevî dostaniya wan jî ti mane nedabû vê nêzîkatiya herdu hekîman. Diviyabû sebebeke pir girîng hebûna ku nehatibûna. Dibe ku tiştek jî hatibûna serê wan. Çavê xwe li wan gerand, lê ji derveyî yek-du hekîmên biyanî kesî din nedî. Çi hatibû serê dostên wan? Rehber jî li naverastê xuya nedikir.

Hekîm xistin muayeneyê. Hoşeng jî ji bo refaqatê ma li wir. Xorremê aqûbeta hekîman pirsî. Garnîzonê bang li wan kiriye û careke din jî xeber ji wan nehatiye girtin!

Heke bixwestana li ba hekîm bimana, şevê ji bo ku jin bimana destûr tine bû. Ji ber vê yekê, ber bê êvarî ji bo vegere malê derket rê.

Hê di çend gavên xwe de his kiribû ku yek li pey wê ye. Di ber xwe de got, “lazim bû ez ewqasî dereng nemabûma.”

Dema ket kolana yekemîn, dît ku du kes ber bi wê ve tên, di dest wan şûrên kurt ên ku ronahiyeke zivîn dide heye. Kêliyekê li cihê xwe sekinî. Gelo paşde vegeriyana, yan jî rêya xwe bidomandana baştir bû? Ji ber ku bê tedbîr tevgeriyabû, wextê wê yê ji xwe aciz bibe jî çênebibû. Wê kêliyê li çareyeke parastinê geriya. Her çiqasî hunerên wê yên şer hebûn jî, wê kêliyê nikarîbû asta xeteriyê hesab bikirana.

Gelo hejmara wan ewqas bû?

Heger bixwestibana paşde bireve, wê xwe bi rehetî bigihandanê. Heke karîbûna şûrekî ji dest wan bigire, wê baştir bibûna. Di nava xwêdanê de ma.

Hê biryar nedabû. Dît du kes ketin navbera wê û wan herdukên din. Şer kirin. Çend caran xençer li hewayê biriqîn. Dûvre dudu li erdê çît bûn, yên din bi lez û bez ji ber çav winda bûn.

Bi bandora vê bûyera di kêliyê de pêkhatî, demekê li wir bist bû. Gelo divê di ser wan terman re derbas bibe û biçe mala xwe, yan jî vegeriya baştir bû? Dibe ku nemiribin jî. Fêm nekir çima ketiye hisekî wisa ku yên li erdê term in. Xwest biçe binêre. Dûvre dema dît wisa li cihê xwe bê liv û tevger sekinîne, jê qeriya.

Kî bûn ev? Kî bûn ev ên êrîşkar? Kî bûn ew ên hatibûn parastina wê? Bi xwe di hedefê de bû yan jî tesadufî bibû şahidê bûyereke wisa?

Di zemanekî wisa de bûn ku li kolanên qirêjbûyî cinayetên bêsebeb çêdibûn, lê li vî bajarî bûyerên bi vî şeklî zêde nehatibûn bihîstin.

Gelek fikir di serê wê re mîna tîrêjan derbas bûn, tirsa xwe tepisand û ber bi paş vegeriya dibistanê.

Her çiqasî nobedera li ber derî gotibe wê naxîne hundir jî Xorrem bêyî gotinekê bike ket hundir û çû odeya hekîm. Hekîm razayîbû, Hoşeng jî li ser kursiyê di xew de bû. Dema ku li ber derî hatina xwe bi çend kuxikan diyar kir, ciwan ji cihê xwe pengizî.

Got, “Çi bû?”

Xorrem serpêhatiyan gava din bi pistepist jê re gotin. Li ber ronahiya kêm a findê dît ku ji nav tiliyên destê rastê yê Hoşeng xwîneke zirav ziwa bûye. Sebeba wê nepirsî. Heta sibehê li ber serê hekîm sekinî.

## Li Haremê Înciya Veşartî: Şoşan

Dema Eslê ketibû ber sikratê, yek ji keçên li ber serê wê jî Şoşan bû. Ji bo hemû bêbextiyên Eslê kirî şahidî kiribû. Ji ber qetilkirina Mazdek û hevrêyên wî, ew berpirs didît û bi wê kîna ketî ser hev ji qesrê reviya.

Keçên Esleyê ew mezin kiribûn. Malbata xwe qet nas nekiribû. Tenê dizanîbû malbata wê sirgûnê Babîlê ne û Cihû ne. Bi çavê dayika xwe li Esle dinêrî. Malbata wê ew bûn û li qesrê mezin bibû.

Ewqasî xweşik bû ku hemû keçên Eslê jê dihesidîn. Porên reş heta çokên wê dihatin, bêhna yasemînê jê belav dibû. Tevî ku temenê wê bibû 14 salî jî, bejna wê ji ya Esle dirêjtir bû. Înciya qesrê ya di nava qalik de bû. Her kesên ku ji bo karibin ji qalikê wê derxînin hewl dabûn jî bi şeklekî li pey xwe hiştibû.

Dema ku Esle diçû ba zilaman hê 12 salî bû. Ji bo ku heman tişt neyê serê Şoşanê jî ew girtibû bin baskên xwe.

Piştî Qralîçeyê ya ku gotina wê herî zêde li qesrê derbasdar dibû Esle bû. Li ber çavê qral jî tenê cariyeyek bû û pir zêde qîmet nedidayê. Ji ber vê yekê jî kîna wî ji kûranî kişandibû dilê xwe. Ji qral nefret dikir. Şoşan jê dûr digirt, lê hewl dida bala prensê ku wê bibe qral jî bikşîne ser wê.

Şoşan wekî qralîçeya siberojê xeyal dikir. Ji bo ku karibe sifata “qralîçeya qralîçeyan” bigire jî çi ji destê wê dihat dikir. Ji ber vê jî hewl dida ji hemû zilamên xwe nêzî wê dikin dûr bigire, lê dîsa jî zilamên ji qesrê mîna kûçikan ketibûn pey wê.

Şoşan dema bibû 17 salî, wezîfedarekî ola sexte bela xwe tê dabû û tecawiz kiribûyê. Esle dizanîbû heger ev bûyer bihatana bihîstin wê hesabên wê serûbin bibûna. Heta demekê nehat bihîstin, lê dema dubare bû, vê carê Esle ew zilamê tecawizkar bi jehreke nediyar kuşt.

Piştî mesela jehrîkirinê, Şoşan ji Esleyê pir tirsiya û mîna bibû xulama wê.

Piştî wê rojê nêzîkatiya Esleyê jî guherîbû û li dijî zilamên ku dixwest bixe bin kontrola xwe Şoşan bi kar tanî. Di nav van de qral jî hebû!

Şoşan piştî ewqas êşê û mirina Esleyê ji qesrê reviya. Wê çaxê emrê wê bibû 28 sal. Piştî ku 28 salan li qesrê mabû, fikrê revê ji ber daxwaza xwegihandina hevjîna Mazdek, Xorremê bû.

Esle difikirî ku heger bêbextiya xwe jê re bigota, wê karîbûna xwe ji hemû gunehên xwe yên heta wê rojê pak bikirana.

Qetilkirina Mazdek sûcê Esleyê bû, lê dema ku bibû şirîka sirê, xwe jî wekî şirîka sûcê his kiribû. Baweriya xwedê ew bi temamî rapêçabû. Tekane armancê jiyanê wê ew bû ku xwe bigihîne Xorremê û jê re rastiyê bibêje.

Halbûkî Xorremê çavkaniya bêbextiyan ji her kesî baştir dizanî. Rewşa Şoşanê ji bo bîrbirina vê ne guncav bû. Ya ku ji bo wê girîng jî ne ev bû. Ya girîng ew bû ku wê bi xwe ev ji Xorremê re bigotana.

Wê efû jê bixwesta. Bi bexşandina Xorremê wê bexşandina Xwedê jî pêk bihatana. Ji bo wê ewqasî girîng bû.

Her çiqasî nizanîbûna wê çawa xwe bigihandana wê jî, ji qesrê reviyabû û veger tine bû.

Kurê zilamê ku xalîçe tanîn qesrê dinasî. Digot ew ê alîkariya wê bike.

Hevdîtina wan a yekem li cihê wan ê rêsandina xaliyan bû. Li gel Esle çibûn wir. Esle wekî her demê dîsa ketibû pey lîstokekê, lê wê bi heyranî temaşe dikirê ka çawa dest dide xaliyan. Dema ku li wir kurik dîtibû, li beramberî wî jî hisên germ pê re çêbibûn.

Çaxa xalî anîbûn qesrê, dîsa dîtibû, vê carê pê re axivîbû jî. Wexta beriya 17 saliya wê bû û Esle ji bo bibe qralîçe ew amade dikir. Ya ku kurik ji wê dûr xistibû jî Esle bi xwe bû. Hayê Şoşan jî jê çênebibû bê çi pê kiribû.

Piştî ewqas wext ketibû navberê, hêvî dikir wî li wir bibîne. Ti cihekî biçê, kesekî alîkariyê jê bixwaze tine bû.

Wisa ew dîtibû. Zewicî bû, zar û zêçên wî çêbibûn. Gotê, Esle gef lê xwarine, ji ber vê yekê jê dûr sekiniye, lê ji bo her cure alîkariyê jî amade ye.

Wê jî jê re behsa xerabî û bêbextiyên Esleyê kir. Jê re got ji ber vê yekê jî dixwaze xwe bigihîne Xorremê.

Kurik gotê, navê Xorremê û mirin eynî tişt in. Ditirsiya.

Tevî vê jî gotibûyê wê alîkariyê bike. Lê nizanîbû ne Xorrem ne jî şopdarên Mazdek li kû ne. Hebûn û tinebûna wan jî nediyar bû.

Tevî ku bi sempatî nêzî wan dibû jî ti carî fikrên xwe kifş nekiribû. Li gel Kewyaran têkiliyeke veşartî jî danîbû. Lê, di vê demê de nizanîbû xwe çawa bigihîne wan jî. Tenê îhtîmalek hate bîrê.

Gundê keçeke li ber destê wan mehfûran dirêse, li nêzî paytextê bû û di dema raperînê de hatibû şewitandin. Dibe ku vê keçê tiştek bizaniya. Heger wê jî nizanîbûna, ti kesên ku ji wan fêr bibûna jî tine bû.

Çûn ba keçê. Keçikê li cem xwe got ji aliyê wan ve tê ceribandin, destpêkê pir zêde xwe lê nekir xwedî, lê dûvre dema halê Şoşan ê pir israr dike û digirî dît, jê bandor bû, alîkariyek da wan.

Keçikê ew nas nedikirin. Lê got ew bi xwe dikare ji gundiyên xwe bipirse. Gundiyên wê jî li deverên cuda yên bajêr belav bibûn.

Ronahiya Xwedê rê li ber Şoşanê xistibû û ew heta vir anîbû. Ji ber ku ew keçik, yek ji çavkaniyên zaniyariya şervanên Kewyarê bû. Helbet navê wan wekî Kewyaran nizanîbû. Tenê tiştek dizanî, qesrê gundê wan şewitandibû, ew jî dijminê qesrê bûn.

Şoşan bû mêvana malbata mehfurker, veşartî ma û hatibû parastin. Fikirîbû dikare biçe kû derê, lê cihekî biçûna jî tine bû.

Piştî bi rojan, biyaniyek hat malê û xwest pê re biştexile.

Tiştê lê geriyabû hatibû ber deriyê wê…

**Kurê Pençeşêr, Ez û Rima Min!**

**Hişk bû**
**Ahenga wê çû**
**Xwîn tevlî deng bû**
**Kir qirçînî û di nîvî de şkest**

Ji ber ku hekîm dest ji têkoşîna xwe ya jiyanê berdabû, li nexweşxaneya dibistanê zêde temendirêj nebû.

"Gora wî heta dawiyê wê tenha bimîne, mîna gora Habîl!"

Ev gotinên Xorremê li ser serê gora Hekîm ji bo ferdên malbata xwediyê malê, yan ji bo Rehber yan jî ji bo xwe gotibû, ne diyar bû.

Piştî merasîma cenazeyê, Rehber got êdî ev bajar ne ewle ye; li jorê, li milê Xorasanê dost û alîgirên wan hene, dikarin biçin wir.

Xorrem jineke têkoşer bû. Ji bo xwe li Reyê veşêrin hatibû, lê dema xwe veşartibû jî bi qasî karîbe dilê gel qezenc bike kar kiribûn.

Bi dengekî teqez û bi biryar got, "Em naçin ti deveran!" Rehber tenê serê xwe xwar kir û got, "hûn çawa dixwazin em ê wisa bikin!"

Ji derveyî du dostên wan ên hekîm ti kesên din nizanîbûn Xorrem kî ye. Dema ku Rehber û Hoşeng jî li vê hejmarê zêde dibû, digihiştin çar kesan.

Demekê hekîm nexuya bûn. Ji Rehber xwest ku li aqûbeta wan binêre. Xwe gihandina encamekî ne rehet bû, ji ber ku ti şop tine bû.

Wan çaxan li qesra Sasaniyan gotegotên têkildarî Xorremê zêde bûn. Gotegota herî li pêş jî ew bû ku ji bo tolhildana Mazdek, Xorrem dixwaze komeke çekdar ava bike. Ev jî wisa girê didan: Dema ku Mazdek hatiye qetilkirin, ji Xorrem pirsîne wê niha çi bike. Wê jî gotiye, "Xom û Rim". Ango, Ez û rima xwe!

Her wiha mîna ku heta wê rojê navê wê cuda bûye, piştî wê rojê, ji Xom û Rim derketine rê û navê wê wekî Xorrem hatiye bibîranîn, vedigotin.

Niştecihên qesrê, di mezinkirina tirsan û afirandina dijminahiyê de hoste bibûn. Ji ber vê yekê têkildarî Xorremê her cure gotegot

diafirandin. Halbûkî navê Xorremê ji dayikbûnê ve wisa bû, lê belê, ji bo rêbazên têkoşînê ketibû nav lêgerînên nû, ev rast bû.

Piştî qetlîamê, hestên tolhildanê pê re zêde bibûn, lê yekser neketibû nav tevgerê, bi helwesteke zaniyaran fikirîbû ku veşartî û bi kûranî gel rêxistin bike.

Çend ta porên ku ji serê wê diket ser gepên wê veguherîbûn rengê zivîn û vê jî hewaya wê ya zanatiyê peyitandibû. Wekî berê çawa perçema dirêj serbest berdida, porê xwe yê spî jî wisa berdida. Tevî vê jî ciwan û dînamîk xuya dikir.

Li qirika xwe stûmaleke sor, zirav ya pemboyî girê dida. Piştî qetlîamê ew ti carî dernexistibû. Tevî ku pêlavên wê peritîbûn jî, bi yeka nû nediguherî.

Ji pereyên Sasaniyan ku li rûyekî wê serê qral li rûyê din agirê pîroz resim kiribûn, li gel Rehber qederek hebû. Ji Rehber nepirsîbûn ka ev pere ji kû dîtine. Di serê wê de fikrekî wekî helbet wê demek were ev ê lazim bibin, hebû.

Her çiqasî ji wan gundên ku rêzikên jiyana hevpar pêk dianîn pir dûr bûna jî tiştekî pir zêde guherîbû tine bû. Ev zêhniyetek bû, terzekî jiyanê bû. Biçûna kû derê jî nediguherî.

Bang li Rehber kir û ji ber gotibû bajar êdî ne ewle ye, jê xwest vekirî bipeyive:

-We çima li wan herdu zilaman da?

Dema ku pirseke wisa yekser û ji nişkê ve jê pirsîbû, serê xwe berda ber xwe. Xorrem got:

-Serê xwe rake û ti carî daneyne! Çi dibe bila bibe!

Rehber serê xwe rakir û li Xorrem nêrî. Hewl da fêm bike ka aciz e yan na. Gotinên Mazdek ên “em ê nekujin!” ket nav guhê wî:

-Niyeta me ne kuştin bû.

-Temam, mirin?

-Bawer im!

-Ew kî bûn?

-Me ferq kiribû ku demekê hem mala hûn lê diman û hem jî hûn bi xwe dihatin şopandin. Em fêr bûn ku wekî sîxur ji derve anîne bajêr. Dema me xwe nêzî wan kir, behsa îşareta stêrkê ya li ber çavê we dikirin. Bawer im wê rojê fêm kiribûn ka hûn kî ne.

-Lê dîsa jî lazim bû we nekuştana. Dibe ku eleqeya wan bi windabûna dostên me yên hekîm jî hebûna.

-Gotina wê zehmet e, lê em dibêjin qey êdî hekîm ne sax in.

-Qet şop tine ye?

-Na, lê ji ber ku herdu jî pev re winda bûn û dûvre jî sîxuran hewl dan êrîşî we bikin, ti îhtîmaleke din nayê bîra me. Îhtîmaleke mezin revandin, êşkence kirin, dema navê we fêr bûn jî kuştin.

Xorrem, tevî ku rastiya meseleyê dizanî jî pirsî:

-Yê li ba te kî bû?

Rehber hinekî sekinî, dûvre gotê Hoşeng bû.

Xorrem wê kêliyê aciziya xwe diyar kir:

-Ew hê zarok e!

-Temenê wî biçûk e, lê fîzîk û perwerdeya wî temam e.

-Çawa? Ji kê perwerde dîtiye? Perwerdeya çi dîtiye?

-Hoşeng ji 12 saliya xwe ve perwerdeyê dibîne, hevrêyekî me yê saxlem e! Di vê mijarê de alîkariya dostên me çêbû.

Kesên ku jê re “dost” dihat gotin, ji dema ku Mazdek li stargeha veşartî dîtibûn heta niha li dora xwe didît û dibihîst.

Ji ber ku wekî hevrê behsa Hoşeng kiribû, bala wê kişandibû. Dilsoziya malbata ku li balê dimînin bala wê kişandibû, lê rewşa Hoşeng ti carî nikarîbû texmîn bikirana.

Dema ku Xorremê pirsîbû jî tenê gotibûn bavê wan li paytextê dixebite û tiştekî din jî negotibûn. Halbûkî bavê wan jî di nav îsyanê de hatibû kuştin. Li ser êşa Xorremê nexwestibûn behsa êşa xwe jî bikin.

Dayika pîr a Hoşeng û xwişka wî nizanîbûn Xorrem kî ye, lê Hoşeng ji mêj ve dizanîbû.

Xorrem dema pê hesiya Hoşeng kurê Pençeşêr e, wê çaxê mat mabû.

Li rewşeke wisa rast hatibû, gelo ev mûcîze bû, tesaduf bû yan jî peyameke Xwedê bû?

Vê rewşê biryara wê teqez kir. Tevî hemû qetlîamê jî Hoşeng nûnertiya hêviyê dikir. Wê têkoşînê dewam bikirana. Hebûna Hoşeng van hestên wê xurttir kir.

Aqûbeta nediyar a dostên hekîm û li ser rûdanê dema rastiya Hoşeng jî zêde bû, fikirî ku lazim e bikevin nav tevgerê.

Destpêkê lazim bû ji bo xwe veşêrin cihekî nû bibînin, dûvre jî alîgirên xwe yên li bajêr kom bikin.

Gelo pêwîst bû yekser bi xwe derketana pêşberî gel yan jî bi navbeynkariya hevrêyên xwe xebatên xwe yên ewil bidana destpêkirin ne baştir bû?

Li ba du hevrêyên ceribandî bû. Bersiva xwe baş zelal nekir wê çawa bike, got herdu rewş di nav hev de jî dikarin mimkun be. Piştî ketin tevgerê jixwe wê berdewama wê bihatana. Ji îro û şûn de nikarîbû kêliyekê jî xerc bike. Nedihat zanîn ka rojên li pêş wan çi tîne.

Di ser de jî li herêmên pir ne dûrî bajêr, gelek dilên ku bi agirê întiqamê dişewitîn jî li benda hatina wê bûn!

## Dayika Her Tiştên Zindî: Xwedawend Arînna

Behr, çol, çiya jî nebûna, ma cihekî ku mirov ji dinyayê bireviya û xwe lê bistranda dima?

"Bêdengî!"

Cihê ku her tim mirov xwe diavêt bextê wê û herî rehet diçûyê diyarê bêdengiyê bû.

Dema li wir bû, fikirî ku ji hemû peyvên dizane jî zêdetir pêdiviya bi tiştekî dîtir heye. Dûvre xwestibe çi bike jî ferq kir ku tenê were bîra wê bes e. Piştre dema fêm kir ku bêyî bîne aqlê xwe jî tenê bi saya hisên xwe dikare têkiliyê li ba her tiştên zindî deyne, fikirî ku zimanê diyarê bêdengiyê fêm kiriye. Dîsa jî tam rehet nebû, ji gumanên xwe rizgar nebû.

Ruhê wê wekî perporekê bi bask bibû, difiriya, lê dîsa jî di nav wê de bêhizûriyek hebû. Xwedê dizane li çi geriyabû û nedîtibû!

Wê kêliyê dengek hatê:

"Tu li çi digerî, ez dayika her tiştî me!

Dayika hemû xwedawendan,

Di ruhê her jinekê de veşartî,

Ez Arînna!

Dayika her tiştên zindî!

Di her jinê de dijî!

Min bibîne, min bibîne!"

Gera wê ya li diyarê bêdengiyê, dema çavên xwe vekir bi dawî bû. Gelo xewn bû yan jî xeyal dikir?

Xwedawend Arînna ya li ser texta xwe ya qeşagirtî ya li tehtên çiyayê berfgirtî rûniştî, rabibû ser piyan; bi rabûna wê roj derketibû, cemet heliyabûn, bibûn kanî û her der şîn bibû.

Xwedawend pê re axivîbû. Emrek dabûyê. Dayika her tiştên zindî jê xwestibû ku ya di nava hemû jinan de dijî bibîne.

Bi rojan li vê peyama xwedawendê fikirî, bi baweriyeke nû tijî bibû; diviyabû ya ku di her jinê de dijî bidîtana, lê çawa?

Piştî qetlîama mezin bêdengiya mezin hatibû. Ev bêdengiya bi xwînê hatibû xuliqandin wê bi çi û çawa bihatana xerabkirin? Bi dengekî çawa?

Diviyabû wisa bûna ku tenê bi emrê mirovekî sînordar nebûna, olana wê bi sedan salan dewam bikirana! Heta wisa bikira ku pergala

avakirî tenê bi sedan salan jî sînordar nemana, wekî terzekî bi temamî cuda yê jiyanê bêdawî bibûna.

Lêgerîna wê ew gihand xwedawendên winda. Di nava her jinekê de xwedawendek hebû. Xwedawenda di jinekê de derketana ortê dikarîbû cewherê hemû jinan derxistina holê.

Gelo mimkun bû sirekî hezaran salan di jinekê de xwe bidana der?

Winda nebibûn, tenê xwe veşartibûn! Mîna her razekê ji bo kifşkirina wan tenê mifteya rast lazim bû.

Ti tiştên heyî tine nabe!

Dayika her tiştên zindî civak e. Cihê ku hemû xezîneyên winda lê veşartî, stargeha ebedî ya hemû xwedawendan…

Mazdek xwest hemû deriyên stargeha azadiyê veke, hemû dilên kilîtkirî…

Armanca wî xwegihandina civaka eşqê bû.

Serî rakiribû li hemberî sîstema ku dinya kiribû zindana koletiya dildar.

Her tiştê xwe fedayî civakê kiribû. Her ku civakê ew fêm bikira, wê ji nîzama koledariyê rizgar bibûya.

Diviyabû behsê bike.

Bêyî bêzar bibe, aciz bibe, vebêje!

Êdî wê tenê bi rêzikên olê negotana. Hestên wê yên olî zeîf nebibû, lê li dinyayê ewqasî zêde ol hebûn ku, behsa ewqas xwedayan dihat kirin ku, êdî ji van aciz bibû.

Gumana wê ne ji olê bû. Digot yên ku dixwazin xwedê li gorî berjewendiyên xwe eyar bikin, esasên olê xerab kirine.

Nedibû ku ol li gorî berjewendiyên her beşê bihatana biteşekirin. Her kesî li gorî xwe, li gorî tebeqe û berjewendiyên xwe pênaseyeke xwedê dikir. Ev li wê Gundeşapûra ku jê re digotin pir pêşketî ye jî dîtibûn.

Mazdek ne ji ber olê, ji ber ew kesên ku xwestibûn olê li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin hatibû qetilkirin. Heger lîstokên rahîbên paşverû yên ji xwe re digotin "Zerdeştî" nebûna, wê Mazdek jî sax bûna.

Mirov ji olên cuda bûna jî, esas ne di ferqê de bûn ji heman Xwedayî re îbadetê dikin. Heger rêzikên olê ne li gorî rêzikên jiyana civakî bin, ew ol sexte ye. Li gel ew kesên ku digotin lazim e civak bi

rêzikên olî teşe bigire, bi rêzikên olî bê birêvebirin, nîqaşên germ meşandibû.

Li gorî wê rêzikên jiyana hevpar a civakê tenê ji olê nedihat. Piştî qetlîamê, nêrînên wê di vê mijarê de zêdetir pêş ketin.

Formula wê ya ji bo civak û olê sade bû: Diviyabû herdu jî hevaheng bûna, berevajî, wê hin komên berjewendîparêz ji nakokiyan sûd wergirtana.

Fikrê ku lazim e mirov civakî nêzî mijara olê bibe, beriya ku Mazdek nas bike, bi awayekî zeîf be jî di serê wê de bi cih bibû. Niha jî li dijî hemû nêzîkatiyên li derveyî vê îlana şer kiribû. Nedizanî, gelo wê karibe li derdora xwe jî ti kesên ji vê fêm bike bibîne. Fêmkirin li milekî, bêyî daraz dikarîbû bihatana lînçkirin jî. Di destê civakê de hêna jî “mafê pîroz ê lîncê” hebû!

Aqûbeta Hypatîa her kêlî li ber deriyê wê bû. Jixwe dewletê ji bo qetilkirinê sond xwaribû, gelo wê çi bertek ji civakê bihatana? Bûyîna Hypatîaya nû, dikarîbû bihatana maneya lînceke nû jî.

Wekî tevgera têkoşîna feqîran û gundiyan derketibûn ortê. Her çiqasî Mazdek bawermend be jî, rêzikên wî nerm bûn. Civakê jî ew germ pêşwazî kiribû, lê hê jî pir zêde alozî hebû.

Bi xwe jî dîn red nedikir, tenê li dijî ew kesên ku ol bi kar tanîn û şaşiyên di olê de heyî dixist ber lêpirsînê.

Ji ber ku ev bi têrkerî li ba Mazdek nîqaş nekiribû, dubare dubare heyfa xwe tanî.

Bi qasî hêza xwe wê behsa wî û hevalên wî bikirana. Wê civaka eşqê ya di xeyalên Mazdek de vegotana.

Têkiliya milkiyetê û koletiya bingehê zewacên li gorî fermiyeta dewlet û ruhaniyên sexte dahûrandibû. Li dijî vê helwest pêş xistibû û li ser bingehê exlaqê azadiyê terzekî nû yê têkiliyê diparast.

Li beramberî nîzama ku hewl dida civaka eşqê bi bêbextiyên qirêj reş bike û weez dikir ku ruhê jinê tine ye, karê wê qet ne rehet bû.

Du hevrêyên wê yên dilsoz li balê bûn. Vê cesaret dida wê. Lê, zoriyên li pêşiya wê jî dê zehf bûna. Wê ji her demê zêdetir li zoriyan rast bihatana. Baweriya xwe bi îradeya xwe tanî. Îrade her tiştê wê bû.

Dibe zanebûna mirov kêm bûna, derfet kêm bûna, lê heke îrade xurt bûya, dikarîbû her tiştên bixwazibe pêk bianiya.

Îrade, enerjiya Xwedayî bû. Şertê wijdan bû; yê ne xwediyê îradeyeke xurt bûna, nedibû xwedî wijdan jî. Wijdan, dema ku kes li

xwe dipirsî dest pê dikir. Xorrem bawer dikir ku mirovê bikaribe şaşiyên xwe qebûl bike, bi îrade ye. Yên xwedî îradeyeke zeîf jî serî li beramberî şaşiyên xwe ditewînin, yan jî bi serketineke biçûk jî ji ser hişê xwe diçin, êsîrên hestên xwe ne. Têkiliya di navbera wijdan û olê de her tim serê wê mijûl kiribû. Encama gihiştibûyê jî ew bû ku herdu jî ne cuda ne.

Ol ji bo wê wijdan bû.

Yên xwedî îradeyeke zeîf ti eleqeya xwe bi olê re jî nedibû.

Îrade îspata baweriyê bû!

Bêîradebûn û bêbawerî, bêîradebûn û sextebûn yeksan didît. Mirovekî ku baweriya xwe mezin bûna, di îradeyê de jî pirsgirêka xwe tine bû. Bi saya îradeya tûj a baweriyê, dikarîbû serî bi her cure zoriyên jiyanê derketana.

Yên xwedî baweriyeke zeîf, li ser navê ol, wijdan, civakê çi hebûna, dikarîbûn henekên xwe pê bikin. Bawerî, bingehê biryardarî û cidiyetê bû. Samîmîbûn û bawerî ji hev nediqetiyan. Mirovê bêîrade nedibû xwedî cidiyet, samîmiyetê.

Hemû rê li îradeyê vedibûn. Hêza fikrê ya ku mirov dikir mirov, di jiyanê de îrade bû.

Mirovê bêîrade, mirovê xwedî ruhekî kole bû: Her ku îradeya wî kêm dibû, mirovahiya wî jî kêm dibû. Her ku zêhnê wê vedibû, Xorremê digot qey gihiştiye îradeyeke ku dikare pêvajoya xwedawendan zindî bike û ev îradeya wê jî her tim mezin dibe.

Digot, “Îrade xezîneya kesayeta azad e, her ku tê bikaranîn zêde dibe!”

Li gorî fikra wê, dema ku ev îrade bû îradeyeke civakî, ti asteng nikare li pêşiyê bisekine.

Îradeya civakî mîna ronahiya pîroz bû; ronahiyeke ku her kesî ronî dike, rê nîşan dide, diparêze û xurt dike!

Di çavkaniya îradeyê de nirxên Manî’wî hebûn; ev jî di civakbûnê de derdiket ortê. Her kêliya civakî zindî bû. Bi saya vê xeyalên xwe taloq nedikir, kêlî bi kêlî dijiya. Xeyalên wê hebûn, lê ew xeyalên xwe ji bo dema hilweşandina împaratoriya zilmê nedihişt. Li şûna ku behsa dinyayeke siberojê ya ji zilmê rizgarbûyî bike, dixwest ji îro ve wê dinyayê di jiyana xwe de biafirîne.

Li kû derê dibe bila bibe, ketina nav civakeke biçûk bi qasî rêgezên olî pîroz didît.

Paşverûtiyên di nava civakê de nedihat wê maneyê civakbûn were redkirin. Berevajî, li dijî paşverûtiyan têkoşîneke civakî pêwîst bû.

Qezenckirina îradeya îlahî, dîsa cîvakbûn pêwîst dikir.

Îrade, hêzeke civakî bû ku nedihişt xeyal bişkên.

Îradeya herdu hevrêyan jî xurt xuya dikir. Mirovên bawermend û xwebexş bûn. Digot wê zeîfetiyeke îradî nîşan nedin. Heger şaşiyên wan çêbibûna, wê ne ji ber pirsgirêka îradeyê, dibe ji ber nezanî yan jî ji niyeta pak bûna.

Mîna civaka ewil a piştî tofanê bûn. Ew ê dilşkestî nebûna…

Sê kes dikarîbûn bibûna civakek. Civakeke biçûk a ku ji bo hemû civakê bibin mînak. Her çiqasî sê kes jî bûn, lê mîna komeke mezin a şerker didît û tijî cesaret bibû.

Ev civaka biçûk, lê bi qeys û qerar, wê bibûya hilgirê xezîneya veşartî û civaka mezin derxistina holê.

Malbatên herî nêzî xwe anî bîra xwe. Ji ber ku heta wê rojê ji nêz ve bi zarokên Asara re mijûl nebibû, xemgîn bû.

Asara jî mîna wê bi têrkerî bi wan zarokan re mijûl nebibû. Wextê xwe ji bo civakê xerc kiribû, nedabû zarokên xwe. Bi xwe, ji bo ku wê valatiya Asarayê dagire çi kiribû? Di vê mijarê de wijdanê wê ne rehet bû û her ku dihat bîrê jî xemgîn dibû.

Niha jî li vir dayik û xwişka Hoşeng wisa li pey xwe bihişta wê dilê wê ne li cih bûna. Dema ev mijar ji Rehber re got, biryar dan ku dayik û keça wê bişînin cihekî ewle. Rehber ew birin û piştî du rojan vegeriya.

Ji Xorrem re got cariyeyeke bi navê Şoşan jî dixwaze xwe bigihîne wê.

Ev agahî rast bû, lê di demeke wisa de nikarîbû cariyeyeke ji qesrê bianiyana ba xwe. Nas nedikirin û nikarîbûn ewlekariya xwe bixin xeteriyê. Ji ber vê yekê cihê Xorremê ji ti kesî re negotibû. Lê Xorrem li ber vê ket. Heger Şoşan bi xwe re bianiyana wê baştir bûna.

Şoşan dikarîbû ji bo agirê întiqama dilê Xorremê bibûna çare. Qral ji berê jî zêdetir dihate parastin. Ji bo întiqama Mazdek li gelek rêyan geriya ku xwe bigihîne qral, lê negihiştibû encamekê. Şoşan dikarîbû bibûya firsendeke mezin, lê beriya nas bikin ev firsend ji dest dabûn.

Yên alîkariya Şoşanê kiribûn, gotibûnê alîgirên Mazdek li milê Reyê zêde ne û bixwaze dikare wê bibin wir. Her çiqasî Rey pir dûr bû jî, Şoşanê ev rêwîtî da ber çavê xwe.

…

Li derveyî Reyê, li dûzbûniyê rêzek gund hebûn. Hin gundên ji van mîna bihuştên veşartî bûn. Ji derveyî van gundên ku çemên biçûk tê re derbas dibûn, dîtina kaniyeke avê, hema hema ne mimkun bû.

Halbûkî, li bakurê wê, qûntarên başûr ên çiyayên Elbûrzê hebûn. Li wir xumexuma avê bû. Ji vir lûtkeya çiyayê Demawend ê ku çar demsal jî berfgirtî ye, xuya dikir. Terîqeteke veşartî ya ku mezinên berê yên ola Zerdeştî ava kiribûn û ji nêzî Demawendê derbas bibûn, navê “Saheb-e Dilan” li vir kiribûn: Xwediyên Dil!

Li vê herêma çiyayî ya ku wekî “Mala Xwediyên Dil” jî tê binavkirin, zivistanê mayîn pir zehmet bû. Cihekî wisa bû ku gelê Medyayê dema Ajî Dahakayê zalim têk dibin li vî çiyayî zincîr dikin û heps dikin. Heta ku hemû xerabiyên sererdê tine dibin jî wê li vir êsîr bûna.

Mirov digot qey, ewrên ronî yên ku hijmeta Xwedayî diteyisandin, piştî ku li ser dinyayê geriyane, her der terikandine û li vir, li ser Demawendê kom bûne. Berfa ku çar zivistanan li hemû dinyayê dibariya, li vir di carekê de diket.

Li vir tenê komek hebû, zivistan jî didan ber çavên xwe; civateke ji çavan dûr, hayê ti kesî jê tine ye. Qebîleya şervanên efsanê ya ku Xorrem li deverên pir dûr li wan digeriya, lê qet li şopa wan rast nehatibû: Kewyaran!

**Pepûleya Pêncemîn!**

Hisên wê pir kûr bibûn û bibû xwedî tecrûbe, dikarîbû di demeke kurt de aliyên herî veşartî yên mirovekî jî kifş bikirana. Tevî vê jî ji razên hevrêyên xwe, mirovên li ber serê xwe bêxeber bû.

Li her îhtîmalê fikirî, got lazim e li herêmeke çiyayî cihekî ji bo xwe çêbikin. Rehber û Hoşeng wekî ku ji mêj ve amade bûn, rehet tevgeriyan.

Mirovên xwedî sir bûn. Mazdek dîtibûn, li ba wî têkoşîn meşandibûn. Ji nêz ve dizanîbûn fêrkirinên Mazdek ên ku berçav dihatin hesibandin, esas ne ewqasî berçav in, ya veşartî girîngtir e.

Ji Xorrem re gotin li milê Demawendê dostên wan hene, lê negotin kî ne.

Xorrem yan wê bi çavên xwe ev dost bidîtana, yan jî wê ti carî nizanîbûna kî ne. Heger du hevrêyên heta mirinê pê ve girêdayî jî vê agahiyê wekî sirekî vedişêrin û wekî sondxwarî devê xwe venakin, Xorrem ji bo ev sirê mezin fêm bikira, heger lazim bûna hemû çiyayên dinyayê derbas bikirana jî amade bû.

Got, “Niha Mohra min li ba min bûna em ê wekî ba biçûna.”

Rehber:

“Ji bo em biçin wir hespên herî saxlem ê dinyayê ji me re lazim in. Hespên Moxolan saxlem in. Peydakirina wan zêde wext naxwaze.”

Her ku Xorrem dibû şahidê zanebûn û jêhatîbûna Rehber, mezinahiya Mazdek Bamdad bi bîr tanî û difikirî ku ronahiya wî derbasî Rehber bûye.

Dema hesp dîtin ecêb mabû. Li ba wê bejna bilind, serê tîk û bijiyê dirêj ê Mohrê ev hesp çilmisî bûn, lê ewqasî saxlem xuya dikirin ku mîna her yek dikarin du Mohran li pişta xwe bikin û bibin. Lingên wan kurt, bijiyên wan kurt û hişk, teriya wan jî bi qasî bigihiştana erdê dirêj bû.

Ji van hespan re “Takhî” digotin, bin çokên wan reş û bi pirç, gewdeya wan jî qehweyî bû. Dema li ser wan derketin rêwîtiyeke nû, rojê li asoyê milê çepê şerîdeke sor çêkiribû. Heta ku tarî ket erdê, paralelî wê şerîdê çûn.

Bi roj nikarîbûn ji bajêr derketana. Ber bi êvarî, dema ku her kes ji kolanan vekişiyabûn derketibûn rê, li ti kesî rast nehatibûn, lê tarîtiyê jî ew zû girtibûn. Ne gundek ne jî xanek hebû biçûnê.

Seqema şevê cemidî bû. Tûmên ku jê re "Diranê Gur" digotin, striyên mezin pê ve bûn û ji ber bi don bû bi rehetî dişewitîn, li hev kom kirin, agirek dadan û xwe germ kirin.

Ev gonî ji binî rakirin pir zehmet bû. Tenê darên wê dikarîbûn bihatana şkandin. Tekane xatiraya ku ji herêma daristana berê mabû, tenê ev tûmên bi don û qeyîm bûn.

Her cara agir kêm dibû, Hoşeng zêdetir Diranê Gur tanî.

Dema ku Hoşeng gonî avêtin nav agir, di carekê de geş bû. Li ser rûyê hersêyan jî wekî gulên sor vebibûn. Demekê bêdeng li şeklên li serikê agir çêdibûn mêze kirin. Dûvre her yekî gotin ka van şeklan dişibînin çi.

-Hespek!

-Ejderhayek!

-Çavek!

-Qertelek!

Bayekî kêm hebû, her kêlî şekil diguherîn. Xorremê çîroka çar pinpinîkên ku heqîqeta agir meraq dikin vegot.

Yekê mêze kiriye û gotiye, "ronahî", yek nêz bûye û gotiye, "germahî", yek gihiştiye agir û gotiye, "dişewitîne".

Ya dawî dema ketibû nav agir heqîqet fêm kiribû, lê wê nikarîbûna ji bo yên mayî vegotana!

Hoşeng piştî ku hinekî fikirî got Xorrem "pepûleya pêncemîn e". Xorremê bersiveke wisa dayê; "Ne ez Mazdek wisa bû."

Dema ku navê Mazdek derbas bû, hestiyar bûn, ketin nav fikrên kûr û dûr. Dema ku bêdengî çêbû, dengê agir gûrtir derket. Çavên hersêyan jî mîna ku di nav agir de li tiştekî digeriyan, mêze dikirin.

Çirûskên biçûk û dengê agir mîna melodiyekê di guhê wan de bi cih bû. Dûvre hêdî hêdî bû koz. Dema ku li wan kozên ji pey agirê nû tefiyayî mayî û li gel hev in mêze dikirin, kûr û dûr çûn. Ji bo van kozên ku agirekî şîn jê diçû, "jîlemo" digotin.

Xorremê got, "çi navekî wê yê xweş heye."

Rehber jî pejirand, got, "Jîlemo" û sekinî. Nefeseke kûr kişand, got, "Heçkû jîlemo jî mîna me bi derdekî ye; wê bi hiznê bitefe û ji bo pêkeve li benda bayekî biçûk bimîne." Xorremê jî jîlemo şiband jinên lal û bêçare…

Her yekî heta xew ket çavên wan bêdeng li kozan mêze kirin.

Xorrem, ji ber ku li ba van hevrêyan bû, dikarîbû bi rehetî pişta xwe bide wan, bi hizûr bû. Pala xwe da zîna ku ji hespê daxistibû û raza.

**Rasthatina Kevî!**

Mexrebê rabûn û ketin rê. Zêde wext neçû, bayekî sar ê ku dida hiskirîn ber bi jor ve çûne, bi ser wan de hat. Danê nîvro jî lûtkeya cemetgirtî ya Demawendê dîtin, li pêşiyê girên biçûk ên bi sûlavan mîna gerdeniyê xemilandî hebûn.

Li vî cihê avî demekê ji qebîleyên berê yên Aryenê, qebîleya Mazana bi cih bibû. Ev cihê ku piştî ji çolistanekê hatibûnê, ji wan re wekî bihuştekê bû.

Çaxa nêzî qûntarên wê bûn, dîtin ku ji girikên li dorê dûman û dûkel bilind dibin. Xwezayê bandor li wan dikir, ew dikşandin.

Ji dûzbûna zer a ku genimên bejî lê belav bûne bihurîn. Gihiştin qûntarekî tîk ê bi her tonê keskê xemilandî. Dema ku li dora vir geriyan û derbas kirin, vê carê jî ber bi jêr daketin.

Ji dûranî doleke kûr xuya dikir. Xwe bigihandana wê dolê, dê dawî li rêwîtiya wan jî bihatana.

Heçkû li van deveran ti kesî jiyan nekiribû. Ti şop tine bû mirov bibêje mirovek di vir re derbas bûye.

Xorrem carê ji Rehber dipirsî ne cihekî şaş be, carina hespa xwe disekinand, digot, “tu baş dizanî ev der e?”, Rehber jî her carê bi awayekî ji xwe pir bawer dibersivand, lê rê û rêwîtî jî nediqediya.

Heta gihiştibûn wê dolê jî pir wext derbas bibû. Hingî westiyabûn taqata wan nemabû. Xorrem çend carekê dikira ji hespa xwe biketana. Lingên wê tevizî bûn, êşeke mezin dida hemû laşê wê. Ruxmê vê jî ji bo zû bigihêjinê nesekinî.

Li dawiya dolê, girekî qelaç, fireh û tijî pozikên tûj dîtin, lê di nav teht de şiverê hebûn, hesp dikarîbûn bi rehetî tê re biçûna. Dema qelaç derbas kirin, gihiştin dûzbûneke fireh.

Li dûzbûna dûvdirêj, ji bilî çend parçeyên zinar ti tişt nedîtin. Hespên ev dûzbûn dîtine, ma wê nexwazin wekî firtoneyê bibezin?

Hespê xwe rakirin çargavê û çûn. Piştî demekê hatin ser kendalekî û li qiraxa kendal tiştekî spartî zinar dîtin. Ev tişt, bi destê mirovan hatibû çêkirin!

Herî dawî cara yekem tiştekî bi dest mirovan hatibû çêkirin derket pêşberî wan. Ji nişkê ve enerjiyeke nû hat Xorremê.

His kiribû ku êdî gihiştine cihê xwe. Li derdorê mêze kir. Rê qediyabû. Li milê din ê kendal jî cihekî daristan û qelaç hebû. Çavê wê li wan zinaran ket. Di jiyana xwe de zinarekî wisa bi heybet û tîk

nedîtibû. Dema ku hinekî din bi baldarî lê mêze kir, xezal dîtin, li ser zinar digeriyan. Ji hevalên xwe re jî got û heta ku ji ber çav winda bûn, temaşe kirin.

Dûvre hatin li qiraxa kendal sekinîn. Li çep-rastê wan kendal dirêj dibû; li jêr mêze kirin, valatiyeke bêdawî hebû. Kendal ne pir fireh bû, lê kûr bû.

Dema ku çavê Xorremê li kindira heta wî alî diçe û li vê amûra ecêb ket, texmîn kir tiştekî bi rola pirê ye.

Dibe ku ji bo xwe ji dijmin biparastana pir çênekiribûn.

Ji pişt zinarê biçûk komek şervan bi şûran derketin hemberî wan. Bi dostanî pêşwazî kirin.

Ji bo wê tişta ecêb ew tişta bû ku bi destê mirovan hatibû çêkirin, "Galîskî Helvasrau" digotin. "Galîskî" navê heya bi taxûk bû ku li ser berfê bi ben dikşandin. "Helvasrau" jî dihat maneya "ya daliqandî", herdu nav kiribûn yek û navekî dirêj li "amûra li hewayê rê kurt dike" kiribûn. Hinekan jê re digotin "Qeyika Hewayê".

Heger bixwestana bi hespên xwe dewam bikirana, diviyabû ji jêra dola, ango ji rêya hatibûn, ji zinaran daketana û ji hemû dolê paşde vegeriyana. Dûvre jî wê doleke dirêj bişopandana, li beramber careke din rapelikiyana. Lê heger hespên xwe li ba van şervanan bihiştana, Galîskî Helwasrau dikarîbû demildest ew derbas bikirana. Hespan jî dikarîbû bêhna xwe bidana û dûvre ji bo wan bihatana şandin.

Piştî vê westandinê helbet rêya kurt hilbijartin. Ji jor, binî û ji kêlekan bi kindirê hatibû girêdan. Li beramber jî hinekan bi kindireke din dikşandin û wisa hereket dikir. Mîna digotin, dişibiya qeyika hewayê jî. Du kes dikarîbûn tê de rûniştana.

Destpêkê Rehber û Hoşeng li vê qeyikê siwar bûn, rûniştin û xwe şid bi kêlekên wê girtin. Di carekê de derbasî milê din bûn.

Dûvre kişandin vî alî, vê carê Xorrem û şervanek lê siwar bûn. Dema ku Xorremê li jêr nêrî, serê wê gêj bû. Pirên bilind dîtibû, lê cara yekem ji cihekî ewqasî bilind derbas dibû. Di ser de jî bi vê îcada ecêb!

Dema serê wê gêj bû, çavên wê jî reş bûn û got qey qeyika hewayê ketiye ser kêlekê, bi xwe jî dikeve erdê. Qîrek da. Xwe baş bi kêlekên wê girtin û hewl da qeyikê rast bike.

Halbûkî ne qeyik ketibû ser kêlekê ne jî bi xwe diket. Zendên wê mîna kindira ku ew dikişandin hişk bibû. Eziyeta di wê dema kurt de dîtibû, domahiya rê nedîtibû. Herî dawî dema çûn milê din, got:

-Çi îcadeke xweş e! Em zû derbas bûn!

Mîna ku ya di derbasbûnê de xwêdan pê ketibû ne ew bi xwe bû.

Şervanê li balê tenê bi ken bersiv dayê.

Piştî ku kêmekî meşiyan, gihiştin gundekî. Malên vî gundî jî mîna wê "amûra rê kurt dike" ecêb bû.

Xanî pal dabûn şkêrekî bilind. Li beşeke bilind a vî şkêrî jî têketinên mîna şkeftan hebûn. Dirinceyeke van çalan jî tine bû. Gelo ji nav malan diçûn wir? Ev çal kêrî çi dihatin?

Tevî ku mal du qatî jî bûn, wekî yek qat xuya dikirin. Ne zêde bilind bûn û di navbera wan û şkêr de valatiyek hebû. Helbet bi demê re wê fêm bikirana, çi kêrî çi dihat.

Li gund tenê şervan tine bûn. Komeke qelebalix a jinan ew pêşwazî kirin. Bi hestiyarî Xorrem hembêz kirin.

Li derve xwarin dan mêvanên xwe û hiştin bêhna wan were ber wan.

Dema ku Xorrem şiyar bibû, roj diçû ava. Fêm nekir ji ber westandinê çiqasî razaye. Ber bi êvarî gihiştibûn gund. Bi xeweke kêm çawa bêhna wê hatibû ber wê, hemû westandina xwe ji ser xwe avêtibû.

Halbûkî nedibû sibe, şeva roja din bû. Dema ku Xorrem bi vê hesiya, li jina ku pê re dikeniya mêze kir, kenekî şermîn kir:

-Piştî rêwîtiya li ser wê zîna wekî kevir û hespa wekî kevirekî, ez dikarim heta bi hetayê li ser wê doşeka wekî perikên çivîkan birazêm!

Ji wan xwest Rehber û Hoşeng jî şiyar bikin. Wê bi hev re bihatana ser xwarinê. Vê carê wê rûyekî nû bidîtana.

Rehber li cem vî zilamê balaberz, kal, bi yek milî û mîna çiyayekî bi heybet, pir rêzdar disekinî. Destê xwe dirêjî Xorremê kir. Bi destê hev girtin. Kalo destê Xorremê berneda, xwe xwar kir û bi rêzdarî maç kir.

Dema ku Xorremê xwest wekî wî bersivê bide vê nêzîkatiya wî, kalo firsend nedayê.

-Navê min Kevî! We gundê me rûmetyar kir!

-Em jî pê şanaz bûn. Heyfa wê dema çûyî ku min heta niha nizanîbû li gundekî wisa dûr yê çiyê dostên me hene.

-Ez jî di demek nêz de hatime vir. Beriya qirkirinê!

-Naxwe hayê we ji bûyeran heye?

-Destan her tişt ji me re gotin.

-Destan?

-Ma ne hûn bi hev re hatin!

-Navê Rehber ev e? Min nizanîbû Destan e.

-Destan xwarziyê min e. Tenê kurê xwişka min a mezin ev bû, yadîgara wê ye, rehmeta Xwedê lê be. Şêrê Kewyaran e.

-We bi menqîbeya Kewyaran behsa Destan kir, naxwe gelek caran egîdî kirine. Demekê min jî bihîstibû, heta ji bo ku şopa wan bibînim, ez li çiyayên Med kêm negeriyam. Wekî efsane man. We navê Kewyaran ji kû bihîstibû?

-Çawa bihîstin? Bawer im min kêm anî ziman. Dizanim niha tiştên bibêjim hûn pê bawer nakin, lê ya ku jê re Kewyaran dibêjin, ne efsaneyeke berê ye. Efsaneya me bi dayika me Kewyarê dest pê kir û em hêvî dikin wê niha jî bi we re dewam bike!

Kevî fêm kir Xorrem ji ber şaşwaziyê nizane çi bibêje, di navbera bawerkirin û bawernekirinê de maye, fêm kir pê ne ewle ye, got:

-Ev sirê me ye. Ma me yê ji te re negota ji kê re bigota?

Dostê min ê qedir bilind, birayê min ê Manî'wî Mazdek Bamdad Hemedanî ez ji zindanê revandibûm, ez kurê Kewyar Kewyaran Kevî me!

Lazim e hûn bizanin ku ez van cara yekem û dawî dibêjim. We civak rûmetyar kiriye. Ji ber vê yekê me ji we re got. Lê hûn ê navê Kewyaran bi rehetî nebihîzin. Ji bo ku zirar negihêje pîroziya vî navî, em bawer dikin ku lazim e tim û tim neyê ser ziman. Her wiha, veşartina sir li cem me hem exlaq e, hem jî xwedî girîngiyeke jiyanî ye.

Xorrem ji cihê xwe rabû. Lêvên wê cirifîn. Çavên wê tijî bûn. Çû û xwe avêt stûyê Kevî. Riha kalo bi firmêskên xwe şil kir.

Bûyerên nayên payin hêj neqediyabûn. Dayik û xwişka Hoşeng jî bi navê cihê ewle şandibûn vî gundî. Hoşeng jî şervanekî Kewyarê bû.

Niha dema li rojên bihurî mêze kir, fêm kir Şêrdilê Pûşîkirî û yên jê re her tim "dost" dihatin gotin hemû jî Şervanên Kewyarê bûn. Li cem qehremanên efsanewî yên zarokatiya xwe têkoşiyaye, lê hayê wê jê tine bûye. Ya diqewimî ev rewş bi xwe bû.

Di ser de jî niha li gundê wan bû û li cem efsaneya herî mezin a zindî, li cem Kevî bû. Dema jê bihîst bê Mazdek çawa ew ji zindanê revandibû, careke din qeneet lê anî ku gelek razên Mazdek jî hebûne.

Kevî pir xemgîn xuya dikir. Rojekê sebeba wê got:

-Me ew neparast. Deynê stûyê me ye. Me neparast!

Ev ewqasî ji dil gotibû, Xorrem jî bandor bibû.

-Wî ev rê hilbijartibû. Ne sûcê we ye. Bi zaneyî çû ser mirinê. Dema ku tarîtî zêde bibû, hêvî kir karibe deriyekî veke. Bi dek û dolab, qetlîamê bersiv dan.

-Helbet hesabê van dê were pirsîn, tenê em li bendê ne ku zeman rê bide ber me. Heta kamilbûna zeman, heger ji bo we jî guncav be, em dixwazin hûn ciwanên me perwerde bikin.

-Bi qasî çavdêriya min perwerdekirî ne.

-Jiyan li vî welatî dişibe agir; dibêjin av diherike agir dişewitîne, lê li vir av dişewitîne, agir diherike. Ji ber vê yekê şervantî bûye qedera me.

Piştî esaretê, dema hatim vir, min dît ku kevneşopiya me ya şervantiyê hatiye domandin. Herî zêde jî keyfa min ji vê re hat.

Ciwanên me di şervantiyê de bi hostayî hatine perwerdekirin, lez in, wêrek in, lê ma ne lazim e fikrên wan jî bi qasî dilê wan yeman be?

-Têgihiştim. Bi şanazî qebûl dikim. Jixwe heçkû em hatine çiyayekî dawiya dinyayê. Ji bilî vê ma em dikarin li vir çi bikin?

-Wisa xuya dike ne wer? Lê dibe hûn jî rojekê bibînin; ji vê derê wirdetir, li milê Gîlanê jî birayên me yên olê û heta birayên me yên şer hene. Li wir hevrêyekî din jî heye ji nav Azeran tê ba me û diçe. Dinya me ne ewqasî teng e, fireh e.

Xorrem, ji ber navê Gîlan nebihîstibû, heyfa xwe lê anî. Pir tişt hebûn fêr bibe. Zimanê wan Gîlanî, pir dişibiya zimanê pirtûka pîroz Avestayê. Li wir bi saya baweriya ji dema Manî maye, merêbatiya Mazdek zû pêş ketibû. Hêza baweriyê tiştekî wisa bû ku ne qral ne jî sedsal dikarîbûn pê re bigihiştana.

Çawa bibû Mazdek di demeke ewqasî kurt de fikrên xwe gihandibû her derê? Ji ber ku demekê jê dûr ketibû, bi qasî niha ti carî wisa xemgîn nebibû…

Dema ku mirov dibêje qey dawî li xweşikiyekê hat, xweşikiyeke din ji nav wê zindî dibû.

Dema ku Xorrem gihiştibû Demawendê, Şoşan jî gihiştibû Reyê. Rehberê li balê zarok bû. Mîna kurê wê ye, pev re ketibûn rê. Lê ruxmî zarok bû jî, ji ber ku li ba karwanvanan xebitîbû, ji Şoşanê zêdetir cih dizanîbûn û jê zêdetir jiyan nas dikir.

Şoşan jî xwedî armancekê bû û vê jî hisên wê xurt kiribûn. Hisekî wisa xurt pê re çêbibû digot Xorrem li Reyê ye.

Li Reyê hem şopên Xorremê hem jî dijminahî li benda wê bû. Hê nediyar bû wê çi were serê wê.

## BEŞA PÊNCEMÎN: DERIYÊ SIRAN

### Zanatiya Sirên Jinê

Li mala di nav hembêza çiyayên Med de li cem Mazdek nîqaş dikirin, ew hatin bîrê. Piştî ew veqetiyabû jî her kesên li nahiyeyê kom bi kom li dora sohbetên xwe civandibûn. Dûvre li gundan komên biçûk ên keçan çêkiribû û bi perwerdeya wan re mijûl bibû. Civat ji bo wê zewqa herî mezin bû, perwerdeya herî mezin bû.

Di dema qetlîamê de li wê nahiyeya dişibiya gundê çiyê ti malên nehatibûn şewitandin û hilweşandin nemabû. Ya mirov dabûn ber şûran yan jî avêtibûn zindanan, yên mayî di sirgûnan de tevlî nav windayan bibûn. Dema ku Xorrem bi vê hesiyabû, bi qasî kuştina Mazdek hizna wê teze bibû. Ruxmî vê jî heke ji ew ên perwerdekirî yek kes jî sax bûna, digot ji bo hejandina textê hikumdarên zalim bes bû.

Şervantiya bêperwerde dişiband şûrê bê kalan; her kêlî dikarîbû xwediyê xwe birîndar bikirana!

Niha jî wê perwerde bidana zarokên egîdan. Digel vê, wê ji bo wê bibûna destpêkirineke nû.

Ciwan li meydana gund kom bûn. Wê rojê bi wan re axivî, yek bi yek nas kir, guhdar kir.

Tenê xort hatibûn. Çû serdana Kevî. Jê xwest her kes were.

Roja din dayik û pitika xwe, şivan û berxikên xwe, mihên xwe hatibûn. Li her malê ji bo hespan axur hebûn, lê hevşiyên (Cihê sînckirî yê pez û dewaran) mih-bizinan hevpar bû. Şivantî jî bi dorê bû. Şivanê wê rojê, kêfa gund, Banîko bû.

Banîko bi safîtî û henekên xwe ve hevalê herî baş ê zarokan bû. Tenê qisûrek wî hebû, qet nediwêriya were cem jinan. Heger yek nêz bibûna, fedî dikir, sor dibû û direviya. Ji ber vê yekê jî di şivantiya wî de pez li dûrî gund digeriya. Wê rojê ew bi xwe jî hatibû.

Meydana gund tijî bibû.

Digot qey wê tenê ciwan werin. Nedipa hemû kom bibin. Ji bilî çend kal û pîran, her kes hatibû.

Tevî wê qelebalixiyê jî bêdengî hebû. Ji bilî çend çêçikên nesekinî yên ku li derdorê xwe hildiavêtin, heywan jî bêdeng disekinîn.

Heman tiştên ku ji ciwanan re bigotana, nikarîbû ji her kesî re bigota. Di vê sohbetê de gotinên ku wê ji bo keç û xortên ciwan bikirana, danî milekî.

Li beramberî gundiyên rûniştî şipya disekinî, gundiyan jî xwe dabûn benda gotinên wê. Hinekî li ser mijara qiseya xwe fikirî.

Ji hostayeke qiseyê zêdetir, hostayeke guhdarkirinê bû. Dema guhdarî dikir, sebreke bêdawî raber dikir, dema dipeyivî jî hewayeke rêzdar, germ, ji dil û dida guhdarkirin ava dikir. Li gel wê axaftin û nêzîkatiyeke besît çênedibû, pir zehmet bû. Ev taybetmendî dikarîbû bi cidîbûna kal û pîrên qebîleyê bihatana qiyaskirin, lê li cem Xorrem cidîbûneke mezintir hebû. Kal û pîrên bêdeng temaşeyî Xorrem dikirin, di nav xwe de behsa vê kiribûn. Ew xwedî enerjiyeke kêşîner, çêker û veguherîner bû ku tenê li ba jineke azad dihate dîtin. Ti kesên ku bikarîbûna mîna wê enerjiya xwe ya jiyanê xurt biteyisandana tine bû.

Ji dema Dayika Kewyar û wir ve ti kesên ku bikaribin bi mêzekirinên xwe jî mirovan demildest bandor bike, nedîtibûn. Tevî çavên xemgîn ên ku êşên mezin diteyisandin, enerjiya wê ya jiyanê ewqasî diyar bû ku heçkû ne mirova vê dinyayê bû.

Mîna eynikekê bû ku her kesî xwe tê de didît. Di demeke kurt de bibû ziman û sembola hesretên wan. His kiribûn ku bersiva pirsên jê re bersiv nedîtine jî li ba wê ne.

Sekna wê ya xwebawer her kes dihejand. Niha jî bi meraq li bendê bûn, wê çi bigotana.

Yek bi yek li her kesî nêrî. Çavên xwe li Kevî gerandin. Nedît. Çavê wê ket çavê kê, pê re keniyan. Piştî çend deqeyên wisa bêdeng, got:

-Jin, keçên mezin-biçûk hemû bila werin herî pêş.

Keçek hema rabû û hat li pêşiyê rûnişt. Ew keça şervanekî mezin bû, navê wê Şîrîn bû. Dema ew çû pêş, yên din jî bi keyf û şadî diaxivîn, ketin tevgerê û cihê zilamên li pêş rûniştine ji wan girtin. Ji bilî çend kurikên nehs, hemû zilam li piştê man.

Piştî derbasî nîzama nû ya rûniştinê bûn, dîsa bêdengî çêbû. Her kes li bendê bû Xorrem bipeyive, lê wê şivan Banîko da axaftin.

Rewşa heywanan pirsî. Banîko heta berxikên ku nav li wan kirine, behsa her yekê kir. Dûvre dayikekê giliyê hin zilaman kir ku orta nîvro diketin nav bîstan. Apekî kal, bîranîneke xwe got, ragihand ku mîna îro li hev kom bibûn û biryareke şerê mezin girtibûn. Heyecan da ciwanan.

Xorremê ortameke pir germ û samîmî ava kir, guhdarî her kesî kir. Her kesî jî li hev guhdar kir. Dema ku hemû axaftin qediyan, Xorrem ji bo rêzdariya xwe nîşan bide, ji bo bîranîna hemû şervanên Kewyar û Kewyaran bi kurtî axivî. Dûvre got:

-Civaka me civaka wekheviyê ye. Jin-zilam wekhev in. Hûn jî civakeke bi vê bawer in, lê jiyana we bi rastî jî wisa ye? Wexta wê hat, em ê dîsa kom bibin. Her yek ji we bila xwe amade bike, hûn ê çavdêriyên xwe bibêjin! Baş çavdêrî bikin, baş bifikirin, dema em kom bûn, em çavdêriyên xwe bidarizînin.

Bi her gotineke xwe dilê jinan rehet dikir. Zilam ji niha ve ketibûn nav fikrên kûr. Ji wê rojê û şûn de êdî wê li beramberî jinan baldartir bibûna, nêzîkatiyên xwe li ber çav bigirtana.

Navê jineke ku jin-mêr xîtabî her kesî dike bihîstibûn, lê pir kêm kesî ew dîtibûn. Ew jin Kewyar bû. Niha mîna ku ruhê wê li beramberî wan zindî bû.

Di hênikahiya şevê de Kevî çû cem Banîko. Kerî kom kiribû, karên wê rojê qedandibû.

Banîko girt ba xwe, çûn li ser zinarekî mezin rûniştin. Hewa hênik bû, hê stêrk derneketibûn, lê çirçirkan deng derdixistin. Demekê li çiya mêze kirin, bêdeng li ba hev rûniştin.

-Tu çi dibêjî Biko, tu dibêjî wê Xorrem karibe valatiya ji Dayika Kewyar mayî tijî bike?

-Tu nizanibî ma kî dizanî xalê Kevî.

-Tu çi dibêjî, tu wê bêje min, hatina wê baş bûye yan na, ez vê dipirsim.

-Ma çend roj in hatiye? Ji niha ve gundê me guhert. Di dilê me de agirekî nû pêxist. Ez dibêjim hatina wê baş bû.

-Biko, ciwanên me ne wekî demên berê ne. Dixwazin şer bikin, lê ji şer wêdetir jî nafikirin. Dayika me destpêkê jiyan fêrî me dikir. Ji bo ciwanên me beriya şer ka jiyana rast çi ye, digot. Hurmeta ji bo jinan mezin bû. Yên nizanîbana xweşik bipeyive, xweşik rabe û rûnê

şervan nedihesiband. Te fêm kir Biko? Li gorî te niha çima wisa bûye?

-Min fêm kir xalê Kevî. Em wekî we li çiyayên welatê xwe nemane. Em li welatên din pir geriyan. Nizanim, dibe ku ji ber vê yekê be.

-Ax Biko, te birîna min vekir. Tu her bijî. Rojekê em ê li çiyayên xwe vegerin.

Şivan bêdeng ket nav xeyalan. Heta ku stêrk zêde bûn, ji zinar daneketin.

Xorrem, roja din, bi qîrewîra zilamekî şiyar bû. Zûka derket ber derî. Perwerdeya şervanan dest pê kiribû.

Xort li meydanê kom bibûn, bi fermana perwerdekarê xwe hereketên nefes û laş dikirin. Li ser kursiya ber derî rûnişt û mêzeyî wan kir.

Yek ji nav wan dikira biketana xwarê. Xwe da goşeyekê û demekê rûnişt. Dûvre rabû û çû ba darekê.

Destê xwe ji zendê ba da û spart darekê, bi hêza xwe hemûyî dehf da û bi qasî deqeyekê sekinî û dûvre destê xwe ji kêlekê berda jêrê. Dûvre milê xwe paralelî erdê rakir.

Dema ku navber danê, Xorrem çû ba wan. Ji wî ciwanê ku destê xwe spartibû darê sebeb û wateya vê hereketa wî pirsî.

Tu nabêjî ji vê re dibêjin "rehjen" yanî tansiyona xwe pîvaye.

Bi saya demarê ku ji zendê hatibû tengavkirin, wextê destê xwe berdidin kêlekê, ji ber xwe radibû. Ev hereketa ku ji ber xwe dibû jê re pir balkêş hatibû.

Ti carî nedihat bîrê zexta xwînê ewqasî xurt be. Heman tiştî ji bo civakê jî fikirî. Kêliyekê di serê wê re derbas bû, dûvre jê pirsî bi vê rewşa mil tansiyon çawa tê fêmkirin.

"Dema mil radibe jorê, heger paralelî erdê tam li ortê, li texma dil bisekine, zexta xwînê normal e, li jêr bisekine kêm e, derkeve jorê jî bilind tê hesibandin!"

Xwest bi xwe jî biceribîne. Ji zendê destê xwe ba da û pişta destê xwe spart darê. Bêyî laşê xwe pê bike, lê ji milê xwe jî destek girt û şidand. Lê wextê wê tijî bû û berda kêlekê, lê tiştek nebû!

Şaş pêk anîbû. Ne ji demarê digihêje milê wê, çibû ji hestî şidandibû û wisa jî tiştê xwestibû pêk nehatibû.

Dema careke din ceriband, vê carê milê wê ji ber xwe rabû û bi hewa ket. Hat texma dilê wê, derbas kir, milê wê jî derbas kir û enceq

sekinî. Vê rewşê nîşan dida ku zexta wê ya xwînê bilind e. Bi dehan dostên wê yên hekîm hebûn, lê ji yekî rêbazeke wisa nebihîstibû.

Hema di cih de sîr gihandinê. Wê karîbûya wisa tansiyonê xwe hevseng bikirana.

Piştî navberê ciwan ji gund veqetiyan. Li cihekî din wê perwerde bidomandana.

Destan dît û sebeba vê jê pirsî.

-Ya serê sibê tenê îdman e. Perwerdeya eskerî di şertên herî zor de û veşartî ye.

-Ji kê veşartî?

-Ne ji ti kesî, ji bo fêrbûna veşartîbûnê, veşartî tê kirin. Ango ji cihê gund veşartî pêk tê. Tenê perwerdeya zarokan di nava gunde de vekirî ye. Ji bo hemû zarokan perwerdeya parastinê heye, lê perwerdeya şervanên ciwan di nava veşartîbûnekê de ye.

Veşartîbûn!

Xorremê dersa xwe ya îro girtibû.

Heger dayika hemû Xwedawendan bixwestana, wê hemû sir ji bo her kesî eşkere bikirana. Heke nekiriye, naxwe her tiştek dem û cihekî xwe heye.

Ji bo guhertinê dem pêwîst bû.

Hat bîrê, berê pir bi rengê zer girêdayî bû. Bi demê re hin darazên wê guherîn, lê hin ji wan jî her tim wekî xwe man.

Heger civak wê têkildarî sîstema nû ya baweriyê û nirxên nû ronî bibûna, ev hinekî girêdayî pratîzebûna van jî bû.

Civaka li gund ji bo wê modelek bû. Li vir her kesî ew destek dikir, tenê komeke ji dostan bû, lê gelek şaşiyên wan jî dîtibû.

Destpêkê jiyana vê koma şerker a ku heyranê wan bû, baş çavdêrî kiribû; bi qasî mirov bibe heyran egîd bûn, lê bi qasî wê jî taybetmendiyên paşverû li gel wan hebûn. Lê jinên wan hinekî din cuda xuya dikirin.

Sirê di perwerdeya eskerî de nizanîbû, lê sira civakê di dest jinan de bû. Bi vê bawer dikir.

Jin ji bilî karên rojane yên gund, her tim ben dirêstin, bi rengê xakê boyax dikirin, caw dihûnandin û ev pev dixistin.

Keçên ciwan jî ji darên zirav û dirêj û ji qamûşan hesîrên bi çaviyên vêl, berfireh çêdikirin û ev pev dixistin.

Kal û pîrên wan jî kindir dihûnandin.

Li vî gundî pir hez dikirin ben birêsin, rûber, hesîran çêbikin, lê wer xuya dikir ku bi van jî ti tiştek nedikirin, tenê wextê xwe pê derbas dikirin.

Xorremê gote wan wextê xwe bi karên sûdmendtir derbas bikin. Dîsa jî wan di nava veşartîbûneke Kewyaran de negotin wê çi bikin ji van tiştan û karê xwe yê heyî domandin.

Rewşa wê ji bo karibe hemû sirên gund fêm bike, guncav bû. Texmîn kiribû ku ev sir li ser bingehê amadekariyeke eskerî tê pêşxistin. Çanda cengê ya eşîrên berê, di nava Kewyaran de di nava siran de dewam dikir.

**Tavge!**

**Tu duaya li ser qilîçê yî**
**Tu ba yî, keviran digihîne hevdu**
**Çima te xwe di nav ava xwe de veşartiye?**

Her êvar dihatin ba hev, sohbet dikirin. Xorrem jî tevlî kevneşopiya sohbeta jinan bibû û bi saya vê wekî çawa ew ji nêz ve nas kiribûn, ji bo karibe kêmasiyan jî hel bike, mijûl bibû.

Ketibû pey fikrekî ku dinyayê biguherîne. Bi vî fikrî jiyaneke çawa dikarîbû bihatana afirandin, dixwest bi awayekî şênber nîşan bidana. Jiyana xeyalên xwe bi hîkayeyên cur bi cur ji jinan re digot. Çend jinên ku xwedî asoyên fireh nas kiribû. Didît ku piraniya wan di nava beza rojane de dihelin û diçin. Ji wan xwest ku xeyalan bikin û van xeyalên xwe parve bikin, vebêjin.

Di şevbêrkekê de jina herî yeman, ji çavên wê agir dibariya û ket odeyê. Bi destê kurikê xwe yê 6-7 salî girtibû.

Zarok giriyabû, pozî wî herikîbû, çavên wî sor bibûn, lê tenê serê xwe xistibû ber xwe û bi navber pozê xwe dikşand.

-Te xwîna pozê wî dît! Heger tu yê kurê xwe terbiye neke, ez dizanim ez ê çi bikim!

Û bi ser jinê de meşiya.

Çawa bi porê wê girt, Xorrem ket navberê. Herdu jî rabibûn ser piyan û pevdiçînin. Xorremê heta bi hişyariyan ew aram kirin, xeberên qet nebihîstibûn bihîstin.

Xeberên wisa hebûn hem pir eyb bûn hem jî pêkenok bûn. Ji bo nekene xwe bi zorê digirt. Her yekê xwe xistibû şûna kur, bira, mêrê xwe û wisa xeber dabûn!

Pevçûn sekinî, lê wê şevê zû belav bûn. Roja din herdu jî bi hev re hatin ji Xorremê lêborîn xwestin. Piştî çend rojan careke din şerê zarokan kirin. Xorrem vê carê ji ber wan xeberên afirîner têra xwe keniya.

Wê bi perwerdeya ciwanan mijûl bibûya, lê keç tevlî sohbetan nedibûn yan jî pir kêm tevlî dibûn. Ji ber vê hizûra wê ne li cih bû.

Ne ku wê dersa heyatê bidana wan. Van mirovan şert û mercên herî zor dîtibûn. Di nava komeke efsane de bû, hewl dida kêliyekê be

jî vê ji bîr neke. Lê belê, carina paşverûtî bi şeklên wisa çors li rûyê wê diketin ku dihat asta xeniqandinê.

Tevî hemû hewldanên wê jî, di mijara eleqe, têgihiştin, bendewarî û ecibandinên jin û keçên ciwan de pêşketin çênedibû.

Pir zêde bi karên malê, karên hevpar ên gund hatibûn girêdan. Mijara axaftinên wan pir zêde têkildarî xwarinan bû. Pir hez dikirin têkildarî zilaman bipeyivin. Çendekên perwerdeya şervanan dîtibûn jî di nav wan de hebûn, li dora Xorremê digeriyan, lê piraniya gotinên wê nediket serê wan.

Zilaman jî di sohbetan de guhdarî Xorremê dikirin, lê zêdetir pûte bi şervantiyê didan.

Ji bo wan îrade û dîsîplîna cewherî her tişt bû. Bi saya vê fêrî baldariyê bibûn.

Ji ber ku her tim hereketên xwe dubare dikirin, lez jî bûn. Ne ji bo mirinê, ji bo jiyanê perwerdeya şervantiyê didîtin. Heger yekî bigotana “ji bo mirinê ew amade ye”, ev hem eyb bû hem jî ne li gorî felsefeya wan a jiyanê bû.

Ji ber ku tirsa wan a mirinê tine bû, çûna ser mirinê nedibû hinceteke mezinahiyê. Tenê bi tiştekî dikarîbûn serbilind bibûna, ew jî întiqam bû. Ya esas jiyan bû û ev jî tenê ji bo tolhildanê bû.

“Jiyana ji bo întiqamê!” Xorremê her behsa nebesiya vê rewşê kir û heta astekê pêş ketibû jî. Tevî vê jî yên kevn bi fikare bûn; heke hestên wan ên tolhildanê zeîf bibûna, digotin wê şervanên xurt ji wan dernekevin.

Xorrem digot bêyî ruhên xwe yên şerker winda bikin, lazim bû berê xwe bidana armancên watedartir. Jin germtir nêzî vî fikrî dibûn û bi wateyên nû asoyên xwe firehtir dikirin.

Jinên şerker di jiyanê de bi îradetir û pîvantir bûn. Yên din pirsgirêkên biçûk jî pir mezin dikirin, karekî di dest xwe de wekî dawiya dinyayê ye digirtin dest û wisa nêz dibûn. Lê nedizanîn karên girîngtir danîne milekî. Yên şerker li gorî yên din girtî bûn. Sebeba vê fêm nedikir.

Xorrem pir hez dikir li dora gund bigere. Her guhertinên xwezayê ecêbmayî dişopand. Li ber siya daran radiza, li gel her nebatê, her kulîlkê, teyr û xezalan dipeyivî.

Rojekê li derveyî gund çibû gerê, li kêleka çem dît ku dara ziqûmê dirêj bûye. Dostên wê yên hekîm ev dar nas dikirin. Keçên ciwan li cem xwe bir wir.

-Çi bêhneke xweş jê tê ne wer? Em jê re Jale dibêjin. Ji bo xwisiya dikeve ser pelan jî heman nav tê bikaranîn. Bejna wê dikare 2-3 qatî bejna me bibe. Ji ber vê yekê bala min kişandibû. Kulîlkên wê çiqasî xweşik in! Lê yên ku peleke vê darê jî bixwin, wê bimirin. Jehrî ye.

Keçekê got berê jî bihîstibû ev dar jehrî ye.

-Baş e, hûn dizanin wextê di miqdareke guncav de were girtin, jehrek jî dikare hin nexweşiyên mirovî baş bike?

Keçan gotin hayê wan ji tiştekî wisa tine ye.

-Mirov jî heywan jî ji vê darê bixwin dimirin, heta heywanekî dar xwaribe û mirov ji goştê wî heywanî bixwe jî jehrî dibe, dibe ku bimire jî. Lê dema ku pir kêm tê xwarin, îdrarê zêde dike, ji bo gurçikan baş e, lezê dide dil, gera xwînê zêde dike. Dema pelên wê were eciqandin, li ser cihê mar gezkirî were danîn, bandora jehrê kêm dike.

Heke em bizanin em dikarin ji jehrê jî feydeyê bibînin, em nizanibin em ê ji hingiv jî zirarê bibînin. We nebihîstiye, yê ku demek dirêj hingiv nexwe, wextê zêde bixwe aciz dibe? Heta pir zêde bixwe pê dimirin?

Her tiştekî zêde bi zirar e! Hin ji we perwerdeya şervanan dibînin, lê hûn pir zêde zoriyê didin fîzîka xwe. Temam, qeyîmbûna we zêde dibe, lê dema wisa yekmilî dibe jî nermbûna zêhnê we namîne. Heta bêyî hûn bikevin ferqê hûn ji civakê jî dûr dikevin. Hûn xwe dikşînin nava xwe. Ji bo yên din, bi qasî ku dibînim ji gund wirdetir xeyal jî nakin. Hûn jî hişk bûne, cemidî ne. Hûn çawa dikarin jiyaneke wisa ji bo xwe qebûl bikin?

Piştî van gotinan, ji erdê darekî ziwa û hişk rahiştê da keçeke şerker Azînê. Bi xwe jî parçeyekî zirav, lê qayişokî girt. Jê xwest mîna şûr bi kar bîne û pê re şer bike. Piştî çend hereketan dara qalind û hişk şkest. Keçan qet bawer nekiribûn Xorrem karibe şûr bi kar bîne. Ruxmî ku wan bi dehan caran perwerde dîtibûn jî, Xorremê dara zirav ji wan pir leztir bi kar anîbû. Jê wirdetir, bedena wê wisa vezelokîbû şervana li beramber carekê jî wî darê ziwa lê nedabû.

Xorrem herî dawî ji wan re got, "bila aqlê we nerm be ku hûn karibin laşê xwe baş bi kar bînin."

Keç anîbûn wir, mebesta wê ne tenê dersdayîn bû. Xwestibû wan derxîne derveyî gund.

Ji wan re behsê kir, ka di zarokatiya xwe de der heqê şervanên Kewyarê de çi bihîstine. Çanda berxwedanê ya navê jinekê lê bû, çima niha bi zilaman re sînordar bibû?

Dema li çiya bûn, her kes şervan bû, lê di jiyana gund de ji bilî çend îstîsnayan wezîfeyên jinan cuda bibû.

Jinên şerker xwe kişandibûn nava xwe, gavek jî nediavêtin derveyî gund. Pirsî, çima hatine vî halî. Şîrîn, Azîn, Şîrvan û Şeyda bi şermokî li hev mêze kirin.

Bersiva vê nizanîbûn. Keça herî bedew û wêrek a gund Azîn, bêhnek kişand, tenê got ji mezinên xwe guhdarî demên berê kiriye, ew bi xwe heyranê wan deman e. Yên şervan jî tê de, keçên din tiştek negotin. Lê diyar bû, bandor bibûn. Diponijîn. Çima wisa bêdeng bibûn? Sirê wê çi bû? Li naverastê xerabiyeke ku were terîfkirin jî tine bû, lê çawa wisa li wan hatibû?

Dibe ku ji ber ne girêdayî armanceke mezintir bûn wisa li wan hatibû. Bi rastî jî armanceke wan a çawa hebû, têkildarî siberojê çi difikirîn?

Bêyî xeyalkirina siberojê, ne mimkun bû rabirdû ji cihê ku xwe veşartibû bihatana derxistin.

Bêguman, armanceke wan hebû. Wekî civak li derveyî seheya dewletê heta li derveyî civaka giştî civakbûneke wan hebû û armanceke vê jiyana wan hebû. Kevneşopiyeke didomandin. Bi hestên tolhildanê mezin dibûn û jiyana xwe didomandin.

Temam, lê wekî komeke biçûk wê heta kengî karîbûna ev rewş bidomandana?

Dema ev pirs kirin, di çavên keçan de mîna aveke zelal, îfadeyeke sekan dît.

Wê bi wan re ji nêz ve mijûl bibûya.

Jinên şervan tevlî hemû sohbetên xwe dikir. Bêdeng bûna jî eleqeya wan zêdetir bû. Dema ku didît mîna zilaman barên giran radikin, xwe bi wan re aciz dikir. Dîsa di demeke wisa de dît ku Şîrvan barekî ji bejna xwe jî mezintir rakiriye û Şeyda jî tevî emrê xwe yê mezin barekî mezin hilgirtiye, ew sekinandin û ji wan xwest barê xwe deynin. Şeydayê bersiv dayê:

-Xwişka Xorrem, tu nebêjî qey em ji van karan sil dibin. Mesele ne fîzîkî ye, wijdanî ye! Ez nekim wê ya din bike! Tenê hiştin, hemû bar li hinan kirin, ne rast e!

Xorremê nizanîbû çi bibêje. Qet wisa nefikirîbû. Piştî wê rojê êdî berfirehtir li meseleyên wisa mêze kir.

Li milê din, ferq nekiribû, ew barên wan ji bo amadekariya şer bû.

Di perwerdeya şervanan de cewherekî civakî hebû. Dikarîbû ji wir bi meseleyê bigirta û pêş bibira.

Lazim bû perwerdeya civakê jî têkildarî armancekê bûya. Çima şervan dihatin perwerdekirin û çima bi eleqeyeke wisa mezin nêz dibûn, ji bo perwerdeya civakê jî rêyeke hevşib lazim bû.

Her tim dayik û zilamên bi ezmûn bi perwerdekirina civakê mijûl bibûn. Destê dewletê gihiştibû kû derê, ev kevneşopî jî xera bibû. Her tişt mîna kopyaya dewletê, di dest bavan de hatibû hiştin.

Her ku Xorremê behsa têkiliya jinê û civakbûnê dikir, baweriya jinan zêdetir bi wan dihat.

Hemû şev aîdî wan bûn. Jinên zewicî jî beriya biçin cem mêrên xwe, wekî hemû jinan, dikarîbûn bi dilê xwe sohbet bikirana. Behsa bîranînên xweş-biêş dikirin. Ji hev re xewn û xeyalên xwe digotin. Yên ku gotegota mêrên xwe dikirin jî rengekî cuda didan sohbetê.

Lê yên wisa jî hebûn, her tim dixwestin dawiya wê bi şer biqedînin. Navê ya herî “har” “Tavge” bû. Navê mêzaya teyrên Qertel-Bazê bû Tavge. Êlegê hirî yê qehweyî jî ku her tim li xwe dikir, ev navlêkirin temam dikir. Karaktera wê jî mîna wateya navê wê bû. Tavge yeka cazîbedar bû, bejna wê zirav û dirêj bû, dema dimeşiya jî heyecana wê ewqasî diyar dibû ku cilên wê jî dihejiyan. Vî halê wê dişibandin şelaleyê. Ji ber ku dîmenekî her tim bi liv û tevger, herikbar dida, ji bo şelaleya ku heta wê rojê digotin “rêjgeh” êdî Tavge gotin.

Tavge, pevketinên zarokan dikir hincet û bela xwe di hemû jinan de dida û wan dikir du kom, dida şerkirin.

Carina tama vî karî nedihişt, lê jin lê baniyabûn, bêyî pevçûna wê dê tama jiyanê jî kêm bibûna. Ji ber vê yekê, dema aram dibû jî jinan bela xwe tê didan, ew aciz dikirin, dikişkişandin û dixistin nav pevçûnê. Dûvre jî ew şermezar dikirin. Di nava coşa rojan de ev pevçûn jî dihatin hesibandin.

Êdî wê rojê ji çi aciz bibû, ji şibakeya dawî agir berda kadînê.

Li gund cara yekem şewat çênedibû, lê ji ber ku wê agir bi lez li kadînê belav bibûna, encamên xerab jî wê bi xwe re bianiyana.

Ji nişkê ve mal di nav agir de ma. Gihişt heta axura qatê jêrê.

Xwediyê malê Xelîl, hevjîna wî û 6 zarokên wan bi hev re derketibûn, hinekî ji dûr li mala xwe ya dişewitî dinêrîn. Pir wext di ser re neçû, gundî jî li dora wan kom bûn. Ji ber ku agir zêde geş bibû, nikarîbûn mudaxele jî bikin.

Ji hundir şeyîna hespê, dengê oreorê hatin. Dema ku şeyîna hespê bi awayekî bi êş dirêj kir, Xelîl nema xwe ragirt, ket nav agir. Dûvre keça wî ya mezin Şîrîn jî wê biketana hundir, lê dayika wê wisa hembêz kir, hema hema bênefes ket erdê. Tam Xelîl dikira hespa xwe derxistina derve, xanî bi ser de hat. Nikarîbû derketana…

Qîrewîrên jin û zarokên wî jî li ser dengê sawdar ê hilweşandina xanî zêde bûn.

Xelîl, egîdekî şerker bû, çiyayên Med dîtibûn. Ji ber vê mirina Xelîl, demek dirêj li gund hewayeke şînê çêbû.

Jin hatin sûcdarkirin. Zilaman li hemberî hemû jinan helwest girtin. Dema ku hin pîran jî di vê mijarê de destek dan zilaman, di carekê de jin bûn gunehkarên gund.

Xorrem li derveyî vê dihiştin, rêzdar nêz dibûn, lê êdî li wê jî guhdarî nedikirin.

Xorrem destpêkê mîna di navbera du artêşan de mayî his kir. Dema ku mesela helwestan dirêj kir, xwe jî di naf refên jinan de dît.

Yekî mîna Xelîl pêşengekî civakî û fermandarekî şer miribû. Êşa wê ne hêsan bû. Pêdivî bi demê, aqlê selîm hebû.

Kevî, mirovekî bi tecrûbe bû. Xorremê hewl da pê re biaxive, lê Kevî di hurmetê de ti qisûr nekir, jê re got di vê rewşê de gundiyan heta demekê di halê wan de bihêle.

Di mijara zeman de fikrên Xorrem jî ne cuda bûn. Lê niyeta wê tine bû, gundiyan di nav halê wan de bihêle.

Li ba Destan û Hoşeng axivî. Herduyan jî li devê Kevî dinêrîn.

Wekî demên destpêkê kirî, xwest dîsa gundî hemû li meydanê kom bibin.

Jinên Kewyar bi gûrûr bûn. Li gel zilamên ku li hemberî wan helwest nîşan didan, li malê jî nedipeyivîn. Yên wan jî helwesteke dijber bû. Jê re helwesta bêdengiyê digotin…

Li cem Kevî, Destan û Hoşeng çûn meydanê. Hemû zilamên ew dîtin, komî ser hev bûn.

Jinên ku Xorrem dîtin jî ketin pey wê. Ji bilî Tavge û çend kesên kal her kes hatibû.

Rengên ku mizgîniya payizê didan, hemû dar pêçabûn. Li pelên zerbûyî mêze kir.

Got, “emir derbas dibe” û li jinên ciwan mêze kir.

“Nebêjin em ê her tim di vî emrî de bimînin. Bêyî hûn bikevin ferqê wê were, wisa li deriyê we naxe û di carekê de nayê. Jiyan e!

Pelên payizê jî di carekê de nakevin. Hêdî hêdî zer dibin, di her merheleyekê de cuda xweşik dibin û herî dawî mîna teyrên ji hêlîna xwe diçin, ji dara xwe vediqetin û qedera xwe ji ba re dihêlin.”

Qelebalixê bêdeng guhdar dikir. Dest bi axaftinê kiribû. Lê dîsa armanca wê ya esasî ew dana axaftin bû.

“Tu çi dibêjî xalê Kevî, ti kes ji me wekî te jiyanê nas nake, em ê mîna pelan xwe ji însafa ba re berdin?”

Kevî li pelên darê nêrî, got:

“Dema zarok bûm, min jinek nas kir. Digot, ‘mirovê îradeya wî tine be, exlaqê wî jî tine ye.’ Bi îradebûn û exlaqbûn yek tişt dihesiband; ev fêrî me kiribû.

Ew jin dayika me hemûyan bû. Rêzika yekemîn ya vê civakê û rêzika naguhere, wextê em zarok bûn, wê fêrî me kiribû. Hê bavê me sax bû, li dijî dewletê şerê me dest pê nekiribû!

Em ji dayikeke wisa hatine. Niha em ji zimanê te heman wateyê dibihîzin. Ev me rûmetyar dike.”

Xorremê dewam kir:

“Dema ku ez li ba Destan û Hoşeng ketim ser rê, min digot tenê em ê werin cihekî ewle. Hûn xeyalê zarokatiya min bûn. Ez bi efsaneya vê civatê mezin bûm, ji hebûna we hayê min tine bû. Ez hatim nav Kewyaran. We sirê xwe ji min re got. We ez rûmetyar kirim!

Ez gelekî ponijîm, min digot li ser rûyê erdê komeke wisa maye gelo. Helbet li gundan bi şeklê kozê mane. Helbet bi hesreta firtoneyekê ye, dibêje bila were û vê xweliyê ji ser min rake. Dibe ku li benda şervanên mîna we efsanewî bin.

Heta dawiya emrê xwe, dikarim li ba efsaneyên sax bimînim. Ez ê rûmetyar bibim!”

Di vê derê de li hemû gundiyan mêze kir, got dema wê hatiye û niyeta xwe kifş kir:

“Lê belê, min li vir tiştekî din jî dît. Gotina vê ne rehet e. Gotina min ne ji bo Kewyaran e, wê çîleyên mezin dîtine û qesrên zilmê

hejandine. Min li vî gundî, li vir, di navbera we de, di armancê de zeîfbûn dîtiye.

Hûn şervanan digihînin. Çima? Hûn perwerdeyên xwe yên eskerî ji gundê xwe jî veşartî dikin û diyar e tijî zorî ye, lê çima? Armanca ewqas xwêdanê çi ye?

Heger armanc tenê xwe li vî gundî parastin be, ji deverên din ên cîhanê heta vir teyrek jî nayê; di ser de jî ji bo ku hûn karibin dostên xwe biparêzin, hûn diçin her derê. Mesele ev e yanî? Hemû eziyet ji bo vê ye?

Heger armanc mezin bûna, em ê jî her tim li gorî wê bijiyana. Li gorî wê helwest nîşan bidana. Li gorî wê bihatana ba hev.

Heke armanc mezin bûna, dema ku ew bûyera bi êş hat serê me, em ê wekî niha bihatana cem hev û me yê hewl bidana xwe bigihandana encamekê.

Lê me her tişt di halê wê de hişt û em negihiştin encamekê. Niha em li cem hev in.

Lazim e em karibin bi hêza aqlê darazê, dilê fêmkirinê û îradeya civakî bigihêjin encamekê."

Ji Kevî zêdetir ti kesên ku wate û hêza van gotinan bizaniya tine bû. Piştî dayika xwe, ev gotin ji devê ti kesî nebihîstibû. Bi saya van gotinan, di serê Kevî de xeyal û bîranînên berê zindî bûn. Tenê bi heyranî li Xorremê mêze kir. Bi meraq xwe da benda îradeya gundiyan.

Dîsa jî gotinên Kevî li dilê hemû gundiyan dabû. Hin kal û pîran bêdeng rondik dibarandin.

Dema ku Xorremê mafê axaftinê da gundiyan, çavên wê çûn ser Destan û Hoşeng. Mîna ku ji wan destek dixwest.

Jixwe Hoşeng li ser piyan bû. Beriya dest bi axaftinê bike, Xelîl bi bîr anî, behsa mamostetiya wî kir, ji ber bûyerê xemgîniya xwe anî ziman.

"Ez li ber mezinên xwe dipeyivim, wan fêrî me kirine, li cihekî biyanî mîna avê bêdeng bin, li Kewyaranê jî bêdeng nebin.

Ruxmî ku di navbera me de neyarî tine bû jî malek hat şewitandin. Ev îşareta dijminahiyekê bû. Neyartiyeke veşartî!

Zarokên wê malê bêbav man. Tavge bû sebeba vê, helbet ne dîn e. Ruhên tarî çawa ketin wî aqlî, wî dilî? Ev hemû ruxmî hebûna me wisa bûn?

Naxwe ruhê me yê jiyana hevpar tam çênebûye? Ruhê jiyana hevpar, ruhê yekîtiyê ne li gorî hêzdarê me tê pîvan, lê li gorî zeîfê me tê pîvandin. Em ji mezina xwe Xorrem wisa fêr bûn. Me di wextê de lawaziya xwe nedît. Em hemû sûcdar in!

Mamekî kal mîna ku enerjiya xwe ya dawî xerc dikir ket navberê û lez axivî:

"Ma berê wisa bû? Qebeheta kê hebûna cezayê xwe jî dikşand! Wextê em li çiyayên welatê xwe bûn, armanca me mezintir bû, rast e. Lê tiştên em li vir dikin, jiyana me ya vir jî ne eziyet e. Ev heyata me ye."

Yekî din jî got:

"Em li vir vala dipeyivin, em nikarin yê çûyî vegerînin, ew enceq bi ronahiya Xwedê di nava însanekî din de bijî. Ji bo ku careke din bûyereke wisa nebe, lazim e her kes hişê xwe bixe serê xwe, bila jin têkilî her tiştî nebin, bes e!"

Xorremê xwe li vê gotinê ranegirt:

"Sûcdarkirina jinê hêsan e! Şaşiya jinekê nabe şaşiya hemû jinan. Sûcekî mirovî hemû emrê wê nake sûcdar û nabe sebeb heta dawiya emrê xwe sûcdar bimîne.

Darizandin, ji bo dadweriyê ye. Ne tenê jinan, eger em ê hemû civakê berpirs bibînin, wê çaxê lazim e em bipirsin, miroveke bûye sebeba bûyereke wisa çawa ji nav me derdikeve?"

Xorremê tam nizanîbû axaftin bi kû ve diçin, lê axivîn. Herî dawî jin wekî berê nehatin sûcdarkirin. Kevî dixwest ev nîqaş dirêj nekin. Dixwest heyetek kom bibe û demildest biryarekê bide. Lê vê carê Xorremê ji bo ecele neke ew hişyar kir. Wî jî gundar kir.

Her tişt dihat axaftin, lê tenê tiştek hatibû jibîrkirin.

Ji bilî Xorremê ti kesî rewşa Tavge nepirsîbû. Hişyarî dabû jinan jî, gotibû "em bi tenê nehêlin, pê re eleqedar bibin."

Piştî bûyerê Tavge bi ser xwe ve nehatibû, nexwar-venexwar, neket nav gundiyan, carekê jî li derve nehat dîtin. Bi zarokên xwe re mijûl nebû.

Sibeyekê, ji gund dûr, wextê li ber kendal dimeşiya hatiye dîtin. Tenê ev bû.

Cenazeya wê neanîn gund.

Gotin, "ruhê wê li binê kendal ma!" Piştî wê rojê her şev ji bin kendal dengekî qîrîniyê hat. Hinekan digotin ba wisa dike, lê piraniya wan bawer dikirin ku ev qîrîniya Tavge ye.

Ne ji ber tirsa mezinan bûna, wê ciwan biçûna ew bianiyana. Ji ber ku digotin:

"Ruhê Tavge diqîre, alîkariyê dixwaze!"

Ji ew kesên digotin ba ye, bawer nedikirin. Lê nedixwestin li dijî daban tevbigerin, zirarê bidin civakbûna xwe.

Helwesta wan ji baweriya Zerdeşt dihat. Yên berê ev baştir dizanîn. Her wiha, nirxên xasî qebîleyê jî li ser vê zêde bibûn.

Xwekujî, di nava Kewyaran de tiştê herî xerab bû. Li hemûyan, bi taybet jî li ew ên di şer de mirine, heqaret bû. Xwekuştin dihat maneya cezakirina wan. Wan jî cezayê herî mezin didan ev kesên xwe kuştî: Jibîrkirin!

Birayê Kevî yê ku îxanet kiribû, dema xwe kuştibû, rewş cuda bû. Jixwe ew ji qebîleyê qut bibû, îxanet li birayê xwe kiribû. Lê Tavge di nava qebîleyê de ev kiribû. Xwedî lê derneketin. Nîqaş jî nekirin…

Xorrem ji vê meseleya întixarê pir bandor bû. Ji meseleya şewatê jî zêdetir bandor bibû. Bi rojan neaxivî. Di nav gundekî wisa de du mirin li ser hev hatibûn. Ji bo gundiyan jî ne rehet bû.

Perwerdeya şervanan hat qedandin. Dîsa hewaya şînê ket ser gund.

Xwe berdan nav destên zeman.

Gundiyan piştî demekê xwe komî ser hev kirin û heta bêriya sohbetên Xorremê jî kiribûn.

Xorrem nediştexilî. Çibû warê bêdengiyê. Lê wate nedidanê. Nizanîbûn ev bêdengî rêbazê wê yê xweperwerdekirinê ye.

Vê carê dirêj kiribû. Dema dîsa dest bi axaftinê kiribû jî ti kes li beramberî wê tine bû. Li pelên ji daran diket dinêrî û du gotin kirin:

-Wext hatiye!

Li gundê Kewyaran ewle bû. Lê ji bo ku xwe bigihanda civakê rêyeke derketinê jê re lazim bû. Heke di nava civakê de têkildarî berxwedanê tiştekî nebîne, dikarîbû rê li ber şkestineke xeyalan a ku wê bandorê li sedan salan bikira vekira. Her ku li ser vê diponijî xew nedihatê, dilê wê teng dibû.

Dê ji wir veqetiyana. Zemanê ku herî zêde çûyîn dispartê hatibû. Çi dibû bila bibûya, diviyabû biketana nava civakê, xwe nîşanî mirovan bidana. Nikarîbû bi şeklekî din hêvî zindî bihiştana.

Hêvî ji bo wê hinceteke jiyanê bû. Hêviya ku civak li dijî zilmê bisekine, hêviya raberkirina îradeyê, hêviya rizgariyê!

Întiqama herî mezin a li dijî qetlîamê, zindîhiştina hêviyê bû! Heger hêvî bimirana, her tişt dimir, heta hêvî hebûna, wê bayê ku agirê ruhê azadiyê geş bike jî her tim hebûya.

Destpêkê fikrên xwe ji jinan re got, lê Destan jî bi vê hisiya.

Xorrem wê xwedî li gotina xwe derketana, ev dizanîbû. Dema ku ew biçûna, wî yê çi bikira? Cara yekem di dilê xwe de got:

“Ez dibêjim qey dilê min ketiyê! Ez ê çi bikim?”

**Efendiyê Siran!**

**“Ya her kesî ye û ne ya ti kesî ye!”**
**(Ji bo baweriya kevn a Kurdan dihat gotin)**

Êşeke ji êşa zarokan mezintir tine bû. Dibe ku li şûna kurekî hatiye kuştin bi hezaran bihatana mezinkirin enceq teselî bihatana!

Qade ji bo xemrevîniyê li deveran negeriya. Ne li pey dilmîniyê bû. Tu bêjî întiqam; helbet ew agirê ku di dilê wî de tovên hêrsê çandibûn netefiyabû.

Heger armanceke wî ya mezintir tine bûna, tevî temenê xwe yê mezin jî ma dikarîbû dûr-nêz li ewqas deverê bigeriyana?

Ma ne ew bi xwe bû piştî qetlîamê keça xwe Xorrem heta Reyê şand, ji wir berê wê da Elbrûzên ku “Textê Xwedayan”, “Cihê Dilşadan”, “Çiyayê Zimanan”?

Dîsa ma ne sirên mezin ên Qade bûn keça wî gihandibû heta zarokên herî asî yê Elbrûzan, Demawendê, ango cem Kewyaranên li Xwediyên Dil?

Qade, dikarîbû wekî “Efendiyê Siran” bihatana hesibandin. Dema ku wê Xorrem ji gund derketana, wê têkildarî bavê xwe jî rastiyên nû bidîtana.

Xorrem û du hevrêyên wê hatibûn; dema veqetiyan jî ji bo ku balê nekşînin tenê hejmarek li xwe zêde kiribûn.

Şîrîn, ya ku di egîdiyê de ji xortên şerker ên gund paşde nedima, dildar hatibû. Dersên ewil ên şervaniyê ji bavê xwe girtibûn. Mazdek pêxember dihesiband. Baweriya xwe bi Xorrem jî anîbû.

Dixwest li ba Xorrem be, lê heta niha ti jin ji wî gundî bi vî şeklî neçibûn. Ev ê bibûya yekemîn. Tenê erêkirina Kevî bes bû.

Kevî:

-Kewyaran her tim bûye xwedî îradeyeke hevpar. Lê jina Kewyaran dikare bi îradeya xwe biryarê bide. Em vê ji te fêr bûn!

Keyfa Xorrem hem ji helwesta Kevî re hem jî ji biryara Şîrîn re hatibû.

Dema ku ji qebîleya tijî sir vediqetiya, Kevî sirekî din jê re got:

"Yê ku ez anîm vir, bavê te Qade bû. Qade nebûya, Kewyaran nikarîbû li vî gundî kom bibûna. Tu diçe kû derê biçe, wê li her bajarekî dostekî te hebe! Em li cem te ne!"

Xorrem dizanîbû sirên bavê wê hene. Kewyaran mezintirîn sir bû. Sir û Qade! Herdu qet ji hev cuda nedibûn! Dîsa jî ji ber ku jê re negotibû hevdu nas dikin, wate nedayê.

Rêwîtiya wê ya nû jî tijî sir û nediyarî bûn.

Yan wê biçûna çiyayên Med yan jî rêya tersê wê Xorasanê.

Kurdên ku diviyabû ji çiyayên Med daketana, ji ber ku ji qesrên zilmê dûr bû, çibûn Xorasanê û baweriya Mazdek pejirandibûn. Koçberî, ji ber mijara ewlehiyê, ber bi Xorasanê ve çêdibû. Niha xwegihandina çiyayên Med jî pir zor bû.

Berê xwe dan Xorasanê, hespên xwe meşandin.

Xorrem dixwest seriyekî li dostên xwe yên li Reyê bide û wisa derbasî Xorasanê bibe, lê vê carê Destan di mijara ewlehiyê de tawîz neda, heta negihiştana dostên xwe wê neçûna ti bajarî.

## Cihê Roj Lê Hiltê: Xorasan!

Beriya baran li wan bike xwe gihandin gundên ewil. Ev xak aîdî eşîra Kurd a Lawîn bû. Ji bo wan cihekî ewle bû.

Eşîra Lawîn, nehiştibû ew tebeqeyên hişk ên li seranserî Êranşehrê çêbibûn di nav wan de jî çêbibin. Esilbûna wan jî ji vir dihat.

Têkiliya xwezayî ya begê li ser wan û şivanê wan wekî çawa nîşan dida dabên civakê didome, her wiha betalkirina hemû pêkanînên rahîbên sexte jî bandora Mazdek nîşan dida.

Xwe gihandibûn xakên herî dûr ên Eşîra Lawîn. Dema ku ji wir hinekî din ber bi hundir ve çûn, ber bi cihê bi qismî çiya bi qismî deşt, mîna ku hatine dinyayeke din his kirin.

Li wê xakê pîroziya berê ya roj, heyv û agir dewam dikir; serê sibê û ber bi êvarî du caran rûyê xwe didan tavê û dua dikirin.

Ev der cihê hilhatina rojê bû.

Yên li wir diman, digotin Zerdeşt di dawiya emrê xwe de li vir maye û li ser van xakan razaye. Destûra wî ya îradeyê li vir hemwateyî rêzdayîna jiyanê bû. Ji ber vê yekê îradeya mirovî li ser her tiştî didîtin. Kûrahiya wê çandê di duayên wan de jî diyar dibû. Carekê tenê jî navê qral di duayên wan de tine bû. Di baweriya wan de evdîtiya mirovan tine bû.

Zirar nedidan xakê, nebatan û heywanan. Komeke ku bikarîbûna fena wan cewherê Zerdeştiyê baş biparêzin, zehmet dihat dîtin.

Xorremê ji jineke li ber mala xwe rûniştibû, pirsîbû, bi çi debara xwe dikin. Bersiva dabû Xorremê ji bo karibe bereketa vê xakê vebêje bes bû:

“Heke li hevşîkê karik çêbibe, li zozan gihaya wê şîn dibe!”

Sirên baweriyê hebûna jî ev têkildarî kûrahiya wateyê bû. Mijar parvekirin bûna, camêr bûn. Baweriya xwe jî tenê aîdî xwe nedidîtin:

Digotin, “Ya her kesî ye û ne ya ti kesî ye!”

Xorrem ev gotina cara yekem ji Mazdek bihîstibû. Di rojên destpêkê de his kir ku wê li vir di ti tiştekî de xerîbiyê nebîne.

Pir diyar bû, ji cilên sor hez dikirin. Di hemû cilên wan de rengê sor hebû. Di îbadeta wan de muzîk hebû. Jinên wan ên esmer li beramberî zilaman çewisî xuya nedikirin, berevajî di her qadên jiyanê de li pêş bûn.

Li wir, li navenda bajêr bi xwe jî ewle bûn. Ji bo vî bajarê herî mezin digotin, “Dayika Hemû Bajaran”: Merv!

Li wir her çiqasî ewle bin jî, nedihat wê maneyê Xorrem xwe eşkere bike. Her çiqasî garnîzonê nikarîbû pir zêde dest li jiyana bajêr werde jî, di encam de ev navend jî girêdayî qral bû.

Dema ku li bajêr aşvanekî dilsoz nas kirin, karê wan rehettir bû. Li gorî vî aşvanê kal, hemû silale aşvan bûye. Digot pêşiyên wan hemû aşvanî kirine, piştî wî jî wê zarokên wî vî karî bidomînin.

Bi saya malbata vî aşvanê Kurd li bajar û bajarokên derdorê gelek gundên ku karibin xwe lê veşêrin eyar kiribûn. Bajarokê herî zêde Xorrem lê rehet jî Şîrvan bû.

Yên li Şîrvanê diman, ferqek wan hebû. Tevî ew kesên ku yên li ser navê dewletê peywîrdar, hemû kes Kurd bûn û ji eşîrên şerker ên ji Medyayê hatibûn. Bajar wan bi xwe çêkiribû û çandeke xweserî xwe ava kiribûn. Ji ber ku kevneşopiya wan a civakî xurt bû, deriyê xwe bi wêrekî ji bo Xorrem vekiribûn.

Li herêma Mawereûnnehr ya diket rojhilatê wê jî, hejmareke zêde ya alîgirên wan hebûn. Dema bi vê hesiya şaşwaz bibû. Çawa keysa xwe lê bianiya wê biçûna wir. Lê ji ber ku rewşeke têkildarî malbata wê derket, ev gera xwe taloq kir.

Karwanvan ji Mervê dihatin Hemedan û Tîzponê. Bi saya wan piştî demeke dirêj agahî ji malbata xwe girtibû.

Dayzerê koça xwe ya dawî kiribû. Dê û bavên Mazdek, Bamdad û Ahûyar jî beriya wê, ango hema piştî qetlîamê miribûn. Keserek mezin ket nav dilê wê.

Asara hê li Gundeşapûrê bû. Malbateke qelebalix a Arad çêbibû. Qade jî emrê wî çibû, lê dîsa jî pir dixwest cara dawî keça xwe bibîne.

Xorremê ev daxwaza bavê xwe paşguh nekir. Her çiqasî xeberên mirina dayika wê Dayzer, Bamdad, Ahûyarê dilê wê êşandibe jî, ew wekî zarokên dawî yên Xwedawendan bi bîr anîn.

Dayika wê Dayzer bi êşên xwe ve bibû mamosteya wê. Ji ber ku di kêliyên wê yên dawî de ne li balê bû, xemgîn bû. Herî dawî fikrekî ku dilê wê germ bike hatibû bîrê: “Dayik û keça wê bi mirinê jî ji hev naqetin. Ji bo zilamên ku her tim meyla wan ji bo jibîrkirinê heye derbasdar be jî, jinên ku her tim bi bîr tînin, veqetînê nas nakin!”

Di jiyana xwe de jineke mîna Ahûyarê sempatîk nedîtibû. Bamdad çiqasî otorîter bûna, Ahûyar jî ewqasî xwîngerm û sempatîk

bû. Mîna ku hêza parazvaniya Xwedawendan pê re hebû. Dilê wê yê başî dagirtî, ji bo bawerkirina Xwedawendan sebebekî têrker bû. Bîranînên wan pir bi qîmet bû. Beriya bavê wê jî bimira dixwest wî bibîne.

Çavê wê li rê bû, li milekî jî tevlî sohbetên gel dibû. Di piraniya wextê xwe de jin têkildarî mijara olê ronî dikir.

Destan, bi demê re hestên xwe yên têkildarî Xorremê darizandibû; guhertineke diyar bi xwe re çêkiribû. Hezkirina wî kûrtir bibû, lê ev wekî berê ji rêzê nedigirt dest. Bi hezkirin her kar hembêz dikir. Mîna ku îbadet dikir dixebitî.

Dema hinekan baweriya wî jê bipirsiyana, digot, “ez baweriya xwe bi Xorrem, civak û xebatê tînim!” Wisa jî meydan ji hemû pîvanên demê dixwest.

Ji derveyî armancê her tişt li xwe heram kiribû. Xwînsar û baldar bû. Hewl dida her astengiyên dibe ku derkevin pêşiya Xorremê ji holê rake.

Hoşeng jî di vê mijarê de ne kêmî wî bû. Bi enerjiyeke bêdawî ya ciwantiyê şev û roj di nava civakê de dixebitî.

Destan û Hoşeng, ne tenê diparastin, di heman demê de malbatên ku wê pê re biaxiviyana jî amade dikirin û herî dawî Xorrem bi van malbatan didan naskirin, gelek malbat jî bi vî şeklî gihandibûn hev. Di nava malbatên têkildar de qenaleke piştevaniyê lez û bez çêdibû û bi saya vê jî xwe pir hêzgirtî his dikirin.

Her kesekî li helwest û nêzîkatiya Destan dinêrî û diyar dikirin ku wê çawa nêzî Xorrem bibin. Rêzdayîn û dilsoziya Destan bibû pîvan.

Xorrem jî biçûna cem kê bêyî ku bikeve nav hewldaneke taybet bandor dikir. Hewaya wê ji ya her kesekî cudatir bû. Mîna ku ti pirsgirêkên nikaribe hel bike tine ye. Ev hewayeke wisa bû ku bi mijarên mijûl dibe, bi israr, bi aramî, bi gotin û nêzîkatiyên xwe, bi germahiya xwe, heta dema ku bêdeng rûdinişt û difikirî jî mirov li dora xwe kom dikirin, dihişt ku baweriyeke mezin a mirovan çêbibe. Nedişibiya hinên din. Kê ew çawa didît heçkû efsûnî dibûn.

Xorremê dizanîbû eleqeyên dihatin nîşandin pêşwazî bikirana. Li ser her kesî şopek dihişt. Ji zarok heta kalan dilê hemûyan qezenc kiribû. Her çiqasî carina lazim dibû şerê zilaman bike, mijûl bibe jî jinan yekser cihê xwe li ba wê digirtin.

Li her derê êşên jinan dişibiyan hev. Dîsa jî her jinekê asoyekî cuda vedikir, her jinekê deriyekî dinyayeke cuda vedikir. Zilaman ev nedîtana jî, bi saya nîqaşan jinan ev didîtin, bi hev dihatin girêdan.

Xorrem, Şîrîn ji ba xwe venediqetand. Hevrêyên xort nedixwestin ji ber rewşa ewlehiyê ji cem veqetin, lê di her firsendê de erk dida ber wan û dişandin. Li ba Şîrîn û çend jinan di nava gel de dixebitîn. Ewlebûneke ji ya ku gel ava dikir saxlemtir tine bû. Di ser de jî dixwest li cem jinan bimîne. Lewma ji Destan û Hoşeng dixwest biçin û bi malbatên li dûrtir eleqedar bibin. Wisa xwe digihandin qadên nû jî.

Li her malekê, di sohbetan de Şîrîn li cem xwe dida rûniştandin, carina dida axaftin. Şîrînê li vir behsa şerkeriya xwe nekiribû. Jixwe pêwîstî pê nemabû van behreyên xwe li vir bi kar bîne. Lê dema mijar dibû axaftin, pir şermoke dibû.

Di nav Kewyaran de dîtibû, şervanên herî baş kêm dipeyivîn. Kevneşopiyek bû, bi qasî dikir diaxivîn, bi qasî diaxivîn jî dikirin.

Di warê axaftinê de şermoke bû, lê dema diaxivî jî bala guhdaran dikşand. Bi tonê dengê xwe, bi hereketên dest û milên xwe, pir zelal, aram bû. Guhdar dixistin bin bandora xwe û dihişt bêdeng guhdar bikin. Wisa lê dikir, heger li derve pelek biketana, li hundir dengê wê dihat.

Heger li ser rûyê wê deqdeqokên tirîncî jî nebûna, wê rûyê wê, eyarê wê yê spî mîna heyvekê bibiriqiya, lê di mêzekirina ewil de rûyê wê yê tijî û sorik dîmenekî keçikeke biçûk dida. Halbûkî ji Hoşeng mezintir bû, ji Destan jî biçûktir.

Hez dikir dayika wê porên wê bihûne. Ji çaxa ji gund veqetiyabûn, porê xwe, şeklê xwe, tiştên eleqedarî bedena xwe li milekî hiştibû, dest jê berdabû. Her tim behsa bedewiya ruhî û baweriyê dikir.

Rojekê Xorremê porê wê yê belave mîna dayika wê hûna. Wekî dayikekê pê hate girêdan. Carina wekî dayik, carina jî wekî xwedawendekê nêz dibû. Di sohbeteke xwe de gotibû lazim e keçên ciwan li laşê xwe mêze bikin, wê çaxê ji xwe şerm kiribû.

Xorrem, wekî mînak behsa wê kiribû û gotibû:

“Li Şîrînê binêrin, bi hisê yekem dest ji bedena xwe berda! Na! Laşê we bi xwe jî ne wekî li ber çav e. Tê de çi çîrok veşartîne! Heger min behsa siran kir, nebêjin qey zindan e. Laşê we ne zindan e. Ew mala ruhê we ye. Ma mala we ne rêkûpêk be, ruhê we dikare tê

de rehet bibe? Stêrkên li asîman bi xwe jî teyisandina ruhê we ye, ma mimkun e laşê we ji vê cudatir be?”

Di axaftina wê de destê Şîrîn ber bi porên wê ve çibû, hewl dida belavebûna heyî rast bike.

“Em ji bîr nekin, em hemû heman roniyê di hundirê xwe de dihewînin. Bedewiya jinekê, bedewiya hemû jinan diteyisîne. Hûn ê xwe li beramberî hemû jinan berpirs bibînin. Hûn karibin li beramberî jinan berpirs nêz bibin, wê çaxê hûn di xizmeta civakê de ne. Mesele ne xwe ji bo zilaman xweşikkirine, wekî rêzdayina xwe û hemû jinan, hûn ê bi fîzîka xwe re mijûl bibin.

Hem bedena we wekî civakê ye. Em belav bikin, wê çi jê bimîne? Ma heqê me heye em civakê nexweşik bikin?”

Van gotinan hewesa Şîrînê ya ji bo fêrbûnê zêdetir kir. Berê tenê fêr bibû bi hisên xwe bawer be, lê niha ev têrê nedikir. Di nav hunera şervantiyê de cihê hisê mezin bû, lê ji Xorremê fêrî tiştekî nû bibû: Hisên jinan ji hisên şervanan jî xurttir e! Wê baweriya xwe bi vê bianiya, lê li dijî fikrên şaş jî têbikoşiya.

Porê xwe xweşik şe kir, hûnand. Şanika şîrîn, qehweyî ya li ser gepa wê zêdetir xuya bû. Ronahiya çavên wê zêde bûn.

Qelewbûna xwe nekir derd. Her diçû zeîf dibû. Bi qasî her kesekî dikarîbû rehet bihatana û biçûna. Piştî wê, di sohbetan de his kir ku rehettir e, wêrektiya wê zêdetir bûye û êdî hilma wê hatiye ber wê.

Şevekê cara yekem diçûn gundekî, hemû malbat li malekê kom bûn. Balkêş bû, tijî zar û zêç bûn. Hemû jin hatibûn. Di nav wan de 2 zilam jî hebûn. Xorrem ne li benda vê bû.

Ji raperînê bandor bibûn, hewl dabûn malên xwe di nava xwe de bikin yek û jiyana hevpar ava bikin, lê nikarîbûn pêk bianiyana.

Tevî ku hayê wan ji fikrên Mazdek ên der heqê olê de tine bû jî, tenê serî li ber feqîriyê rakiribûn. Halê xerabûyî yê olê bi her awayî bandora xwe didomand.

Li vî gundî, gundiyan nizanîbûn ku ruhaniyên sextê yên ku naveroka ola Zerdeşt veguherandibûn jiberên vala, çi dikin. Ne mimkun bû zilam li cem jineke biyanî bipeyivin. Lê rêzdariya ji bo Mazdek hiştibû ku bi rêzdarî Xorremê jî pêşwazî bikin.

…

Di sohbetê de Xorremê got jin û zilam yek in. Zilamekî got:

-Di nav ewqas derdî de derdekî din jî zêde nebe! Te ev got, êdî jin nema li me guhdar dikin. Di dest me de oleke me maye, ew ê jî here!

-Wê guhdar bikin, çima guhdar nekin, guhdarkirin baş e, guhdarkirin cuda ye, serîtewandin cuda ye; wê guhdar bikin, dûvre bidarizînin, rast be jî wê bikin. Ev ne tenê ji bo jinan, ji bo her mirovekî lazim e qanûnê jiyana baş be. Ji ber vê jî ol ji dest naçe. Dibêjim qey tu ne ji olê, ji çûyîna jinan ditirsî!

Jin bi vê gotinê keniyan.

Zilam aciz bû:

-Çima wê bidarizînin? Çi bidarizînin? Darizandina gotina zilam ne dabên me ne, di ola me de jî tine ye.

-Lê niha tu daraz dike, niha jî daraz dike. Gotinên min daraz dike. Darizandin baş e, lê bihêle hinekên din jî karibe bidarizîne. Wê çaxê em dikarin xwe bigihînin rastiyê.

-Jixwe rastî çi be, ola me gotiye!

Dema ku gotinên xwe yên dawî hişk got û hewayeke aciziyê çêkir, Xorremê hewl da nerm bike.

Keçek qelew, nêzî 2 salan temenê wê hebû, di hembêza dayika xwe de bû û tim bi pozê xwe dilîst. Xorremê navê wê pirsî.

Zarokê bi dengê xwe yê şîrîn dema got “Xorrem”, wê kêliyê Xorrem fêm kir ku jixwe li wî gundî zafer qezenc kirine.

Zilamê ketibû nîqaşê jî nerm bibû, awirên wî yên tirş hinekî din aram bibûn. Xorremê lê nêrî, bi şeklekî ku dilê wî nehêle got:

-Tu wêrek î, lê tu nizanî, aqlekî dil jî heye.

Jina li balê rûniştî bersiv dayê:

-Aqlê çi halê çi. Aqlê wî hebûna wê li te guhdarî bikirana!

Jina bersiv dabû, hevjîna wî bû. Her çiqasî Xorremê xwest zilam bide axaftin jî, ji nişkê ve şermoke bibû. Careke din dema axivî, got; “Em baweriya xwe bi Xwedê, Rojê û xebatê tînin, tiştên din ne mesele ne.” Dema ku hevjîna wî çavên xwe lê beloq kirin, hema lez li ser zêde kir: “Em bi Xorrem jî bawer in!” Xorrem bi kurtî got, “ne bi min, heqîqet çi be, bi wê bawer bike!” Ji guhdaran re got ka dewlet çawa olê bi kar tîne û dûvre jî hinekî têkildarî dîrokê peyivî.

Du mînak di serê gel de man: Yek, çîrokeke têkildarî avabûna bingehê kevneşopiya dewletê, ya din jî têkildarî qebîleya Îbranî bû:

“Dewletên berê gotine, qral rûyê Xwedê li ser erdê ye. Mirov jî ji pîsîtiya Xwedê hatine çêkirin. Ji ber vê yekê jî mirov ji derveyî xizmeta qral li tiştekî din nefikirîne. Koletî wisa hatiye avakirin.”

Guhdarekê xeberek ji dihkanan re da û got, “Ew jî bi çavê pîsîtiyê li me dinêrin!”

Xorremê got, Zerdeşt qedexe kiriye mirov li ser mirovî serdestiyê bike, lê ruhaniyên sexte û dewletê ev ji bo berjewendiyên xwe tine hesibandine.

Gundiyekê bi safîtî pirsî, “Ya qewimiye çawa dikarin biguherin?” Li ser vê Xorrem got, “Heger her civakekê dîroka xwe binivîsandana, ti kesî nikarîbû rastî biçepanda. Kî hêzdar be dikare yên bêhêz li gorî dilê xwe pênase bikin. Li dijî hêzdaran hêza me hişmendiya me ye, dîroka me ye, baweriya me ya bi dîrokê ye, xwe naskirina me ye, pênasekirine. Qebîleya Îbranî ya bi ola Hz. Mûsa bawer dikin, ev pir baş kirine. Ma we qet bihîstiye çawa ye?”

Guhdaran pev re gotin, “na”.

“Hûn dizanin, navê Îsraîlê Xwedê li wan kiriye. Ev pir girîng e. Dibêjin ku nebî Yaqûb rojekê şerê yekî dike. Demek dirêj li ber hev dane. Nikarîbûne bi hev. Dûvre wî kesî rûyê xwe yê rast nîşan daye û gotiye, ‘Ez xwedayê we me. Te bi min re şer kir. Ji niha û şûn de bila navê we Îsraîl be.’ Yanî, Îsraîl tê maneya “Yê bi Xwedayê xwe re gulaşê dike!” Ka bînin ber çavê xwe, li milekî mirovek ji pîsîtiya Xwedê çêdibe, li milê din mirovekî gulaşê bi Xwedayê xwe re dike! Eşkere ye, kîjanê xurttir e. Yek dibe, benî-evd, yê din wê çiqasî bi xwe bawer be, ne wisa? Ji ber ku vî nirxê xwedayî tenê li zilamên qebîleya xwe û zilamên ziriyeta mirovahiyê bar kirine, her tim nîvco, her tim bi tenê û her tim di nava şer de mane. Tenê di dema Silêman de aştî dîtin. Ev jî deyndarê jinên Îbranî û jinên qebîleyên din bûne.

Ji bo me jî çavkaniyên xwebaweriyê hebûn. Mûğ!”

Xorremê ji wan re behsa qetilkirina Mûğan kir û mînaka Îbraniyan domand:

“Di dema Nebî Dawûd de her tim şer hebûne. Wateya Dawûd, fermandarê şer e. Di dema Nebî Silêman de jî ji ber ku qebîle û eşîr gihandine hev, kiriye yek, her tim di nava aştiyê de jiyane. Wateya Silêman çi ye? Erê, wekî ku hûn jî texmîn dikin, zilamê aştiyê! Ev ne tesaduf in. Dîroka xwe wisa ava kirine. Pirsgirêk ew e ku di nava vê dîrokê de cihê jinê tine ye.

Tê gotin ku Silêman ji her qebîleyê bi jinekê re dizewice û yekîtiyê ava dike. Lê esasê meseleyê hewldanên van jinan ji bo yekîtiyê ye. Jin bi qasî ku karîbûna ferqa xwe ava bikin bi bandor bûne.

Niha lazim e em têkildarî pêşengên mezin ên baweriya me Zerdeşt, Manî û Mazdek careke din bifikirin. Çi ji me re digotin? Çima em naxwazin fêm bikin? Em karibin fêm bikin em ê karibin ferqa xwe jî nîşan bidin. Em ê jiyana îro biterikînin. Wê çaxê wekî mirovên azad em ê jî karibin azad bijîn, lê ji bo vê lazim e em xwe li her cure fedakariyê ragirin. Di jiyanê de ti tiştekî hêsan tine ye. Guhertin jî ya herî zor e.”

Bandora Xorremê li ser gund di demeke kurt de xuya bû. Di jiyana xwe de hin guhertin kirin. Ji bo jiyana hevpar fêm kirin ku piştevaniya Manî’wî pêwîst e. Lê nikarîbûn bandora hişk a ruhî ya bi bandora olê çêbûyî jî derbas bikin. Ruxmî her tiştî parastina Xorremê jî ji bo xwe wezîfeyeke pîroz hesibandin.

Li vî gundî, ewqasî pêşketin çêbibû, lê guhertina zilaman tenê di nava her kesî de bi nêzîkatiyeke rêzdar a li beramberî jinan sînor bû. Li malê jî her kesî çi dizanî ew dikir.

Teşegirtina ji ber olê, qalibên pir hişk çêkiribûn. Serketina herî mezin a nîzama ku ruhên wan êsîr girtibû jî ji vir dihat.

Wê çawa karîbûna ev derbas bikirana?

Ji îro û şûn de Xorremê nikarîbû dibistaneke vekirana û mîna Hypatîa ders bidana. Ew Hypatîaya civakê bû, ne ya zanistê bû! Hekîm rast gotibû. Di dilê xwe de li ser perwerdeya nava civakê difikirî, his kir ku divê karibin wirdetirî sohbetan biçin, herî dawî gihişt vê encamê; “Lazim e her gund bibe qada jiyana hevpar, her mal bibe dibistan.” Vê fikrê heyecaneke mezin pê re çêkiribû, lê baş nizanîbû wê çawa pêk were, çawa bibe.

Mirov kengî li ser ruhê mirovan serdest bibû, wê çaxê li ser hemû dewlemendiyên maddî jî serdestiya xwe ava kiribû. Wê ji vê rewşê re digot, “qirkirina ruhî”.

Li dijî vê nîzama ku ruhê mirovan qir dikir, lêgerîneke wê ya azadkirina ruhê mirov hebû. Diviyabû kelheyên berxwedanê yên hilnaweşe di ruhê mirov de ava bikirana. Bi şev û rojan fikirî bêyî ku li ser mirovan serdest bibe dikare çawa vê pêk bîne. Encameke wisa jê derxist ku civaka bizanibe xwe perwerde bike wê karibe ruhê xwe

yê windakirî ji nû ve qezenc bike. Heke perwerdekarên civakê jî jin bin, wê çaxê ev hemû dikarîbûn pêk bihatana.

Tenê karîbûna civakê bîne ba hev bes bû. Jixwe piştî wê dibû karê civakê. Di vê mijarê de jinan dikarîbûn rol bigirtana. Her çiqasî komkirina zilaman û bi wan re axaftin zor be jî, dikarîbû bi her jinekê re bi hêsanî têkilî daniya.

Di nav fikrên sexte de yên herî xeter têkildarî jinan bûn. Heger jinan karîbûna xwe ronî bikin û bibin yek, wê dawî li hemû derewan bianiyana.

**Dilê Bihizir!**

Dema ku Hypatîaya civakê pêşengî ji civakê re dikir, lazim bû jin jî li ba wê bûna. Diviyabû destpêkê jinan bizanîbûna xwe perwerde bikin. Wextê ku ev hizir pê re çêbû, bi keyfxweşiyeke mezin qîr da:

-Dawî li hemû hikumdarên zalim, oldarên sexte û derewan hat!

Li ser vî dengî, Şîrîna razayîbû ji nav nivînan pengizî. Di tarîtiyê de li dora xwe mêze kir. Xorrem li ser doşeka erdê, çarmêrkî rûniştibû.

Xwediyên malê li odeya din radizan. Xorrem neketibû ferqê, dengê wê bilind derketibû. Çaxa Şîrîn şiyar bû, fêm kir ku bi dengekî bilind fikiriye.

Hey Şîrîn şiyar bibû, diviyabû van fikrên xwe jê re bigotana. Nikarîbû xwe bidana benda sibê.

Şîrîn bi çavên xewî li van guhdarî kir. Dûvre gotinên bavê wê Xelîl ên ku di dema perwerdeyê de ji wan re gotibû hate bîrê:

“Şerê nefsê şerê herî mezin e! Şervanek destpêkê divê bizane nefsa xwe têk bibe!”

Ji Xorrem jî fêr dibû ku şerê herî mezin şerê fikrî ye.

Ji bo ku tiştên guhdar kirî ji bîr neke, gotinên Xorremê di serê xwe de dubare kirin. Heta ku xewê pişta wê danî erdê, li ser wateya “şerê fikrî” ponijî. Ji ber ku xewê hicûmî mejiyê wê kiribû, ji bilî bi dehan caran dubarekirina “şerê fikrî” tiştekî din nehat bîrê. Dema şiyar bû, dît Xorrem şiyar e. Qet ranezabû.

Xorrem ji bo karibe birame bêdengiya şevê bi kar anîbû. Bêdengî, mîna kûpekî bû ku fikrên herî kûr tê de dimeyan.

Lazim bû hinek fikrên xwe jî bi awayekî bêdeng, aram û veşartî ragihandana. Di nav civakeke wisa de ku bi hêsanî bertek nîşan dida, raperînek dikarîbû bi rehetî çêbibûna, bi rehetî jî bihatana tepisandin.

Fikrê perwerdekirina jinan, ji fikrê hilweşandina dewletê jî xetertir bû.

Jineke perwerdekirî di her warî de berdêlî dewleteke mezin û gurçûpêçkirî bû. Pirsgirêka tecrûbeyê dikarîbû bi rêka perwerdeyê bihatana helkirin.

Tecrûbeya dîrok û civakê dikarîbû bi perwerdeyê bihatana qezenckirin. Di jiyana xwe de bicihkirina her tecrûbeyê nedihat maneya bi tecrûbebûnê. Heke ji heyatê, serpêhatiyan ders hatibin

derxistin, ev vediguherîn tecrûbeyê, hekena tenê dibû barekî ku pişta mirov xûz bike.

Tiştên nikarîbûn li gundê Kewyaran bike, dikarîbû li vir pêk bîne. Gotibû, “Jin û mêr çiqasî wekhev in? Çavdêriya jiyanê bikin û werin bêjin!”, lê bûyeran nehiştibû vê bikin. Tenê carekê jî ev bikirana, êdî wê deriyê çandeke nû jî vekirana. Bi vê bawer bû.

Li milê din, bawermendeke destpêkê bû, digot baweriya Mazdek oleke nû ye. Dema ku gerekên vî dînî vedigot, ferq kiribû ku bi bandor e. Encamgirtina bi şêweyekî din hema hema bêîmkan bû. Ji ber vê yekê fikrên xwe bi xwe jî bi baweriya Mazdek distra û wisa radigihand. Ji ber ku di warê cewher de ferqeke wan tine bû.

Koma biçûk her diçû mezin dibû. Komên ku li gundan li dora jiyana hevpar diciviyan, veşartî fikrên wan belav dikirin; fikrê nû û terzê jiyana nû dibû berxwedaneke veşartî.

Li heman gundî demdirêj nediman. Wekî çareyekê ev bi kar tanîn, ji bo ku wekî mirovên pir mezin nêzî wan nebin wisa dikirin. Heger demek dirêj li eynî cihî bimana, fikrên wan ew bû ku gel li şûna îradeya xwe wê îradeya pêşengan esas wergirtana û heta ji ber vê yekê, cihêbûnên ku her tim li dijî wê derdiketin dikarîbû di nav wan bi xwe de jî pêş biketana. Jixwe biçûna kû derê, di demeke pir kurt de encam digirtin. Carina tenê xwe nîşanî mirovan bidana jî bes dibû.

Hebûna Xorrem, kaniya hêviyê ya ku digotin “miçiqiye” ji nû ve geş kiribû. Li cem hevrêyên xwe di demeke kurt de rê li ber guhertinên mezin vedikirin.

Şîrîn bibû pêşenga ciwanan. Çend gotinên wê yên xweş bi serê xwe jî ciwan ber bi heyecanê sewq dikirin. Ji ber ku gotinên wê çiqasî kurt jî bûna, tijî wate bûn. Îcar dema şer dikir, ciwan li dorê dibûn perwane.

Ew dipeyivî; hin kesên ku kûrahiya wê ferq nedikirin jî tenê deng derdixistin, qîr dikirin. Yên diaxivîn xwedî fikrekî bûn. Yên din di warê xwebaweriyê de zeîf bûn.

Wateya ku Xorrem li qiseyê bar dikir, ji bo jinan şeklê herî baş ê xwe îfadekirinê bû. Li gorî wê tenê bi qîr û nêzîkatiyên bêwate derketina meydanê, tenê ji bo xwe nîşandana zilaman bû. Digot, “Lazim e em xwe nîşanî xwe bidin, ne zilaman. Em nikarin bi şeklekî din nasnameya xwe ya winda bi dest bixin.”

Ti tiştek bi qasî qiseyên jinan ên di nava civakê de heyecan nedida Xorremê. Axaftin ne tiştekî kêm bû. Axaftin, di nava civakeke wisa de ku ewqasî zext li ser hebû, çalakiya herî mezin a şoreşgerî bû.

Digot, "Biştexilin! Jinên naştexilin jî biştexilînin! Di axaftinê de neşibin ti kesî, dilê xwe bidin axaftin, nîşan bidin dilekî we yê dihizire heye. Bibin xwe, bi qasî hûn karibin aqlên wan kesên henekê xwe bi aqlê we dikin li erdê bidin li xwe vegerin, wekî jinekê bipeyivin!" Heçkû xwedawendek diaxivî.

Guh didanê û pêk tanîn. Baş dizanîbûn li kû bipeyivin, li kû bêdeng bibin. Dizanîbûn, qesta Xorremê ji axaftinê ne qiseyên pûç û vala bûn.

"Dilê Bihizir" bibû sirê hemûyan.

Gel di nava xwe de ji Xorremê re digot "Dilê Bihizir".

Di her mijarê de ew mînak digirtin.

Her qiseya wê li ser îrade, exlaq, yekîtî, berxwedan û azadiyê bû.

Êdî jin li kû derê bûna, ew der qadeke şer bû, her qiseyek zaferek bû.

Xorrem dibû şahid, her jineke di nava civakê de dipeyivî, îradeyeke mezin derdixist ortê, wêrekî dida her kesî. Sirê jinê ev bû: Jin heqîqet bi xwe bû! Her ku bi îrade, fikir û zimanê xweserî xwe dipeyivî, heqîqet kifş dibû.

Cesareta qisekirinê, ji bo şkandina hemû zincîran dibû gava yekemîn. Bi saya van jinan civakê ji nû ve heqîqeta xwe nas dikir.

Her ku guhertina civakê di asta berçav de pêk dihat, jin jî li her derê dibûn pêşengên civakê. Di nav civakên bi pêşengiya jinê de pakbûnek pêk dihat.

Li cihê ku jin lê bûn, saxtetî û duristî zû derdiketin ortê. Ew kesên ku ruxmî beşdarî berxwedanê jî bibûn, lê jin biçûk didîtin, dersên biheng jê digirtin; Xorremê îradeyên wan diceriband, dihişt ku zeîfiyên xwe jî bibînin.

Koma wan a biçûk bibû dibistaneke gerok û veşartî. Xorrem diçû kû derê behsa girîngiya veşartîbûnê dikir, lê piştî demekê wê hebûna wan ji cihên pir dûr, ji paytextê jî bihatana bihîstin.

Piştî Mazdek, tirsa di nava civakê de cara yekem dihat şkandin. Heke Xorrem nebûna, hilweşandina dîwarên tirsê ne mimkun bû. Ji ber vê yekê êdî navê Xorremê li qesra împaratoriyê dihat axaftin. Dîsa jî li hin gundan nasîna wan bi êş çêbibû.

…

Her çiqasî li her derê bi rêzdarî dihatin pêşwazîkirin jî, li gundekî hatin ber qiraxa mirinê.

Li gundekî mezin ê deştê ku ji cihekî din hatibûn û li herêma Mervê bi cih bibûn, destpêkê wekî mêvanê xwedê xweş hatibûn pêşwazîkirin; dûvre ji ber şaşfêmkirinekê hema hema dikira bihatana lînckirin.

Gundî li dora wan bûn, sohbet dikirin. Di sohbetê de wextê gotinên mîna "ronî, roj, şewq" ji devê Xorremê derket, hêrseke mezin rabû.

Li kêleka çavê jina qiseker, jêçûyî be jî deqeke bi şeklê stêrkê hebû. Vê nîşan dida wekî ku ev kes ne di bin emrê oldarên paşverû de ye. Lê heçkû eskerên zalim bi ser wan de girtine, gundî ketin nav liv û tevgerê.

Jineke girs tirmixa di dest xwe de avêt rûyê Xorremê. Xorrem xwe di carekê de ji tirmixê xelas kir û bi ser jinê de meşiya. Wisa tûj mêze dikirin, ew jina girs ji tirsa vekişiya. Tevî vê jî ji mêzekirinên gundiyan wisa diyar bû ku wê bi hev re êrîş bikin, bi hêrs dikirin qîrewîr.

Qebîleyên vî gundî bi tarîtiyê bawer bûn; "ronî, roj, şewq" dijminê wan bû!

Xorremê cara yekem civakeke bi tarîtiyê bawer didît.

Di rewşeke wisa de dibe ku ev gundî sîxurên qral jî bûna.

Destan û Hoşeng, di nav fikrên welê de xwe hazir kiribûn wekî şêran bikevin navê. Ne li benda wê êrîşa li ser Xorremê hatî bûn, ne jî li benda wê atîkbûna Xorremê bûn! Cesareta wê baş dizanîbûn, lê piştî ku bûn şahid ewqasî vezelokî û atîk e jî, pêwîst nedîtin bikevin pêşiya wê. Her yek li milekî wê disekinîn. Ji bo karibin lînç nebin û ji vî gundî derkevin, diviyabû çavê van gundiyan bitirsînin.

Destan wekî qertelekî li qelebalixê dinêrî:

"Hûn dibêjin qey hûn dikarin egîdên ku serî li hemberî zilma împaratoriyê rakiriye, berdêl daye bitirsînin? Yên xwe nedin paş, wê şûrê me yê bi baweriyê tûjbûyî nas bikin!"

Li ser van gotinan, li şûna xwe bidin paş, jina bi tirmix û çend jinên li pêş xwe avêtin hembêza Xorremê. Ew dan ber maçan. Hema hema hilm lê çikandibûn.

Li herdu milan jî şaşwaziyeke mezin hebû. Kalek derket pêş û got:

“Çima hûn destpêkê nabêjin. Me digot qey hûn roj, ronahî, ola qraliyetê diparêzin. Ev zalim çi diparêzin, em tersê wê diparêzin. Ew bi çi bawer bin, em bi tersê wê bawer in! Di nava ronahiya wan de dinya winda dibe, lê di nava tarîtiya me de hemû kaînat xuya dike!

Em ê ti carî bi vê nîzama zilmê re nebin yek, em ê nebin wekî wan! Em ev in. Hûn kî ne?”

“Em jî hevrêyên Mazdek Hemedanî ne!”

Cara yekemîn xwe li gundekî biyanî ewqasî eşkere didan naskirin. Halbûkî gava din dikira bihatana kuştin.

Heçkû tevna civakî ya gund qet xera nebibû. Oleke bertekî pêş xistibûn û avaniya xwe ya azad parastibûn.

Xorremê li ba xwe got sirên dinyayê çiqas pir in. Xweda Ahûra-Mazdayê ku hikmê xwe li ser van siran hemûyî heye, di destê Sasaniyan de bibû bingehê ruhanî ya împaratoriya zilmê. Heta ji ola xerabûyî veger nebûna, ji vê nîzama zilmê jî xelasî ne mimkun bû. Mazdek ev ceribandibû û jiyana xwe li ser kiribû.

Niha dem hatibû, mîna Xweda Ahûra-Mazda hemû siran li cem xwe kom bike û bi civakê re parve bike.

Bavo Qade bi salan ji bo vê dixebitî, derwêşek bû. Dereng jî bûna, Xorremê fêm kiribû. Helbet wê der barê bavê xwe de jî her tim baş bifikiriyana.

Ji bo hevdîtina wan demek kurt mabû. Karwan li ser rê bû. Dema pê hesiyan nêz bûne, Destan çû pêşwaziya wan.

Lê çi heye ku xatirayeke herî zor a jiyana xwe dît. Bi xebereke şewat vegeriya: Ne karwan ne jî Qade hebû! Li ser rê êrîş bi ser wan de hatibû. Du kes xelas bibûn û gihiştibûn bajarê Mervê. Di nav şervanên parastina karwan de ciwanên Kewyaran jî hebûn. Ew jî sax nemabûn. Nexwe êrîşeke mezin bû.

Destan, kesên ku ji êrîşê xelas bûne li xanekê dîtin. Êrîş li ser navê qral Xusrew pêk hatibû, lê li ser êrîşkaran cilên eskerî tine bû.

Gotibûn, “Her kesên ku alîkariya Mazdek kirine û hê jî bermahiyên wî vedişêrin wê werin cezakirin!” Herdu kes jî ji bo peyamê belav bikin sax hiştibûn.

Tirs bi lez belav bû, ev herdu kes hê ji xanê derneketibûn, agahî li bajêr belav bibû.

Qade û bîranînên wî hebûn.

Nikarîbû bi rondikên çavan bigire. Gelo wê çawa ji Xorrem re bigotana?

Hespa xwe bi halê wê yê herî hêdî anî. Dema gihişt gundê Xorrem lê, yên li ser banî dua dikirin derbasî hundir dibûn.

Çaxê gihişt ber deriyê malê, Xorrem ji ber şeyîna hespê ji cihê xwe pengizî. Ber bi derî ve beziya. Wê Bavo Qade hembêz bikirana.

Roja ku Mohr jê re anîbû hate bîrê. Eynî mîna wê rojê kirî, dîsa bi keyfxweşiyekê derî vekir. Destan dît, ji hespa xwe daketibû, çavên wî şil bibûn. Fêm kir…

Yên êrîşî karwanê kiribûn, eskerên ji garnîzona Reyê bûn. Ev bûyer çirûskek bû, ji bo bi ser tirsê, ecelê, celad bimeşin.

Zêdetir li bendê mayîn, wê rê li ber yan rizandinê yan jî bûna xwarinê vekirina. Niha dema liv û tevgerê bû. Her çiqasî hevrêyên li balê ji ber ewlehiya Xorremê bi fikar jî bûn, his kirin ber bi raperînekê ve diçin û li dijî wê derneketin. Ew şervan bûn. Azweriya şerkirinê girantir bû.

Nîqaş kirin, biryar dan û di nava çend rojan de vegeriyan Reyê.

**“Zilam Xerab in!”**

Kurikê rehber baqil bû. Her çiqasî li Reyê xwediyê karwanan nas dikir jî pirsa Xorremê ji wan nekir.

Ev mirovên pir dewlemend bûn, navê Xorrem jî bibihîstana wê ziravên wan biqetiyana.

Bibûn mêvanên wan, lê sebebên hatina xwe negotibûn.

Çawa be jî li Reyê hekîmtî pêşketî bû. Ji ber vê yekê, Şoşanê gotibû zarokên wê çênabin, lewma hatiye bajar û li hekîmekî digere. Jinên malê rêbazên cur bi cur li ber xistibûn, nasên xwe xistibûn dewrê û gotibûnê wê alîkariyê bidinê.

Ji ber ku zilamê wê pê re nehatibû, lomandin, lê dema ku gotibû memûrekî qesrê ye û ji ber karên xwe nikarîbû were, wê çaxê jî zêde bi ser de neçibûn.

Rehbertiya kurik jî bi rastî kiribû hedef ku Şoşanê li Reyê bigihîne hekîmekî. Lê hekîmê lê digeriya beriya demekê li cem hevalekî xwe yê hekîm ji ber çav winda bibûn. Ji herduyan ti şop tine bû.

Mîna ku mala kurik bi ser serî wî de hilweşiyabû. Bi xemgîniya ku wezîfeya xwe serketî neaniye cih, tijî bû. Hewldanên dilnimîniya Şoşanê jî bê feyde bû.

Diviyabû kurik vegeriyana, lê heta Şoşan bi hinekan nedana naskirin ma dikarîbû vegeriyana? Wijdanê wî ne rehet bû. Biryar da, heta kesên navbeynkar ên ku wê Şoşan bigihandana daxwaza wê nedîtana wê venegeriya.

Xwediyên malê ji ber terbiye û zanebûna Şoşanê bandor bibûn. Bûyîna jina memûrekî qesrê ha tiştekî wisa bû!

Zilamên karwanvan, ew ti carî negerandibûn. Hin rêwîtiyên wan bi mehan dewam kir, carina 6 mehan venedigeriyan malê. Tevî vê jî jinên wan ji malê gav nediavêtin derve.

Li pişta malê baxçeyekî mezin hebû. Di nava baxçe de avahiyeke kevn a dişibiya xanê hebû. Ji hespên karwanvanan heta eşyayên wan ên herî bi qîmet li wir bûn. Mîna sûkeke kevn bû. Tijî neqş, nîgar, zînet, cawên hevrîşm, tiştik miştik bûn.

Ji nav wan yên herî xemldar hilbijartibûn û li deverên cuda yên xanî bi cih kiribûn. Tekane zewqa jinên vê malê ev tiştik bûn. Dinyayeke din li cem wan tine bû.

Hatina Şoşanê jiyana wan a ji rêzê rengîn kiribû. Heçkû ji dinyayeke din hatibû. Di rûyê wê de keçên malê ji roja destpêkê ve ketin nav xeyalên zewaca li ba memûrên dewletê.

Sê xwişk, sê dotmam, şeş keçên ciwan li malekê diman û hatibûn dema zewacê.

Jin-keçên karwanvanan heta wê rojê her tim ji bav, bira, hevjînê xwe guhdarî çîrokên diyarên cuda kiribûn û ji hev re gotibûn. Niha Şoşanê digot, lê ya wê cudatir bû.

Digot, "zilam xerab in" û serpêhatiyên xwe yên "eşqê" mîna ku hatiye serê hinên din vedigot.

Bi taybet jî ji keçên ciwan re digot ka zilam mirovên çawa ne, ji tiştên çawa hez dikin, bi detayên bêedeb digotin. Wê çaxê rengên keçan dişibiya gulên xemrî yên li baxçe.

"Zilam xerab in! Nizanin bi eşqê, dema xwe tatmîn dikin, pişta xwe didin te û diçin!"

Yê ku wekî zilam herî zêde behsa wî dikir Xusrew bû. Xusrew ji eziyetdayînê zewq digirt. Lê dema behsê dikir helbet nedigot ew kî ye.

Dema wê behsa van dikir, keç ji ser hişê xwe diçûn, stêrk li ser serê wan digeriyan, xwe li cem wan zilamên bêar xeyal dikirin, di hembêza wan de diketin nav wê şehweta sawdar, dûvre bi tirsa Xwedê dihatin ser hişê xwe, lê ji dubarekirina vê jî zewq digirtin. Şoşan ne di ferqa vê de, tenê bi armanca reşkirina zilaman hîkaye digotin. Halbûkî vê bandoreke ters li keçan dikir.

Keça mezin got bi dizî ji yekî hez dike. Şoşanê cesaret dabûyê û gotibû:

"Te erdê bûkanî çandiye ji bo hezkirina bayê! Biçe jê re meseleyê bibêje! Hezkiriyê xwe ber ba bernede!"

Bi çîrok û gotinên xwe bandor li keçan kiribû, di nav wan de bi awayekî ewle dima.

Rojan wisa dabûn pey hev. Kurikê rehber hat û agahiyeke nû da: "Xorrem çûye!"

Dema ku ev bihîst, hem xemgîn bû hem jî keyfxweş bû. Cara yekem pê dihesiya Xorrem sax e û hatiye van deveran. Heta niha tenê li ser texmînan hatibû heta vir, lê niha texmînên wê rast derdiketin. Nêzî wê bibû. Hisên wê rast bûn.

Cihê ku alîgirên Mazdek lê zêde ne, lêkolîn kirin. Ji Reyê wirdetir, herêmeke bi navê Xorasanê hebû. Şoşan, hê di zarokatî de

navê vir bihîstibû. Heta yên behsê kiribûn, têkiliya malbata wê pê re danîbûn, lê sebeba wê nedihat bîrê. Biçûna wir hem dikarîbû Xorrem bidîtana hem jî dibe ku têkildarî malbata xwe li şopekê rast bihatana. Heger Xorrem ji Reyê derketibe, cihê biçiyê dibe ku ew der be.

Sebebên çûna diyarên nediyar, wêrekiya pêwîst didayê.

Qet wext derbas nekirin. Ji xwediyên malê re gotin li Xorasanê hekîmek heye û bi alîkariya wan tevlî nav karwanekî bûn û ji Reyê derketin. Herî zêde jî keçên malê bi vê xemgîn bûn.

Tersîtî ev bû, di heman çaxê de Xorrem jî ber bi Reyê ve dihat…

**Ênûşîrvan!**

Wî, bi komployeke dijî bavê xwe, bi dijminahiyeke mezin a ku dîroknasên qesrê jî nikarîbûn veşartana, text desteser kiribû.

Kûbad xwe nedabû paş: Bi alîkariya rahîb û esilzadeyan ji aliyê kurê xwe ve hatibû zincîrkirin!

Kurekî wisa çi netanî serê gel?

Heta mirinê jî bavê xwe zincîrkirî hiştibû. Dema ku Mazdekî jî qetil kiribûn, gotibû êdî li pêş wî ti asteng nemane. Wê bibûna qralê mezin ê gel!

Dema ku Xusrewî, Mazdek û hevrêyên wî serberjêr binax kiribû, gotibû, "Mehsûla berhemê we çandiye ev e!" Lê çi heye ku nizanîbû di dilê hemû gel de çi hatiye çandin!

Dîroknasên qesrê not kiribûn: Qralê qralan rehmek mezin nîşanî gel da, bexşand! Ew heta dawiyê ji rêderketiyên olî rizgar kirin!

Her ku derew mezin dibûn, hezkirin û rêzdarî jî kêm dibû. Gelê Îranê ne ji Xusrew, lê ji Mazdek hez dikirin û rêz jê re digirtin. Xusrew ne nûnerê gel bû, nûnerê zorbetiyê bû û mîna her zorbeyekî di nav tirs û xofê de jiyan dikir.

Piştî komplo û qetlîama xwînî, êdî tirsê bi pêsîra Xusrew girtibû. Hewesa xwe bi qralên Pers anîbû, bi hêzeke eskerî ya dişibiya "Nemiran!" xwe diparast. Ji bo rahîbên sexte û dihkanan jî li gorî dilê wan esker şandin. Kujerên di bin emrê xwe de şandin her derê.

Bibû qralê xerab ê Zerdeştiya xerabûyî. Tevî ku rêzikên olî li milekî hiştibû jî mîna ku pir bi olê girêdayî tevdigeriya û emir derxistin ku her kesên girêdayî olê wekî dixwaze dikare bijî.

Hemû dûvikên dewletê yên ji vê cesaret girtin, bi awayekî sexte wekî girêdayî rêzikên olî ne tevgeriyan, lê binvebinve jî hemû baweriyên pîroz ên civakê rizandin.

Haremên hatibûn girtin dîsa vekirin, ev der kirin çiraveke fermî. Li zindanan komên tecawizê ava kirin. Mirovên ku îrade û rûmetan wan şikandin wisa kirin sîxurên xwe.

Dîroknasan wisa nivîsandin: Qralê qralan, fezîlet û exlaq mezin kir! Xwedî li ola me derket. Qira jirêderketiyan anî. Hizûr anî welat!

Her kesên ku di nava civakê de dihatin hezkirin, kirin hedef, ji nav çirava xwe herî li wan dan; lê ew mîna nîlûferê bûn, di nava çiravê de jî qet qirêj nedibûn.

Tevî derew, bêbextiyan jî nikarîbûn pêşengên civakê bêbandor bikin, vê carê li ber çavê her kesî bi êşkenceyê qetil kirin. Lê wan mîna nîlûferê her roj ji nû ve pel vedikirin, her roj ji nû ve bûtik didan; sembola jidayikbûnê û ji nû ve bûyînê bûn.

Heqê qetilkirina pîroz bi bîr xistin û tirs belav kirin. Ji bo ew kesên bîat dikin jî mafê jiyana koledar pêşkêş kirin.

Bi van rêbazan dixwestin hemû berxwedêriya civakê biqedînin.

Di vê dema wisa de ku dixwestin hemû mirovahiyê tine bikin, sifetên mirovê mezin li Xusrew kirin.

Piştî qetlîamên mezin, ji bo ku xwe ji gunehê cinayetan bişon, ji bo kujerên “mezin” sifetên mezin hatine dayîn.

Ma ji bo hevwextê wî Împaratorê Bîzansê Justînyen wê sifetê “mezin” were bikaranîn, Xusrewê bê sifet bimîne?

Beriya Mazdek were qetilkirin bi du mehan, di 13’ê Çileya 532’yan de li Konstantînopolîsê raperîna Nîka hatiye tepisandin, nîvê bajêr hatiye şewitandin, bi deh hezaran kes hatine kuştin. Dema ku Justînyen vê raperînê ditepisîne, li hîpodromê 30 hezar îsyankarî kom dike û qetil dike.

Maneya Nîka ew bû, “qezenc bike, yê qezenckirî tu be!”

Îsyanê li hîpodroma nêzî qesrê, di dema pêşbaziyên hespan de dest pê kiribû. Bi qetlîama li hîpodromê jî hatibû qedandin.

Piştî wê serdema zêrîn a Bîzansê dihat. Mîna serdema zêrîn a Sasaniyan!

Zeman bi xwîn û derewan dihat hûnandin. Mîna ku Împaratorî di dema xwe ya herî bi heybet de ye, herî fireh de ye, weqanivîsan qeydên murefeh ên qesrê digirtin. Halbûkî qesr ketibû nav çiravekê. Xanedaniya Sasaniyan hem bi qetilkirina Manî hem jî Mazdek, rûyê xwe yê hov nîşan dabû. Yên serwer di cewher de ti eleqeya xwe bi gel, mirovahî, edalet, olê tine bûn. Ji bo bincilkirina vê, bi çavê parazvanê Zerdeştiyan li Xusrewê qatilê ruhan hatibû mêzekirin û piştî ewqas kuştinan, sifatê “ruhê nemir” lê hatibû kirin: Ênûşîrvan!

Ji bo qralên piştî wî hatin wekî inwan di maneya “her tim mizafer” de “Xusrew” hate gotin. Ji dewletên yekem heta wê rojê, tiştekî pir zêde li ser kevneşopiya xwe ya serweriyê zêde nekiribûn. Lê ji ber ku tevgera Mazdek ji holê rakiribûn, xwe mezin kirin. Mîna ku terzekî nû yê têknaçe ji bo îdarekirina dewletê dîtine, tirs û xof xistin nav dilê bindestan.

Tiştek ji bîr kiribûn: Mazdek, rastiya Zerdeştiyên sexte nîşanî her kesî dabû, her wiha heqîqeta ezel-ebed a civakê derxistibû ortê. Ne “zeman” ne jî rêbazên serweriyê karîbûn vê heqîqetê tine bikin. Lê belê, nexwe Xusrew pê bawer kiribû ku dema alîgirên Mazdek jî tine bike wê pirsgirêk nemîne.

Ji ber vê yekê, piştî qetlîamê, li hemû welat tofaneke zilmê da destpêkirin.

Qatilên fermî yên qesrê li bajar, li gund dema berxwedaneke biçûk jî didîtin, her kes dikirin hedef, derketibûn nêçîra mirovan.

Ji bo ku ti bîranîn ji Mazdek nemîne, êrîşî her derê dikir. Li kû derê nivîseke biçûk jî hebûna îmha kirin; dest ji nivîseke ku ji hevokekê pêk tê berde, kê navê wî gotibe, tespît kirin û qetil kirin. Di vê navberê de xwestibin kê bikujin jî bi alîgiriya Mazdek tewanbar kirin û beralî kirin.

Dîroknasan nivîsandin: Wî, berjewendiyê hemû esilzadeyan parast. Nîzama xerabûyî rast kir. Ew hikumdarê herî dadperwer ê dîrokê bû. Navê “dadperwer” jî li pêşiya navên din zêde kirin.

Mazdek, felsefeya Zerdeştiyê bi hemû felsefeyên jiyana azad strabû û mizgîniya xwişk-biratiyê dabû hemû mirovahiyê. Piştî ku ew qetil kirin, oldaran ji bo civakê weez kirin, çavkaniya rast a biratiyê ew e ku her tebeqe di nava sînorê xwe de bimîne.

Li her derê gotin ola wan bi edalet e, ji ber ji mezheba jirêderketî rizgar bibûn, şîrî-avis guhdar nekirin, ji her cure heywanî ser jêkirin û cejn kirin. Helbet ev li ba mezinên xwe dikirin. Ji bo gel dîsa “hestiyê ber kûçik” bû!

Yên ku li ser navê olê mirov kuştibûn, dilsoziya wan bi olê nemabû. Ji bo wan di baweriya Zerdeşt de qurbannekirina hin heywanan jî ne girîng bû. Mîna her rêzikê ev jî li gorî xwe guherîbûn.

Bi saya rêzikên ku dixwestin bi zorê bi civakê bidin pejirandin, digotin qey dikarin heta hetayî serdestiya xwe bidin domandin. Halbûkî, ev rêzikên qelp hemû tenê wekî qaşilekî bû û her kêlî dikarîbû bihatana parçekirin.

Çi kirin jî nikarîbûn ruhê jiyana hevpar û piştevaniyê ya ku civakê dike civak ji holê rakin.

Dîroknasan nenivîsandin, lê Xorremê ruhê berxwedana civakî pêl bi pêl li her derê belav kir, bi sed salan bayê wê kêm nebû.

Ji bo ku xwe bigihînin Xorremê, êrîşî hemû xizmên wê kirin. Arad, Asara û ji malbata wan ti kesî agahî jê negirtin.

Şopandineke mezin dan destpêkirin. Hewl dan derdora wê teng bikin.

Xwestin xwe nêzî wê bikin, li kevçika dilê wê bidin û herî dawî jî wê bigirin. Fêr bibûn, li wî bajarî cihekî bû.

Wisa jî xwe gihandin herî nêzî wê, ango Şîrînê!

## BEŞA ŞEŞEMÎN: BAWERÎ Û ŞÛR

### Kevneşopî Didome!

Ma kîjan împaratorî li ser zilm, xwîn û êşkenceyê nehatibû avakirin?

Êşkencekirin, ji bo ku tiştekî nehatiye bidestxistin were bidestxistin, bi rêbazên cur bi cur dihate kirin. Ne tenê ji bo zaniyarî girtinê, di heman demê de ji bo karibe îradeya kes hûrikhûr bike û ruhê wî bi dest bixîne dihate kirin.

Dewlet, dezgeha êşkenceyê bû.

Her dewlet li ser ruhên hatine teslîmgirtin û tepisandin tê avakirin. Mezintirîn amûrê êşkenceyê dewlet bi xwe bû.

Îro li vir êşkence bi mirovekî tê kirin, yê êşkencê pê dike dewlet bi xwe ye.

Kesê bi dewletê re rû bi rû bûye, nikare ji hesabpirsîna xwînî bireve. Yan wê li ber xwe bide û dewletê têk bibe, wê çaxê bibe xwedî îrade yan jî wê têk biçe û wê demê jî êşkenceya dewletê domdar bibe!

Heger te serî li hemberî dewletê hildabe, êşkence jixwe normal e, heqekî Xwedayî ye!

Mirovê ku bêyî li temenê wî û serê wî binêrin xistibûn bin êşkenceyê, bavê wan berxwedêran bû ku împaratorî hejandibûn.

Laşê wî yê tazî di nav kul û keseran de mabû. Ji ber ku qamçî lê dabûn, goştê pişta wî vebibû. Bi rojan êşkence lê kiribûn, lê gotinek jî nekiribû.

Her çiqasî tîbûnê pir zehmetî lê dikir, heta wê ji ber tîbûnê bimirana jî biryar dabû, wê dilopek av jî ji wan nexwestana.

Nizanîbûn di nava komê de ew jî hatiye dîtin. Di bin navê alîgirên Mazdek de êrîş kiribûn, lê yekî ji wan ew nas kiribû.

Ji ber vê yekê sax hiştibûn û biribûn garnîzonê. Diviyabû bi rojan qîrên wisa bihatana, mîna wê dîwarên kelheyê hilweşin, lê li

beramberî ewqas êşkenceyan bêdengiya xwe xera nedikir, li şûna wî wan bi xwe dikirin qîrewîr.

Temam nepeyivîbû, lê carekê jî negotibû “ax”. Vê jî êşkencekar dîn û har kiribûn.

Herî dawî li hucreyeke bê şibake ji mirinê re hiştin. Piştî ewqas êşkenceyan, li hucreya tarî bi qasî karibe bijî nan û av danê.

Sedemên wî yên xurt hebûn ji bo sax bimîne. Ji ber vê yekê li ber xwe dida, diviyabû li ber xwe bide.

…

Xorrem, li gundekî nêzî bajarê Reyê dima. Berê jî hatibû vir. Li vir jinek dît, mêrê wê lê dabû. Rûyê wê û milên wê reş û şîn kiribû. Tiliyên destê çepê nedilîstin. Pir êş dikişand. Îhtîmaleke mezin milê wê şkestibû. Li gund ti kesên ji cebarê fêm dikir tine bû.

Jin pir zêde ji mêrê xwe ditirsiya. Xorremê ew îqna kir ku bibe ba hekîmekî li bajêr. Hevjînê wê ne li gund bû. Heta vegera wî dikarîbû jin bibira û bianiya. Şîrîn jî pê re şand. Bajar nêz bû, lê ji bo zû biçin û werin bi hespan ketin rê.

Xorrem û hevrêyên wê jî ji bo sohbetê gundî dawetî cihekî derveyî gund, cihekî daristanî kiribûn, çûn wir.

Hekîm mudaxeleyî destê şkestî yê jinê kir, Şîrîn jî ji bo hin pêdiviyan daket sûkê. Karên wan çawa biqediyana wê vegeriyana gund.

Li sûkê sîxur hebûn û li ser tarîfê gumana wan li ser Şîrînê çêbû. Ew şopandin. Ji bo xwe bigihînin Xorremê, cara yekemîn yeka ewqasî nêzî wê dîtibûn. Çi bibûya jî wê ev firsend ji dest nedana.

Dema ku Şîrînê fêm kir tê şopandin, hewl da xwe ji wan vedize. Wekî çawa neçû ba hekîm, her wiha hewl da ji nav qelebalixiyê bêyî wan pê bihesîne xwe ji wan dûr bixîne. Cawekî reş û dûz kirî û li serê xwe gerand.

Ji serê bazarê heta dawiya bazarê hat, ji ber ku hê jî dihat şopandin, xwest bûyerekê derbixîne û wisa xwe bide windakirin. Dema xwe nêzî wê kirin qîr da, ji mirovên derdorê alîkarî xwest. Lê belê, zilaman nîşaneya qraliyetê nîşan dan, piştî wê ti kes ji cihê xwe jî neliviya. Ev zilamên qesrê bûn.

Du kesên xwestin bi milên Şîrînê bigirin, carekê dîtin pehîn xwarin û li erdê ne. Lê hejmara wan zêde bû. Yên din xwe avêtin ser serê wê, girtin û birin.

Ji ber ku Şîrîn venegeriyabû, hekîm çû sûkê, li wir ji dostên xwe guhdarî meseleyê kir. Lezûbez vegeriya û ji jinê re rewş got. Jin bi milê xwe yê pêçayî vegeriya gund. Hayê Xorrem ji meseleyê çêkir.

Destan û Hoşeng dizanîbûn wê Şîrîn bibin garnîzonê. Lê hejmara wan têra destwerdanê nedikir. Ji ber vê yekê Hoşeng li ba Xorremê ma û çûn cihekî ewle. Destan jî ji bo alîkariyê bîne derket û çû.

Du roj, demeke pir dirêj bû. Her ku êşkenceyên lê dihat kirin tanî ber çavên xwe, diqeherî. Lê belê bi halê xwe yê herî lez jî nikarîbû beriya du rojan vegere. Li ser rê mîna ku serê wî û dilê wî dikira biteqiyana, ji cih derketana lê hatibû. Demarên li ser eniyê û li ser milan nepişîbûn, mîna xwîna wî dixwest derkeve derve, ji xwe re li cihekî pejiqînê digeriya.

Hoşeng, net kir ku Şîrîn li garnîzonê tê ragirtin. Dizanîbû wextê diçe di alayê wan de ye. Ji ber vê yekê ji bo alîkariyê bistîne xwe gihand hin dostên kevn. Di nava wan de hin gundiyên egîd û şerker hebûn.

Dema qeneet kir hejmara wan ji bo karibin ji nişkê ve bi ser garnîzonê de bigirin bes e, berê xwe dayê. Xorrem li gundekî ewle veşartibû. Hayê Xorrem ji vê hewldana wî tine bû û rîskeke mezin bû.

Hoşeng ji nav hevalên xwe yên gundî, 8 kesên herî yeman derxistin, ew birin cihekî li derveyî bajêr, nav daran. Her çiqasî mîna wî perwerdeya şervaniyê nedîtibin jî wêrekiya wan a şerkirinê û hêrseke mezin a dijmin bi wan re hebû.

Ji bo rizgarkirina Şîrînê xwe nedan benda êvarê. Destan duh çûbû û nikarîbû alîkarî beriya êvarî bianiya. Dibe ku êvarî jî negihiştana, heta roja sêyemîn jî bimaya.

Ji ber vê yekê, çawa li hev civiyan, planek çêkirin. Dîwarê kelha garnîzonê bilind bû û li ser wê li nêzî hev nobedar hebûn. Diviyabû ji derî biketanayê. Tenê karîbûna derî bidana vekirin bes bû.

Bêyî zêde bimînin, berê xwe dan kelheyê.

Nobedarekî got siwarek hatiye û dixwaze fermandar bibîne.

Cîgirê fermandar ji zereqeya derî axivî:

-Tu kî yî, çima hatî, çi ji fermandar re bibêjî?

-Divê ez fermandar bibînim. Tiştekî girîng heye.

-Tu yê çi bibêjî, ji min re bêjî.

-Ji fermandar re bibêjî, bila min bixe hundir, jiyana min ketiye xeteriyê, min têkildarî Xorremê agahî aniye. Îşev wê êrîşî kelheyê bikin.

Dema ku navê Xorremê bihîst û dît tenê yek kes e, bêyî hayê fermandar çêbike derî vekir. Çawa derî vebû, 9 şervan ketin nav kelheyê.

Cîgirê fermandar û eskerên li balê reviyan kelheya hundirîn. Çend eskerên derketin pêşiya wan dan ber şûran û xwe gihandin kelheya hundir.

Li vir pir zêde wextê wan neçû, lezûbez bi dîwarê kelha hundir rapelikîn û deriyê wê vekirin. Lê dema derbasî kelheya hundir bûn, ji ser dîwarên kelheyê bi dehan eskeran berê tîran dabûn wan. Pergala parastina hundirîn a kelheyê wisa bû û ji ber ku bi vê nîzanîbûn ketibûn kemînê.

Fermandar ji ser dîwarên hember ji wan xwest şûrên xwe deynin.

Li dora xwe dinêrîn, yekî jî şûrê xwe danenî. Bi dehan tîr li şervanekî ketin, ket erdê û şûrê ji destê wî ket ser zemîna kevir û deng derxist.

Dixwestin wan bi saxî bigirin. Fermandar dîsa qîr da:

-Şûrê xwe deynin!

Ti kesî şûr danenî. Tîr li şervanekî din jî barandin. Ew jî mîna yê beriya xwe ket erdê.

Hoşeng li çareyekê digeriya. Heger karîbûna xwe bigihandana wî fermandarî, dikarîbû esker bêbandor bikirana.

Heger tiştek nekirana, wê yek bi yek hemû bihatana kuştin. Heke hewl bidana tiştekî bikin, wê hemû di carekê de bi tîran bihatana kuştin. Ti tiştekî ku karibin wekî mertalê bi kar bînin jî tine bû.

Hoşeng baweriya xwe bi çipikbûn û leza xwe tanî.

Eskeran kevanê xwe kişandibûn û dikira berdana. Fermandar destê xwe rakir hewayê. Ev destê ku emrê kuştinê bû, heta daketana lazim bû Hoşeng bi lez bi dîwar rapelikiyana. Heke nikarîbûna bike wê bihatana kuştin. Di serê wî de ne mirin, Şîrîn hebû. Ne ji ber tîrên bi ser de bibarin, zêdetir ji ber ku xwe negihandibû Şîrîn xemgîn bibû.

Di wê kêliya pir hesas de ji deriyê kelheyê dengekî gumîniyê hat.

Bi ser eskerên şaşwaz de tîr bariyan.

Mûcîzeyek pêk dihat. Hoşeng û hevalên wî bêyî binêrin kî hatine alîkariyê, dest bi êrîşê kirin. Hoşeng pê li niçikên dîwar dikir û bi lez pê rapelikî. Hê fermandar fêm nekir çi qewimiye, ket erdê.

Yên din jî ji dirêncekên kevir derketin. Gaveke din wê pê bihesiyana kî hatine alîkariyê.

Şervanên Kewyarê bi pêşengiya Kevî xwe gihandibûn wan. Di nav wan de Xorrem û Destan jî hebûn. Dema ku Hoşeng ji nişkê ve winda bibû, Xorremê mesele fêm kiribû û tedbîrên xwe girtibûn.

Hoşeng heta wê rojê digot qey hemû tevna têkilî û îrtîbata Xorremê tenê ji aliya wan ve pêş dikeve. Lê dema ev rewş dît, ecêb mabû. Xorremê têkiliyên xwe yên veşartî xistibû dewrê û wisa lê kiribû ku bi lez û bez hêza Kewyaran gihandibû bajêr.

Li vir taybetmendiyeke din jî dîtin: Xorremê şûr bi kar tanî! Diyar dibû pir zêde ew nas nekiribûn.

Bêtirs ketibû nava eskeran, şûrên dihatin ser wê bi laşê xwe yê vezelokî vala derdixist.

Di dest wê de şûrekî kurt û zirav hebû. Neqşên wê yên nazenîn diyar dikirin ku ev şûrekî taybet e.

Mîna di nav zeviyê genim re dibihurî, ji nav eskeran bi rehetî derbas bû, ew birîndar dikir û dixist erdê.

Xalê Kevî jî tê de, şervanên xort ên Kewyaran cara yekem wê rojê fêm kirin ku Xorrem xwedî behreyên wisa yên şervantiyê ye. Tevî behreyên şervantiyê jî Xorremê her tim hêza fikrê derdixist pêş. Ha niha, li cihê şer pêwîst dikir jî Xorremê şer dikir. Herî zêde jî keyfa şagirtên wê ji vê rewşê re hatibû.

Dema ku şervanan egîdiya wê dîtin, bi cesareteke mezintir êrîş kirin û di demek kurt de kelhe bi dest xistin.

Diviyabû li vir bi sedan esker hebûna, lê niha hejmara wan bi qasî 50 kesî bû. Fêm kirin piraniya eskeran li derve ne. Beriya ku ew jî vegeriyana diviyabû derketana.

Destan û Hoşeng deriyê zindanê şkandin û ketin hundir.

Ji korîdorên bêhna xwînê jê dihatin derbas bûn. Find pêxistin û yek bi yek hucre kontrol kirin. Girtî serbest berdan. Di nav wan de Şîrîn tine bû.

Dema derketin derve, ferq kirin ku kûleyeke din heye, li cihekî kor e, girtî ye. Ketin wir û bi ronahiya meşaleyê Şîrîn dîtin. Tarîfa hestên wisa ku di carekê de pêk tên bi rehetî nabe. Lê wisa lez

hereket dikirin, nedihiştin hest karibin xwe diyar bikin. Ew jî bi xwe re girtin û birin.

Xorrem, Şîrîn hembêz kir û jê lêborîn xwest. Şîrîn jî bi rêzdarî xwe xwar kir û got qebehet a wê bi xwe ye û lêborîn xwest. Piştî vê axaftina kurt, gotinek jî nekirin.

Diviyabû bi lez ew kelhe biterikandana. Eskerên li derve dikarîbûn vegeriyana. Heger bi wan re hevrû bibana, serketina wan a îro dikarîbû berhewa bibûna. Bi lez derketin derve. Herî dawî girtiyekî qop derket. Dema gihişt ber derî, bang li şervanan kir. Destpêkê minetdariya xwe anî ziman û dûvre got li qatê jêrê yê zindanê kalekî din heye.

Her çiqasî Kevî got wextê wan tine ye jî, ruxmî derketibûn derve, dîsa vegeriyan û berê xwe dan zindanê. Kevî, bi salan di zindanê de mabû. Di vê kêliya tijî rîsk de jî bêyî bizane kî ye, nexwest ti kesî li pey xwe bihêlin.

Ji bo ku eskerên birîndar zirarê nedênê, bi îşareta Destan du şervan li pey wî çûn. Li ba Kevî hewşên kelheyê derbas kirin û daketin qatê jêr ê zindanê.

Dema ku dereng man, Destan vegeriya hewşê. Çawa vegeriya, eskerekî birîndar tîr avêtê. Ji ber tîra ku gihiştibû heta pişika wî, ji devê Destan xwîn hat.

Yên daketibûn qatê jêrê yê zindanê, kalek dîtin; bi îfadeyeke rasttir, mîna ku xeyaletek dîtibûn. Por û riha wî ketibû nav hev, ji noqê û şûn de tazî û her derê wî birîn, reş û şîn bûye. Dema ku kalê birîndar serê xwe rakir, Kevî li cihê xwe matmayî bû. Ji bo bawer bibe bê kî ye, li ser milên wî li şopên şewatê mêze kir.

Mûcîzeyên efsanewî diqewimîn. Lê tiştekî wisa qet nedihat bîra wî. Li beramberî wî jiyaneke winda dîsa berçav bibû: Qade!

Bêyî ji hev têr bibin, wî jî girtin ba xwe û bi lez derketin. Li hewşê dema ku Destan di nava xwînê de dît, dinyaya Kevî xera bû. Qîrînî pê ket û bala kesên ku ji kelheyê derketibûn kişand. Xorrem û yên li balê vegeriyan. Beriya Qade, di nava xwînê de Destan dîtin. Li erdê dirêj bibû. Şûrê Xorremê ji dest ket. Li ber serî rûnişt. Qirika wî ji ber xwîna ji devê wî diherikî sor bibû. Destê xwe da ser qirikê. Lêvên wê cirifîn. Kelegirî bû. Kevî ji milên wê girt û rakir. Cara dawî bi xwe kontrol kir. Ji bo karibe nîşaneyeke saxbûnê ji Destan bigire, bîranînên wî anîn ber çavên xwe. Mîna ku dixwest ji bîranînên wî

enerjiyeke jiyanê çêbike û hêzê bide Destan. Çi kir jî nebû. Hevalên wî ji dest û lingên Destan girtin û ber bi deriyê kelheyê ve birin.

Xorremê bavê xwe dît, lê got qey xeyal e. Pişta xwe dayê û ber bi derî ve meşiya.

Heta gihiştin gundekî ewle, qet nesekinîn. Li gund careke din bavê xwe dît. Dîsa got qey xeyal e. Ji ber xemgîniya Destan rastiya li beramberî xwe nedidît. Vê carê Qade çû balê û bi destê wê girt. Xorrem wê çaxê mesele fêm kir. Bavê xwe hembêz kir.

Di heman kêliyê de hem keyfxweşiyeke mezin hem jî êşeke mezin dîtibû. Berdêlê ji bo Şîrînê dabû ber çavê xwe, Xorrem gihandibû bavê wê, lê bibû sebeb hevalê xwe yê fermandarê herî mezin li ser vê rêyê bike.

Gundiyan dema li ser pişta hespê cenazeyê Destan dîtin giriyan. Ji ber qîrewîrên jinên gund, cara yekem ji çavên Kevî rondik bariyan. Şervanên ciwan ên ku Kevî di vî halî de dîtin jî xwe negirtin. Li ser vê rewşê Xorrem ji bo gundiyan axaftineke kurt kir. Got yên di şer de mirine, nemir in. Qîrewîran cihê xwe ji bo îskîngê hiştibûn.

Ciwanên gund ji bo şervanan sifre danîn. Ti kesî dest neda xwarinê. Dema xwarin jî nexwarin, pêwîstî nedîtin pir zêde li wir jî bimînin û ketin rê.

Ji bilî întixarê, sebeba mirinê çi dibe bila bibe, wekî çanda qebîleyê miriyên xwe dibirin zinarê ku jê re “Şkêrê Pîroz” digotin. Ruhê miriyan li wir azad dibû.

Cenazeyê Destan li ser hespekê girê dabûn û wê heta wir bibirana. Piştî demekê, hespê serê xwe virde wêde hejand û dengên bêaramî derxistin. Vê rewşê bala Kevî kişand. Ji bo ku fêm bike çima wisa li hespê hatiye, xwe nêz kir. Dît ku ji devê Destan xwîna taze diherike. Bi heyecan bang li şervanan kir. Destan daxistin. Kevî xwe xwar kir ser wî. Di wê kêliyê de di serî de Xorrem, yên din jî ji hespên xwe daketin û bi meraq li dorê kom bûn. Destan nefes digirt!

Kevî dema fêm kir destan hilmê digire, demildest av xwest. Hemû keyfxweş bibûn. Birîna wî paqij kirin û pêçan. Destan hê jî ne li ser hişê xwe bû.

Kevî, digot qey Destan miriye, lewma pir diqeherî. Niha jî ji bo başkirina wî wê her tişt bikirana. Bi tecrûbeyên ji çiya girtî, gelek birînên xedar baş kiribûn.

Sebeba mirinê çi dibe bila bibe, çandek qebîleyê hebû, rojekê miriyê xwe dihiştin, binax nedikirin. Ji bo ku ruh serbest bimana,

wisa wext didanê. Gelek kesên ku gotibûn miriye, di heman rojê de dîtibûn bi ser xwe ve hatiye.

Keviyê çiyayî li şervanên xwe yên keyfxweş nêrî. Yek bi yek li wan mêze kir û pîroz kir.

Gûrûra ji nû ve bidestxistina onûra şervantiyê ji çavên wî diyar dibûn. Wekî berê dîsa li ba şervanên xwe bû. Destan ji mirinê vegeriyabû. Qade, Şîrîn û cengeke mezin qezenc kiribûn. Dizanîbû, wê qraliyetê bersiveke pir hişk bidana vê, lê hêjayî vê bû. Kevneşopiyê dewam dikir. Ya girîng ev bû.

## Te Got Egîd Divê Her Tim Ji Bo Şer Amade Be!

Heke ku ji devê cinawir jiyanek dikarîbûna bihatana xelaskirin, wê çaxê xistina wî cinawirî jî mimkun bû. Heger cinawirek birîndar bihatana hiştin, ya herî xeter ew bû.

"Hêza te hebe tu yê hilweşînî! Heke tu negihiştibe wê hêzê, tu yê her tim derban lê bidî, her tim di nava kul û birînan de bihêlî, bi demê re tu yê xurt bibî û ew ê zeîf bibe." Kevî dema ku ev gotin ji devê dayika xwe dibihîst hê nebibû bîst salî. Piştî rizgarkirina Şîrînê dizanîbû wê bi awayekî cidî ew û dewlet werin rûyê hev. Ji bo ku amadekariyên xwe bikin wextê wan hebû. Xwezayê ev camêrî li wan dikir.

Zivistan zû hatibû. Piştî payizeke bêbaran, zivistaneke tijî berf dest pê kiribû.

Gelê bajêr ji bo zivistanê ne amade bû. Amadekariyên êzing, cil, xwarinê dewam dikirin. Berf ji bo zarokan bibû mîna cejnê, lê mezin ketibûn nav panîkê.

Ji bo ku li bajar dîmenekî îsyanê nedin, ew der lez terikandibûn û şopên xwe dabûn windakirin.

Tevî vê jî eskerên ji artêşa qraliyetê hatibûn, şîrê çilitiyê di pozê gel re derdixistin. Wexta berfê zêde lê kir, esker jî ji kelheyê derneketin. Vê rewşê keyfa gel anî. Zeman û berf, gelo wê karîbûna ser xatirayên xwînî bigirtana, nediyar bû.

Bi hev re vegeriyan gundê Kewyaran û tedbîrên parastinê di ber çavan re derbas kirin, ji bo şerekî mezin xwe amade kirin.

Kevî pesnê wêrekiya Hoşeng da, lê dûvre gotê ji ber ku amadekariyeke baştir nekiriye û çûye şer, ev jî nîşan dide dilinî ye. Ruxmî her tiştî jî Hoşeng lêborîna xwe xwest. Perwerdeya şervantiya 6 hevalên xwe yên sax girt ser xwe. Heft kesan bi hev re berpirsiyariya dermankirin û mêzekirina Destan jî li xwe girtin. Destan hê nehatibû ser xwe. Şiûra wî girtî bû.

Şîrînê dema ku firsend dît, careke din Hoşeng hembêz kir, spas kir, lê Hoşeng tenê bi rûyê xwe yê sorbûyî, bi awayekî şermoke li ber xwe nêrî. Şîrînê ew wisa hembêz kiribû, deng ji hestiyên wî hatibûn. Dema bi tenê ma jî ferq kir ku hestiyê pişta wî hê jî diêşe. Destên xwe wekî baskê pinpinîkan li hev da, keyfxweşiya xwe ji çiya-

keviran re got, bi hespan re peyivî, ji agir re got, di şevên bêxew de ji stêrkan re got.

Guhertina Hoşeng bala hemû gundiyan kişandibû. Piştî wê rojê êdî digotin ew û Şîrîn dikarin bibin malbatek.

Kevî jî dihizirî ku behreyên wî yên şer tên ceribandin û keyfxweş dibû. Her wiha, tiştên hatibûn serê Mazdek, Şêrdil û hevrêyên din, nehatibû serê Qade û Şîrîn. Gotibû êdî ew bextewer e, bimire jî xemê naxwe. Bi rizgarkirina wan, kêmekî jî be ji kesera dilê xwe dûr ketibû.

Eskerên Xusrew ji bo ku karibin xwe bigihînin Xorremê dixwestin Şîrîn wekî êm bi kar bînin. Bi saya vê hemleyê ew sax û silamet xelas kiribûn.

Qade jî di bin êşkenceyên giran de mabû, peritîbû. Dîsa jî dema bavê xwe sax dîtibû, besî Xorremê kiribû.

Dema gihiştin gund, mîna ku Qade di kêliyên dawî yên jiyana xwe de wesiyet û şîretên xwe li her kesî dikir. Bêriya axaftinê kiribû.

Li gund wekî qehremanekî mezin hatibû pêşwazîkirin. Her kesekî guhdarî şîretên wî dikirin. Her tim pesnê wî dihatin dayîn, li ser vê rojekê şervanên ciwan kom kirin û têkildarî egîdiyê ji wan re axaftineke ku wê careke din ji bîr nekin kir:

-Yê ku te jê re got egîd, her tim ji şer re amade ye. Dema dijmin hat ber derî, têra pêşwazîkirina dijmin hêza wî heye. Dema derkeve û biçe, çavê wî li pey wî namîne.

Ji dilê ku firtoneyan disekinîne, ti bayê dudiliyê derbas nabe.

Ne ku di nav agirê ejderhayan de hatiye şuştin, ne li ser pişta şêran siwar bûye û hatiye. Egîdiya wî ji mirovbûnê, mirovahiyê tê, tenê ji mirovahiyê!

Yê te got egîd ne çiya dida pişta xwe ne jî behran diqelêşe. Na! Ne ewqasî hêsan e, yê te got egîd, dizane xwe hilgire!

Rojekê dibe çavê qertelê ku ji çiya ber bi zozanan difire, rojekê dibe pira moriyeke ku dixwaze ji çemekî biçûk derbas bibe. Lazim be li kû be, tevî ku beriya cismê wî bigihêje wir jî, lê qet nakeve bin siya nav û dengê xwe.

Yê te got egîd, ne li kirinên xwe dinêre, wê çi bike, çav berdide wê. Ya dibêjin nabe pêk tîne, ya pêk tê jî tine nahesibîne. Çiqasî egîd dibe bila bibe, egîdiya wan kesên ku dikevin ser xakê li xwe dipêçe; ne xwe, wan egîd dihesibîne.

Sed mixabin, qubeqaz (qû) hema beriya bimirin bi dengê xwe yê herî xweş stranên xwe yên herî xweş dibêjin; beybûn piştî tên jêkirin bêhna xwe ya herî xweş didin, pinpinîk piştî ku cihên xwe yên ewle parçe kirin û derketin, rengên xwe yên herî xweş digirin. Di jiyanê de zanîna qîmetê jî egîdî ye.

Egîd ne bi temenê xwe, bi kirinên xwe tê bibîranîn. Kirinên xwe ne ji bo were bîranîn dike, xwe nade benda bedelekî. Çiqasî egîd dibe bila bibe xwe mezin nake. Dizane, kesên ku rojekê bi radeya qehremaniyê xwe mezin kirine, roja din xeleka îxanetê xistine stûyê xwe. Ji bo wan kesên ku pesnê egîdiya wî didin dibêje, "Di dawiyê de wê diyar bibe! Herî Dawî!"

Herî dawî, gote wan li şûna pesnê wî bidin divê xwe ji bo şer baş amade bikin.

Ji ber ku dostê wî yê berê bibû mamosteyê hemû gundiyan, keyfa Kevî dihat. Wî jî karê başkirina Destanî dabû ber xwe.

Xorrem jî her kû fêr dibû bavê wê, yê digot qey baş nas dike, tijî sir û raz in, zêdetir meraq dikir û di her firsendê de jê dixwest behsa sirên xwe bike.

Qade digot êdî wext hatiye hemû sirên xwe ji Xorremê re bibêje. Ewil diviyabû jê re bigotana ku di dema îsyanê de Perwa hatiye kuştin.

Fikirî, wê çawa ji Xorrem re bigotana. Dûvre rojekê li balê rûnişt û mijar gerand, herî dawî anî ser vir. Jê re got Perwa di dema îsyanê de çawa hatiye kuştin, dewam kir:

-Ji zarokatiyê ve gelek bîranînên te pê re çêbûn, lê ez dizanim, te di dema wê de nikarîbû mane bidana hin xatirayan. Gelek pirsên te hebûn, her ku te dipirsîn min nedixwest bibersivînim. Eşkere ye, ka rewşa welatê me çi ye, em li cihekî çawa dijîn. Wisa nebûna, hewldanên min ên ji bo parastina te wê pûç derketana. Hêvîdar im tu yê min fêm bikî û efû bikî.

Yek ji van bûyeran dîsa têkildarî Perwa bû.

-Kuçikê Delegur ê li orta sûkê hat kuştin tê bîra te? Helbet tê bîra te!

-Erê, ew roj qet ji bîra min neçûye.

-Wê rojê serê zilamekî ciwan hat jêkirin, esas te ew û yê din jî nas dikirin.

Xorrem şaşwaz bû. Ewil nikarîbû bersiv bidana. Demekê wisa kûr û dûr çibû. Dûvre got:

-Qey Perwa gote te wê rojê çi qewimiye û ew kî ne?
-Na, na. Jixwe ji destpêkê ve hayê min ji her tiştî hebû.
-Bawer nakim! Te ewqas sal ji min veşart? Çima te behsê nekir?
-Te çima behsê nekiribe, min jî ji heman sebebî behsê nekir. Dema ku me soz dida, em li ser nedipeyivîn.
Wê çaxê, Perwa şagirtê Awyerê Çiyayî bû, dixwest qezenc bike. Wê rojê alîkarî da kuştina Delegur û wê Perwa bixista rêyeke nû ya jiyanê. Hayê wî jê hebû, tu yê jî li wir bûya.
Jixwe te jî dizanî, yên hatibûn wir Awyerê Çiyayî û hevalekî wî yê ciwan bû. Herdu li sûkê ketin nav zilamên Delegur û şer kirin. We herduyan jî li çeperê derve ew parastine.
Dema soz tê dayîn sir nayên gotin.
Dema tu vegeriyabû malê te behsa rêwîtiya xwe ya çiyê kiribû, te gotibû we dostê çiyayî yê Perwa nedîtiye. Ev jî rast bû. Lê te tiştekî din jî nizanîbû.
Heman rojê min bi xwe birînên wî dostî pêçan. Ruxmî ku hûn heta çiyê li pey çûn jî we ew nedîtibû. Jixwe ne mimkun bû hûn bibînin. Ji ber ku wê rojê li mala me bû. Tevî tu vegeriyabû malê jî te ew nedît. Min li odeya xwe veşartibû. Roja din bi alîkariya Perwa me bir cihekî ewle, ba dostekî.
Xorrem di nava hestên tevlîhev de bi dest bavê xwe girt. Destên kalbûyî xistin nav destên xwe û maç kirin.
-Piştre çi bû? Ez dixwazim bizanim çi hat serê wan.
-Dema zewaca we bêîmkan bû, Awyer jî Perwa girte ba xwe û kir murîdekî terîqeta şervanan. Ne Kewyaran bûn, lê dostaniya wan hebû.
Qade behsa hemû detayên dizanî kir.
Xorremê ewqasî ji Perwa hez kiribû ku li ba wî di kuştina zalimekî de cih girtibû.
Ji ber ku bavê wê sirekî herî mezin ê jiyana wê dizanî, gelo diviyabû şaşwaz bibûna, yan jî ruxmî ku Awyer li mala wan bi xwe bû hayê wê jê tine bû, yan jî pêşengiya Perwa ya ji bo raperînê? Bila ji bo kîjanê şaşwaz nebûna?
Tiştên bihîstin dilê wê êşandin…

Awyer, Perwa tevlî terîqetê kiribû. Ruxmî vê jî ji ber ku Xorrem nedidît û serî li ber zexta malbata xwe tewandibû, her tim poşman bû.

Ji ber vê yekê her tim gotibû wê ti carî xwe efû neke, rojekê teqez ji ber vê mijarê derkeve pêşberî Xorremê û efûyê ji bixwaze.

Hesreta dîtina Xorremê ti carî nedabû aliyekî, lê ewil hesabekî mabû hel kiribû. Heyfa neheqiya li wan hatibû kirin ji pismamê xwe rakiribû, ew zimanê wî yê tûj û qirêj dabû ber xençera xwe.

Dûvre jî ji bo ku xwe bigihîne Xorremê hewl dabû. Lê dema fêr bibû bi Mazdek re zewicî ye, dawî li vê lêgerîna xwe anîbû.

Li ser vê destûr ji terîqetê girtibû û rêvebirina îsyanê girtibû ser xwe. Heta mirinê jî ji bilî îsyanê bi tiştekî din mijûl nebibû.

Qade, bi xebereke hêvîdar qiseyên xwe temam kirin:

-Îcar Awyer. Tê gotin ew hê li Çiyayên Med dijî. Gotineke wî hebû, tim û tim digot, “Çiyayî namirin”. Di nava gelê çiyayî de ev gotin belav bibû. Tê bawerkirin ew li çiyê dijî û wê rojekê ji bo tolhildanê vegere; Ji bo tolhildana Mazdek!

Xorrem, ji ber ku piştî demeke dirêj bi van hesiya, hem xemgîn bû hem jî keyfxweş. Dilê wê bi Perwa şewitî. Egîdiya wî bi bîr anî. Navê wî li zarokekî gund kir.

Ti bedel vala nediçûn. Her bedelekî di hafizaya gel de şopên jê naçe dihişt.

Barekî giran ji ser Qade rabibû, rehet bibû. Tenê sirek mabû, diviyabû parve bike. Lê bêyî destûra Kevî qet parve nedikir. Nikarîbû pê li vê soza daye Kevî û dayika wî bike. Heger Kevî bixwestana wê wekî sir nemana.

## Nivîsa Li Ser Xençerê!

Ji dema ku gihiştine gundê Kewyaran her roj Xorremê diçû Destan didît, ji destê wî digirt û ji bo baş bibe bi dengê bilind dua dikirin.

Destan di orta zivistanê de ket tayê, germahiya laşê wî zêde bû, çavê xwe vekirin. Li gund hewayeke cejnê çêbû. Ji ber birînê bi zorê bêhn dida û disteng. Zêde mimkun xuya nedikir bi temamî rehet bibe. Dîsa jî ji ber sax bû her kes keyfxweş bibû.

Destan dixwest di firsenda yekem de bi Xorrem re tenê bimîne û pê re biaxive. Lê qet firsendeke wisa nedît. Li gund her tim amadekariyên şer hebûn. Ji ber ku tevlî van amadekariyan nedibû, xemgîn bû. Kengî bixwesta biçûna ba şervanan, piştî çend gavan bêhna wî diçikiya û di cih de diket.

Xorrem jî ti carî Şîrîn ji cem xwe qut nedikir, di nava jinan de diman, bi wan re mijûl dibû, ji bilî dîtina Destan hema hema nediçû nav zilaman. Hemû emrê xwe di ber çavên xwe re derbas dikir, her kêliya xwe ji jinan re digot, li kû şaşî kirine dinirxand, başî û hêvî li kû û çawa mezin kirine jî bi hev re şîrove dikirin.

Jinên gund jî ji Xorremê re digotin wê bûyerên ji vana girîngtir û mezintir bibîne û wisa hewl didan hêzê bidinê.

Hisa li ba wan xurt bû. Jinên Kewyaran dema ku têkildarî siberojê pêşdîtinên xwe îfade dikirin, ewil ne bi gotinan, bi nêzîkatiyên xwe diyar dikirin. Bi hezkirin û rêzdariyeke wisa mezin nêzî Xorremê dibûn ku heçkû li beramberî wan xwedawendek hebû. Her tim di nava xemgîniyê de jê re digotin, “divê tu amade bî, tu yê biçî deverên dûr!”

Rojekê keçeke ji wan keçên ku li ba dara zeqûmê pê re axivîbû, behsa bûyerekê kir. Zilamekî gund di meseleyeke biçûk de li naverastê tenê ji ber ku jin e, heqaret lê kiribûn. Li ser vê bûyerê, jin li hev kom kiribûn û gotibû:

“Zilamek, jinekê tenê ji ber ku jin e, sûcdar bike, ev tê maneya hemû jinan sûcdar dike. Divê em li dijî vê rabin!”

Û wisa ew zilam li derveyî civatan hiştine, li gund yek jî pê re nepeyiviye, bi demê re wisa lê kirine ku lêborînê bixwaze.

Dema ku Xorrem bi vê hesiya, got ti hêz nikare bi jinan. Şervan bûn, efsane bûn, lê berê têkildarî jinê fikreke wisa di ber serê wan re

jî derbas nedibû. Ji ber ku pêşketineke wanî mezin çêkiribûn, Xorrem bandor bibû.

Li vî gundî xwestibû bi sohbetên xwe guhertinê çêbike, lê bi xwe jî pir guherîbû. Tevî destûra “em nakujin!” jî bi temamî qeneh bibû ku di vî halê şer de xwe biparêzin. Carina ji xwe dipirsî:

“Gelo ez tevlî Kewyaran bûme, yan ew tevlî min bûne?”

Fikirî, ji kû derê xwe gihandiye kû derê. Bêyî şer ma çawa dikarîbû civakê biparêze? Dema çû serdana Destan, encamên ku têkildarî şer pê re çêbûne gotê:

“Ew me naxin şûna însanan. Beşek ji gel jî dibêje berxwedan vala ye, wê dawiya me jî wekî Mazdek bibe. Halbûkî dawiya wê mirin jî be şerê zaliman kirin pêwîstiyeke mirovbûnê ye. Mirovbûn, mirov mayîn, şer pêwîst dike. Her kes wekî însan tê dinyayê, lê her kes wekî însan namire!”

Helbet armanceke wê hebû. Mezinbûna armanca wê berxwedêriya wê zêde dikir. Nîzama zilmê ya bi hezaran salan hatibû avakirin, baş nas dikir. Dinya jî wê di carekê de ji vê zilmê rizgar nebûna. Lê wê her tim berxwedêr derketana.

Wisa difikirî;“Tovên me çandî bûn şitil, bûn dar. Reh berdan, êdî ti hêz nikare van kokan hil bike!” Lê, wê piştre çi bikirana? Di nav van fikran de raza.

Serê sibê bi dengê dîkan şiyar bû, dengê Hoşeng bihîst, qîr dikir û digot çiya, kevir her der tijî esker bûne û ber bi wan ve tên.

Şîrîn jî piştî wê derket. Dayika Hoşeng a ku Xorrem li balê dima, beriya her kesî li ber derî bû.

Li her cihekî bezekê dest pê kiribû. Şervan li meydanê kom bûn. Guhdarî fermana fermandarên xwe kirin.

Grûbek ji bo parastina Xorremê hate wezîfedarkirin. Komeke din jî ber bi qefên li ser zinarê tîk ê li jor malan rapelikîn. Bi neynûkên xwe ji niçikan girtin û gihiştin jorê. Ketin nav qefan û winda bûn.

Di destê wan de torbe hebûn, ji paç hatibûn çêkirin, bi şirîtên pan hatibûn pêçan û qeyîmkirin. Bi benên qalind baldarî berdan jêrê, dûvre jî bi heman baldariyê daketin.

Xorrem cara yekem wate nedabû wan qefan, vê carê sebeba wê fêm kir. Fêrî siran bibû. Sirên wisa bûn ku yek bi yek bihatana gotin jî nediqediyan…

Di nav torbeyan de maddeyên sotîner hebûn. Danîbûn cihekî ku hem zarok negihêjinê hem jî ji nêm û germahiyê dûr.

Ev madeyên ku wê agirekî geş ji wan derketana, ji tozên madenên zinarên wê herêmê bi dest xistibûn. Dema pê hesiyabûn ew madde dijwar dişewite, kom kiribûn û veşartibûn.

Wextê dişewitî ronahiya wê şibandibûn bedena mirov, germahiya wê şibandibûn ruhê mirov. Ji bo dengê xumîniya vê agirî jî gotibûn "Dengê Xwedê". Îro wê ev Dengê Xwedayî derketana.

Bazdanê dewam dikir. Qade û Kevî bi hev re çûn cem Xorremê. Şervanên ciwan ji bo amadekariyan şandin. Ji Xorrem re gotin dixwazin jê re sirekî xwe yê dawiyê bibêjin.

Herdu kal mîna ku ji kûrahiya dîrokê diaxivîn. Her kes di nava telaşê de dibeziyan, lê mîna ku qet eceleya van tine bû. Hêdî hêdî diştexilîn. Yekî diqedand, yê din didomand. Herî dawî hatin ser wî sirî.

Kevî, ji nav qumçokên vekirî yên jora êlekê xwe destê xwe dirêj kir, ji pexla xwe, xençereke bi destmalê pêçayî derxist. Ev destmala Xorrem a sor neqşkirî bû, dabû Mazdek. Xençer jî xençera Kevî bû, ji dayika wî yadîgar mabû. Xençera li bin Şkêrê Xezalan veşartî!

Xorrem, hestiyar bû, xençer û destmala zer a sor neqşkirî girt.

Qade got ev xençer tekane xatira ye û ji dayika wî Kewyar jê re maye. Jê xwest nivîsa li ser xençerê bixwîne.

Xorrem li herdu rûyên xençerê jî mêze kirin, lê ti nivîs nedîtin.

Kevî got, "destpêkê Mazdek jî nedîtibû." Û jê xwest li destikê xençerê binêre.

Nivîsa biçûk a bi tîpên Aramî hatibû nivîsandin bi zorê xwend: "Xorrema Kewyaranî"

Ji ber ku navê wê li ba Kewyaran hatibû nivîsandin, şaşwaz bibû. Gelo kê dabû nivîsandin?

Qade:

-Dema tu hat dinê, ev nivîs li ser vê xençerê hat nivîsandin. Kesa ku nivîsandiye û navê te yê ronî daniye, Dayika Kewyar bi xwe bû, ji çiyan hat û bûyîna te pîroz kir. Xençer jî wekî diyariya te ya jidayikbûnê dabû.

Piştî mirina Kewyar, min got yadîgara dayika wî ye, min da Kevî. Dema ku ji zindanê derket, wî jî ji cihê veşartî derxistiye û daye Mazdek.

Îro jî li te vedigere, mîna roja tu hatî dinê.

Em û Kewyaran eynî ne!

Kevî lê zêde kir:

-Bavê te Qade, yek ji kevintirîn şervanê Kewyar e. Karên wî kirî ti kesî nekiriye.

Dema lazim bû, karîbû dijminan şaşomaşo bike. Yên digotin ev Xrîstiyan an jî Cihûyekî veşartî ye jî hebûn. Piştî ku mala wî hate şewitandin, rahîb fikirîn ku tirsiyaye, xwe daye paş, lewma ji bo xwe wekî tehdîdeke mezin nedîtin.

Lazim e tu wateyê bidiyê çima ev hemû ji bo te negotine. Bi şeklekî din ne dikarîbû te ne jî şervanên din biparastana.

Li cem me her kes wisa ye. Ji ber ku Kewyaran pir hişk sirên xwe diparêze li ser piyan e.

Niha tu yê li ba heqîqeta me ji vir veqetî. Destan wê li cem te were. Divê tu biçî!

Xorremê bawer nekir ku ew jî Kewyaran e. Çîrok zindî bibû, mîna ku ji asîman ketiye navê his dikir.

Xwedawend Arînna xwestibû di demeke ewqasî kurt de ewqasî zêde sir jê re werin gotin. Dîsa jî ruxmî barê van sirên mezin hêza pê karibe li ser piyan bimîne jî didayê. Xorrem difikirî ku bi şeklekî din ev mûcîze pêk nedihatin.

Nivîsa li ser xençerê careke din xwend. Bi rastî jî navê wê li ser bû.

Li ser destmala wê ya sor neqşkirî jî nivîseke Mazdek hebû. Bi dengekî bilind xwend:

“Serê me ji agirê sor e. Perwane…

Di wê kêliyê de Qade ket navberê, cihê ku dijmin jê tên îşaret kir, îma kir ku zêde wextê wan nemaye û got:

-Jiyaneke bi rûmet li pey xwe hiştin nabe qismetê her kesî. Te ev rûmet da me. Te eniya me gihand stêrkan. Hê bila çi bibe. Niha divê tu biçî, piştî şer em ê li çiyayên me hevdu bibînin!”

Xorrem bi biryardarî got:

-Ev şer şerê min e jî, şerê me hemûyan e. Ez naçim!

Destan li ser hespekê, li cem zarokên dor lê girtine hat heta wir. Gundiyên mayî jî li meydana ber wan kom bibûn. Destan ji hespa xwe daket, got:

-Em amade ne.

Xorremê li zarokan mêze kir:

-Erê, divê tu wan bibî!

-Ez ê tenê neçim, em ê bi hev re biçin!

Di nava vê nîqaşa wan de ji milê “Qeyika Hewayê” xumîniyeke mezin hat. Ev xumînî dişibiya dengê cinawirê binerd, ango xumîniya zelzeleyê. Mîna ku xaka di bin lingên wan de ji cihê xwe lîstibû.

Qade û Kevî ew li wir hiştin û çûn. Xatir nexwestin. Li pey xwe mêze nekirin. Her carê gavên xwe leztir diavêtin û ji ber çavan winda bûn. Xorrem jî wê li pey van şervanên mezin biçûna, lê Destan jê xwest guh bidiyê:

-Şervan wê li dijî artêşa zilmê şer bikin. Ev şerekî rûmetê ye. Lê ji bilî şervanan wê her kes ji gund derkeve. Berevajî, wê hişê şervanan li ser malbatê wan bimîne. Ev jî wê bibe felaketa me. Halbûkî em dikarin vî şerî qezenc bikin.

Felek kengî yeman e? Dema ku şervanek nikaribe wê qebîle, eşîr, hezkiriyên di oxira wan de şer dike biparêze, ha wê çaxê felek yeman e! Niha lazim e ji derveyî şervanan her kes ji gund derkeve!

Dayikeke pîr piştgirî da van gotinên wî:

-Heke ev berpirsiyarî dabin şervanekî mîna Destan, divê her kes li gorî vê tevbigere! Tu neyê ti kes naçe! Ez dayik im, lê dayikatiya te jî ji me re lazim e. Ez dikarim bibim dayika zarokên xwe û qebîleya xwe, lê tu dayika hemû civakê ye, hêviya hemû mirovahiyê ye. Bêyî hêviya xwe jî em naçin ti derê!

Di dema vê nîqaşa kurt de tîrên agir ketin nav gund. Ji hin malan dûman hil bû.

Çi kir nekir, ti kes neçû, di ser de jî hêdî hêdî li dora wê kom bûn.

Ma hemû tevlî şer bibûna, di cihekî vî şerî de cihê xwe bigirtana wê baştir nebûna? Ev fikir di serê wê de çûn û hatin. Li zarokên li dora xwe mêze kirin. Ne bi dilê wê bû ewqas zarok û dayikên pîr di nav vî şerî de bimînin. Halê nexweş ê Destan jî li dilê wê da.

Zêdetir li ber xwe neda. Tevlî wan bû û gundê şewitî li pey xwe hiştin, berê xwe dan derbasoka veşartî.

Xorrem heta ev biryar dabû zehmetî kişandibû. Dizanîbû ji vî şerî sax filitîn zehmet e. Dîsa jî ji bo wê ya hêsan ew bû ku li wir bimaya û tevlî şer bibûna. Ya zor ne mayîna li wir bû, çûyîn bû. Ji bo karibe xwe bigihîne armanca xwe ya mezin diviyabû biçûna, berxwedan berbelav bikirana. Qade bi bîra wê xistibû, heta wê rojê xwe li çi tiştan ragirtibû. Xorrem tevî vê jî îqna nebibû, lê dema ku zarok li dorê kom bibûn, biryar dabû, wê ya zor pêk bianiya.

Dema ku hemû qehreman, dost, şervanên ciwan ên zarokatiya xwe, bavê xwe li pey xwe dihişt, soz dabû wê egîdiya wan bigihîne çiya û ji çiya jî bigihîne hemû civakan.

Dema gihiştin derbasokê, ji ber xatir ji bavê xwe nexwestibû, cara dawî hembêz nekiribû, fikirî. Dema fikra van kir, stêrkên ji çavên wê dihatin xwarê. Ji bilî wê zaroka ku bi destê wê girtiye, ti kesên din nedît…

**Hevrêyên Qelbî**

**Serê me ji agirê sor e**
**Gelê me mîna perwanê dor e**
**Şerê me Xorremiyan e**
**Çiyayî ye rengê me**
**Alaya me bi stêrka sor**

Ji ber ku ji dûranî ve du şervanên Kewyaran dîtibûn, xwîn ketibû çavê eskeran. Dema nêzî mintiqa “Qeyika Hewayê” bûn, ferq nekirin li pêşiya wan kendalek heye. Fêm nekirin herdu şervan di carekê de çawa ji ber çavan winda bûne.

Kendal bi rûberên mezin ên jinan rêsaye, bi giha û nebatan hatibû qepatkirin, “Qeyika Hewayê” jî hatibû rakirin.

Dema ku esker ji nav daristanê digihêjin dûzbûnê, hespên xwe çargavî dibezînin. Li eraziya fireh bi sedan hespî li ba hev dest bi bezê kirin.

Ji rêkên dirêj hatibûn, zinarên çetîn derbas kiribûn. Niha li vê dûzbûnê mîna ku li şêran siwar hatine his dikirin. Hesp jî dema gihiştibû vê dûzbûnê, mîna ku li ser xakê bi bask bibûn, veguherîbûn qertelan.

Li refên pêşiyê nîzama şer a eskeran bi qismî xerab bibû, lê hespên wan ji heybetên xwe yên dikarin fîlên Hindî bitirsînin, ti tiştek winda nekiribûn.

Li hewayê du qertelî baskê xwe vekirîbûn û xwe berdabûn.

Ruxmî ku şervanên dişopandin winda bibûn jî wan hê hespên xwe dibezandin.

Dema nêzî kendalê kamûflekirî bûn, hespên wan cirnexweş bûn; eskeran ferq kirin cihê li pêşiya wan tê û diçe, lê êdî dereng bû.

Hemû eskerên li pêşiyê tevî hespên xwe di kendal de werbûn. Piraniya yên ji piştê hatî jî yên li pêşiya xwe şopandin.

Di carekê de bi sedan esker li binê kendal ketibûn.

Firsend nedan xwe komî ser hev bikin, tozên sotîner ên ku tevlî giha kiribûn û li erdê belav kiribûn, hewl dan bişewitînin. Ji bo vê tîra yekem a agir şandin. Lê heyecana wan li hewa ma; bayê biharê ji nişkê ve berê xwe da milê wan û tîrên agir nikarîbûn kendal derbas bikirana. Beriya ba dijwartir bibe, dîsa ceribandin, dîsa temirî. Dema ku tîrên wan bêagir ketin xwarê, eskeran gotin ev di vî karê tîr û kevanê de acemî ne.

Bi xwe jî bi heman şeklî bi tîrên agir bersiv dan. Hin ji van tîran heta nava gund çûn û li gund bû sebeba şewatê.

Dema dûmanên hilbûyî dîtin keyfxweş bûn, halanê zaferê hildan. Hayê wan ne ji wan gihayê ber lingê wan ne jî şewata gaveke din hebû.

Dema ku îstîqameta ba neguherî, li hemberî vî bayî vê carê şervanê ciwan Hoşeng ket tevgerê. Kindirek li noqa xwe gerand û xwe ji kendal berda jêr, li tehtên milê din ket. Bi leza lêketinê fêm kir parsûyên wî şkestine. Demekê bêtevger li cihê xwe ma. Di girtina nefesê de zehmetî dikşandin. Girêka kindirê vekir, hinekî bêhna xwe da û dema hat ser xwe, berê xwe da hedefa xwe.

Dema ku bi zinaran radipelikî, hevrêyên wî ji bo ku bala eskeran bikşînin ser xwe, ji pişt kevirên ku wekî çeper bi kar tanîn, derketin.

Dema ku Hoşeng derket ser dûzbûniya kendêl, ji milê din dengê tîlîliyê berz bû. Dil dicirifandin. Tîlîliyeke dirêj bû. Mîna halaneke şer, nîşaneyeke cesaretdayînê, qîreke raperînê bi coş bû. Dema ku eskerên Xusrew vî dengê ku jê re “hêlhêle” digotin û her tim jê ditirsiyan, bihîstin, fêm kirin li dijî wan şervanên jin jî hene. Di nav wan de teredut çêbû.

Şervanan fêm kirin esker şaşwaz bûne, berê tîrên xwe dan wan û barandin. Hoşeng vê barana tîran ya ji valahiya kendal dadiket bi kar anî û agir pêxist.

Çend eskerên ku ew dîtin berê hespên xwe dan wî. Tîreke li lingê Hoşeng jî ketibû. Kuliya, ket û rabû, lê dûvre tîreke din jî hat, yeka din û piştre di nava agir de windabû û çû.

Hoşeng gihiştibû hedefa xwe. Agir bi lez belav dibû, teqîn çêbûn; dengekî wisa tirsnak ê gurmîniyê jê hat, eskeran di emrê xwe de ne

dîtibûn û ne jî bihîstibûn. Qîrîna esker û orîna hespên ku ketin nav vî agirî tevlî nav vî dengê gurmîniyê bû.

Hespên mabûn di nav şewatê de, nizanîbûn biçin kû derê. Tevî ku şewat ber bi kendal ve fireh dibû, hinan berê xwe dan kendal û tevî siwarê xwe ketin xwarê. Hinan siwarên xwe ji pişta xwe avêtin û ji kû hatibin beziyan wir. Zirxên hesin ên eskeran neheliya, lê di nav de wekî masiyan pijiyan. Dema ku hewl dan ji ser xwe biavêjin jî destê wan şewitîn. Yên mirî, yên birîndar wisa wisa qismeke din a artêşê jî telifî.

39 şervanên li beramberî kendal temaşeyî kendal dikirin û bi qehremaniya hevrêyên xwe Hoşeng serbilind bûn.

Şîrîn ji nav wan qîjewîjên şer hemûyî tîlîliyek berz kir. Vê qîrê jan dida dilê mirov. Îfadeya hezkirina wê bû. Tîlîliyeke întiqamê bû. Melodiyeke oxirkirina egîdekî bû.

Li ser gomlekê dirêj û spî, êlegekî xemrî û li ser neqşên sor heyî li xwe kiribû, li noqa xwe jî kembereke ji hevrişma zer hatibû hûnandin girê dabû. Jêrî çoka koşê wê yê spî ku wekî dirêjahiyeke gomlekê wê yê spî xuya dikir, şelwerê wê yê zer û goreyên wê yên hirî dibiriqîn. Benporka sor a li ser eniyê, ji milê din ê kendal jî xuya dikir. Diyariya Hoşeng bû. Dema ku hezkirina xwe cara yekemîn ji hev re gotibûn, dabûyê.

Hoşengê ku bêtirs ketibû nav agir, mîna bazan dikarîbû bêyî çavê xwe biniqîne li tavê binêre, li cem ferîşteyên baskagir bi rê kir. Wê çaxê stêrkên çavên xwe kontrol nekirin. Belekên tirincî yên li ser gepên wê şil bûn. Cara dawî tîlîliyeke dirêj û bi êş ji dilê xwe berda û hevrêyê xwe oxir kir.

Yên ji wir sax filitîn, vekişiyan, ketin ser rêya di bin dolê re tê. Demekê li wir man û dûvre êrîş kirin. Vê carê gund li jor mabû, esker jî li jêr.

Çirava hema li jêrî gund jî mîna li kendal kiribûn, bi giha, çiloyan veşartibûn. Ji bilî vê jî dehfik danîbûn. Yek jî vala neçû.

Kemînên li ser rê leza eskeran kêm kiribû û ji bo ku gundî karibin dûr bikevin zeman dabû qezenckirin. Êdî wijdanê şervanan rehet bû.

Ketin şerê xwe yê herî mezin. Di destê hinan de şûr hebû, di destê hinan de rim hebû, jê re “Neyze” digotin, di destê gelekan de jî tîr û kevan hebû. Herî zêde jî baweriya xwe bi kemînan anîbûn û hesabên wan vala derneketibû.

Şervanên ku destpêkê ew li daristanê pêşwazî kiribûn, ew du şervanên hosteyên danîna dehfikan bûn.

Artêşê heta xwe gihandibû jorê nîvê wê şkestibû. Di nav de hewayeke panîkê çêbû. Wan jî mirin dan ber çavên xwe û êrîş kirin. Şerekî nedîtî bû.

Ji kendal heta gelî, ji gelî heta gund her der tijî termê eskerên Xusrew bibûn. Heçkû ji bo li ser navê qral bimirin hatibûn vir. Hejmara şervanên ku bikuştana wê ne zêdetirî çil kesî bûna. Destpêkê li kendal mirin dîtibûn. Ketibûn nav lepên şervanên ruhazad ên ku li kendalan hatibûn ceribandin.

Li ser wan jî du şervanên mezin hebûn. Du efsaneyên xwedî ruhekî têkneçûyî.

Ew sembola ruh û îradeya têkneçûyî bûn.

Qade û Kevî li cem hev şer kirin. Kevî ji her kesî baştir şûr bi kar tanî. Qade hem şûr bi kar tanî hem jî tîr diavêt. Di ciwantiya xwe de herduyan jî bi hev re perwerdeya şer dîtibûn. Di tayê hev de bûn. Bi ruhê şervantiyê bi hev hatibûn girêdan. Mirovekî dikarîbûna di emrê xwe de çiqas êş bi cih bikirana, hemû hatibûn serê herduyan. Niha jî bi hev re li tama rûmeta şerkirinê dinêrîn.

Kevî cara dawî bang li şervanên xwe kir:

"Me ne ji bo şerkirinê şer kir. Me ji bo parastina qebîleya xwe şer kir. Di vî şerî de qebîleya me hatiye parastin! Serkeftin ya me ye!"

Qade jî xîtabî Pusdîl kiribû. Pusdîl fermandarê eskeran bû, dor li wan girtibû, bi pozbilindî gotibû heta wê rojê ti kesî nikarîbûye bi fermandarekî mîna wî, teslîm bibin. Qade gotê:

"Tu xwe qure dikî, lê li encamê nanêrî! Xwe vala vala nenepixîne. Nebêjî min qezenc kiriye. Nebêjî her tişt li vir diqede. Di dawiyê de diyar dibe, di dawiyê de!"

Gotinan wekî şûr olan dida û heta guhê Pûsdîl çûn.

Dilxerabek bû, ji ber vê jî hinekan navê "bozdil" lê kiribûn. Gotinên diviyabû li dilê wî bikevin, ji guhekî wî ketinê û ji yê din derketin. Tenê mane neda gotina, "wê di dawiyê de diyar bibe!" Her çiqasî ev gotin di bîra wî de mabe jî got:

"Dawiya wî hatiye, hê çi dibêje ev gurê kal!"

Emrê êrîşa dawî da.

Qade û Kevî heta kêliya dawî jî derb li dijmin dan. Dema hatin xwarê jî piştgiriya hev kirin, pişta xwe dan hev û rûniştin. Neketin erdê. Şervanên ciwan dora wan girtin.

Şervanek çawa bi rûmet dibû, wisa şer kirin. Û herî dawî jî mîna kevneşopiyên wan dibêje wan bi rûmeta şerkirinê çavê xwe li vê jiyanê girtin.

Ji ser şervanên kendal tîrêjeke roniyê ber bi asîman ve çû. Dema berê xwe dan asîmanan jî dîtin du qertel mîna ku hurmeta xwe ji bo ruhên şervanên nîşan didin, li ser serê wan digerin û bi heybet xwe berdidin.

Êdî kêliya ku egîdbûna egîdan wê derketana lûtkeyê hatibû.

Hin eskerên ku bibûn şahidê egîdiya Şîrîn û şervanên din ên jin, wekî Xwedê li wan xistibû, xwe avêtibûn erdê û efû ji Xwedê dixwestin.

Azîn, Şîrvan û Şeyda enceq bi tîr û riman birîndar bûn.

Pûsdîl got ji bo ku karibe van şervanan nas bike dikare canê xwe jî bide û ferman da: "Yên mayî sax bigirin!"

Xwestin şervanên dawî saxî bi dest bixin. Yek ji van jî Şîrîn bû. 7 kes mabûn.

Pûsdîlê meraqdar û azwer ji wan xwest teslîm bibin. Li gel wî cîgirê wî, mîna wî azwer, pozbilind, qerase û bi fors bû, bi jêkirina seriyan navdar bibû, Dêwê Guptî bû. Hewl da xwe nêzî Şîrîn bike.

Ewqasî bi xwe bawer bû ku, digot wê jinê bitirsîne. Didît, ya li beramberî wî jineke hinekî dagirtî bû, lê nizanîbû çiqasî baldar û lez e. Enceq brûskek ewqasî lez dibû.

Dêwê Guptî heyranê laşê xwe yê debdebe, rih û pora xwe ya tevlîhev, dîmenê xwe yê sawdar û şûrê xwe yê xwînî bû. Ev jî xefleta wî bû. Fêm nekir çi hat serî, carekê dît şûrê Medî yê di dest Şîrîn de li ser şahdemara wî ye. Ne demar ma ne jî serî!

Serê Dêwê Guptî yê li erdê digindirî, bû sebeb esker xwe bidin paş. Şervanan ev firsend bi kar anîn, torbeyên li nava xwe gerandine dirandin û tozên sotîner jê derxistin.

Careke din eskeran berê rimên xwe dan wan, wan jî hemleyên xwe yên dawî li jêra riman û di nav wan de kirin; her yekî bi şeklê ku karibin lingê çend eskerî jêkin yan jî singa wan vekin lez tevgeriyan.

Ne hosteyê şûran bûn, lê lez bûn, di xweparastinê de hoste bûn, hosteyê cesaretê bûn, hosteyê dilan bûn û hosteyê derbkirina dijmin bûn. Di dema mirinê de jî plan kiribûn derbê li dijmin bidin.

Di keysa dawî de jî li bin lingê dijmin toza sotîner reşandibûn. Her heft kes jî amade bûn agir pêxin. Ev erk ji bo şivan Banîko ma.

Bi dengekî bilind ji xwe re got, “Hadê Biko!” Dema ku bi derbên tîr, rim û şûr kete xwarê agir pêxist. Tevî eskerên ew dorpêç kiribûn di nav agir de man.

Eskerên wekî çembera derve rêzbûyî ji agir û dengan tirsiyan û nîzama xwe xera kirin. Paşde, çep-rast reviyan.

Di demeke kurt de agir hemû şervan rapêçabûn, lê her diçû kêm dibû.

Ruxmî ku hemû li erdê çît bibûn jî yek ji wan mîna semah digerand dizîvirî. Ev şervana dawî Şîrîn bû û hê jî ruxmî di nav agir de bû li ser piyan bû. Her çiqasî çavên wê nedidît jî his kir ku dijmin ber bi wê ve tê. Piyê xwe mîna baskên pinpinîkan li hev dan û ber bi kendal ve beziya. Dema ku eskerekî hewl da wê bigire, destî wî şewitî û xwe da paş.

Şîrîn bi dengekî fetisokî tîlîlî da û xwe ji kendal werkir. Êdî ew jî mîna Hoşeng bibû ferîşteyeke baskagir. Bayê li kendal jî nikarîbû ew agir bitefandana. Nediket xwarê, mîna pinpinîkê ber bi kûrahiyê ve difiriya!

Heta ji ber çav winda bû, eskeran temaşe kirin. Li ber hezkirina agir a di ola wan de heyî, rûniştin û xwe xwar kirin. Ya dawî jineke şervan bû û di nava agir de jî tîlîlî dabû.

Demekê wisa li valatiya kendal mêze kirin.

Pûsdîl li ser vê nêzîkatiya eskeran li cihê xwe bist bû. Dijminên xwe tine kiribûn, lê nikarîbû keyfxweş bibûya. Di emrê xwe de şervanên wisa nedîtibûn.

Mêze kir ka çend kes ji artêşa wî mane. Ji hêrsa dikira xwe ji kendal biavêtana jêrê. Dora wî tijî cenazeyên eskeran bû. Hejmara eskerên saxmayî bi xwe dikarîbû ji qral re bigotana ketine şerekî çawa.

Piştî rojeke xwînî, esker ketin gund, lê ne kesek ne jî tiştekî ku karibin bigirin dîtin.

Şervan jî, saxgirtina wan li milekî, cenazeyên wan jî nedîtin.

Ew şervanên Kewyar bûn! Ji 40 şervanan, cenazeyê yekî jî di dest wan de tine bû.

Eskeran digotin windabûna cenazeyên şervanên kuştî, peyameke Xwedê ye, ji tirsa lerizîn, xwestin demildest vegerin malê.

Ew şervanên kendêl bûn; gotin dibe ku cenazeyên wan ji kendal ketibe. Sirê li vir ji bilî qebîleya Kewyaran ti kesî nizanîbû…

**Eskerê Sedemîn!**

**Em bi çîrokên ozanê gerok mezin bibûn**
**Neheq bûna wê Persan winda bikirana**
**Artêşên wê dê li çolên Kafkasyayê birçî bimana Destpêkê wê hespên xwe bixwarana**
**Dûvre kesek ji aliyê deh kesan**

Kevî gotibû, “Ji nav vî gelî gihandina şervanên Xorremî wezîfeya te ye!” Bi şeklekî din nikarîbû Destan îqna bikirana.

Piştî dît qebîleya wî li cem Xorremê ket ser rê, ji şervanên xwe re gotibû, “em bimirin jî me qezenc kiriye!”

Çawa şervanên Kewyaran dest bi berxwedanê kiribûn, eskerên Xusrew têk çibûn.

Dema ku Hoşeng kendal derbas kiribû, eskerên Xusrew têk çibûn.

Dema ku Kevî û Qade bi birîndarî pişta xwe dabûn hev û cara dawî ji bo şervanên xwe axivîbûn, eskerên Xusrew têk çibûn.

Dema ku Şîrîn mîna pinpinîkeke ji agir xwe ji kendal avêtibû, împaratoriya xwînî ya Xusrew têk çibû.

Nivîsevanan ne nivîsîn, lê ji wê rojê ve asîmanê her heyî û ew çiya bûn şahid, li wir şerekî yeman rû da. Ji rojan roja xemrî-binevşê bû, ango Pêncşem!

Rengê wê rengê wekheviyê bû.

Vê rojê li hev kom dibûn û li sazê didan. Mirov digot qey roja çêbûna Ezraîl tê pîrozkirin û mirin tê pîrozkirin, lê di rastî de ya dihat pîrozkirin xwişktî-biratiya jiyan û mirinê bû.

Roja Pênçşemê, Xwedê Ezraîl çêkiribû. Lê ew roj ne roja mirinê bû, di heman demê de roja bîranîna berxwedêran bû. Roja berxwedanê di wê rojê de çêbibû, ev xwedî mane bû. Hevsengî wisa hatibû çêkiribûn.

Roja Pênçşemê xweş bû, berxwedan xweş bû. Wê rojê jiyan û mirin wekhev bûn. Roja pîrozkirina hem jiyan hem jî mirinê bû.

Li dijî 1100 eskerên sersor û ji serî heta binî zirxên hesin li xwe kirine, 40 şervanên egîd destan nivîsandibûn.

Ji 1100 eskerî 100 lib, mîna nemirên Persan fikirîbûn û şandibûn. Yekîneya taybet bû.

Di artêşa Pers de yekîneya taybet a ku ji 10 hezar kesî pêk dihat û ji ber ku her kêm dibû cihê wan dihat tijîkirin û hejmar sabît bû, “nemir” dihate gotin, di şerê mezin de li dawiya artêşê cih digirt.

Xusrew xweziya xwe bi vê anîbû, di nav yekîneya hezar kesî de vê yekîneya taybet a ji sed kesî pêk dihat bi cih dikir.

Li garnîzonên sedrapiyê jî kopyayeke vê ya biçûk çêkiribû. Yekîneyên ku girêyî wî her cure karên xerab dikirin ava kiribû.

Di dema Persan de ev yekîne guzîdeya artêşê bû; di serî de Fars û Kurd, ji eskerên dildar ên ji gelên cuda yên Îranî hatibû avakirin.

Yên niha mîna yekîneyên qatilên kirêkirî bûn.

Ji 40 egîdên ku ev qatil pêşwazî kirin, 4 jin bûn. Gel ji bo cihê ku ew cenga mezin lê qewimî got, “Çilmêr”, ango: Çil Egîd!

Roja binevşê bû, di vê rojê de jiyan û mirin wekhev kiribûn. Ji bo dijminên wan bibû rojeke xwîna sor.

Wê rojê bi hezar û sed eskerî çûbûn û bi not û neh eskeran vegeriyabûn.

Agahî dan Xusrew ku not û neh esker li ser rêya vegerê ne. Emir da, bila şevê veşartî bikevin bajêr û hayê ti kesî ji vegera wan çênebe.

99 eskerên di bin fermandariya Pûsdîl de li “Baxçeyê Biçûk” ên li pişta qesrê kom bûn.

Her eskerekî bendewariya pesnên mezin, raye û zêran ji qral dikir. Bi qasî têra hemû silaleya wan bike zêr…

Ne tenê yekîneya ji sed kesî pêk dihat, hemûyî mîna “nemiran” şer kiribûn, welatê xwe ji dijminê xwe yê herî har paqij kiribûn! Her cure xelat jî wê ji bo wan kêm bûna. Pûsdîl li ser rêya vegerê bi xeyalên wisa dilê eskeran xweş kiribû, hiştibû ku windahiyên wan ji bîra wan biçe.

Xusrew derket pêşiya wan:

-Çima hûn ne sed kes in?

Fermandar nizanîbû çi bibêje.

Xusrew dîsa pirsî:

-Çima hûn ne sed kes in?

Pûsdîl got:

-Yên din hemû mirin.

Lêvên wî li hev diketin.

Xusrew pişta xwe da wan û çû. Li balê şêwirmend û wezîrên wî jî derketin.

Di wê wextê de li harema qesrê liv û tevgereke zêde hebû. Yekser ji bo daîreya haremê agahî şand. Emir kir ku Şoşan bînin cem wî.

Şoşan, li ser rêya Xorasanê ji aliyê sîxurên qesrê hatibû girtin û anîbûn qesrê. Li bendê bû mîna êsîrekê bînin qesrê, lê wekî namzeteke qralîçeyê anîbûn. Lê qet fêhm nekir ka sîxuran çi aniye serê kurikê rehber.

Xusrew ew dawetî nav nivînan kir, wê çaxê eskerên li baxçe jî di nav xwe de dest bi nîqaşê kiribûn.

Hezar esker miribûn, lê qral dipirsî çima yek kes ji wan kêm e. Wate nedan vê. Pûsdîl jî matmayî bibû. Tenê pirsa yek kesî dikir, çima?

Tenê mabûn û deriyê hesin ê Baxçeyê Biçûk li ser wan hatibû kilîtkirin.

Qral emîn bibû, ji derveyî 99 eskerî hemû yekîne tine bibû.

Bersiva fermandar fermana wan a mirinê bû!

Xusrew sebeba reva Şoşanê jî fêm kiribû. Şoşan di parastina xwe de hê jî safik nêz dibû. Bi hinceteke pir mesûm reviyabû! Tenê dixwest rastiyê ji Xorremê re bibêje!

Xusrew wê şevê bêbextiya Esleyê kirî jî fêr bû, lê emir kir ku gotinên têkildarî qralîçeya qralîçeyan ango dayika wî û Mazdek hatine gotine ne derew in û divê her kes vê wisa bizane! Halbûkî rastî ji devê şahida herî nêz, yanî ji devê Şoşanê guhdar kiribû. Esle wekî qatilên xwînsar derewa herî mezin avêtibû ortê. Xusrew jî wê ev derew bidomanda.

Mîna her rastiyê, ev jî wê di wê şevê de bixistana nava agir. Berevajî, wê çi bihatana serê Şoşanê, gaveke din qîjên ji baxçeyê qesrê hil bibûna wê fêrî wê bikirana!

99 esker bibûn şahidê berxwedaneke wisa ku ji dema Spartayiyan ve nehatibû bihîstin. Heger ev efsaneya mezin bigihiştana gel, Xusrew wê nikarîbûna texta xwe biparasta. Vegotinên 99 eskeran ne ji bo yekê, têra 99 efsaneyan dikir.

Hema hema yekîneya taybet a ji sed kesî ya qral bi temamî tine bibû. Ev yekîne di demên şer de herî dawî diketin şer. Angorî ji bilî çendekan ti kes ji van nemabû, di şer de hin eskerên li pêş reviyabûn paş , bi saya vê, yên ku li dawiyê mabûn ne yekîneya taybet a sed kesî bû, ev 99 esker bûn.

Ew hê li ser rêya vegerê bûn, Xusrew amadekarî kiribûn. Wê ji bo serdegirtina gundekî hezar û sed esker biçûna û tenê 99 vegeriyana! Wê ji bo komek asî artêşeke bijare telef bibûna û Xusrew wê temaşevan bimana? Gunehê xwe bi bavê xwe neanîbû, wê bi wan bianiya? Di ser de jî gel ev tişt bibihîstina wê dawî li Xusrew bihatana.

Amadekarî bi berfirehî kiribûn. Bi hewesa ku karibe kevneşopiyên kevn zindî bihêle, rêbazên berê yên hovane jî zindî kiribûn.

Dema ku Şoşana çavbigirî ya mîna agirê findê dilerizî dixist nav lepên xwe, ji ser dîwarên baxçe qabên tijî maddeyên sotîner avêtin jêrê.

Ev şilemeniya reş, li ser keviran mîna yaxê diherikî û hemû zemîn pêça. Herî dawî meşaleyeke bi agirê geş avêtênê.

Dema ku agir geş dibû, tenê gotinek hat bîra Pûsdîl, tenê xatirayek hat ber çavên wî û sekinî: Gotinên gurê kal, “Wê di dawiyê de diyar bibe, di dawiyê de!”

Qîjewîja 99 eskeran gihiştin heta masiyên ku xwe di nava kevirên ava sar a Dîcleyê de veşartine. Qîjîniyên ku mîna qîjîniyên Xwedayê Tarîtiyê li nava şevê belav dibûn, ji 99’an ber bi jêr ve hêdî hêdî kêm dibû…

Xusrew tenê xwestibû biceribîne û fêm bike. Bi rastî jî nizanîbû sed esker ji şer sax filitîne. Eskerê sedemîn li ser rêya vegerê fîrar kiribû!

Fermandar di nava agir de dişewitî, digot qey ji ber yek kesê fîrarkirî ev ceza li wan hatiye birîn.

Xusrew ji bo hemû kesên li qesrê hayê xwe ji 1100 eskeran heye, qedexe kir ku wê ti carî behsa vê meseleyê nekin. Yên behs bikirana, ew ê jî biçûna “Baxçeyê Biçûk!”

Ew qet neçûn seferê; 99 kes qet venegeriyan, li Baxçeyê Biçûk ê qesrê 99 esker qet nehatine şewitandin, hestiyên ji wan mane jî ti kesî nedît…

Heger fermandar Pûsdîl bigotana kesê sedemîn ji ber tirsê fîrar kiriye, dibe ku ew 99 kes jî sax bimana. Di ser de jî li şûna kuştinê wê di berdêlê “bêdengiyê” de bi zêdehî “xelat” bigirtana.

Bi saya wî eskerê ku wê rojê fîrar kiribû, gel bi wî şerî û rûdanan hesiya.

## BEŞA HEFTEMÎN: HERIKÎNA BÊNAVBER

### Ji bo Fêmkirinê Eşq Divê!

Gotibûn “qediyaye”. Telal derxistibûn û “qedandina wan” îlan jî kiribûn.

“Xorrem jî mîna Mazdek di nava fikrên ola xwe ya jirêderketî de xeniqî!”

“Parî mariyên piştî Mazdek mabûn jî hatin paqijkirin!”

Cejn hat îlankirin!

Qurban hatin serjêkirin!

Li welat edalet çêbû!

Her sibe di bin şibaka wî de hate gotin “Her Bijî Qralê Qralan Ênûşîrvanê Dadperwer”.

Bi rastî jî qediyabû?

Kêliyên wisa tên ne qezenckirin, tenê li ser piyan mayîn jî girîng dibe. Tenê li ser piyan mayîn!

Kêliyeke wisa tê ne qezenckirin tenê meş girîng dibe. Tenê meş!

Kêliyeke wisa tê ne qezenckirin, tenê bawerî girîng dibe. Tenê bawerî!

Bi bawerî meşiyan. Welatê Medyayê singa xwe ji wan re vekir. Demekê di nava êşan de di nav xwe de man. Têra xwe êşên xwe kişandin. Ji êşê nereviyan. Ji bîr nekirin

Ji ber ku mirovên wisa bûn, bi şer dimirin, mirina li ser rêya egîdiyê şeref dihesibandin, mirin ji bo wan ne zor bû. Mirina wan ji bo yên li pey wan mabûn zortir bû.

Piştî mirina şervanên egîd, diviyabû ji bo saxmayînê armancek hebûya. Bi şeklekî din wê çawa mimkun bûya xwe li êşeke wisa ragirin? Tevî vê jî niha ji bilî êşê ti tiştekî din li ser rêya wan tine bû. Her şervanek li ber çavên wan zindî dibû, rondik li pey hev rêz dibûn.

Rêya derketibûnê gelo rêya jiyanê bû, wê berê wan bidana kû derê, nediyar bû. Tenê tiştekî mîsoger hebû, niha ew sax bûn.

Fikra ku “li şûna saxbûnê, diviyabû ez jî li ba wan bimirama” di dilê gelekan de rûniştibû. Ji ber vê rêwîtiya herî bêdeng a dîroka dabûn ber xwe.

Ji bo ku mirov karibe jiyanê bixe ber lêpirsînê, pêdivî bi nakokiyeke yekem heye. Ew nakokiya yekem çi bû? Ji kengî ve ev lêpirsîn pêş dixistin?

Her lêpirsînek, lêgerînek e. Mazdek, kesên ku lêgerînên wan tine ye, dişiband miriyên sax.

Dema jê dihat xwestin pitikên nû çêbûne pîroz bike, destpêkê xwe bi ser guhê wan de xwar dikir û digot:

“Jiyan, lêgerîneke bêdawî ye!”

Dema ku Xorremê ev gotin bihîstibû, heq dabûyê û dûvre gotibû:

“Her lêgerîn evînek e!”

Li gorî wan eşq bêdawîbûn bû. Bi saya gotina “Eşqa Bêdawî!” êdî mimkun bû ku yên rast, zeîf, demkî, besît û sexte ji hev cuda bike. Her yek ji van jî ji ya din cudatir bû. Milê wan ê hevpar jî ew bû ku wê ti carî nikarîbûna nêzî eşqa bêdawî bibûna.

Xorremê rastiya ku eşq qetil dikir dîtibû, bawer dikir ku ji bo karibin xwe bigihînin civaka eşqê, têkoşîna wan tekane rêya rizgariyê ye.

Ji bo vê jî eşq tenê wekî karê hestan nedigirt dest, tew îcar qet danedixist asta têkiliyeke di navbera du kesan de, têkiliya wê li cem aqlê civakî û azadiyê datanî. Rêya eşqê, rêya aqlê civakî û azadiyê bû. Ev rê bi êş, xwîn û rondikên çavan hatibû hûnandin. Rêyeke wisa bû ku yên cesareta xweragirtinê, baweriya serxistinê pê re tine bûna, diviyabû derneketana serê, derkevin jî wê nikaribin temam bikirana.

Dema ku hişmendiya rê bi azweriya pêkanîna xeyalên hezkiriyên xwe re dikir yek, xwe li van êşan ragirtin mimkun dibû. Xorremê ji vê re gotibû, “lêgerîna eşqê”. Têkiliya xwe ya li cem Mazdek ne wekî pêkhatina eşqê, wekî lêgerîneke xurt nirxandibû. Bi hev re derketibûn lêgerîna eşqê û niha li ser vê berpirsiyariyê bîranînên Kewyaran jî zêde bibû.

Lêgerîna eşqê veguherîbû şervantiya eşqê.

Dîrok di şexsê wê de bibû şahidê oleke eşqê.

Oldaran digotin “lêpirsîn guneh e!” û îdîa dikirin ku aqil eşqê diqedîne:

“Ji aqil dûr bisekine, ji ber ku ew agirê di dilê mirov de ditefîne!”

Bi mezinkirina eşqê ve kolekirina mirovan çiqasî jî rehet bû.

Mazdek digot, “koleyên korê eşqê!”

Heger we bigotana eşqa kole nabe û we îtîraz bikirana, wê bigotana tevlî fikrê we dibim û zêde bikira: “Ma ne ez jî vê dibêjim!”

Fêmkirin eşq e!

Ji ew ên ku her tim li pey nediçûn aşiq nedihat gotin.

Hemû lêpirsîn ji bo fêmkirinê bûn.

Zanayekî demê gotibû, “Jiyan, dema mirov sax be nayê fêmkirin!”

“Bi mirina şervan agirê azadiyê naqede!” Qade, Kevî, Hoşeng, Şîrîn û yên din…

Heta ku kendalê di navbera xwe û mirina xwe de bi dijminê xwe danegirtin, jiyana xwe nedan.

Jiyana xwe nedan!

Dema ku perdeya di navbera mirin û jiyanê de rakirin, dîtin ku ne jiyaneke bidin, lê jiyaneke bistînin heye.

Bi neynûkan kolandin, bi diranan rakirin, bi xwîna xwe ew jiyan girtin.

Qezenc kirin!

Ji ber vê yekê xatir nexwestin. Bi stranên veqetînê xwe xemgîn nekirin û bi ilmê gihîştinê xwe teselî nekirin.

Jiyan qezenc kirin û wisa jiyan.

Ji wî zaniyarê kevnar fêr bibûn:

“Beriya wê û piştî wê bi şertekî dikare hebe:

Tu yê di kêliyê de qezenc bikî!”

Qefle ji du rêyên cuda wekî du baskan deşt li pey xwe hiştibûn û gihiştibûn çiya. Ji ber rewşa ewlehiyê veqetiyabûn. Her çiqasî gihiştina wan a li çiyan pir wext xwaribe jî di dawiya dawî de wê pêk bihatana.

Rêyên berxwedanê ew heta çiyayên azad biribûn. Digotin li Reyê ne, lê ew li Çiyayên Med bûn.

Xorrem li çiya his kir ku ev der ne tenê cihekî starê ye, cihekî jiyaneke cuda ye. Wê li vir biketana mezintirîn înziwaya jiyanê, hemû fikrên ku mirovahiyê ronî dikin, li vir kûr bikirana. Hemû gotinên ku ji Mazdek mabûn û hevrêyên wî nivîsandibûn, lê desthilatdariya Sasaniyan şewitandibûn, tine kiribûn, wê li vir ji nû ve zindî bikirana.

Dîrok wê bibûna şahidê berxwedana herî dirêj a bi pêşengiya jina azad û di bin ronahiya felsefeya wê de pêş dikeve. Ji ber ku Xorrem,

wekî xeyal kiribû, di dilê civakê de xeteke têkoşînê ya piştî wê jî dewam bike çêkiribû.

Ji bo ku hestê ewlehiyê li çiya kûrtir bibe zemînek ava kiribû. Xeyal kir, heger berê bi hev re hatibûna çiyê, dibe ku Mazdek, mamoste, Qade, Kevî, Hoşeng, Şîrîn û yên din hemû sax bimana. Her çiqasî demekê di nav vê xeyalê de ma û xemgîn bû jî, rêzgirtina ji bo biryardariya wan a berxwedanê, di serê fikrandina xwe de ev gotin bi cih kir, "çi tiştên diviyabû bihatana jiyankirin, wekî pêwîst bû pêk hat, niha çi kêm mabe, dema temamkirina wê ye!" Bi van gotinan li zêhn û dilê xwe neqş kir ku rabirdû ne windahiyek e.

Ya rû daye, ne têkçûn bû, gaveke mecbûrî ya berxwedanê bû. Firtoneyek bû ji bo geşkirina berxwedanên din. Piştî gihişt vê encamê, wê têkneçûna fikir û terzê xwe yê jiyanê ji her kesî re rave bikirana.

Dema hezkiriyên mirov dimirin, zor e, êşê dide. Ji wê baştir kî vê dizane?

Got: "Êşên herî mezin, dema mirov wan ji bîr bike çêdibe!" Mirov dikare her êşê bikşîne, lê jibîrkirin… Ji ber vê yekê wê her roj ji nû ve êşên wan bikşandana, lê wê xatirayên wan zindî bihiştana. Tenê ne bi bîranîna navên wan, wê fikrên wan û taybetmendiyên wan jî zindî bikirana!

Di vê mijarê de Destan bû alîkarekî baş. Li Çiyayên Med wekî ku bi baweriyeke nû tijî bibû û nexweşiya xwe di asteke mezin de li pey xwe hiştibû. Destan ispata vê bû ku êş dikare bi baweriyeke nû veguhere bextewariyê. Xorrem didît ne tenê birînên wî baş dibin, di heman demê de guhertina di ruhê wî de jî pir bi kok e. Wê çaxê hêviyên wê yên têkildarî civakê jî zêdetir dibû.

Destan jî dizanîbû hatina Çiyayê Med wê encamên nû yên siyasî û eskerî bi xwe re bîne. Tiştê yekem kirî ew bû ku bîranînên berxwedanê ji hemû zarokên qebîleyê re gotin û ew ji bo rojên zehmettir amade kirin.

Bawer dikir ku wê Xorrem oleke nû ji bo mirovahiyê bîne. Ji ber vê yekê xizmeta ji bo wê wekî xizmeta ji bo Xwedê didît.

Oleke jinê, oleke nû ya berxwedanê, oleke pir cuda ya jiyanê çêdibû. Destan ev rewş ewqasî ji kûrahî his dikir ku digot çiya jî îbadetê ji vê ola nû re dikin; yên ji qabîleyê sax mane jî dişiband qebîleya li cem Mûsayê ku ji Misrê derketî. Bawer dikir ku birîna wî û nexweşiya wî jî ji bo vê armancê baş bûne.

Çiya ew parastibûn. Wan jî wê çiya biparastana. Ma wateya navê wan jî ne ev bû: Parazvanên Çiya!

Demeke dirêj hayê kesî ji wan çênebû. Li çiya li cihê herî nêzî stêrkan bûn, lê di dilê gel de wekî parçeyekî kozê mabûn.

Hisên Destan rast derketin. Bayê çiya piştî wê rojê mizgîniya oleke nû da: Xorremdîn!

**Artêşa Qizilbaş!**

Jibîrnekirina êşan, ne tenê jiyana bi êşan bû. Ew êş çima hatibûn kişandin? Ha, ji bo vê diviyabû bijîna. Ev jî tenê wateyeke wê hebû: Berxwedan!

Heger ji bilî êşên nû wê ti tiştekî din nedana civakê, mimkun nabe êşên hatine kişandin watedar bibin. Civakê, di berxwedanê de bextewarî dîtibû.

Êdî mirov di nav êşên xwe de winda nedibûn û xwe ji dinyayê qut nedikirın. Hatibûn wî halî ku mirovbûn û berxwedan wekî hev digirtin dest. Xorremê pêşengiya berxwedana nû dikir. Ev berxwedana nû dişiband baranê.

Halê herî nazdar ê xwezayê dema bi baranê dihat şuştin derdiket. Libên bilûr ên ku piştî baranê di ser pelan re diherikin, dihêlin ku hemû reng derkevin ortê. Li gorî baweriya gel, kulîlkên hê nû vedikin, bang li baranê dikin. Xorrem jî wisa bû.

Xorrem libeke zelal bû, ketibû gerdûnê û kulîlkek bû, bang li baranê dikir.

Hiştibû ku her tişt xuya bibe. Piştî vê mîna baranê dikarîbû li her derê bibariyana û mîna baranê her kêlî winda bibûna. Li ba hevrêyên xwe têkoşîna xwe ya nû wekî tevgereke baranê didît. Baran sembolek bû, pêwîst bûya wê xwe veşartana, pêwîst bû jî wê wekî lehiyê rabûna.

Kulîlkên bang li baranê dikirin, yên li gundên deştê, hayê xwe ji Xorrem û Xorremiyên li ser çiyê hebûn, vebibûn jî. Yên ji bo dîtina Xorremê diketin ser rêya çiya, rastî qebîleyên şerker dihatin. Dibûn heyranê xwebaweriya wan. Ji şervanên çiyayî îlham digirtin, Xorrem nedîtibana jî mîna dîtine li her derê digotin û şîret dikirin ku divê li her derê li dijî nîzamên zilmê şer were geşkirin.

Her çiqasî Xorrem daneketana deştê jî ji ber ku fikrên wê li her derê digeriyan, keyfxweş bû. Mabeyna jiyana li malên hevpar, digotinê “Hemeganî” û jiyana qebîleyên şerker ên li çiyayê ti ferqeke mezin nemabû. Jê re digotin “Jiyana Qizilbaş”. Yên digotin “Felsefeya Qizilbaş” jî hebûn. Di nava gel de jî bi awayekî veşartî “Artêşa Qizilbaş” dihate gotin. Xorrem wekî fermandara vê artêşê dihesibandin.

Dema ku Xorremê bihîst di nava gel de ji wan re “Artêşa Qizilbaş” tê gotin, gotina yekem kirî ev bû: “Tola Mazdek hat rakirin.”

Ji bo ku karibe ji şervanê efsanewî yê qedîm Awyer şopekê bibîne, pir hewl dabû. Bavê wê digot li çiyayên Med e, pir mafdar bû. Li gundên çiyê navê wî hatibû bihîstin, lê ti kesî nizanîbû herî dawî kengî agahî jê hatiye girtin, li kû derê ye. Xorrem wê bîranîna wî jî zindî bihişta. Ji derdora xwe re digot: Şervanên mîna Awyer mezin, namirin. Heger îro ew wekî beden miribe jî, ew ê ji nû ve zindî bibe û pêşengiya berxwedanê bike!

Li çiyê, cihê Xorrem, mîna demekê Awyer kiribû, li herêmên zinarên asê û bilind bû, yan binê tehtekî yan jî binê darekê bû.

Ji hevrêyên xwe re digot; “mekanê we kû derê dibe bila bibe, bila sirê kêliyê her tim di nava lepê we de be.”

Destan di vê mijarê de bibû mînakeke baş. Ti kesî fêm nedikir kengî, kîjan demê li kû derê ye, çawa winda dibe.

Tevî ku kal jî bibû, heçkû ispat dikir zeman monoton naherike, pir dixebitî. Carina hilma wî diçikiya û diket erdê, lê tevî vê jî ji şervanên ciwan jî zêdetir bi liv û tevger bû. Her tim ji ciwanan re digot felsefeyeke şer jî heye. Digot tenê bi wêrekî şerkirin têrê nake.

Li gorî Destan, felsefeya şerekî serketî di fikran de veşartî bû ku wê dûrî destê dijmin bûna û ji ber vê yekê jî têk neçûna. Dema ku ev fikir ketin nav ruhê civakê, jiyana azad mîsoger dibû. Xorremîtî ev bû.

Şervanên ku bi saya fikrên dûrîdest bibûn xwedî zêhnekî nerm, li kû derê biketana zorê, li kû derê bihatana dorpêçkirin, dikarîbûn li cihekî din derb li dijmin bidana û pêşiya xwe vekirana.

Felsefeya jiyanê ya ku Xorremê bi şervanên xwe dabû qezenckirin, dihişt ku dûrîdest bin. Carina baran bi xwe bûn, carina jî mîna kulîlkan bang li baranê dikirin!

Efsaneyên ku têkildarî Xorremê dihatin gotin, ev felsefe piştrast dikir. Yekî digot wî Xorrem li Çiyayên Med dîtiye, yekî din jî digot wî ew li Xorasanê dîtiye. Vê rewşê qadên di bin bandora Xorremiyan de rave dikir. Li her derê komên veşartî dihatin avakirin. Ev, komên Xorremî bûn.

Xorremîtî, felsefeyek bû. Felsefeya jiyana hevpar û berxwedanê. Di warê wateyî de jî felsefeyeke xwedî raz bûn, lê di warê fîzîkî de jî veşartîbûn.

Komên veşartî li her derê bûn, lê dijminê wan nikarîbûn xwe bigihandana wan. Ji ber ku ew hem xak hem kulîlk hem jî baran bûn. Pêwîst dikir mîna bayekî bi dest nayê girtin, pêwîst dikir jî mîna ruhekî bi çav nayê dîtin dikarîbûn winda bibûna. Pêwîstiya kê bi çi hebûna dibûn ew, diviyabû li kû derê bûna, li wir bûn. Taybetmendiyên şervanan derbasî civakê jî bibû.

Serê qesrê tevlîhev bibû. Nizanîbûn Xorrem dijî yan na. Dema diketin pey wan jî ti kes nedidîtin. Halbûkî alîgirên Xorremdîn wekî aşûtê zêde dibûn.

Piştî baranên biharê, hemû hebûn ji bo ku li tama xwezaya xwenûkirî binêrin derketibûn naverastê. Xorrem û şervanên wê jî amadekariyên dawî ya şerekî dikirin. Xorrem ji bo vî şerê mezin difikirî ku biçe Xorasanê. Wê li wir dostên xwe yên kevn bidîtana.

Hewa ewqasî vekirîbû ku rengên pinpinîkeke li dûr difiriya jî dikarîbû ji hev bihatana derxistin.

Xorrem li bin dareke biyê rûniştibû, guh dabû qasidên xwe yên ji Xorasanê vegeriyane. Qasid jin bûn û têkildarî jinan agahî anîbûn.

Zaniyarî erênî bûn. Tevî ku nizanîbûn Xorrem sax e yan na, li her malê alîgirên wê yên jin çêbibûn. Bi wan jinan artêşeke jinê jî dikarîbû bihatana avakirin.

Piştî ku Destan û hinek şervan derketibûn rê, ti kesî agahî ji wan negirt. Ji ber ku ew mîna ewran bû, wê li kû derê bibûna baran, li kû derê veguheriyana firtoneyê nediyar bû, ji demekê diherikîn demeke din; bi heft werîs û heft kindiran nedihatin girêdan, dûrîdest bûn!

## Li Ser Texta Îranê Pêvajoya Jinan: Xwişkên Pûrandoxt û Azermîdoxt

Xorremdîn, piştî dema Xwedawendan, ola yekemîn û dawiyê bû ku li ser navê jinê hatibû avakirin!

Îradeya azad, manewiyata mezin, exlaq û bexteweriya civakî û wekhevî yên ku çavkaniya xweşikî û başiyan e, diparast. Wekî çawa wekheviya jin û mêr diparast, di heman demê de pêşengiya jinê jî kiribû rêgeza xwe. Baweriya bi olê mezin dikir, lê evdîtiya mirov jî qedexe dikir. Exlaq û berxwedana li dijî zilmê yeksan didît. Îdîa dikir ku yê li ber xwe nede, wê nikaribe exlaqî jî be.

Ji Tîzponê heta Gundeşapûrê, ji Reyê heta Xorasanê, ji bo ew kesên ku li ser şopa lingên wan meşiyan, gotin Xorremî.

Li qadên berbelavbûyî, tenê nebû hêviya gelê feqîr, di heman demê de ji tebeqeyên cuda, di serî de jin, bandor li her beşê kir. Wisa lê hat ku tebeqeya herî jor a li qesra Îranê jî ji nêrînên Xorremê bandor bû.

Du keçên Xusrewê Duyemîn ê ku neviyê wî Xusrewê qatilê Mazdek û hevrêyên wî bû, li pey hev texta Îranê bi rê ve birin. Ev, du qralîçeyên bi navên Pûrandoxt û Azermîdoxt bûn.

Bi saya Xorremdîna ku jê bandor bibûn, hewl dan welat bi çanda jinê û pêkanînên nerm bi rê ve bibin. Girîngiya wan a çûyina ser textê, ji ber şerên textê, ku beriya wan pêk hatibû, derketibû ortê.

Di şerê textê de sînor tine bû. Cinayetên navmalbatî yên ku li dora texta Îranê çêbibûn, bi saya kurê Xusrewê Duyemîn, ango Kûbadê Duyemîn, gihiştibû lûtkeyê; Dema ku bi saya Bîzansê di 628'an de hatibû ser textê, bavê xwe û 18 birayên xwe dabûn kuştin.

Lê belê tenê çend mehan li ser textê mabû û ew jî mir. Di oxira hikumdariya çend mehan de wekî qatilê bavê xwe û 18 birayên xwe derbasî dîrokê bû.

Piştî wî kurê wî yê 7 salî, Ardeşîrê Sêyemîn li ser textê hate bicihkirin, lê tenê piştî 18 mehan ji aliyê generalekî hate kuştin. Vî generalî bi şerkeriya xwe nav dabû û ji ber hem hêza wî hem jî nûnertiya zaferê dikir, li ser navê wî sifeta "beraz" hatibû zêdekirin. Navê wî Şahrberaz bû. Lê piştî text bi dest xist, 40 roj di ser re derbas bû, ew jî ji aliyê esilzadeyên Sasanî hate kuştin.

Sedrapî, esilzade, general, malbata şah… Îran di nav xwe de dikeliya. Dema ku Şahrberaz hate kuştin, ti generalî cesaret nekir bikeve şûnê. Esilzadeyên Îranê helwesta xwe li layê malbata şah nîşan dan.

Piştî vê du heyaman qesra Îranê ji aliyê qralîçeyan hate birêvebirin.

Wê çaxê artêşên Îslamê Mekke bi dest xistibûn. Jêneger bû ku Îranê feraseta xwe ya olî nerm bikira û bihişta kêmekî hilma civakê were ber wê. Li ba karaktera pêvajoyê, karaktera ew kesên ku derbasî ser textê bûn jî mohra xwe li rêveçûna welêt xistin.

Bi saya xwişkên ku bêyî nav lê bikin ketibûn bin bandora Xorremdînê, pêvajoyeke nû dest pê kir. Diyar kirin ku wê di rêveberiya wan de edalet hebûna; ew ferqa di navbera dewlemend û feqîr de rabûna û li gorî vê tevbigeriyana.

Ya herî girîng jî digotin jin û mêr wekhev in. Ev wekhevî anîn heta asta ku jin serbixwe bin, azad bijîn û karibin xwe bi rê ve bibin. Bi saya pozîsyona xwe jî eşkere nîşan dan ku cihê jinê di nava siyasetê de heye.

Statuya jinê ya di nava civaka Îranê de hema hema di her demê de ji kendalê di nava çînan de jî xerabtir bû, lê ev rewş bi saya Manî, Mazdek û Xorremê guheriye.

Pêşketina herî diyar ya ku bandora berxwedana Xorremî li siyaseta xwişkan kiribû, têkildarî mafên jinan bû.

Dema ku Pûrandoxt çû ser textê, maddeyên têkildarî mafên jinê yên ku ruxmî di Avestayê de nivîsîbû jî tine dihatin hesibandin, derxist ortê.

Ji van maddeyên ku di asta qanûna olî de dihat qebûlkirin, çendek wisa ne:

-Jin dikare bi awayekî serbixwe xwe bi rê ve bibe.

-Jin xwedî maf e ku dikare bibe xwedan milk û têkildarî van milkan wesiyetê bide.

-Jin wasiya zarokên xwe ye û dikare mafên wan biparêze.

-Zilam, bêyî destûra hevjîna xwe nikare keçên xwe bide zewicandin.

-Jin dikare li şûna zilamê xwe biçe mehkemeyê û karûbarên têkildarî malbatê bişopîne, bimeşîne.

-Jin dikare giliyê mêrê xwe li mehkemeyê bike, dozê veke û mafên xwe biparêze.

-Li mehkemeyê jin wekî miroveke kamil tê qebûlkirin û şahidiya wê û zilamekî di heman astê de ye.

-Jin dikare bi rola hakem rabe, dikare tewanbarên ku pêdiviya wan bi alîkariyê heye, biparêze.

Pûrandoxt hewl da mesafeya di navbera civakê û qesrê de bigire. Siyaseteke hevseng meşand.

Ji bo ku karibe kendalê di navbera dewlet û civakê de çêbûyî bigire, lijneyeke encumenan ava kiribû. Di civîna xwe ya yekemîn de ji wan re got wê encumen û cihê wan ê rêzdar biparêze, welat dewlemend bike û gel ji feqîriyê rizgar bike. Ji wan jî xwest rêbazên ku bikaribin ji vê feqîriya gel re bibin çare bibînin. Wisa jî welat ne bi serê xwe, bi grûbeke şêwirmendan ve bi rê ve bir. Vê jî wekî çawa derfet dayê siyaseteke hevseng bimeşîne, hem di nava civakê de hem jî di nava qesrê de hêzeke mezin jî dayê.

Pûrandoxt, di têkiliyên derve de girîngî da hevsengiyê û ji bo Împaratoriya Bîzansê ya ku dijminê hev bûn, heyetek şand, aştiyeke mayinde pêk anî. Vê pêşketinê hişt ku di nava olan de jî germbûnek çêbibe, her kes jê dilxweş bû. Şerên ku di dema bavê wan de li dijî Bîzansê dihatin kirin, heta deverên dûr berbelav bibû. Çiqas zêde şer, ewqas zêde xerckirina pereyan bû. Ev jî dibû sebeb bacên giran li ser pişta gel bikin. Dema ku şer nebû, zilma bacê jî kêm dibû. Ji ber ku

ev hemû hesibandibûn, pêvajoya Pûrandoxt ji bo gelê feqîr, jin û yên ji olên cuda bibû pêvajoyeke ku karibin hinekî din rehet bikin.

Piştî xwişka xwe, vê carê Azermidoxt hat ser textê, bi pêkanînên xwe ve di demeke kurt de wekî parazvanê edaletê hat naskirin.

Texta Îranê cara duyemîn şahidî ji rêveberiyeke jinê re dikir. Ev pêşketin ji aliyê welatên derveyî Îranê jî bi eleqeyeke mezin dihat şopandin. Lê, li seranserî welat têkoşîna bihêzbûnê nediqediya. Kontrolkirina derdorên berjewendîparêz ên di nava qesrê de, esilzadeyên Îranê û oldaran ne hêsan bû. Dema ku li ser vê pirsgirêkên li eyaletan jî zêde dibûn, rêvebirina welat zortir dibû.

Azermidoxt, li ser rêka xwişka xwe, bi hêza jinê welat bi rê ve dibir. Her çiqasî hewl dida dadperweriyê li ser her tiştî bigire jî, çavbirçîbûna dewlemendan û kesên dixwestin dewlemend bibin, pirsgirêkên di nava tebeqeyên civakî de di her firsendê de geş dikirin. Her çiqasî kontrolkirina deverên nêzî paytextê ne zor bûna jî, li eyaletên dûr mîna xwişka xwe meşandina polîtîkaya hevsengiyê bibû neçariyek. Lê çi heye ku dema mesele hat ser mijareke têkildarî jiyana wê, zewacê, vê carê parastina hevsengiyê mimkun nebû.

Azermidoxt, bi zekaya xwe, wêrekiya xwe, ku li ser navê wê pere hatin derxistin û li ser tabletan di dest wê de bi şûr hat teswîrkirin, û bi bedewiya xwe nav dabû. Di encam de fermandarê Xorasanê Ferox Hermozd xwest pê re bizewice.

Dema ku Azermidoxt ev daxwaza wî qebûl nekir, vê carê Ferox bû dijminê wê.

Ferox hat wê astê ku gef li texta Îranê xwarin. Vê carê Azermidoxt ew vexwend qesrê. Her çiqasî armanca wê hevdîtin bû û qedandina vê dijminahiyê bû jî, li qesra ku bi pîlangeriyên xwe deng vedaye, kar wekî fikrên wê bi rê ve neçûn.

Di nava qesrê de kesên kîndar ên ku dijminahî geş dikirin ketin navberê, Ferox li paytexta ku wekî mêvan çûbûyê kuştin.

Ev bûyer bû sebeb ku Azermidoxt ber bi felaketeke mezin ve biçe.

Kurê Ferox, Rostem Ferox, Azermidoxt wekî berpirsa kuştina bavê xwe dît, bi hemû hêzên di bin kontrola xwe de qesr xist bin zextê. Herî dawî ji fesadiyên nava qesrê û ji piştgiriya hin generalan sûd wergirt, Azermidoxt ji textê anî xwarê. Hat ser rêveberiya artêşa Sasaniyan.

Destpêkê çavên Azermidoxtê kor kirin, dûvre jî da kuştin.

Wisa jî pêvajoya xwişkan bi dawî bû. Her çiqasî generalên di pêşengiya Ferox de hêz xistibin destê xwe jî, nikarîbûn otorîteyeke navendî ava bikin. Îran lawaz bû.

Ji ber ku ev xwişk ji Xorremê bandor bibûn, ji bo jinan û ji bo Xorremdîniyan zafereke mezin bû. Her çiqasî li ser texta Îranê demkurtî mabin jî di wê pêvajoyê de Xorremî bi saya vê firsendê mîna baranên ku hemû dilan rehet dikin, li her derê bariyan.

**Hilweşîna Sasaniyan û Berbelavbûna Xorremdîn!**

Heta wê demê dinya du parçe bû: Sasanî û Bîzans!

Niha parçeyê sêyemîn çêdibû, lê piştî demeke kurt wê tenê yek ji nav wan derketana pêş!

Bi saya wêrekî û hişmendiya ku Xorrem û hevrêyên wê dabûn civakê, li dijî jiyana koledar li her derê raperîn çêdibûn. Dema Xwişk derbasî ser texta Îranê bibûn, kêmekî jî be gel aram bibû, lê li milê din li ber serê wan alaya oleke nû radibû: Îslamiyet!

Piştî rêveberiya Xwişkan seferên dewleta Îslamê dest pê kirin û pêvajoya hikumdariya 400 salan a Sasaniyan bi lez bi dawî bû.

Dema ku Rostem Ferox ê ku Azermidoxt kuştibû, li ser artêşên Îranê bû, qralê dawî yê Sasaniyan jî Yezdigirtê Sêyemîn bû.

Rostem Ferox li beramberî artêşa Îslamê têk çû û paytext Tîzpon, xezîneya wê û hemû dewlemendiyên wê ketin destê Ereban.

Heke li ser textê xerabkarî û belavebûn nebûna, dibe ku artêşa Azadan biketana dewrê û artêşa Ereban bidana sekinandin. Di wê demê de ruxmî ku artêşa herî xurt a Îranê jî bûn, nikarîbûn ev bikirana. Belavebûna siyasî têkçûna eskerî jî bi xwe re anîbû.

Yezdîgîrtê Sêyemîn, ku nevîçirçirkê Xusrewê qatilê Mazdek bû, destpêkê reviya milê rojhilat, dûvre jî reviya Xorasanê û xwe li wir veşart. Ecelê qralê dawî yê Sasaniyan bi destê aşvanekî bû û li Mervê hate kuştin! Sala 651 bû…

Bi saya Îslamiyetê serdema Ereban dest pê kir, lê li milê din Xorremdîn di nava civakên bindest de wekî alaya berxwedanê li ba bû.

Tevî derketina Îslamiyetê jî fikrên Xorremê di demeke kurt de li nava nîvgirava Ereban jî belav bibû. Wekî çawa di derketinê de bandor li ola Îslamê kir, di cudabûna desthilatdarî û dewletê de, bi awayekî xwezayî bû rênîşandarê civakê û hemû bindestan.

Xorremdîn, di derketina Îslamiyetê de ji bo nirxên manewî û civakî çavkaniya îlhamê bû.

Cewherê yekem ê Şîatiyê bû. Li beramberî Mûaviye, ew Hz. Alî bû. (Maz û Alî, çi tesadufeke xweş e ku hemwate ne: Mezin, Bilind!”

Dîsa, baweriya saf a Ebû Zer û Hz. Rabîa bû.

Di vî warî de Xorremdîn û Îslamiyet ne dijberê hevdu bûn. Kengî dewlet anîn serê Îslamiyetê, kengî ziriyeta Mûaviye xwe anî ser desthilatê û qirkirina Kerbelayê pêk anî, ha ji wê demê û şûn de der heqê Xorremdîn de her cure reşkirin pêş ket û ol hatin beramberî hevdu. Di nava civakê de teyisandina vê rewşê, di lehê Xorremiyan de pir xurt bû. Ya wê civak teslîm bihatana girtin yan jî wê dewleta Emewiyan bihatana xerakirin! Di vî karî de rêyeke navberê tine bû.

Dewleta Emewiyan li herêmê zilmeke mezin li hemû gelan û baweriyan kir, lê civak teslîm nebû.

Çi kirin jî nikarîbûn ew agirê Xorremê di wextê xwe de xistibû nav dilê civakê bitemirînin. Berevajî, ew fikra ku dewleta zilmê hilweşand, fikrê Xorremî bû!

Hemû dîroknasên bi heqîqetê ve girêdayî ev rastî qebûl kirine. Yek ji bandorên herî girîng a berxwedana Xorremî di dîrokê de çêkiriye ew e ku piştî qetilkirina Hz. Alî, li dijî dewleta Emewî ya ku xwe kirin desthilatdar, ol bi kar anîn û hemû herêm kirin gola xwînê, bû alaya berxwedanê. Di vê babetê de Xorremdîn bûye şûrê edaletê yê Ebû Muslimê egîdê Xorasanê ku dawî li zilma Emewî anî.

Ebû Muslim li dijî dewleta Emewiyan hevbendiya Abbasiyan kiriye. Lê wekî hatibû îdîakirin ne fikriyata Abbasiyan, fikrê Xorremiyê ya ku mohra xwe li çanda gelê Xorasanê dayê esas girtibû. Esas sebeba qetilkirina wî ya bi destê Abbasiyan jî jixwe ev bû.

Heger egîdî, li dijî zilmê rakirina şûr be, fikrê ku wî şûrî pê dide girtin jî fikrê Xorremî ye. Derew, çepandin û bêbextiyan nikarîbûn vî fikrî tine bikin, wisa lê hatibû ku kelha fedaiyan Alamût bi heman fikir û heman ruhê berxwedanê hatibû avakirin.

“Xençera” ku di destê fedaiyên Hasan Sabbah de hem bû esker hem jî dîplomat, xençera Şervanên Kewyar bû. Fikrê Xorremî nebûya, ma fedaiyan dikarîbûn hêza aqlê civakî bi kar bianiyana?

Modela yekemîn a terzê perwerde, rêxistinbûn û jiyana Karmatiyan jî ku komunparêzên herî yeman ên dîrokê ne, Xorremdînê pêk aniye.

Yê dipeyivî Xallacê Mensûr bû, lê heqîqeta di dilê wî de Xorrem bi xwe bû.

Wekî alaya raperîna gelên bindest, li ser bircên “Bajarê Azadiyê” di pêşengiya Alî Îbn Muhammed de hate çikandin.

Piştî 300 salan, fermandarê têkneçûyî yê gerîla Babek Xorremî navê wê bi onûreke mezin hilgirt.

Ji ber karakterê wê yê civakparêz, berxwedana 300 salan bi navê Xorremê hatibû bibîranîn. Di wan berxwedanan hemûyî de ku ji bo dewlet-desthilatdariyê nehatin pêşxistin û hedefa wê ew bû ku gel jiyana xwe ya azad û komunal û sîstema xwe ya parastinê ava bike, şopa wê hebû. Ji Babaiyan heta Tevgera Bedreddînî, di hedef û armancên wan de karaktera Xorremdînê her tim diyarker bûye.

Xorremdîn, dûvre jî ji bo hemû şervanên heqîqetê bûye rehber.

Heta ku mirovahî hebe wê navê wê were bîranîn, xeyalên wê bijîn.

Her kesên behsa felsefeyê dikin, mecbûr in Xorremê bi bîr bînin. Dema wekhevî û edalet hat gotin, wê Xorrem were bîra mirov. Di wêrekî û egîdiyê de her tim wê behsa wê bê kirin. Her kesên ku ji bo azadiya jinê şer dikin, wê nasnameya Xorremî bi onûr hilgire.

Ne tesaduf bû navê cîgira Babek, şervana herî yeman a jin, yek ji navên şervanên egîd a Kewyar bû. Navê wê jî Azîn bû! Azîn, şervana herî xweşik û wêrek a gundê Kewyaran, hevrêya Hoşeng, Şîrîn, Şîrvan, Şeydayê û şagirta Xorremê! Piştî 300 salî careke din wekî cîgira Babek derdikeve ser dika dîrokê û li dijî zilma Abbasiyan dibe şûrê tolhildana dîrokî ya gelan.

Her kesên ku hevrêtiya Xorremê kiribûn di berxwedanên nû de jiyan dikirin. Bawerî û dilsoziyên herî xurt, hevrêtiyên herî samîmî bi navê wan dihate bibîranîn.

Xorremê agirekî wisa pêxistibû ku enceq bi heybeta Rojê dikarîbû bihatana terîfkirin.

Bû agirê ocaxên natefe yên Êzidî, Yarsan, Ehlê Heq, Elewîtiya Qizilbaş û alaya berxwedana hemû jinan. Li ser navê wê artêşên sor hatin avakirin.

Qaşil guherî, wext guherî, nav guherî, cewher neguherî. Li xakên Hindistan, Afganistan, Azerbaycan, Gurcistan, Ermenistan, Sûriye, Iraq, Erebistan, Yemen, Bahreyn, Misir, Kurdistan û Anatolyayê berxwedanên Xorremî sedsalan dewam kir.

Xorrem, di hemû deman de bû dayika raperînên azadiyê!

Egîdî, tenê ne ketina nav şerê azadiyê ye, di her şert û mercî de domandina azweriya azadiyê ye.

Li gorî baweriya Xorremî, li kû derê zilm hebûna, wê li wir rêberekî civakê derketana û berxwedan bidomandana. Hinan, ji bo kesên pîroz yên ku çav li hatina wan bû, navê "MOJDEG" bi kar anîn. Ya girîng ew bû ku her demê pêşeng derketana û berxwedan bidomiya.

Berxwedan; li cem qebîle, eşîr, gel û civaka xwe berxwedan, û di demên tenêtiyê de jî berxwedan! Ev terzekî jiyanê bû. Di hemû serdeman de wê dewam bikirana. Wê rê nedana şkestina xeyalan. Dema ku berxwedan bû terzekî jiyanê, wê ne ya ku mirov xwe bigihînê, lê jiyaneke ku divê her tim were avakirin bihatana esasgirtin. Jiyanake civakparêz, azadîxwaz a ku jin nayê bindestkirin, feqîrî tine ye, li dijî zext û zilmê berxwedan pîroz tê hesibandin!

Pêşengê vê jiyanê wê jin bûna! Jiyana azad a civakê wê di azadiya jinê de bihatana dîtin.

Wê di jiyanê de sînor nebûna; ked pîroz bihatana hesibandin.

Mirovê mêze bikirana ka çi li ser ruhê avakar ê zeman zêde kirine û li gorî vê hebûna xwe watedar bikirana.

Bi saya Xorremiyan zeman bi berxwedanê şekil digirt. Sedsalan nikarîbûn rêgeza berxwedanê û avakirinê biguhertana. Jixwe daxwaza Xorrem jî ev bû. Her tim berxwedan, her tim avakirina jiyana azad…

Li ser Çiyayên Med piştî 1500 salî li şopeke ji Xorrem mayî geriyan. Bi zaniyariyên ji wir girtî, çûn Reyê û ji wir jî dema agahiyên pêwîst girtin, çûn Demawendê, Xwediyên Dil!

Dihat gotin li wî çiyayî emanetekî pîroz heye. Dibe ku ev emanet şopeke wan bûna.

Şopek, tenê ji bo şopeke biçûk bidîtana, bi vê hêviyê, rîskên mezin dabûn ber çavê xwe.

Ketin pey şopekê…

## Sirê Emanet

***"Hûn ê bibihîzin, bibihîzin, lê hîç fêm nekin
Hûn ê binêrin, binêrin, lê hîç nebînin" (Tewrat)***

Heqîqet, dikare bi şeklên cur bi cur xwe nîşanî her kesekî bide, lê ji bo dîtinê çav tenê têrê nake.

Hemû bêrehmiyên heyatê li ser hev kom bibûna jî ji bo bidestxistina xatirayeke ji Xorremê mayî hêjayî kişandinê bû. Ji bo şopekê tenê 10 sal in li ber xwe didan. Herî dawî bihîstibûn li herêmekê şopek heye û ber bi wir ve ketibûn rê. Bi vê agahiya ku piştî deh salan girtibûn, xwe nedabûn benda zivistanê jî. Bi îdîa bûn û xwe bi van gotinan motîve kiribûn:

"Li ser emanetê pîroz têkildarî Xorremê îşaret hebûne. Di rastiya Xorremê de sirê gerdûnê veşartiye. Dema ku em şopekê bibînin, em ê sirê gerdûnê jî fêm bikin!"

Ji rojan spî bû, ango Sêşem. Spîbûn, ne ji ber berfê bû. Digot piştî her tarîtiyekê, ronahiyek tê. Ew hêna ne di ferqa vê de bûn û ketibûn ser rê.

Ji çaxa ku erebeya xwe hiştibûn û dest bi meşê kiribûn, hema hema 14 saet derbas bibû. Gelo beriya bigindiriyana kendal wê karîbûna emanetê pîroz bidîtana? Ji nav wan yekî hema hema xwe bi zorê ji devê kendal xelas kiribû!

Rehber her tim hêvî dida, digot, "kêmekî li ber xwe bidin, kêm ma."

Dema ku navbereke biçûk dan, rehber ji bo wan straneke egîdiyê ya dilşewat got, strana "Çiyakanî". Straneke pir kevn a Kurdî bû:

"Çiya, sirê min diparêzin! Çiya, derdê min fêm dikin!
Çiya, welatê yara min, çiya çîleya hezkirina min…"

Piştî navberê, lez dan xwe. Mîna ku ne li ser rêyên berfgirtî, lê li ser patîkayeke tijî kulîlk dimeşin, tijî enerjiyeke nû bibûn.

Ber bi êvarî dîsa berfê dest pê kir. Pir kêm mabû bigihîjinê. Rehber got:

-Ti gir neman. Hema hema qediya. Li dawiya vê dolê zinarek heye, dema ku me ew jî derbas kir, em ê bigihîjinê.

Vê carê heman his bi her kesî re çêbû. Gotin, “erê, qediya, em gihiştinê!”

Dol derbas kirin, bi lez bi zinar rapelikîn, derketin qadeke dûz. Bi qasî çav dibîne, qadeke spî li pêş wan bû. Dûzbûn derbas kirin û hatin qiraxa kendalekî. Rê qediya! Wê çawa derbasî milê din bûna? Heke “Qeyikek Hewayê” ya di mîtolojiyan de dihate behskirin hebûna, dikarîbûn derbas bibûna.

Rehber:

“Heta vir e! Gundê kevn ê ku em lê digeriyan, li milê din ê kendal e. Ez jî nizanim em ê çawa derbasî milê din bibin.”

Ji qiraxa kendal virde wêde çûn û hatin, li derbasokekê geriyan. Li kû nêrîn vala ye! Dikarîbûn vegeriyana, ji dolê dar bibiriyana, bikirana wekî pirekê û derbas bibûna. Yê ku ev fikir anî ziman, dema çû li milê din ê kendal nêrî, ji ber mesafeya wê xwe bêdeng kir. Diviyabû rêyek hebûna. Piştî ewqas zehmetê nikarîbûn hema wisa vegeriyana. Yek-du fikrên din hatin ziman, lê ew jî bêdeng bûn. Bêçare, bêdeng bûn.

Ji bo ku karibin şopeke wan bibînin ewqas zehmetî dabûn ber çavê xwe. Bêdeng difikirîn, tenê yekî ji nav wan fikir kir ku li cihekî şaş li şopê digerin, ew jî rehber bû!

Ew rêya ku tê re hatine, di serê wî de fikrên pir cuda ava kiribûn. Şopa lê digeriyan, rê bi xwe bû. Ev rê ji nava civakê dihat. Dema vegeriyan jî wê dîsa ew bibirana nava civakê bi xwe.

Ew şopa lê digerîn, di nava civakê de bû? Di her zindiyekî de!

Têkoşîna Xorremê ji bo vê bû, di nava civakê de şopeke jênaçe hiştibû. Ya pêwîst ma ne fêmkirina wê bû? Destana Xorremê, destana civaka berxwedêr bû! Destana her kesên berxwedêr bû!

Xwest van tiştan bibêje, lê dudil ma. Gelo wê hevalên wî çi jê re bigotana?

Dikarîbûn bigotana, “piştî rêwîtiyeke ewqasî tehde û bi rîsk tu yê me bi vê teselî bikî?” û xwe pê re aciz bikirana. Yê ku ew heta vir anîbûn ew bi xwe bû, rehberî kiribû.

Dora her tiştekî hebû. Ji zeman re hişt. Bêdeng ma.

Hemû bêdeng bûn. Bêçarebûna li beramberî kendal mezin bû. Bêdengî bi qasî kendal kûr bû.

Dema tarîtî diket, ji binê kendal dengekî kûr û dirêj ê tîlîliyê hate guhê wan. Dengê jinekê bû. Hesta hem êşê hem jî egîdiyê bi hev re dida. Di dilê wan de bandora volkanê çêkir.

Bi wî dengî bawer nekirin. Rehber bêdeng ma, yên din peyivîn.

Gotin ba ye. Gotin dengê tîlîliyê û ba dişibe hev!

Deng careke din hat. Bi çavên tirsnak hemûyan li hev mêze kirin. Qîrîneke şadî, qîrîneke êşê yan jî qîrîneke şer bû?

Di carekê de hat bîra rehber ku di nava komê de hîç jin tine ye û ev şaşiyek e:

Bi pistepist got, "ev deng, dibe ku dibêje ez jî heme!"

Destê xwe danî ser dilê xwe û bi dilnizmî ber bi kendal ve bejna xwe bi rêzdarî xwar kir. Bi şeklê ku bibêje, "ez li vir im û te dibînim" got, "Hû!" Dengê wî olan da.

Kendal bersiv dayê:

"Hû!"